Dr. Abdurehman Qasimlo

# KURDISTAN Û KURD

## LÊKOLÎNEK SÎYASÎ Û ABORÎ

JN Wesanên Jîna Nû

Weşanên Jîna Nû: 26
Beşê tarîxê: 8
Çapa Yekem: Îlon 1991

**Navnîşan:**
Jîna Nû Förlaget
Post Box: 30
740 22 Bälinge

Postgiro: 50 37 99-9

ISBN: 9188054-08X

Dr. Abdurehman Qasimlo

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

# KURDISTAN Û KURD

## LÊKOLÎNEK SÎYASÎ Û ABORÎ

Kurdiya wê: Elîşêr

JN Weşanên Jîna Nû

# TÊDE

PÊŞGOTIN JI BO ÇAPA KURDÎ....11
PÊŞGOTINA ÇAPA ÎNGILÎZÎ....15

**BEŞÊ YEKEM**
BEHSA DÎROK Û COXRAFYAYÊ

**Fesla Yekem - KURDÎSTAN Û NETEWA KURD**
1- Kurtîyek ji Coxrafyayê ....19
Av û Hewa.... 19
Cemên Kurdistanê....21
Golên Kurdistanê....23
Daristan....24
Serwetên Bin Erd ....25
2- Danişţiwan (Nifûs)....26
3- Ayîn (Dîn)....32
4- Ziman û Edebiyat....34
5- Xwendin ....35
6- Leşsaxî ....39

**Fesla Duyem - KURTIYEK LI SER DÎROKÊ**
1- Eslê Kurdan....41
2- Kurd di Dema Kevin de....42

3- Kurd di Qirna Navîn de.....43
4- Kurd di Dema Nû de.....46
5- Xezînên Dewletên Emperyalîst li Kurdistanê.....50
6- Kurdistan Piştî Şoreşa Mezin a Sosyalîst a Oktobrê.....53

**Fesla Sisiyan - PARVEKIRINA KURDISTANÊ**
1- Kurd li Tirkiyê.....58
A- Mesela Kurd û Daşnak.....62
B- Mesela Kurd û Partiyên Sosyal Demokratên Avrûpa.....63
C- Siyaseta Kemalîstan di Asîmîlasyona Gelê Kurd de.....66
2- Kurd li Iraqê.....72
A- Mesela Mûsilê.....76
B- Li Kurdistanê Monopolên Petrolê.....78
3- Kurd li Îranê.....82
4- Sebebên Serîhildanên Kurdan û Armancên Wan.....83
5- Komara Mahabad.....86
6- Kurd li Suriyê.....93
7- Kurd li Yekîtiya Sovyetan.....94

**BEŞÊ DUYEM**
ABORIYA KURDÎ

**Fesla Çaran - NÊRÎNEK GIŞTÎ LI SER ABORIYA KURDISTANÊ**
1- Çend Dêmenên Giştî di Warê Aborî de.....97
2- Hinek Zanyarî ji Kurdistana Îranê.....101
3- Seviya Berhemên Çandinî.....102
4- Avdanî.....105

**Fesla Pêncan - NÊRÎNEK GIŞTÎ LI SER DÎROKA CIVAKA KURDISTANÊ**
1- Pêşdeçûyina Dîroka Milkiyetê.....108
2- Kurdistan Wek Beşek ji Bazara Cîhanê.....117
3- Çêbûna Eşîretên Kurdan.....120
4- Guhertina Terkîba Aborî.....128

**Fesla Şeşan - AWAYÊN MILKÎYETA AXÊ**
1- Milkên Xwedî Milkan.....134

2- Milkên Dewletê.....137
3- Milkên Padîşa..... 139
4- Axên Weqfê.....142
5- Axa Gundiyan.....143

**Fesla Heftan - AWAYÊ MILKÎYETA AXÊ**
1-Ranta Aynî, Zireeta Şirîkatî (Nezmê Şerîkebeş).....147
Nîvekarî..... 151
Ji Sisiyan Yekê Ber (Sêyekberî)..... 151
Sê Par (Sê Beş)..... 151
Ji Dehan Dudu.....152
Birinc.....152
Berhemên Sanayî.....153
a- Pincarê Şekir.....153
b- Titûn..... 154
c- Pembo.....155
Baxên Fêkîyan (Meywan).....155
Sebebên Din ên Parvekirina Berhemê.....156
2- Ranta Pere..... 159
3- Ranta Kedê û Koletiya Gundî..... 162
4- Behra Milkî ya Xwedîkirina Heywanan.....169
5- Behra Milkîyeta Sermayedarî.....173

**Fesla Heştan - AVABÛNA CIVAKÎ YA GUNDÎTÎYA KURDISTANÊ**
1- Pêkhatina civata gundîtiyê ya Kurdistanê..... 176
1- Xwedî Milkên Mezin.....177
2- Xwedî Milkên Navîn.....177
3- Malîkanên Biçûk.....177
4- Cotkarên Navîn..... 177
5- Cotkarên Bêax.....178
6- Karkerên Çandinîyê..... 178
7- Hinek Tebeqên Din..... 178
2- Rewşa Cotkaran.....181
A- Faîz..... 183
B- Seviya Jiyana Cotkaran.....184
3-Berhemdariya Çandiniyê û Siyaseta Çandiniyê.....187

**Fesla Nehan - SANAYÎ, BAZIRGANÎ Û REWŞA MALÎ**

1- Sanayî....................................................................197
Rola Beşê Giştî -Dewlet-....................................................199
2- Bazirganî û Rewşa Malî ....................................................202
A- Bazirganîya Derve.............................................................202
B- Rewşa Malî ......................................................................207

**Fesla Dehan - CÎYÊ PETROLÊ DI ABORIYA NETEWÎ DE**

1- Petrol di Cîhanê de...........................................................212
2- Petrola Rojhilata Navîn û Monopolên Petrolê .....................214
3- Şirîkatîya 50-50 û Cîbicîkirina wê.......................................218
4- Millîkirina Petrolê..............................................................227
5- Peywendîya Petrolê bi Pêşkevtina Aborî ve .......................230

**Fesla Yanzdehan - PROBLEMÊN ABORIYA GIHAŞTÎ**

1- Serxwebûna Siyasî û Pêşkevtina Aborî...............................235
2- Peywendîya Dumilî ya di Navbera Çandiniyê
û Danîna Sanayîyê de.........................................................237
A- Warê Başkirina Avakirina Sanayîyê....................................237
B- Başkirina Çandinîyê û Handana (teşvîkkirina)
Berhemên Çandînîyê.............................................................240
C- Hinek Problemên Avakirina Sanayîyê.................................244
3- Bilindkirina Sevîya Jîyanê ..................................................245
4- Helbijartina Riya Pêşdeçûnê...............................................247

**BEŞÊ SISIYAN**

MESELA KURD

**Fesla Donzdehan - MESELA KURD DI DEMA ÎRO DE**

1- Karekterê Taybetî yê Mesela Kurd .....................................255
2- Rewşa Niha ya Kurdan.......................................................258
3- Cihêbûnên Netewayetî yên Kurdan.....................................264
4- Karektera Xebata Rizgarîxwazî ya Gelê Kurd......................268

**Fesla Sêzdehan - MAFÊ QEDERA XWE BI XWE TAYÎNKIRINA NETEWAN Û MESELA KURD**

1- Marksîzm û Mafê Qedera xwe bi xwe Tayînkirina
Netewa Kurd....................................................279
2- Daxwaza Damezrandina Dewletek Serbixwe ya Kurd ........282
3- Riya Rizgariya Gelê Kurd.........................................289

NETÎCE..................................................................293
GOTINA DAWIYÊ JI BO ÇAPA KURDÎ...............................299
**Îlava yekem**
Bendên Beyannama 11'ê Adara 1970'yan.............................303
**Îlava duyem**
Biryara Partiya Karker a Tirkiyê li ser Mesela Kurd.............307
**Îlava sêyem**
Programa Partiya Demokrat a Kurdistanê (Îran) ....................309
SEROKANÎ..............................................................321

## PÊŞGOTIN JI BO ÇAPA KURDÎ

Hemû kitêb xwedîyê dîrokekê ne, kitêba "Kurdistan û Kurd" jî di beşa warê xwe de xwedîyê serpêhatîyek dirêj e. Sala 1953'yan hevalekî xebatker û dostekî nêzîk, pêşniyarê min kir ku ji bo ronîkirina hinek warên sîyasî yên mesela Kurd broşurekê binivîsim. Lêbelê, gelek zû derket ku ev gîrûgirifta han bi broşurekê nayê çareserkirin. Min soz da wî hevalî ku ez ê li ser gîrûgirifta Kurd kitêbekê binivîsim. Gelek mixabin serkevtina derba sala 1953'yan, ku bû sebebê hilweşandina hukumeta netewî ya Musaddiq û serdestîya rejima dîktatorî û zordarî, min ji vî karî şûn de xist ku ez sozê xwe bicî bînim. Hel û mercên têkoşîna nehênî û nebûna serokanîyên pêwîst li ber dest ji bo nivîsandina kitêbek zanistî li ser mesela Kurd, çend salên din jî vî karê han bipaş xist. Lê her ji wê gavê şûn de berhevkirina malzemên pêwîst ji hemû navçên Kurdistanê min ji xwe re wezîfek zanî û gelek hevalên dilsoz jî di vî warî de alîkarîya min kirin.

Min ji sala 1957'an şûn de dest bi nivîsa kitêbê kir û sala 1962'an ew amadê çapê bû. Di navbera wan pênc salan de min gelek hewil da ku herçi serokanî li ser Kurd û Kurdistanê hatine nivîsandin bi dest bixim û îstîfade jê werbigrim. Bi rastî jî ez dikarim bêjim ku ez wisa dizanim qet kitêbek girîng û serokanîyek bi qîmet nebû ku

peywendîya wê bi Kurdolojîyê ve hebe û çavê min pê neketibe. Ez dixwazim vê yeka han jî bêjim, ku piştî min nivîsandina kitêbê xelas kir ji ber berfirehbûnên tevgera rizgarîxwazî ya gelê Kurd (bi taybetî li Kurdistana Iraqê) kitêb û broşurên gelek zêde li ser hemû warên jîyan û xebata gelê Kurd hatin belav kirin, ku hinek ji wan bi rastî hêja bûn. Lê min nekarî ji bo nivîsîna kitêbê îstîfade jê bikim.

Ev kitêba han di eslê xwe de wextê ez li Pragê bûm bi Çekî hat nivîsandin. Sala 1963'an Binkeya Weşanên Akademîya Zanistî ya Çekoslovakî li Prag biryar da, kitêbê bi zimanê Çekî biweşîne. Lê her di wê navê re Binkeya Belavkirina Sîyasî li Bratîslava, da xuyakirin ku dixwaze kitêbê bi zimanê Slovakî belav bike. Bi vî awayî çapa Slovakî sala 1964'an wek yekemîn çapa kitêba "Kurdistan û Kurd" hat belav kirin. Ji bo ku zimanê Çekî û Slovakî gelek nêzîkî hev in û Çekî gelek bi hêsanî nivîsên bi zimanê Slovakî dixwînin, min daxwaz ji Binkeya Akademîyê kir ku ez rê didim wan kitêb bê wergerandin bi zimanê Ingilîzî da ku li derveyê Çekoslovakyê jî îstîfade jê bê kirin. Binkeya Belavkirinên Sîyasî li Bratîslava ji bo ku kitêb zêdetir bê çapkirin û hem jî zêdetir dîqet bikşîne hinek cîyên beşê ji derveyî sîyasî ya kitêbê kêm kir û gelek nimûnên xweşik jî li ser jîyan û xebata gelê Kurd ji hemû perçên Kurdistanê li ser zêde kir. Çapa Ingilîzî ji ber wergerê paşket û ancax sala 1965'an derket. Ev çapa han bê destlêdan hemû hatîye çapkirin, hêjayî gotinê ye Binkeya Akademîyê serbestîyek temamî dabû nivîskar. Dema Akademî bi çapa Ingilîzî ve mijûl bû, Binkeya Koleja London pê re lihev kir ku çapek din jî ji bo vê Binkeyê amade bike. Yanî du çapên kitêbê yên Ingilîzî hene; yek a Binkeya Akademîya Prag û ya din jî ya Binkeya Koleja li London.

Çapa Erebî yekem car di sala 1967'an de li ber çapa Ingilîzî hatîye tercumekirin û weşandin. Sala 1970'yan çapek kurtkirî ya Erebî ji alîyê Daru'l Neşrî Lubnan ve li Beyrudê hatîye belav kirin. Bi vî awayî kurtkirin û çapa kitêbê bi bê agahdarîya nivîskar bûye.

Sala 1969'an li Varşovayê ji alîyê Binkeya Belavkirina Polonî (Lehîstan) "Kitêb û Zanist", "Kurdistan û Kurd" ji ber çapa Ingilîzî hatîye wergerandin ser zimanê Polonî û belav bûye. Ferqa

çapa Ingilîzî û Polonî tenê ew yeka han e ku min pêşgotinek taybetî ji bo çapa Polonî nivîsandîye, ku ev pêşgotina han hewil dide hinek cîyên kitêbê ji hêla sîyasî de ji bo xwendevanên Polonî hîn zêdetir ronî bike.

Va ye niha çapa Kurdî ya kitêba "Kurdistan û Kurd" li ber destê we ye. Dîyar e, tiştek ecêb e kitêb ji alîyê Kurdekî ve li ser gîrugiriftê Kurdan hatibe nivîsandin û ji nû ve piştî ku bi çend zimanên bîyanî hatibe belav kirin û deh sal di ser nivîsa wê re derbaz bibe, şûn de bi Kurdî têt çapkirin. Lê çarenivîsa vê kitêbê 'eksek ji çarenivîsa nivîskar e, ku ew jî 'eksek ji çarenivîsa gelê Kurd e.

Daxwaza min ew bû kitêba min zûtirîn bi zimanê Kurdî bê belav kirin. Her çend deh sal jî di ser re derbaz bûbe, ez gelek dilxweş im ku daxwaza min bi cî hat.

Lê ez dixwazim hinek tiştan li ser çapa Kurdî ronî bikim. Çapa Kurdî di eslê xwe de ji çapa yekemîn a Erebî hatîye wergerandin. Gelek mixabin hinek cîyên çapa Erebî ya ji ber çapa Ingilîzî hatibû kirin, gelek vekirî nebûn, ji ber vê wergera Kurdî tûşî asteng û gelşên mezin bû. Ji bo vê yekê ez mecbûr mam hemû metnê Kurdî carek din di bin çav re derbaz bikim û gelek cîyan jî dest lêbidim. Çapa Kurdî niha her wek ji Ingilîzî hatibe wergerandin wisa ye.

Ev kitêba han di wextê xwe de ji bo bîyanîyan hatîye nivîsandin. Ji ber vê hinek tiştên wisa tê de ne ku ji bo xwendevanê Kurd wek tiştên zêde bên berçav. Lê cardin min rast nezanî di vî warî de dest lê bidim û guherandinê tê de bikim. Min gelek hewil da ku kitêb her wek xwe di destpêkî de çawan hatîye nivîsandin bi wî awayî bigihîje destê xwendevanê Kurd û tenê hinek cîyên gelek pêwist nebin min neguherandîye.

Dîyar e di navbera sala 1957'an û sala 1973'an de şanzdeh sal ferq heye û di van şanzdeh salan de gelek guherînên aborî, civakî û sîyasî bi ser hemû perçên Kurdistanê, bi taybetî Kurdistana Iraqê û Îranê de hatine. Wek nimûne peywendîya cotkaran li Kurdistana Îranê wek 20 sal berî niha nemaye. Lê, li gel vê jî li hinek cîyên gelek pêwîst nebe, wek zêdebûna hejmara nifûsa Kurdistanê, min pêwistî nezanî tiştekî bi ser de zêde bikim. Ew cîyên ku min bi ser de zêde kirîye jî metnê kitêbê her wek xwe maye û têbînîyên nû di perawêzên kitêbê de cîyên xwe girtine. Ew pera-

wêzên di çapa Kurdî de li ser hatine zêde kirin bi vê îşareta han (*) ji yên berê hatine cihêkirin.

Ez pê xweş im dîqeta xwendevanê Kurd bikişînim ser vê rastîya han jî, ku ne tenê werger belko nivîsîna kitêbên zanistî jî bi zimanê Kurdî gelek dijwar e, ji ber ku carek gotinên zanistî hîn cîyên xwe negirtine. Ji ber vê em naçar bûn yekemîn car hinek gotinên nû çêkin û bikar bînin. Armanca me ji vê ne ev yeka han e ku me (nivîskar û wergêr bi alîkarîya gelek kesên Kurdîzan) ev gotinên nû danîne û êdî temam e û nabe dest lê bêdan. Ji ber ku di milekî de em naçar bûn di milekî din de jî em li ser vê bingehê meşîyan ku em wiha datînin ku yekî din baştir bike. Hem di danîna gotinan de û hem di awayê bikaranîna ziman de me hewil da ku hem Kurdîyek saf û rewan binivîsin û hem wisa be ku xwendevan bi rehetî têbigihê. Bi taybetî hewil hatîye dan qet gotinek destkir û durustkirî ku ji zimanê Kurdî re xerîb e neyê bikaranîn. Ji bo rehetkirina karê xwendevan gotinên herî girîng ên me çêkirine li gel mana wan me cihê çapkirine.

Di vir de ez wezîfe dizanim sipasî wan hemû kesan bikim, ku ji bo çap û belavkirina vê kitêba han bi Kurdî, alîkarî dan me. Bi taybetî sipasê wergêr dikim ku bi kurî û dilsozî kitêb wergerand Kurdî û ji bo amadekirina çapê zehmetek zêde kêşa. Aşkera ye berpirsîyarê hemû bîr û baweriya ku di vê kitêbê de hatîye nivîsandin, tenê nivîskar bi xwe ye.

**Nivîskar**
**Cozerdanê 1352 (Hezîran 1973)**

## PÊŞGOTINA ÇAPA ÎNGILÎZÎ

Kurdistan û Kurd ku heta van dawîyên han du gotinên nenas bûn, li hemû dinyayê ketine ser gotin û zimanan. Wezîfa vê kitêbê ev yeka han e, ku van herdu gotinên han baştir bi xwendevanan bide nasîn.

Ev kitêba han behsek aborî û sîyasî ye, lê ez naçar bûm beşa yekemîn ji bo behsa coxrafya û dîrokê amade bikim. Aşkera ye daxwaza min ew nîne ku coxrafya û dîroka Kurdistanê binivîsim. Armanca min tenê ev e ku xwendevan hemû alîyên jîyana gelê Kurd binase. Ev yeka han ji bo têgihîştina gelşa aborî û sîyasî tiştekî pêwîst e.

Beşê duyem ê vê kitêbê peywendîya çandinî ya Kurdistanê dikole. Wisa têt berçav ku hinek behs gelek bi dirêjî hatine nivîsandin, lê, ez di wê bawerîyê de me lêkolîna dûr û dirêj a çandinîya Kurdistanê, ku liqa mezin a aborîya welatê me ye, alîkarîya ronîkirina gelek gelşên aborî û yên din dike.

Di beşê sêyem de min xwestîye ez behsa van herdu gelşan bikim:

Yekem, ronîkirina rewşa netewayetî û sîyasî ya mesela Kurd di rîya teorîya zanistî de û anîna holê hinek pêşnîyaran ji bo çareserkirina wan.

Duyem, lêkolîna hinek gelşên pêşveçûnên aborî ku ew welatên di warê aborî de paş de mayîne tûş dibin û lêkolîna vê ku bi kîjan awayî pêşdebirin û geşkirina hêzên berhemdarî bi tevayî û zû mil dide ber.

Dîyar e min wek Kurdekî karîye hinek zanînên hêja di riya gelek serokanîyên cihê re ez bidest xim. Lê di vî warî de ez tûşî asteng û gelşên zêde bûm. Ji ber ku zanyarîyên aborî bi taybetî materyalên li ser Kurdistanê yan qet bi dest nakevin, yan ger bi dest kevin bi tevayî rast û deqîq nînin. Vêca ew zanyarîyên di warê çandinîyê de hatine nivîsandin û serokanîyên wan nehatine dîyarkirin, hemûyan min bi xwe û yan bi alîkarîya hevalên xwe di nav welat bi xwe de berhev kirin.

Di vir de ez heq didim vê têbinîya han jî, ku qet kes nîne li ser netewa xwe û di warê jîyan û xebata netewa xwe de binivîse û bikare bi tevayî bê teref bimîne. Ji ber vê min hewil da di lêkolîna gelş û astengan de ji çarçova nêrînek rasteqînî dernekevim. Armanca min ev e ku Kurd û Kurdistanê wek hene, bê kêm û zêdeyî nîşanî xwendevanan bidim. Daxwaza min ev yeka han jî nîne ku riya çareserîkirina hemû wan gelş û astengên ku ez behs dikim nîşan bidim, her çendîn di yekemîn nêrînê de wiha bê berçav jî. Bi gelemperî, li gor vê meseloka Kurdî ku dibêje: Xwendin wek wê ye ku çal bi derzîyê bê kolandin. Dîyar e dibe xwendevan bi xwe biryar bide ku ez heta çi derecê di vê daxwaza xwe de bi ser ketime.

**Nivîskar**
**Adar 1965**

BEŞÊ YEKEM

# BEHSA DÎROK Û COXRAFYAYÊ

FESLA YEKEM
# KURDISTAN Û NETEWA KURD

## 1 - Kurtîyek Ji Coxrafyayê

Kurdistan, welatê Kurdan(1) di Asya rojava de ketîye ser beşê Rojhilata Navîn û dewletek serbixwe jê pêk nehatîye, ji ber ku axa Kurdistanê di navbera Îran, lraq, Tirkîye û Surîyê de hatîye parvekirin. Gotina Kurdistanê bi resmî û bi awakî navnetewî îtîraf pê nehatîye kirin û di nexş û kitêbên coxrafyê de nakevin berçav. Gotina Kurdistan ji derveyî Îranê, ku tenê ji bo navça Sine

---

(1)Gotina Kurdistan cara yekem di sedsala 14'an de di wextê fermanrewatîya Selçukîyan de hatîye bikaranîn. Binêre kitêba Nezhetu'l-Qulûb a Hemdullah Mestufî, ku di navbera salên 1335-1340'an de nivîsandîye û di wir de dibêje: *"Kurdistan ji 16 wilayetan pêkhatîye, av û hewaya wê sazgar e û li gel Iraqa Ereb, Xozistan, Iraqa Ecem, Azerbeycan û Dîyarbekir hevsinor e"*. Ev yeka han dide nîşan ku wî çaxî Dîyarbekir bi resmî beşek ji Kurdistanê nebûye û wilayetek serbixwe hatîye nivîsandin.

Her wiha Ewlîya Çelebî yê gerokê Tirk ku di sedsala 17'an de piştî gera hemû navçên Kurdistanê navûdengê wî belav bû, wiha dinivîse: *"Kurdistan ji wîlayetên Erzirum, Wan, Hekarî, Dîyarbekir, Cizîr, Amêdî, Mûsil, Şarezor û Erdelan pêk tê û rîya hevde rojan e"*.

M. Fany: Nation Kurde et son Evolution Sociala, Paris 1933, p. 129

tê bikaranîn, li tu cîyekî din resmî nayê bikaranîn.[2]

Madem wiha ye vêca dîyarkirina hemû sinorê Kurdistanê hinek giran e, lê bi lêkolîna wan melbendên Kurd tê de niştecî ne û di hêla dîrokê û bi hev ve girêdanî de yek welat têt hesêb kirin, mirov dikare sinorê Kurdistanê bi vî awayî bide dîyarkirin:

Ji bakurê rojhilat de ji Çîyayê Ararat ve bi xetek rast destpê dike, ber bi başûr ve ji beşê başûrê Zagros û Piştko têt xwarê, ji wir xetek rast ber bi rojava dikişe heta digihîje bajarê Mûsilê li Iraqê, ji vir ve xetek rast ber bi rojava ku ji Mûsilê digihîje beşê Tirknişînê bajarê Îskenderunê û ji vê noqtê ve xetek ber bi bakurê rojhilat ve dikişe û heta digihîje Erzirum li Tirkîyê, pişt re ji Erzirumê ve xetek ber bi rojhilat ve tê û heta digihîje Çîyayê Araratê.

Bi vî awayî pîvana Kurdistanê hemû li ser hev dike nêzîkî 409.650 kîlometre çargoşe[3] yanî heta ji axa Britanya, Holanda, Belçika, Isviçre (Swisre) û Danimarkê mezintir e. Axa Kurdistanê 194.400 kîlometre çargoşe ketîye ber Tirkîyê , 124.950 kîlometre çargoşe ber Îranê, 72.000 kîlometre çargoşe ber Iraqê û 18.300 kîlometre çargoşe jî ber Surîyê[4] Dirêjahîya Kurdistanê ji

---

(2)Kurdistan beşê rojavayê Îranê yê ku Kurd tê de niştecî ne...lê pêwîst e bê gotin ku yekem: li beşê rojava, ew axa sunnî tê de rûdinin xelkê navê wê danîye Kurdistan û duyem : xelkê rêzê (sade) ji bajarê Sine re dibêjin Kurdistan". (Ferhenga Coxrafya Îranê, bi zimanê Farisî, cilda pêncan, Tehran 1949-1954, rûpel; 356). Bê feyde nîne ku em bêjin : Kurdistan li Îran bi "rojava", li Iraq bi "şimal" û li Tirkîyê bi "Anadola rojhilat û Anadola başûrê rojhilat" têt binavkirin. -Nivîskar.

(3)Hinek akademî û komelên Kurd dibêjin pîvana Kurdistanê ji 500.000 kîlometre çargoşeyan derbaz dibe û ji serê şaxê Araratê ve heta digihîje Xelîcê Faris û Behra Spî jî dikeve ber. Binêre wê nexşa ku Merkeza Lêkolîna Kurdî li Parîsê di sala 1949'an de belav kirîye. L. Rambout pîvana Kurdistanê 530.000 kîlometre çargoşe dinivîse.

L. Rambout : Les Kurdes et le Droit, Paris 1947, p. 12

(4)Herêma Kurdnişînê Surîyê di nav axa Surîyê de bi serhev de nîne û çend melbendên Erebnişîn wê ji hev cuda kirîye, lê hemû beş bi ser Kurdistana Tirkîyê û Iraqê ve ne. -Nivîskar.

bakur ber bi başûr ve 1000 kîlometre ye û dereca navendî ya panîya Kurdistanê milê alîyê başûr 200 kîlometre ye û piştre dema mirov ber bi bakur ve têt zêde dibe û heta digihîje 750 kîlometran(5).

Kurdistan ketîye navbera 30-40 derece panîya rojhilat û 37-48'ê dirêjahîya bakur[6] Kurdistan welatek çîyayî ye, ku xwedî av û hewayek cihê cihê ye. Li rojavayê Kurdistanê Çîyayên Torosê û Banîya Beyn el-Nehir -Cizîr û çîyayên Mêrdînê yên xwarê-, li rojhilat zincîra çîyayên Kurdistanê ku dikevin navbera Gola Wanê û Gola Urmiyê, li başûrê rojava jî Çîyayên Zagrosê hene. Bilintirîn çîyayê Kurdistanê Agiriyê Mezin e, yanî Araratê Mezin e, ku bilindîya wî 5.158 metre ye, piştî vî Çîyayê Reşko yê melbenda Çîyayê Cîloyê tê, 4.168 metre ye, Agiriyê Biçûk, yanî Araratê Biçûk jî 3.925 metre bilind e.

Ne tenê çîyayên Kurdistanê bilind in, dereca navîn a bilindîya welat bi giştî jî heta radeyekê zêde ye. Ji ber ku 1.000 û heta 1.500 metreyan di jorê sevîya behrê de ye. Bajarên wisa jî hene gelek ji vê jî bilintir in, wek Bêcar ku 1.920 metre bilind e û yên wisa jî hene bilindîya wan kêm in, wek Hewlêr ku 430 metre bilind e û ketîye nêzîkî sinorê sehraya Iraqê.

## Av û Hewa:

Av û hewaya deştên Kurdistanê awakî wekhevî ye. Ji ber ku dereca navendî ya baranê di salê de di navbera 200 heta 300 mîlîmeter de ye, lê wan cîyên nizm ku ketine navbera zincîrên çîyan dereca navendî di salê de digihîje 700 heta 2.000 mîlîmetran û hinek caran jî digihîje 3.000 mîlîmetran jî. Piranîya van cîyên han ên nizm çêrîngeh in û çem û rûbar di nav re diçin. Dolên Kurdistanê heta derecek zêde ziwa ne û hinek caran bi te-

---

(5)Ansîklopedîya Britanya wiha dibêje : Dirêjahîya Kurdistanê 600 û panîya wê jî 150 mîl e, lê, Qamusu'l -'Elam dibêje: Dirêjahîya wê 900 û panîya wê jî di navbera 100 heta 200 kîlometran de ye. Stenbol, cilda pêncan, 1896, rûpel; 3840.

(6)Ansîklopedîya Mezin a Sovyetê û Qamusu'l-'Elam behsa 34-39 û 37-46 derecan kirine, Mêjûwî Merdox 32-39 û 39-50 derece nivîsandîye. (Mêjûwî Merdox, bi zimanê Farisî, Tehran, 1954, rûpel; 11).

vayî bê av dimînin. Ji ber ku dereca navendî ya baranê di salê de digihîje 300 heta 500 mîlîmetran.

Ferqa navbera dereca bilind û nizmîya germîyê di Kurdistanê de 80 derece ye. Ji ber ku li "Qerekosê" Kurdistana Bakur dereca germî heta 30-35 derece binya sifir û hinek ji vê jî zêdetir têt xwar, wek di Kanûna Duyem (Befranbar) a sala 1940'an de gihîşte 43 derece binya sifrê. Li Kurdistana Başûr jî havînan li Kirmanşa digihîje 35-45 derece ser sifrê û Xaneqîn digihîje 40-45 derecan. Cetvela hejmara 1 av û hewaya bajarên cuda yên Kurdistanê bi vî awayî nîşandan:

| Bajar | Dereca navîn a germîyê meha Pûşberê (Hez-Tîrmeh) | Dereca navîn a germîyê meha Befranbarê (Kan. Yek-Kan.Duyem) | Dereca Navîn a baranê Di salê de |
|---|---|---|---|
| Malatya | 26,5 | -1,5 | 440 |
| Wan | 22,5 | -3,5 | 380 |
| Urfe | 32 | 4,5 | 440 |
| Dîyarbekir | 31 | 2,5 | 470 |
| Sine | 35 | -15(7) | 500 |
| Kirmaşan | 37,5 | -10 heta -15 | 489 |
| Kerkuk | 41,8 | 12 | 385,2 |
| Xaneqîn | 43 | 14.5 | 385,2 |

**Cetvela hejmara 1**

## Çemên Kurdistanê:

Piranîya melbendên Kurdistanê, ji derveyê hinek cîyên Kurdistana Iraqê û Surîyê ku ketine nêzîkî sehrayê û ne tenê ji bo zîraet, belko ji bo vexwarin û kar û barên nav malê jî ava wan kêm e, tijî serokanîyên avê ne. Serokanîya çar çemên mezin ji Kurdistanê diherik in:

### Çemê Arasê (Eresê):

Ji navça Bîngolê serokanîya wî derdikeve, 435 kîlometreyê wî

(7) Nizimtirîn dereca germê.

di nav Kurdistanê de ye, di navbera sinorê Tirkîyê, Îran û Yekîtîya Sovyetan re derbaz dibe û dirije nav Behra Qezwîn. Dirêjahîya Arasê digihîje 920 kîlometran.

**Çemê Dîcle:**
Li nêzîkê Gola Golcikê li nîverasta Torosên başûrê rojhilat ên bakurê bajarê Dîyarbekrê derdikeve, zêdetirîn 600 kîlometran di Kurdistanê re derbaz dibe, ku ji vî 450 kîlometre di Kurdistana Tirkîyê û nêzîkê 150 kîlometran jî di Kurdistana Iraqê de ye. Hemû dirêjahîya Dîclê 1.900 kîlometre ye.

**Çemê Firatê:**
Ew çiqê bi Qeresu tê navkirin serokanîya wî ji "Dumlutepe" ya bakurê Erzirumê derdikeve û 460 kîlometre ye û serokanîya çiqê din ku jê re Çemê Muradê dibêjin, dirêjahîya wî 615 kîlometre ye ji Çîyayê Aladaxê, ku dikeve navbera Gola Wanê û Agiriyê, derdikeve. Çemê Muradê û Qeresu, li bakurê rojavayê bajarê Elezîzê têkelî nav hev dibin û Çemê Firatê pêk tînin, ku 647 kîlometreyê wî di Kurdistanê re derbaz dibe. Firat û Dîcle nêzîkê bajarê Besra têkelê nav hev dibin û dibin Şetu'l-'Ereb û dirijin nav Xelîcê Faris.

**Çemê Qizilewzen:**
Ji başûrê rojavayê bajarê Dîwandere yê Kurdistana Îranê tê û di navça Zengan û Miyane û pişt re di başûrê bajarê Reşt re derbaz dibe (li vir jê re Sifîdrod dibêjin) dirije Behra Qezwînê.

Çemên din ên Kurdistanê evên han in: Zêya Mezin, 450 kîlometre dirêj e û di nav Tirkîyê û Iraq re derbaz dibe, Zêya Biçûk, 200 kîlometre dirêj e, ku li Merdukyan têkelê nav Dîclê dibe. Çemê Bedlîs û Botan li Kurdistana Tirkîyê, Çemê Sîrwan li Kurdistana Îran û Iraqê, Gamasyab û Çexetû (240 kîlometre) û Tetehû ya Kurdistana Îranê beşek din ji çemên Kurdistanê ne.

## Golên Kurdistanê:

Beşê bakurê rojhilatê Kurdistanê ketîye navbera Gola Wanê û ya Urmîyê. Gola Wanê 3.765 kîlometre çargoşe ye û dereca bi ser hev kurbûnî 100 metre ye û 1.120 metre ji sevîya behrê bilind e. Ji ber ku ava vê gola han gelek şor e, qet tiştekî jîndar ê behrî tê de

nîne.

Gola Urmiyê ketîye rojhilata bajarê Urmiyê (Rezaîye) û qeraxê rojavayê beşek ji sinorê rojhilata Kurdistanê ye dirêjahîya wê digihîje 130 kîlometran û panîya wê 50 kîlometre ye, pîvana wê ya bi giştî 6.000 kîlometre çargoşe ye û dereca têkrayî ya kurbûna wê 6 metre ye, li hinek cîyan digihîje 15 metran. Mezintirîn durgeha vê golê Şah Golî ye, ku pîvana wê digihîje 25 kîlometran.

Ji derveyî van, Gola Hezarê yan (Golcukê) ye, dikeve bakurê Dîyarbekrê nêzîkî serokanîya Dîclê ye û 1.155 metre ji sevîya behrê bilind e. Piştî vê Gola Zirêwar a melbendê Sine nêzîkê Merîwanê ye, dirêjahîya wê 4,5 kîlometre ye û panîya wê 1,7 kîlometre ye û dereca têkrayî kurîya wê 15 metre ye.

## Daristan:

Çîyayên Kurdistanê kêm dar in, lê li deştan û cîyên nizm daristanên tabîî û yên destdanîn jî li dor û berê bajar û gundan zêde ne. Piranîya çîyayên Kurdistana Îranê bi daristanan xemilî ne, ji başûrê rojavayê Gola Urmîyê bigre heta bigihîje Loristanê, ku pîvana wan ji çar mîlyon hektaran derbaz dibe[8] beşê piranîya wan daristanên darên berû ne. Tenê ji %6'ê axa Kurdistana Tirkîyê daristan in, lê Kurdistana Îranê ji %32 û Kurdistana Iraqê jî ji %8 daristan in. Pîvana hemû daristanên Kurdistanê nêzîkî şeş mîlyon hektar e, yanî nêzîkî %14'ê hemû axa Kurdistanê ye. Her çendîn ev nisbeta han bi nisbeta cî kêm e, lê eger li gel navçên din ên Rojhilata Navîn bê muqayese kirin gelek e. Her wek ev di cetvela hejmara 2'an de jî tê xuyakirin.

| | Iraq | Îran | Tirkîye | Surîye | Kurdistan |
|---|---|---|---|---|---|
| Pîvana daristanan bi hezar hektaran | 1.540 | 19.000 | 10.548 | 449 | 5.740 |
| Nisbeta daristanan li gel hemû ax | %3,5 | %11,6 | %13,8 | %2,4[9] | %14 |

**Cetvela Hejmara 2**

[8] Pîvana daristanên rojavayê Îranê digihîje zêdetirî 11,3 mîlyon hektaran (T. Behrdamî): "Coxrafya Îqtîsadî ya Îranê" rûpel; 47.

Daristanên Kurdistanê gelek gurr nînin û her ku diçe teniktir jî dibin. Ji ber ku hukumet parêzgerî lê nakin û danişţiwanên navçê jî bi awakî dûr menfeeta xwe ya aborî nabînin û dibirin. Sebebê wê jî ew e ku ji derveyî daran tişţekî wan ê şewatê nîne.

## Serwetên Bin Erd:

Heta niha li Kurdistanê wek ku pêwist e lêkolîna serwetên bin erd nehatîye kirin, wisa dixuyê gelek kanîyên madenên xam tê de hene ku bi dîtin û derxistina wan dikare rewşa welat bi tevayî pê bê guhertin.

Girîngtirîn serweta bin erd a Kurdistanê petrol e. Heta niha li Kurdistanê nêzîkî 2600 mîlyon ton petrola xam hatîye dîtin ku nêzîkî ji %8'ê hemû berhemê petrola cîhana sermayedarî ye[10].

Niha li Kerkukê, Kurdistana Iraqê, li Şahabad nêzîkî Kirmanşana Kurdistana Îranê, li Surîyê û Kurdistana Tirkîyê petrol tê derxistin û bêguman li melbendên din ên Kurdistanê jî serokanîyên din ên petrolê hene. Her niha li beşê Kurdnişînî yê Cizîrê li Surîyê çend serokanîyên petrolê yên nû hatine dîtin.

Mezintirîn serokanîya petrola Kurdistanê li Babegurgur a nêzîkî bajarê Kerkukê ye, ku monopola emperyalîst a şirketa petrola Iraqê derdixe[*]. Berhemên petrola Kurdistanê di salê de zêdetir ji 50 mîlyon tonan e yanî nêzîkî 90,1'ê hemû wê zexîra petrolê ye ku li Kurdistan hatîye dîtin.

Niha li Dîvrîka Kurdistana Tirkîyê hesin, li Erganî her li Kurdistana Tirkîyê û Loristan sifr (baqir, mis), li bakurê Dîyarbekirê krom, li navça Sine li Îranê kukurd, li Keban Kurdistana Tirkîyê, Mako Kurdistana Îranê qurşîn, li başûrê Kirmanşan zêr û li Kaban zîv hatîye dîtin. Ji derveyî van gelek kanîyên rijîya (komir) kevir, xwê, qelay û cîwa li melbendên Kurdistanê hene.

---

(9) Amarî Geşkirina Aborî li Derve Sala 1958'an (bi zimanê Çekî) Pirag 1959, rûpel; 633.

(10) Berhemê petrolê di dinya sermayedarî de di tarîxa 1.1.1958'an gihîştîye 32.466.238 hezar tonan. Her eynî serokanî.

(*) Petrola Kerkûkê di yekê Hezîrana sala 1972'an de ji alîyê hukumeta netewî ya Iraqê ve hat millîkirin.

## 2- Danîştiwan (Nifûs)

Di pêş de me behs kir ku dîyarkirina sinor ji bo hemû Kurdistanê hinek giran e, dîyar e dîyarkirin û derxistina hejmara nifûsa Kurdistanê gelek ji vê jî girantir e. Ji ber vê yekê hejmara rastir a Kurdan a her yek di wan welatan de dema em dîyar bikin, berî hemû tiştekî em sê serokanî digrin ber çav ku her yek ji wan hejmarek cihê ji yekî din didin nîşan û piştre jî em ê wan muqayese bikin. Yekem, serokanîyên resmî yên her yek ji wan dewletan ku hebûna netewa Kurd qebûl nakin, yan hewil didin çiqas ji wan bê hejmara wan kêm nîşan bidin.

Li piştî qetlîamên berfireh ên salên piştî 1920 û 1930'an li Tirkîyê ku nifûsa welatê wan nêzîkî nîvê wan gelê Kurd e, gotina "Kurd" bi tevayî ji zimanê Tirkî derxistine. Ferhengeke "zanistî" Tirkî, Kurdan Tirkên çîyayî dinvîse ku guya zimanê wan ê eslî wek "Tirkî be" û jibîr kiribin. Îsmet Înönü serokê bi nav û deng ê Partîya Cumhurîyetê ya Gel, di sala 1930'an de, ku bi xwe serokwezîr bû, li ser behsa serîhildanên Kurdistana Tirkîyê bawerîya xwe bi vî awayî dide dîyarkirin.

*"Ew serîhildanên ku pênc sal e li navçên rojhilata Tirkîyê (yanî Kurdistana Tirkîyê-nivîskar) tên domandin, heta niha nîvê hêza xwe wenda kirine... Di vî welatî de tenê mafê netewa Tirk heye ku doza mafê netewî û regeza xwe bike û qet mafê regezek din nîne".*(11)

Her di eynî salê de Mehmûd Esed ê Wezîrê Edaletê di gotarekê de ku di wextê helbijartinê de da xuyakirin, li ser Kurdan wiha digot:

*"Em li Tirkîyê dijîn ku ji zêdetirîn hemû welatên dinyayê tê de azadî heye... Di vî welatî de tenê Tirk axa û fermanrewa ye û ewên ne li ser regeza Tirk in, tenê mafek wan li ba me heye, ew jî ew maf e ku bibin xizmetkar û kole. Bila dost û dijminên me di vê rastîya han bigihên û bila çîyayî jî vê yeka han bizanin"*(12).

Bi vî awayî aşkera derdikeve ku di warê Kurdên Tirkîyê de em nikarin agahdarîyek bi vî awayî ji karbidestên vî welatî wer-

---

(11)Rojnama Millet, hejmar 1636, 31 Tebax 1930

(12)Rojnama Millet, hejmar 1655, 19'ê Îlon 1930.

bigrin ku dilê me sererast be[13]. Li Îran jî ku hukumet Kurdan Îranî yanî Faris dihesibîne, xwîna paqij a Îranîyan di demarên wan de digere, her ew nexş û nîgar tên ber çavên me.

Şovenîzma Panturkîzm û Panîranizmê ku îftîxarê bi mezinîya xwe ya berê dikin, karek wisa kirine ku bi tu awayî hejmareke resmî ya rast di warê hejmara Kurdên van herdu welatan de bi dest nakeve.

Ya baş ew e em wan agahdarîyên ku serhejmara demografî ya salane ya Komela Netewên Yekgirtî ya di warê Tirkîyê de li ser zimanê danîştiwanên Tirkîyê didin dest, bixin ber çav. Di sala 1945'an de ku hejmara nifûsa Tirkîyê 18.790.173 kes bûye, ji vê 1.476.562 kesên wê Kurd bûne, di sala 1950'an de ku hejmara nifûsa Tirkîyê gehîştiye 20.974.188'an ji vê 1.854.569 kes Kurd bûne. Li gor vê serhejmara han, hejmara nifûsa Tirkîyê di navbera pênc salan de, yanî ji sala 1945'an heta 1950'an %11,25 zêde bûye, li hemberê vê goya hejmara Kurdan di wê navê re %25,5 zêde bûye. Aşkera ye ev yeka han jî ne rast e. Perawêzên serhejmarên salane yên Netewên Yekgirtî wê riya ku ji bo bidesxistina van materyalan hatîye helbijartin, bi vî awayî ronî dike: zimanek behsa wî tê kirin ku qet nebe deh kes yan zêdetir pê biaxivin, ku çi heye di beramberê vê de ev materyalên han:

" ... van rastîyan diveşêrin ku ewên bi zimanê serdest yên welatekî diaxivin, bingeha zimanê tevan yek nîne"[14].

Bêguman gelek ji Kurdan di welatekî de ku gotina "Kurd" qedexe ye, newêrin behsa zimanê bab û bapîrên xwe bikin. Li gel vê jî li gor wan serhejmarên jorê divê niha ji du mîlyonan zêdetir Kurd li Tirkîyê hebe ku bi resmî îtîraf bi wan hatîye kirin.

Lê çi heye serhejmarên resmî yên Tirkîyê tiştên din ji me re dixin ber çav. Wek mîsal sala 1935'an li Tirkîyê 13.899.110 Tirk û 1.480.200 Kurd hebûne, wextê serhejmara sala 1945'an, Tirk bûne

---

(13)B. Darkut, mamostê Zanistgeha Stenbolê, ji bo ku li ser behsa Kurd nesekine di kitêba xwe ya bi navê "Coxrafya Tirkîyê" de her behsa vê yeka han tenê dike, ku dibêje %98'ê nifûsa Tirkîyê Musilman in. (Çapa Rûsi, Moskova, 1859, rûpel: 57)

(14)Serhejmara demografîk ya salane ya Komela Netewên Yekgirtî, bi zimanê Fransî, 1956, rûpel; 34.

16.590.500 û Kurd jî tenê 1.362.900 kes bûne, yanî li gor vê hejmara Kurdan 117.300 kes ji sala 1935'an kêmtir bûne[15].

Grûba serokanîyên duyem ew kar in ku rêxistinên zanistî, gerok û rojhilatnasên welatan kirine. Lê weşanên zanistî yên welatên rojava li gel serhejmarên resmî yên van dewletan gelek cihê nînin, dîyar e eger ev cure serhejmarên han jî bi dest bikevin. Wek nimûne Ansîklopedîya Amerîka dibêje hejmara Kurdan 1.700.000 kes e, ya Îngilîzan 1.500.000 kes dinvîse. Hukumeta Frense heta sala 1892'an di kitêba Zerd de hejmara Kurdan 3.012.897 kes dinvîse, di wê navê re ev hejmara han tenê ya Tirkîyê bûye, yanî Kurdistana Tirkîyê, Iraq û Suriya niha.

Di milek din de ew heyeta nuneran ku Komela Gelan di sala 1925'an de ji bo lêkolîna mesela Musilê amade kirîye, hemû nifûsa Kurdistanê 3.200.000 kes hesêb kirîye[16].

Ev car Wilyam Douglas ê Qazîyê Dadgeha Bilind a Amerîkayê di sala 1952'an de daye xuyakirin ku nêzîkî ji çaran yekê daniştiwanên Îranê ku dike 16 mîlyon kes, Kurd in[17].

Serokanîyên Sovyetê ji tevan zêdetir cîyê bawerîyê ne. Ji ber ku Ansîklopedîya Sovyetê di sala 1952'an de hejmarek dixe ber dest ku ji tevan zêdetir nêzîkî rastîyê ye. Dibêje: hejmara Kurdan heft mîlyon e ku ji dudu heta sê mîlyonê wê li Tirkîyê, ji dudu heta du mîlyon û nîvê wê li Îranê, 1.200.000 li Iraqê, 300.000 li Surîyê û 200.000 li Afxanîstan û Pakîstanê dijîn û di sala 1939'an de 45.866 Kurd li Yekîtîya Sovyetê jîyane[18].

Grûba serokanîyan a sêyem kitêbên Kurdî yên hêja ne, pêwîst e em bêjin ku hinek zêdekirî tê de ne. Sebebê wê jî nerazîbûna nivîskarên wan a ji rewşa karbidestên Tirkîyê û Îranê ye. Li gel

---

(15)Tirkîya Îro, bi zimanê Rûsî, 1958, rûpel; 28.

(16)Ch. A. Hooper: L'Îraq et la Societe des Nations. Paris, 1928, p. 75.

(17)W. Douglas: Strange Lands and Friendly People, London 1052 p. 55.

(18)Ansîklopedîya Mezin a Sovyetê, bi zimanê Rûsî, cilda 24'an, rûpel; 91.

vê jî ji serokanîyên din rastir in[19].

Ew nivîsên ku di sala 1948'an de hejmarek ji rewşenbîrên Kurd pêşkêşî Komela Netewên Yekgirtî kirin, hemû Kurdên Tirkîyê, Îran û Iraqê heşt mîlyon hesêb kirine. Bi vî awayî em dikarin li gor gotin û karê piranîya kitêbên Kurdî hejmara Kurdan 9 heta 10 mîlyon deynin.

Armanc ji behskirina ev çend nimûnên han ev yeka han bû ku ew cihêbûna di navbera wan serokanîyan de ku li ser hejmara Kurdan hene em bixin ber çavan. Dîyar e ew agahdarî ne bi temamî rast in û nikarin rast jî bin. Dema ku em vegerin ser melbendên Kurdnişîn û li ser serhejmarên van deran bisekinin, nifûsa van melbendan yek bi yek li gor wan serhejmaran bikin ku her yek di van welatan de bidest dikevin, em digihîjin vê berhema han a xwarê:

Li Tirkîyê[20] 4.600.000, li Îranê[21] 3.000.000, li Iraqê[22] 1.400. 000, li Surîye 400.000, ku hemû bi hev re dike 9.400.000 Kurdên ku li Kurdistanê ne. Ji derveyî vê mîlyonek zêdetir Kurd hene ku li melbendên cûda yên derveyê Kurdistan dijîn. Ji van 300.000 li melbendên Xorasan, Qoçan û Dergez[23] û li Îranê dor û berê Qezwîn, 200.000 li Afxanîstan li melbenda Guryan li navça Hîrat û nêzîkî sinorê Îranê û Afxanîstanê,[24] û her wiha li Belucîstanê

---

(19)Wek nimûne E.Seccadî sala 1959'an di kitêba xwe ya bi navê "Şorişekanî Kurd" de hejmara Kurdan 15 mîlyon dinivîse û wiha dibêje: "Evên han tenê ew Kurd in ku niha bi zimanê Kurdî diaxivin, ji xwe eger em wan jî bixin ser ku bi bab û bapîrên xwe ve Kurd in û bi derbederî û malwêranî ketine bajar û deştên bîyanî û niha ew zimanê Kurdî nizanin, dibê bawerî pê bê kirin ku evên han ji sê mîlyonan kêmtir nînin û hemû li ser hev ji "18" mîlyonan derbaz dibe. Cardin divê eynî bawerîya han jî hebe ku ev hejmarên han li ser reqema bi kêmasî hatîye nivîsandin ne ya zêdeyî". (E. Seccadî "Şorişekanî Kurd", Bexda, 1959, rûpel 12).

(20)Melbendên Kurdî di vir de li gor nivîsîna 'Tirkîya Îro" hatîye nivîsandin, ku sala 1959'an li Moskova bi zimanê Rûsî derketîye.

(21)"Îrana Îro" bi zimanê Rûsî 1957 û Ferhenga Coxrafya Îran (bi zimanê Farisî, Tehran, 1949-1954).

(22)El-Mecmu'etu'l-Ehsaîyye" Bexda, 1958.

navça Serhed,[25] 95.000 li Yekîtîya Sovyetan li Ermenîstanê, Azerbeycanê, Gurcîstanê û Turkmenîstanê,[26] û nêzîkî Ankara, Bexdad û Şamê jî dijîn. Yanî hejmara Kurdan hemû li ser hev digihîje 10.450.000 kesan. Ji derveyî van li Kurdistanê nêzîkî 1.200.000 kes ji netewên din û netewên kêmayetî dijîn, ku eger em van jî bixin ser hejmara wan Kurdên li Kurdistanê dijîn, em dikarin bêjin hejmara nifûsa Kurdistanê digihîje 10.600.000 kesan.

Li gor vê em dikarin van herdu cetvelên han ên xwarê di derbarê pîvana Kurdistanê û hejmara Kurdan li Kurdistanê û derveyî Kurdistanê deynin.

| Navê welat | Pîvane bi kîlometre çargoşe | Hejmara nifûsê di kîlometre çargoşe de | Hejmara nifûsa Kurdistanê di wî welatî de | Hejmara Kurdan li welatê xwe Kurdistanê de | Hejmara Kurdan di welat de |
|---|---|---|---|---|---|
| Tirkîye | 776.980 | 33 | 5.100.000 | 4.600.000 | 4.900.000 |
| Îran | 1.640.000 | 12 | 3.500.000 | 3.000.000 | 3.300.000 |
| Iraq | 444.442 | 15 | 1.600.000 | 1.400.000 | 1.550.000 |
| Surîye | 184.470 | 22 | | 400.000[27] | |

**Cetvela Hejmara 3**

[23]Di Tarîxa Rewdetu'l-Sefa de wiha dibêje: Sala 1796'an, 50 hezar malên Kurd li Xorasan bûn ku li melbendeke ji hev neveqetandî dijîyan û di destpêka sedsala 17'an de li ser emrê Şah Ebbas ji bo parêzgerîya sinor ji êrîşên wan eşîretên ku ji alîyê bakurê rojhilat de dihatin, anîn van melbendên han bicîkirin-nivîskar.

[24]"Afxanîstana Îro", bi zimanê Rûsî, Moskova, 1960, rûpel; 69

[25]M.K.Pikolin "Belucî" bi zimanê Rusî, 1959, rûpel; 32. Ev Kurdên han bi emrê Nadir Şah di sedsala 18'an de hatine şandin vê melbendê

[26]Li gor serhejmara sala 1959'an. Serhejmara salane ya Ansîklopedîya Mezin a Sovyetê, Moskova, 1960, rûpel; 7

[27]Di nav vê hejmarê de Kurdên danişţiwanên Şam û Helebê jî hene-nivîskar.

Ji %85'ê nifûsa Kurdistanê Kurd e, bi gotinek din em dikarin bi vî awayî bêjin: 400.000 Tirk, 300.000 Azerbeycanî, 150.000 Faris, 250.000 Ereb û 200.000 kes jî ji netewên kêmayî yên din ên wek Asûrî, Tirkman û Ermenî ne. %85'ê nifûsa Kurdistanê li gundan û tenê ji %15'ê wan li bajaran dijîn. Mezintirîn bajarên Kurdistanê Kirmaşan e li Kurdistana Îranê, hejmara nifûsa wê 150.000 kes e, pişt re Kerkuk li Iraqê[28] 78.648 û Dîyarbekir li Tirkîyê 63.108 kes e[*].

---

[28] Şovenîstên mezinîxwaz ên Tirkîyê beyhude hewil didin îspat bikin Kerkuk bajarekî Tirkman e, yanî Tirk e. Tiştek aşkera ye ku bajarê Kerkukê bajarekî kevin ê Kurdan e, hemû wextî piranîya nifûsa bajêr Kurd bûye. "Ji sisiyan çarê nifûsa bajêr Kurd in û yên din Tirk, Ereb û yên din in" ev yeka han ew tişt e ku di "Qamûsu'l-'Elam" de hatîye nivîsandin. (Bi zimanê Tirkî cilda 5'an Stenbol 1896, rûpel; 3802)

[*] Ger em bi vî awayî deynin nisbeta Kurdan û nifûsa Kurdistanê li Tirkîyê, Îran, Iraq û Surîyê neguherîye, li gor cetvela hejmara 4'an ger em hejmara wan hesab bikin, em dikarin ji bo sala 1970'an cetveleke nû bi vî awayê xwarê durust bikin:

(Monthly Bulettin of Statistics, November 1971 U. N. New York 1971 hatîye girtin)

| Navê welat | Hejmara danîştiwan | Hejmara danîştiwanê Kurdistanê li welat | Hejmara Kurdan li welat |
|---|---|---|---|
| Tirkîye | 35.563.000 | 6.756.970 | 6.401.340 |
| Îran | 28.258.000 | 4.803.860 | 4.521.280 |
| Iraq | 9.690.000 | 2.228.700 | 2.131.800 |
| Surîye | 6.182.000 | 618.200 | 618.200 |
| Hemû bi hev re | - | 14.407.730 | 13.672.620 |

Eger hejmara wan Kurdên ku ji derveyî van herçar welatan dijîn (li Yekîtîya Sovyet, Afxanîstan û.h.w..) em bixin ser hejmara Kurdan dibe 14.022.620. Eger em zêdebûna hejmara nifûsa Kurdistanê a sala 1972'an hesab bikin ew dem hejmara danîştiwanê hemû Kurdistanê dike 15.300.000 û hejmara Kurdan jî dibe 14.493.000.

Aşkera ye hejmara nifûsa bajarên herî mezin ên Kurdistanê jî li gor vî hesabî sala 1972'an bi vî awayî dîyar dibe: Kirmaşan 282.538, (Serhejmara

## 3- Ayîn (Dîn)

Piranîya Kurdan Musilman in û zêdeyî Kurdên Musilman jî Sunî ne. Li başûrê Kurdistanê li melbenda Kirmaşan û Loristanê[29] û li Kurdistana bakur li melbenda Dêrsimê hejmarek kêm Kurdên Şî'î (Kurdên Dêrsimê Elewî ne-Elîşêr) dijîn û li melbenda Mûsilê li Iraqê û li Tirkîyê nêzîkî 100.000 kes Kurdên Êzîdî hene ku navê pêxemberê wan "Melekê Tawîs"e, dînê Êzîdîyan di eslê xwe de

---

Umumî ya Nifûs û Mesken, cilda 20 û 8'an a bajarê Kirmaşan 1968), Kerkuk 258.861 (El-Mecmu'etu'l-ehsaîyyetu'l-senewîyye 1969 Bexdad), Dîyarbekir 145.459 (Türkiye İstatistik Yıllığı 1968 Ankara, s.32)

(29)Heta niha jî Lor û Loristan di nav rojhilatnasan û Kurdan de jî cîyê behsê ne. Di vir de du rayên serekî hene, yekemîn ku di nav Kurdan de hîn zêdetir tereftariya wê heye, dibêjin; Lorî û Bextîyarî Kurd in, raya din van du netewên serbixwe dihesibînin ku dibêjin nêzîkî netewa Kurd in, lê beşek ji vî netewî nînin. Hejmara Loran digihîje 650.000 kesan û ya Bextîyarîyan jî digihîje 400.000 kesan. Her çendîn em naxwazin bi dirêjahî behsa vê meselê bikin, lê pêwîst e nezerek me ya ronî li ser vê meselê hebe. Piştî lêkolîna herdu rayên pêşî û hel û mercên melbendê, bi nezera me baştir ew e di navbera Lor û Bextîyarîyan de ferqek bê danîn. Lorî li bakurê Çemê Ardiz ê milê bajarê Kirmaşan rûdinin, bi nisbet van Bextîyarî ketine melbenda başûrê vî çemî milê alîyê rojhilat. Em Lorîyên niştecîyên bakurê Çemê Ardiz Kurd dizanin, dîrokê jî îspat kirîye ku Lor û Kurd herdu bi hev re heta niha cîranên hevdu bûne. Vê carê Kurd ji Eşîreta Gotî zêde bûne û Lorî jî paşvemayên Eşîreta Lolo ne. Ev herdu jî du eşîretên Zagrosê ne ku 2500 sal berê mîladê li melbenda Zagrosê Başûr bi hev re jîyane. (Reşîd Yasemî: Kurd û Pêwîsteki Nijadî Wan", bi Farisî, Tehran, 1956, rûpel; 23). Ev melbenda han jî navçeke serbixwe bûye û heta sedsala 13'an Kurdistana Îranê bi Loristan ve beşek ji vê melbendê bûye, ku Ereban jê re Melbenda Guyîstan gotine.

Lehça Lorî jî ewqas dimîne bi zimanê Kurdî ku di navbera Lehça Kurdî ya Kirmanşan û ya Lorî de qet tu ferqek nîne. Ev yeka han, xwe li gel ruhê netewî ya Loran û şaristanîyeta wan jî dixe ber çav. Kitêba Şerefnamê, ku di sala 1596'an de Emir Şerefxanê Bedlîsî li ser dîroka Kurdan nivîsîye û yekem car sala 1860'an li Petersborgê hatîye belav kirin, Kurdan dike çar beş: 1- Kirmanc, 2- Lorî, 3- Kelhurî, 4- Goran. Di van gotinên xwarê de jî derdikeve ku Kurd û Lor li gor qeneeta dîroknivîsan yek netewe ne: *"Kerîm Xan serokê Eşîreta Lor bû ku li melbendê Zend dijîya"*. (Gelên Asya Navîn, bi zimanê Rûsî, Moskova 1957, rûpel; 266).

dînê Zerdeşt e, ku dînê gelên Îranê bû, lê di netîca tesîra dînê Îslamê û Mesîhî de hinek usûlên van dînan ketîye navê.

Di nav Kurdan de ji derveyî van bawerîyên ayînî û mezhebî yên din jî wek Mesîhî, Elî-Îllahî, Elewî yan Ehlê Heq û Cûhutî heye. Ji serokên terîqetên sunî re şêx tê gotin ku heta niha di gelek melbendên Kurdistanê de tesîrek wan a mezin heye. Terîqeta Qadirî û Neqşîbendî girîngtirîn terîqet in ku heta niha jî mane.

Her yek ji van şêxên mezin hejmarek zêde alîgirên wan hene ku ji wan re mirîd -sofî, derwêş- tên gotin, bi taybetî li gundan zêde ne, ewên bi îcaza xelîfetîyê ne ew nunerê şêx ên rasteqînî ne. Her mirîd hewce ye bi kêmasî salê carekê biçe zîyareta şêx, dîyarîyek baş bi xwe re ji şêx re bibe û li hember, duayên şêx werbigre. Ji vê pê ve di nav Kurdên sunî de merkezek desthilatdar a dînî nîne. Mela wextê xwendina xwe temam kir, li ba melayek mezin û bi nav deng îcaze distîne û piştre dest bi karê melatîyê dike. Mela di destpêka kar de ji derveyî wê zekata ku(berate) musilman didinê, habûnek wî nîne, gelek caran ji feqîr û hejarên gundîya ne, mela naçar e ji bo debara mala xwe zîraet û heywanan xwedî bike. Ev cure melayên han wek xelkê dijîn û wek xelkê kar dikin, ji ber vê, mela, li gelek gundên Kurdistana Îranê tenê kesek xwendewar e, gelek caran rolek gelek baş di tevgera rizgarîxwazî ya netewî de dilîzin. Ji xeynî van, piranîya şêxên Kurdistanê piştgirîya xebata kedkaran dikin lê çi heye hindek ji van jî piştgirîya sîyaseta kevneperestî ya hukumetên van wela-

---

*"Di sedsala 18'an de giringtirîn ew eşîretên ku bi zimanê Kurdî diaxivtin Eşîreta Zend bû...Vê eşîreta han nexşa paşatîya Îranê girtîye destê xwe"* (Doktor Hîdayet "Tarîxî Zend", bi Farisî, Tehran, 1956, rûpel; 78). Her di eynî serokanîyê de dibêje: *"Li Xurremabad jî (yanî paytextê Loristanê- nivîskar) hejmarek ji eşîretên Kurdan pêşwazîyek germîn li Kerîm Xan kirin".*

Dema Rousseau di sedsala 18'an de eşîretên Lorî dihejmart, behsa Kelhor, Mukrî û Zengene kir, ku niha hemû kes wan Kurd dizanin.

Bi vî awayî em dikarin bîr û bawerîya xwe bidin dîyarkirin ku piranîya Lorîyan piştî geşbûna peywendîyên aborî û cihêbûna netewa Kurd, dibin beşek ji gelê Kurd.

J. Rousseau, Notice Historique sur la Perse Ancienne et Moderne et ses Peuples en Général, Marseille 1818.

tan dikin û piştgirîya hêzên emperyalîst jî dikin.

## 4- Ziman û Edebîyat

Zimanê Kurdî di grûba zimanê Îranî de ye, ku ew jî liqek ji zimanê Hindû-Avrupî ye ku ji zimanê Kurdî, Farisî, Efxanî û Tacikî pêk tê. Her çend Kurd demek dirêj di bin desthilata Tirk û Ereban de bûne û ger çiqas karbidestên Tirkîyê û Îranê bi taybetî piştî Şerê Cîhanê yê Yekem sîyaseta asîmîlasyona Kurd dane ber xwe jî zimanê Kurdî gotinên xwe yên eslî parastine û bi qedexekirina xwe ve jî gelek kêm ketîye bin tesîra zimanê Ereb û Tirkan(30).

Heta niha awakî yekgirtîya edebî di zimanê Kurdî de peyda nebûye, niha du lehçên serekî hene; Kurmancî û Soranî. Lehça Kurmancî li perçên bakurê rojavayê Kurdistanê tê bikar anîn ku piranîya Kurdên tê de dijîn, ji derveyî dor û berê Dêrsimê, ku bi Lehça zazakî diaxivin, hemû Kurdên Kurdistana Tirkîyê digre nav xwe. Kurmancî her wiha li Surîyê û li melbenda Mûsilê li Iraqê û li melbenda bakurê Urmiyê li Îranê jî tê bikaranîn.

Lehça Soranî jî(31) Kurdên beşê başûrê rojhilatê Kurdistanê yanî piranîya Kurdên Iraqê yên ji Rewandizê ber bi başûr û yên Îranê jî ji Urmîyê şûn ve cardin ber bi başûr de, diaxivin.

Heta Şerê Cîhanê yê Yekem lehça Kurmancî lehça edeba Kurdî

---

(30)Her çendîn zimanê Kurdî belavî ser çend lehçan bûye jî cardin karakterê wî yê taybetî bi awakî berçav tê de maye.

B. Nikitine: Les Kurdes, Paris 1956 p.9.

(31)Di cîyê gotina Soranî de gotina Kurdî, Mukrî yan Silêmanî jî tê bikar anîn, lê gotina Soranî ji tevan rastir e. Ji ber ku ji derveyî Kurmancîyê hemû lehçan digre nav xwe, ji derveyê vê Mukrî, lehça melbenda Mehabad û Silêmanî jî ya dor û berê Silêmanîyê ye. Gotina "Kurdî" jî ji bo hemû zimanê Kurdî tê bikaranîn. Gotina Kurmancî di melbenda navbera Mehabad û Silêmanîyê de bi mana gundî ye û bêyî ku tu peywendîya wê bi lehça Kurmancî ve hebe ji hemû gundîyan re Kurmanc dibêjin.-Nivîskar. Binêre: "Îrana Îro", bi zimanê Rûsî, Moskova, 1957, rûpel: 61

bû, lê piştî qedexekirina zimanê Kurdî li Tirkîyê û Surîyê, bihêzbûna xebata rizgarîxwazî netewî ya Kurdên Iraq û Îranê, lehça Soranî tesîra xwe li ser edeba Kurdî zêde kirîye.

Lehça Soranî di dema Komara Demokratîk a Mehabadê de, di navbera salên 1945-1946'an de, li Îranê heta derecekê zêde pêş ket û piştî serkevtina şoreşa 14'ê Tîrmehê ya Iraqê, ku di qanûna esasî ya Iraqê de îtîraf bi hebûna Kurdî hatibû kirin, edeba Kurdî di Kurdistana Iraqê de gelek bi tundî pêş de çû û bi vî awayî Soranî bû lehça edeba Kurdî ya îroyîn.

Pêwîst e ev yeka han jî bê gotin ku di navbera van herdu lehçan de ferqek mezin nîne û di eslê xwe de zimanek in; ji ber ku gotinên eslî û rêzimana herduyan wek hev in.

*"Pêwîst e bê gotin ku ferqa di navbera Kurdî -yanî Soranî- û Kurmancî de gelek besît e, Kurdek bakurê rojava bi hêsanî di Kurdekî başûrê rojhilat digihîje* (32)

Zimanê Kurdî li Iraq û Îranê bi tîpên Erebî, li Surîyê bi tîpên Latînî û li Sovyet jî bi tîpên Rusî tê nivîsandin, li Tirkîyê jî ku zimanê wan bi tîpên Latînî tê nivîsandin, bi tu awayî çapemenîyek bi zimanê Kurdî nîne. Bêguman ji ber nebûna awayek nivîsandina yekgirtî ji bo zimanê Kurdî, tesîrek xerab ji bo pêşdeçûna ziman heye û di rastîya xwe de astengek mezin a pêkhatina zimanek yekgirtî ya edeba Kurdî ye li hemû Kurdistanê. Aşkera ye tîpên Latînî ji bo nivîsîna zimanê Kurdî ji hemû tîpên din baştir e.

Hînbûna zimanê Kurdî hinek rehet e, eger tîpên Latînî bê bikar anîn, nexwendewarî zêdetir ji holê radibe û biyanî jî hîn rehetir zimanê me hîndibin.

Zimanê Kurdî li Tirkîyê, Surîye û Îranê qedexe ye û tu dibistanek Kurdî nîne, xwendin û heta lêpirsînên dadgehî jî bi zimanê Tirkî, Farisî û Erebî ye. Tenê li Iraqê piştî şoreşa 14'ê Tîrmehê ya 1958'an birêveberîyek giştî ji bo xwendina Kurdî hatîye damezrandin, ku wezîfa bi giştî cîanîna xwendina Kurdî di hemû dibistanên destpêkî yên Kurdî de girtîye ser milê xwe.

Li Zanistgeha Bexdayê jî di vî warî de ji bo perwerdekirina mamostan beşek ji bo ziman, edeb û dîroka Kurdî hatîye vekirin.

---

(32)"Îrana Îro", bi zimanê Rûsî, Moskova, 1957, rûpel: 34.

Li Ermenîstana Sovyetê di dibistanên Kurdî de zimanê Kurdî tê xwendin û rojnama "Rîya Taze" organa Komîta Merkezî ya Partîya Komunîst a Ermenîstanê gelek sal in bi Kurdî derdikeve û ji bo pêşdebirina ziman û edeba Kurdî û Kurdnasiyê gelek hewil tê dan. Ji derveyê van li Moskovayê, Leningradê û Bakuyê hejmarek ji zanayan ji bo lêkolîna vî warî hatîye amade kirin.

Netewayê Kurd xwedî kulturek şanazî ya kevn e, lê dagirkerên biyanî, bi taybetî Tirk û Faris, ku nîşana bêşermîya asîmîlasyona Kurdan di destê wan de ye, berhemên kultura Kurdan ya dagir kirine, yan ji holê rakirine[33].

Di gel van tevan de jî ew kultura kevin têk neçûye, her niha jî li hemû navçên Kurdistanê şûnewarên vê kultura me bi dest dikevin û paşvemayên borî derdixin ku Kurdên "çîyan" di wan rojan de xwedî şaristanîyetek pêşketî bûne û bi jîyanek serbixwe û ji desthilata bîyanîyan dûr jîyane.

Hemû ew rojhilatnasên bi Kurdnasîyê ve mijûl in, hevfikr in ku folklora Kurdî gelek dewlemend e û ji ber ku millet nexwendewar bûye di riya wan beyt û sitranan de ku dîroka şerên kevnare û dildarîya ji neslekî derbazî neslek din bûye, mîras maye û ji bîr neçûye.

Wek nimûne em dikarin li her navçek Kurdistanê sitranek bi wî awayî sehbikin ku ji seetekê zêdetir didomîne û behsa qehremanîya gelê Kurd a xebata dijî dagirkerên bîyanî dike. Niha jî hemû cîyên Kurdistanê beyta Dimdim li ser devê xelkê ye ku behsa xebata Kurdan li dijî eskerên Şah Ebbas a sedsala 17'an dike.

Edeba Kurdî tijî ji çîrokên netewî ne. Niha em dikarin gelek şiirên wisa peyda bikin ku diçin digihîjin sedsala 17'an û behsa êrîşên Ereban dikin. Tiştê ecêb ev e ku ev şiirên han bi zimanê wî demî hatine nivîsandin û niha jî xelk tê digihîje.

Pîrê Şalyar kahînê Zerdeşt şi'irek bi navê "Ma'rîfet" li pê xwe hiştîye, ku heta îro jî xwendewar jê hez dikin. "Ma'rîfet" bi Kurdîyek vekirî, rewan û xweşik hatîye nivîsandin.

Zimanê Kurdî jî wek zimanê Farisî zimanê şa'iran e. Ji ber ku nesr nivîsandin di kevin de gelek kêm bûye, lê şair gelek bûne û heta niha jî gelek in. Mezintirîn şair evên han in: Baba Tahir

(33)Ansîklopedîya Mezin a Sovyetê, "gotina Kurd", cilda 24, rûpel: 9.

(935-1010) bi Lehça Lorî şiir gotîye û navûdengê rûba'îyên wî li derveyî Kurdistanê jî belav bûye,[34] Melayê Cizîrî, ku şairekî mezin ê sedsala 12'an e (Ê sedsala 17'an e-Elîşêr), mezintirîn şairê edeba netewî Ehmedî Xanî (1650-1706), ku dîwana wî "Mem û Zîn" mezintirîn dereca edeba Kurdî ya dema derebegtîyê ye, Mewlewî (1815-1892) şairê herî mezin ê xezelbêjîyê ye, li Kurdistana başûr jîyaye, Koyî (1815-1892) xelkê ji bo xebata rîya azadî û serxwebûnîyê teşwîq kirîye.

Em dikarin ji şairên sedsala 20'an Pîremêrd (1867-1950), Ehmed Muxtar Caf (1897-1935) û Bêkes (1905-1948) bêjin. Îro şairên bi nav û deng li Îranê Hejar û Hêmin, li Surîyê Qedrî Can[*] û li Yekîtîya Sovyet jî Evdal û Şemo ne.

Qet gûman di wê de nîne ku Ebdullah Goran ( di sala 1962'an de li Iraqê koça dawî kirîye) çi di warê naveroka şiirê de çi di awayê nû de ku di şiirê de danîye û çi jî di rewanî û Kurdîya bijartî ya şiir de ku pê gotîye, gihîştîye serê çika (zîrva) edeba nû û şiirê ji qeyd û benda şiira kilasîkî ya Kurdî rizgar kirîye û bi vî awayî asoyek nû ji bo geşkirina pêşdebirina şiira Kurdî vekirîye.

Edeb û hunera Kurdî piştî şoreşa 1958'an li Iraqê bi awakî berbiçav pêş ketîye û jê tê hêvîkirin ku ne tenê şairên nû peyda bin, her wiha nivîskarên baş jî derkevin[35].

## 5- Xwendin

Ji %80'ye nifûsa Kurdistanê nexwendewar e. Hukumetên Îranê û Tirkîyê qet gavek nû ji bo belavbûna xwendinê di nav Kurdan de

---

(34) *"Bîr û bawerîya dijî derebegtî di nav gel de belav dikir... di şiirên xwe de bi tundî dijî zulm û zorîya civakî sekinîye. Her wiha dijî axayên mezin û fermanrewayan bûye"* (Dîroka Cîhanê, Prag, 1960, cilda sêyem, rûpel; 502, çapa Çekî).

(*)Di sala 1972'an de koça dawî kir.

(35)Di cî de ye ku bê gotin, gelek ji şair, nivîskar û zanayên Kurd û yên din.. kitêb û nivîsên xwe bi zimanê Erebî û Farisî nivîsandine û heta niha jî her wiha ye. Me di vir de tenê behsa wan kesan kirîye ku bi zimanê Kurdî nivîsandine -Nivîskar.

neavêtine, li Kurdistanê zanistgeh qet nîne û dibistanên navendî jî gelek kêm in, her wiha dibistanên destpêkî jî gelek ji pêwîstîya danişţiwanan kêmtir in. Ger wek nimûne em navça Mahabadê ya li Îranê bixin ber çavan, em dibînin ku hejmara nifûsa wê digihîje 250 hezar kesan, li hemberî vê wek di cetvela hejmara 5'an de jî derdikeve, tenê huvde dibistan hene.

Sala xwendinê ya 1954-1955[36]

| | Destpêkî | | Navendî | |
|---|---|---|---|---|
| | Kur | Keç | Kur | Keç |
| Hejmara dibistanan | 8 | 4 | 4 | 1 |
| Hejmara xwendevanan | 1.650 | 558 | 339 | 56 |

**Cetvela Hejmara 5**

Li gor vê, hemû li ser hev donzdeh dibistanên destpêkî hene, ku 2.208 xwendevan têde ne, di pênc dibistanên navendî de jî 395 xwendevan ders dixwînin. Di hemû Kurdistanê de nêzîkî 300 dibistanên destpêkî û 30 jî dibistanên navendî hene, yanî ji bo 10 hezar kesan dibistanek dikeve.

Di hemû Kurdistanê de tîyatroyek gelemperî nîne û sînema jî tenê li bajaran heye. Wek nimûne li hemû Kurdistana Îranê 10 sînema hene, yanî ji bo 300 hezar kesan sînemayek.

Rewşa xwendina jinan gelek ji vê jî xerabtir e, li bajaran ji %95'ê jinan û li gundan jî hemû nexwendewar in[*].

---

(36)Teqwîma ferhenga Mahabad 1954-1955, rûpel; 145.

(*)Li gor "Serhejmara Umumî ya Nifûs û Mesken (cild 55) a bajarê Mahabadê, 1967", li bajarê Mahabadê ji %86'ê xelkê nexwendewar in, li bajarê Mahabadê 12 hezar kes ku temenê wan ji heft salan jortir e nexwendewar in, ji %60'ê temamê wan kesên ku temenê wan ji deh salan zêdetir e xwendin û nivîsandinê nizanin, ew zarokên ku temenê wan di navbera heft û heta panzdeh salan de ye (temenê wan ê çûna dibistanê ye) 1.400 kes naçin dibistanê. Yanî ji her çar zarokan yek nexwendewar e.

## 6- Leşsaxî

Av û hewaya Kurdistanê li gor melbendên cîranên xwe gelek saztir e û kanîyên avên paqij li gundan gelek in, li gel vê jî gelek kes ji destê nexweşîya rovîyan, terahom, malarya û yên din dinalin, ku li gelek navçên Kurdistanê belav bûne. Gelek kêm doktor diçin gundên Kurdistanê, heta li hinek bajaran jî doktor bi dest nakevin. Heta niha jî doktor û derman ji bo kedkarên Kurdistanê

---

Ji %75'ê jinên Mahabadê nexwendewar in, ji her pênc keçan ku temenê wan di navbera heft heta panzdeh salan de ye didu ji wan naçin dibistanê.

Li gundên bajarê Mahabadê ji %94'ê xelkê nexwendewar e, di nav jinan de nisbeta nexwendewaran digihîje %99'an.

Li hemû bajarê Mahabadê 133 kesan zanistgeh temam kiriye, ji van tenê 11 kes jin in. Li temamê navça bajarê Mahabadê tenê 11 muhendîs û 21 doktor hene. Ji bo her 7.200 kesan doktorek dikeve. Li Bokan tenê şeş kesan zanistgeh temam kiriye, ku ji van du kes doktor in û muhendîs nîne.

Cetvela xwarê jî sevîya xwendinê li Kurdistana Tirkîyê nîşan dide.

| Navçe | Dereca xwendewarîya hemû nifûsê % | Dereca xwendewarîya jinan % |
|---|---|---|
| Agirî | 26 | 9 |
| Bedlîs | 23,7 | 9,4 |
| Dîyarbekir | 25,8 | 11,4 |
| Hekarî | 17,6 | 3,9 |
| Sêrt | 21 | 7,8 |
| Wan | 24 | 9 |
| Hemû Tirkîye | 48,7 | 32,8 |

Di vê cetvelê de bi awakî ronî derdikeve ku nêzîkî %75 heta %80'yî nifûsa Kurdistana Tirkîyê nexwendewar e. Li hemberê vê di hemû Tirkîyê de ev nisbeta han % 50 ye. Di nav jinan de sevîya nexwendewarîyê digihîje %90 heta %96'an, ku li hemberî vê di hemû Tirkîyê de ji %17'an kêmtir e -Nivîskar.

hêvîyek ji dest dûr e. Rewşa nexweşxanan ji vê jî şepirzetir e, li hemû Kurdistana Îranê tenê 250-300 nivîn di nexweşxanan de hene, yanî ji bo her deh hezar kesan nivînek dikeve(*).

(*)Li hemû gundên navça Seqizê li Îranê, ku 74.112 kes tê de dijîn, wek nimûne tenê du gund nebin, ku destê wan digihîje doktoran, li hemû gundên din heta dermangahek jî nîne. (Serhejmara Umûmî ya Nifûs û Mesken, cild 24, 1968, Bajarê Seqiz) Ev yeka han baş ronî dike ku di navbera 10-15 salên borî de qet karek ji bo baştirkirina rewşa leşsaxîya nifûsa Kurdistanê nehatîye kirin -Nivîskar.

INSTITUT KURDE de PARIS
• BIBLIOTHÈQUE •

FESLA DUYEM

# KURTÎYEK LI SER DÎROKÊ

## 1- Eslê Kurdan

Netewayê Kurd dikeve ser kevintirîn netewên Rojhilata Navîn ku dergûşa şaristanîyeta kevin tê naskirin. Ji ber ku heta niha jî lêkolînek pêwist li ser dîroka Kurd nehatîye kirin, gelek bîr û bawerîyên cuda li ser eslê Kurdan û pêşdeçûnên dîroka Kurdan hene[1]. Hinek ji "dîroknivîsan" bi zanetî rastîyên dîrokî berevajî

---

[1] Di derbarê eslê Kurdan de gelek çîrok hene. Nêzîkî hezar sal berî Firdewsî yekî bi şiir di vî warî de nivîsandîye, ku di "Şaname" de heye. Ev çîroka han wiha dibêje: Di zemanê gelek kevin de padişahek hebû navê wî Ejdehak bû, li gel xelkê xwe gelek xirab bû, dilreşîya wî padîşahî di wê de derket ku du mar li ser milên wî peyda bûn, xwarina her yek ji van maran mejîyê xortekî bû. Xelk ji destê vê zulm û zordarîyê bêzar bûbû, di wî welatî de tu malek nemabû ji destê wî padîşahê bê rehim qurbanan nedabû. Gelek kes mabûn heyirî û nedizanîn dê çawan xwe ji destê vê zulm û zorê rizgar bikin. Heta di dawîyê de du kesên bi navê Ermayîl û Germayîl, ku dostên hev bûn, ji bo zilm û ezîyeta li ser xelkê kêm bikin fêlek dîtin. Ev herdu dostên han li gel aşçîyê padişah li hev hatin, ku rojê tenê însanekî bikûje û di cîyê wî de mîyekê şerjêke û mejîyê wê têkelî

nîşan didin, ji bo bi hinek belgên bê esas îspat bikin ku Kurd ji eslê Samî ya Tirkan e. Hinek din jî xizmatîya di navbera zimanê Farisî û Kurdî ya ku herdu ziman jî digihîjin liqa zimanê Îranî, dikin belga wê yekê ku Kurdan Faris bihesibînin. Bi kurtî îtîraf bi hebûna Kurdan wek netewekî serbixwe nakin û rastîyên dîrokî berevajî nîşan didin.

Îro zanistîyê derxistîye ku Kurd paşvemayîyê eşîretên Zagrosê yên "Gotî, Loloyî û yên din in", ku di zemanê kevin de li melbendên Çîyayên Zagrosê niştecî bûn û li gel eşîretên "Hindo-Avrupayî", ku di hezarê duhemê pêş zayînî de hatine van melbendan û têkelî yek û du bûne. Belgên dîrokî yên dema Akadan îspat dikin ku Eşîreta Lûlûyî û Gotî 2000 sal pêş zayînî peywendî li gel Akadîyan damezrandiye, heta çend kes ji van herdû eşîran di Dewleta Akad de fermanrewayî kirine(2).

Li ser bingeha kelîma "Kurd" jî dijîtî heye. Hinek digihînin ser kelîma Karduxîyên kevin ku Ksenophon behs kirîye, hinek din dibin ser Gorîyan ku nêzîkî Gola Urmiyê jîyane. Ksenophon, di sala 400'an ya pêş zayînî di kitêba xwe ya bi nav û deng a Anabasîs "Vegerîn"ê de behsa mêranîya Karduxîyan dike û bi dirêjahî behsa wî şerî ku wextê ew serokê deh hezar eskerên Yunanî bûye û ber bi Yunanîstanê ve vegerîyaye, li gel wan kirîye dike.

## 2 - Kurd di Dema Kevin de

Ev bîr û bawerîya han xurt e ku Kurd nevîyê Medan in (Mêdya) û dîroka wan jî bi girtina bajarê Nînova destpê dike, ku di sala

---

nav mejîyê xortekî bike û bide wan marên nefsik. Ew kesê ku bi vê fêla han rizgar dibûn dişandin dûrtirîn çîya û deştan û kesê din nedidît. Bi vî awayî her meh 30 xort diçûn çîyan û dema hejmara wan gihîşt 200 kesan, aşpêj çend serî bizin û mî ji wan re dişand ji bo ku xwedî bikin û pê bijîn. Eslê Kurdan diçe digihîje wan xortan ku ji destê marên Ejdehak rizgar bûn -Nivîskar.

(2) R. Yasemî: "Kurd û Pêwîstekî Nijadî Wî", bi zimanê Farisî, Tehran, rûpel: 30-31. Îhtîmalek gelek nêzîk e ku gotina Kurd ji gotina kurd a Farisîya kevin hatibe wergirtin, ku bi mana aza ye.

612'ê pêş zayînî de bi destê Kîyaksarê padîşahê Medan hat girtin.

Dema Împaratorîya Medan a di sedsala 7'an a berî zayînî de ku di welatekî fireh de hatibû avakirin, 'esîlzadên Medî desthilatek mezin bi dest xistin û bi awakî bê hesab jî dewlemend bûn. Nabunî ferman rewayê Babîlê nûnerên Necîbzadeyên Medî bi "Padşah" nav dikir. Çiqas Necîbzadeyî dewlemend dibû, kesên ji eşîreta wî jî ewqas feqîr diketin û hejmara kolên xwe zêdetir dikir. Zêdebûna cure cure serwet û pirbûna kolan bû sebebê wê ku yekîtîya eşîretên Medîyan têk biçe û bibe dewletek koledarî. Her çend ji ber xîyaneta beşek zêde ji Necîbzadeyên Medî, Împaratorîya Medî di sala 550'yê berî zayînî de serî li ber hukumeta Persan tewand, lê Kurdan di çîyayên xwe yên asê de serxwebûna xwe her parastin.

Ksenophon di kitêba Anabasîs de wiha dibêje:

*"Kurd bi serê xwe ku di çîyan de dijîn, tu wextî ne ji ber desthilata Kisarkes "Xeşayarşa" û ne jî ji ber dewleta Ermenî serê xwe netewandine".*

Wisa dîyar e ji dema Sasanîyan de di sedsala 7'an berî hatina Ereban, Kurd bi vî navî hatine naskirin, wî wextî jî heta derecekê li der û dorê vê melbendê niştecî bûne ku niha jê re Kurdistan dibêjin.

## 3 - Kurd di Qirna Navîn de

Ereban Hukumeta Sasanîyan hilweşandin ku yek ji wan mezintirîn binemala desthilata Îranê bû. Piştî Sasanîyan heta êrîşa giran a Moxolîyan, çend binemalên din desthilatdarî kirin. Ji van hemûyan girîngtîr Şedadî bûn, ku binemala desthilatdarîya xwe sala 951'an li bakurê Kurdistanê damezrandin. Piştî van Merwanî hatin (990-1069), ku fermanrewatîya Dîyarbekrê û çend bajarên Ermenîstanê di destê wan de bû. Yek ji van herî şanazîtirîn fesla dîroka gelên Rojhilata Navîn, xebata serkevtî ya Selaheddînê Eyyubî ya dijî êrîşa xaçperestên Avrupayê ye. Selaheddîn împaratorîyek damezrand ku Misir, Surîye û Beynu'l-Nehreyn digirt nav xwe. Hukumeta Eyubîyan 81 sal jîya (1169-

1250), ku mezintirîn binemala desthilata wî wextî bû. Ji wê rojê heta êrîşa Moxolîyan, Kurd ku gelek şerker û aza bûn, gelek caran xizmetên mezin ji bo hukumranîyên bîyanî kirine. Lê, piştî hatina Moxolîyan sîyasetek gelek şaş li hemberê Kurdan destpê kir, ku ev yeka han ji bikaranîna xizmet û qehremanîya Kurdan ji bo şer û êrîşên dijî netewên din pêk dihat û ji derveyê vê eşîretên Kurdan jî li dijî hev dihatin rakirin. Her çendîn roj bi roj kêmtir biserkeve jî, ev sîyaseta han heta îro jî her berdewam e.

Sê êrîşên mezin rewşa daniştiwanên Kurdistanê û Asya Nêzîk heta derecek zêde guherand. Hatina Tirkên Selçukî ya di sala 1051'an de, êrîşa Moxolîyan a sala 1231'an û hatina Tîmurê Leng a sala 1402'an, ev hersê êrîşên han bi ser hev de bûne sebebê dagirkirin û wêrankirina welat, gelek astengên aborî û civakî yên mezin pêk anî, ku heta wextek dirêj çareserî nehat kirin.

Di destpêka sedsala 16'an de li Îranê û li welatê Osmanî du hukumetên navendî damezrabûn ku di wê demê de gelek bi hêzbûn. Simaîlê Yekem (1502-1518) danerê bingeha binemala Sefewî li Îranê de mezhebê Şîî di dijî mezhebê sunî de bihêz kir, ku mezhebê Îslamê yê resmî bû. Dema mirovên mezin ên Kurd pêşniyar lê kirin ku di şerê Sultanê Osmanîyan de alîkarîya wî bikin, Şah Îsmaîl vê pêşnîyara han qebûl nekir û fermana girtina wan da(3).

Sultan Selîmê Osmanî di saya îstîfadekirina hestê ayînî, Kurdên sunî li dijî Sefewîyan han da, bi vî awayî Tirkan bi alîkarîya Kurdan karîn di Şerê Çaldiranê de, ku di 23'ê Tebaxa sala 1514'an de li bakurê rojavayê Gola Urmîyê qewimî, eskerên Şah Îsmaîl bişkînin. Sala 1514'an ji bo netewa Kurd salek ne baş bû, di netîca vî şerî de Kurdistan di navbera Îran û Împaratoriya Osmanî de bi fîîlî hat perçekirin û beşê mezin ket bin desthilata Osmanîyan. Ev parvekirina han di peymanekê de ku di sala 1639'an de di navbera Şah Ebbas û Sultan Muradê Osmanî de hat muhur kirin, bi resmî cîyê xwe girt û ev yeka han felaketek girîng bû ku tesîrê kir li ser hemû bûyerên paşeroja dîroka gelê Kurd.

Piştî sala 1514'an Sultanê Tirk fermana pêkanîna emaretek

---

(3) "Şerefname" , Qahîre, rûpel: 168.

Kurdan da Mele Îdrîs, ku Kurdek ji xelkê Bedlîsê bû. İdrîs ji bo parastina sinorê Tirkîyê eşîretên nû ji Kurdan di xeta sinor de niştecî kir û hemû bac û xeracan ji ser wan rakirin.

*"Ew eşîretên ji hemû bac û xeracan hatibûn azad kirin, bi wî mercî ku eskerek gelemperî damezrînin, çi wextî pêwistîya Tirkan pê hebe bikar bînin"* (4).

Di navbera sala 1514'an û heta nîva duyemê sedsala 19'an de çend mîrnişînên (Mîrektî, derebegî, fermanrewatî -Elîşêr) Kurd hatin damezrandin ku her yek ji wan di nav çarçova Împaratorîya Osmanî, yan Îranê de xwedîyê awakî serxwebûnîyê bûn. Heta peywendîya hinek ji wan hem li gel Şahê Îranê û hem li gel Sultanên Osmanîyan hebûn.

*"Wan derebegên bi hêz hinek caran cewaba padişahan nedane û ji xwe re pere lê dane, navê xwe di xutbên înan de di şûna navê padîşah de dane xwendin"*(5)

Wek me di pêş de got ne tenê derebegan, binemalên fermanrewa û mîrnişînên Kurdan jî her çendîn awakî serxwebûnîyek wan hebû, lê di nav xwe de yek nebûn, her wext şer û problem di navbera wan de hebû, gelek caran wisa lê dihat ku ji bo şerê yektir daxwaza alîkarîyê ji Şahên Îranê yan Sultanên Osmanîyan dikirin.

Piştî çend şeren giran di navbera salên 1752-1795'an de, binemalek mezin a Kurd, di bin serokatîya Kerîm Zend de hat damezrandin. Dema desthilatîya Kerîm Xan (1752-1779) xweştirîn fesla dîroka gelê Kurd bû. Aşkera ye ew wext ji bo serxwebûna gelê Kurd firsetek baş bû, lê her wek Selaheddîn bû serdarê çend netewên din, Kerîm Xan jî bû fermanrewayê hemû Îranê. Kerîm Xan yekem kes bû ku xelkê leqeba "Wekîl" pê ve danîbû.

Konsolosê Frense li Bexdayê di namekê de ku di sala 1763'an de ji Parisê re şandîye, li ser Kerîm Xan wiha nivîsandîye:

*"Di bin pêşengîya Kerîm Xan de ku xwedî nifûsek şexsî û akarêkî zanayane ye, aşkera ye welat ketîye geşbûn, tuşî hêmnayetî*

(4) B. Nikitin: "Kurd", Paris, 1956, rûpel: 186.

(5) Eynî serokanî.

*û îmarê bûye. Asayîş û hêminî cîyê têkelhevî û şer girtîye"*[6].

Konsolos pişt re wiha dinivîse:

*"Rê emîn bûne, bazirganî destpê kirîye, gelek karwan ji vir*[7] *diçin Îranê, 15-20 hezar malên Îranî ku pena anîbûn Iraqê, niha hêdî hêdî vedigerin welatê xwe"*[8].

Kerîm Xan gelek piştgirîya zanist û kulturê dikir û gelek hewla avabûna welat dida[9]. Gerokê bi nav û deng ê Îngilîz Malcolm bi vî awayî behsa Kerîm Xan dike:

*"Bi bextîyarî jîya, koça dawîyê wek mirina babek xwoşewîs di nav mal û zarokên xwe de bû"*[10].

Mîrnişîna dawîyê ku di Îranê de mabû, Mîrnişîna Erdelan bû. Mezintirîn fermanrewayên wê Emanellah Xan (1800-1820) û Xusrevxanê kurê wî bû. Erdelan heta dema Xusrevxan, ku serokek bi nav û deng bû, heta niha jî di wê melbendê de bi rêzgirtina xelkê serxwebûna xwe parastîye[11].

Sala 1865'an Xulamşahxan bû walîyê Erdelan û piştî mirina wî, şahên Îranê ew mîrnişîne hilweşandin û walîyê xwe danîn wir. Bi vî awayî dawîya azadîya melbendên Kurdistanê ku heta derecek serxwebûna wê hebû, ji destê wan hat sitendin.

## 4 - Kurd di Dema Nû de

Piştî sala 1683'an ku Tirk li nêzîkî Viyanayê şikestin, fetil dan ber bi sinorê rojhilat ve û hêdî hêdî destê xwe dirêjî nav kar û ba-

---

(6) Archives Nationales de France, Correspondence Consulaire, Baghdad Vol. 1 No. 175.

(7) Yanî ji Bexdad.

(8) Eynî serokanî.

(9) Hêdaytî: "Tarîx Zend", Tehran, 1956.

(10) Sir John Malcolm: Histoire de la Perse, Paris 1821, Tome. III p.220.

(11) B. Nikitine: Les Kurdes, Etude Sociologigue et Historique, Paris, 1956, p. 68.

rên mîrnişînê Kurdan kirin. Ji sala 1830'an şûn de destpê kirin di Kurdistanê de bingehên eskerî damezrandin. Ev karê han bû sebebê acizbûn û nerehetîya Kurdan û gelek di ser re derbaz nebû serîhildanên Kurdan geş bûn û ji bo serxwebûna xwe serîhildan. Bi vî awayî serîhildanên han heta dawîya sedsala 19'an her berdewam bûn.

Yek ji wan kesan ku bi azayetî bi Tirkan re şer kirîye, Mehemed Paşa bû ku bi navê "Mîrê Rewandizê" bi nav û deng bû. Mehemed Paşa esker berhev kirin û li Rewandizê kargehek çeksazîyê damezrand, ku tê de xencer, tiving û heta top jî dihat durust kirin. Nêzîkî dused top çêkirin ku heta niha jî nimûnên wan li Rewandiz û Muzexana Bexdayê mane(12). Mehemed Paşa ji 30 hezar kesan zêdetir esker saz kir û di sala 1826'an de serxwebûnîya welatê xwe îlan kir. Ev mirovê han ê qehreman di demek gelek kurt de serkevtîyên gelek berbiçav bidest xist: Navça Musil, Mêrdîn û Cizîrê (Îbn 'Emer) girt û ji Bexda bigire heta sinorê Îraq û Surîyê, Îraq û Îranê ferman dikir. Mehemed Paşa li gel Birahîm Paşayê kurê Paşayê Misrê, ku bi Tirkan re şer dikir, ji bo ku di herdu milan de êrîşê Împaratorîya Osmanî bikin, peywendî danî. Dema Sultan bi vê yekê hesîya eskerek mezin şand ser Mehemed Paşa, vê êrîşa han qet feydek neda, lê gelek di ser de derbaz nebû Mehemed Paşa bi xwe teslîmî Sultan bû û çû Stenbol. Ew jî di netîca handana fetwa ku mela dabû. Li gor wê fetwayê li dijî xelîfe şerkirin gunehek mezin bû. Dema di vegera xwe de bi destê kirêgirtîyên Tirkan li Trabzonê hat kuştin.

Mîrê Cizîrê Bedirxan dest bi berxwedanek mezin kir li dijî Tirkan û sala 1842'an, li bakur hemû melbenda navbera Gola Wanê û Urmîyê, li başûr Musil û Rewandizê kir yek perçe û dest-hilatê tê de girt destê xwe. Lê, Tirkan karîn Mesîhiyan bikin dijî wî, ku amade nebûn vêrgî û cerîme (bac û pîtak) bidin Bedir-xanîyan, ji ber vê jî bi tundî ew ceza kirin. Di vir de Brîtanya û Frense bi tundî daxwazê ji Sultan kirin ku parêzgerîya jîyana Mesîhîyan bike. Piştre Bedirxan di netîca xîyaneta xizmekî xwe de şikest û esîr ket.

---

(12) Elaeddîn Seccadî: "Şorişekanî Kurd" (bi Kurdî), Bexda, 1959, rûpel: 65.

Mezintirîn serîhildana wê demê ew serîhildan bû ku wextê şerê di navbera Rûsya û Tirkan de (1853-1856) di bin serokatîya qehremanê netewî Yezdanşêr de berpa bû. Vê serîhildana han li melbenda Hekarîyê û Botan destpê kir û pişt re zû belav bû, di demek gelek kin de Yezdanşêr karî hemû melbendên navbera Gola Wanê û Urmîyê rizgar bike. Yek ji wan karekterê herî berbiçav a vê serîhildanê eva han bû ku piranîya xelkê jar û feqîr piştevanîya wê dikirin û di eksê serîhildana Bedirxanîyan de hevwelatîyên Mesîhîyan gelek alîkarîya serîhildanê kirin û di şerên wan de beşdar bûn.

*"Di Kanûna Duyem a sala 1855'an de hejmara hêzên Yezdanşêr gihîşt 30 hezar kesan û di Sibata eynî salê de bû 60 hezar kes û pişt re gihîşte 100 hezar kesan, ku Rûm(Yunanî) û Ereb jî pê re bûn"*(13).

Yezdanşêr hewla wê jî da ku ji bo şerê Tirkan bi eskerên Rûsya re peywendî deyne, lê gelek mixabin bi ser neket.

Vê serîhildana han xwe du sal ragirt, pişt re Brîtanya hêzên xwe anî hewara Tirkan û di rîya mirovê xwe Nemrûd re karîn Yezdanşêr îkna bikin ku bi Sultan re li hev bê. Bi vî awayî Yezdanşêr jî bi wan soz û peymanan hat xapandin û çû Stenbolê û serîhildana wî dawî lê hat. Lê, tesîra vê serîhildanê di bûyerên paşerojên xebata gelê Kurd de gelek bû. Heta niha jî navê Yezdanşêr di folklora Kurdî de bi rêz û xoşewîstî tê bibîr anîn.

Serîhildanek girîng a Kurdan jî ewa han bû ku Şêx Ubeydullahê Şemizdînî serokatîya wê dikir. Ev serîhildana han sala 1880'yan berpa bû. Şêx Ubeydullah îstîfade ji nifûza xwe kir û eşîretên Kurdan anî ba hev û hemû wê melbenda navbera Gola Wanê û Urmîyê rizgar kir. Şêx gelek baş bi wê gihîştibû ku heta Kurdan neke yek, heta sîyasetek dostane li hemberê kêmatîyên netewayetî nexe ber çav, nikare bigihîje armanca xwe. Ji ber vê sala 1885'an dema pêşnîyar lê hat kirin ku di kuştarîya Mesîhîyan de beşdar bibe, di bersîva xwe de wiha got:

*"Tirk dixwazin em li Mesîhîyan bixin, dema Mesîhî ji holê*

---

(13) P. Y. Awiryanov: "Kurd di Sedsala 19'an di Şerê Navbera Rûsya, Tirkîyê û Îranê de". Bi zimanê Rûsî, Tîflîs, 1900, rûpel: 148-149.

*rabûn wê çaxê wê berê xwe bidin me"*(14).

Vê carê jî nokerên emperyalîzma Brîtanya rola xwe ya nebaş lîstin. Şêx di gotarek xwe de li Nançîya (Mintiqek li Mêrgeverê nêzîkî Şemizdîna ne-Elîşêr) konsolosê Brîtanya yê bajarê Wanê destnîşan kir û digot:

*"...Ez guhê xwe nadim gotinên bîyanîyan, ez di wê bawerîyê de me niha ku serokên Kurdan ketine ber êrîşên hukumeta Îranê, nabe em vê firseta han ji dest berdin ku ji bo sitendina hemû melbendên Kurdnişînên Tirkîyê û Îranê li hev hatîye. Divê em van melbendan rizgar bikin û bikin bin desthilata xwe û mîrnişînek serbixwe ya Kurd damezrînin"*(15).

Pêwîst e bê gotin di beramberê vê de dema ku hukumeta Îranê û Tirkîyê daxwaza Şêx fam kirin, pişt dan hev û bi hêzên herdu milan ve vê serîhildana han a girîng a Kurdî tefandin.

Piştî vê serîhildana han sultanên Osmanîyan sîyasetek "nerm"tir li beramberê Kurdan dan ber xwe. Sala 1892'an çend dibistan li Stenbol û Bexdayê ji eşîretan re bi navê "Eşîret Mektebleri" ji bo pêgîhandina hêzên siwarî yên Kurd, ku jê re Hemîdîye dihat gotin ( bi navê Sultan Ebdulhemîd, ku wî çaxî li ser text bû) vekirin. Her çendîn pêwîstîya Tirkan bi vê yekê ji bo şerê navbera wan û Rûsya hebû jî, lê ji bo ji holê rakirina Ermenîyan jî ji vê hêza han îstîfade kirin û cîyek girîng Siwarên Hemîdî di şerê navbera Tirkan û Rûsya de tunebû. Lê, Kurdan ji ber sebebê Siwarên Hemîdî milê Tirkan girtin. Vê carê Tirkan bawerî bi van siwarên han nedikir. Qanûna li ser Siwarên Hemîdî ya sala 1895'an a Tirkîyê bi aşkera dibêje:

*"Endamên hêzên Siwarên Hemîdî nabe ji derveyê wextê tehlîmê cilên eskerî li xwe kin û çek hilgirin, di wextê tehlîmê de nabe endamên hêzên Siwarên Hemîdî ji bo dadgehên zemanê aşîtîyê bên bang kirin"*(16).

---

(14) B. Nikitine: Les Kurdes, p. 189.

(15) B. Nikitine: Les Afchars d'Urmuyeh, Journal Asiatique. Jan-Mars 1929, p. 100.

(16) M. Fany: La Nation Kurde et son Evolution Sociale, Paris 1933, p. 171.

## 5- Xezînên Dewletên Emperyalîst li Kurdistanê

Çarenivîsa Kurdan her di wextê şerê Rûsya û Îranê de dîqeta Rûsya Çarîtî kêşa bû, ji ber ku ji sisîyan diduyê eskerên Îranê ji Kurdan pêk hatibûn[17].

Rûsyayê di şerê Rûsya û Tirkîyê yê salên 1828-1829'an de, pişt re bi taybetî di şerê nav xwe de (1853-1856) qîmetek mezin didan Kurdan . Qîmetpêdana Hukumeta Çar bi Kurdan ku neteweyek aza û şerker hatibû naskirin, ji bo wê bû ku li dijî hêzên Sultanê Osmanîyan û Şahê Îranê bi wan şer bidin kirin, yan bi kêmasî wisa lê bikin bê teref bin û dijî Rusya şer nekin.

Hukumeta Rûsya ya Çarîtî û Brîtanya teasubîyek "Mesîhîgerî" ya tund beramber bi çarenivîsa Ermenîyên Tirkîyê û bi taybetî ew ên li Kurdistana Tirkîyê dijîyan nîşan da. Armanca wan jî her ew bû ku parastina mafên Ermenîyan bi navê Mesîhîgerî ve bikin bahane ji bo wê di warê sîyasî de dexm bikin ser Sultan. Ewqas peywendîya wan bi Kurdan ve jî hebû, ew herdu dewletên "Mesîhî" Kurdan her ji însanan nedizanîn. Di 7'ê Îlona sala 1880'an de Hukumeta Rûsya, Brîtanya, Frense û hinek ên din ji welatên Avrupayê di beyanamekê de ku li ser Ermenîyên daniştiwanên rojhilatê Tirkîyê belav kiribûn, ku ew di wê melbendê de zêdetirîn ji %17'ê nifûsê bûn, nivîsînek bi hev re dabûn Hukumeta Osmanî û di wê nivîsînê de bi aşkera wiha digotin:

*"Ji ber ew Kurdên koçer ku li çîyan dijîn her ji bo têkelhevîyên li dijî mesîhîyan bi deştî ve tên xwarê, pêwîst e di van serhejmaran de neyên hesab kirin ku ji bo derketina piranîya daniştiwanê vê melbendê tê kirin"*[18].

Lê çi heye di Şerê Cîhanê yê Yekem de dewletên emperyalîst pêwîst zanîn ev "Kurdên koçer" bibîr bînin, ji milê bakurê Kurdistanê ve nokerên Rûsya û Brîtanya û ji milê başûr ve jî yên Almanya û Brîtanya ketin xebatê. Heta Wasmos ê konsolosê Almanya li

---

(17) Kurdoğlu: "Kurd û Emperyalîst" weşanên deng û behsê Rojhilata Navîn, hejmar 13-14, bi zimanê Rûsî, rûpel: 94.

(18) M. Fany: La Nation Kurde P. 161.

Buşehir bi yarmetîya Eşîreta Kurdên Sencabê[19] parêzgerî li yektirgirtina hêzên Rûsya û Brîtanya bike û nûkerên Brîtanya jî karîn Eşîretên Kelhor, Goran û Hewraman bi pere bixapînin, bi zêr nîşandan û sozên derew li dijî Eşîretên Sencabîyan rakin[20].

Yekem car di destpêka sedsala 20'an de Amerîka bi rîya mîsyoneran ve karî dest bavêje Kurdistanê. Wan, wextê Şerê Cîhanê yê Yekem rolek girîng li melbendên Urmiyê û Mehabadê lîstin. Lê, di navbera wan herdu şerên cîhanê de, bi taybetî piştî Şerê Duyem nifûza Amerîka gelek bi hêz bû.

Di Şerê Cîhanê yê Yekem de, piştî Frensa û Brîtanya zanîn ku Almanya di şer de şikestîye, di derbarê kar û barê dahatuya Rojhilata Navîn de peymanek nehênî muhr kirin, ku bi navê Peymana "Saykis-Piko" têt zanîn. Li gor vê peymanê, ji Împaratorîya Osmanî du melbend di bin nifûza Brîtanya û Frensa de hat parvekirin. Melbenda desthilata Brîtanya ku melbenda "Sor" bi nav kiribûn, bi awakî serekî ji Beynu'l-Nehreyn (Îraq) ku ji Xaneqîn (li Kurdistana Başûr) heta bakurê Kuveytê digre nav xwe, pêkhatibû. Melbenda desthilata Fransa jî bi navê melbenda "Şîn" bi nav kiribûn, bi awakî serekî ji Surîyê, Libnana îro û beşê başûrê rojhilatê Tirkîyê (yanî Kurdistana Bakurê Rojava) pêk dihat.

Filistîn "Navça Qehweyî" hat binav kirin , biryar hat dan ku bikeve bin çavdêrîya navnetewî.

Wezîrê Derve yê Rûsya Sazanov dema hest bi peymanê kir, di 26'ê Nîsana 1916'an de da xuyakirin ku bi vî şertî bi vê peymana han razî ye ku melbendên bakurê rojhilatê Tirkîyê ji Rusya re bê dan. Ev melbendên han jî bi awakî serekî ji Trabzon û beşa bakurê rojavayê Kurdistanê pêk hatibû. Bi vî awayî piranîya axa Kurdistanê ji alîyê van hersê dewletên emperyalîst de hat parvekirin.

Şazade Şaxofiski yê konsolosê Rusya Çarî yê Şamê berî Şerê Cîhanê yê Yekem û yekem kirêgirtîyê Çar ê li Kurdistanê di şer de, wiha dinivîse:

"Min karek mezin kiribû, lê bûyerên fewrî berhemên wî ji holê

(19) Kurdoğlu: "Kurd û Emperyalîst ", rûpel: 115.

(20) Eynî serokanî.

rakir in"(21).

Armanc ji bûyeran şoreşa burjuwa-demokratîk a 1917'an a Rûsya ye. Kurdoxlû bi vî awayî didomîne:

*"Heqê mirov heye mirov bêje, şoreşa Rûsya û pişt re Şoreşa Oktobrê karîn dawî bi dîplomasîya Çar bînin û heta dereceke bi van lîstikên xwînawî li gel çarenivîsa gelê Kurd bi qazanca emperyalîzmê dihatin krin"*(22).

Hukumeta Sovyet perde ji ser peymana Saykis-Piko û peymanên din hilda, bi vî karî alîkarîya gelên Rojhilata Navîn kir, ku fêl û fendên emperyalîstan ji wan re aşkera be.

Şoreşa 1905'an a Rûsya du şoreşên din li Îran û Tirkîyê di pê xwe re anî. Li Tebrîzê, ku di wan rojan de bingeha şoreşa Îranê bû, li bajarê Mahabadê, Sine, Seqiz û Kirmaşanê li Kurdistana Îranê, komîte hatin damezrandin. Komîta şoreşa Mahabadê di bin serokatîya însanê mezin ê civakî û lêhatî Kurd Qazî Fettahê şair hat damezrandin. Li Kirmaşan nêzîkî deh komîte hatin damezrandin û her di wî wextî de serîhildana Eşîra Şikakan li dor û berê Urmê di bin slogana (diruşma) "otonomî ji bo Kurdan" de hilket.

Kurdên Tirkîyê jî serkevtina Partîya "Tirkên Ciwan" firset zanîn û ji bo damezrandina dewletek Kurdî ya serbixwe dest bi kar kirin. Sala 1898'an(*) rojnama "Kurdistan" di destpêkî de li Qahîrê derket û pişt re cîyê wê guherandin Cenevê. Sala 1908'an rojnama "Hetawî Kurd" a organa Komela Teraqî we Tealî hat belav kirin û piştê vê rojnama "Rojî Kurd" a organa "Hêvî Kurd" derket. Hemû ev rojnamên han ji alîyê wan rewşenbîrên Kurdan ve dihatin weşandin,ku li ser binemala derebegan yan komelên netewî bûn û hewil didan bîr û bawerîya xebat û bi destxistina mafê netewî û rizgarî ya gelê Kurd belav bikin.

---

(21) Eynî serokanî.

(22) Her eynî serokanî.

(*) Navê eslî Kurd Teawun ve Terakkî Cemîyetî ye û organa wê Kurd Teawun ve Terakkî Gazetesî bû. Hetawî Kurd û Rojî Kurd herdu jî ji bal Komela "Hêvî" hatin derxistin (Elîşêr)

Şerê Cîhanê yê Yekem dawî li têkoşîna wan komele û rojnamên Kurdî anî. Hukumeta Tirkîyê "xeza" îlan kir û Kurd jî bi xezayê ve mijûl bûn û xebata wan a rizgarîxwazî bêhêz bû. Ev xebata han ku dikarî bi hêsanî û bi taybetî jî di wextê şer de berfireh bibe û bikemile. Di ser vê re jî ku Hukumeta Tirkîyê sîyaseta jinavbirina Kurdan dabûn pêşîya xwe, hejmarek zêde jî ji serokên Kurdan kuştin. Di milek din de Hukumeta Tirkîyê bi bahana paş de kêşana li hemberê hêzên Rûsya, cîyê 700 hezar Kurdan guhert û ji welatê wan derxist, ber bi vê guherandinê re hejmarek gelek zêde Kurd qir bûn(23). Di Şerê Cîhanê yê Yekem de eskerên Tirk ne tenê li Kurdistana Tirkîyê li Kurdistana Îranê jî gelek gundên Kurdan wêran kirin û terş û talanê gelek Kurdan birin û bi hezaran hevniştimanê wan ên destgirêdayî kuştin û ji holê rakirin(24). Berhemên Şerê Cîhanê yê Yekem ji bo kedkarên Kurdistanê tenê feqîrî, ezîyet, kuştin û zehmetî bû.

## 6 - Kurdistan Piştê Şoreşa Mezin a Sosyalîst a Oktobrê

Di 30'ê Çirîya Yekem a sala 1918'an de peymanek şersekinandinê hat muhurkirin, ku li gor vê peymana han Tirkîye bê lam cîm teslîm bû, ev peymana han di wî wextî de mana hilweşîna Împaratorîya Osmanî bû.

Li gel sekinîna şer, rêxistin û rojnamên Kurdî xebatek berbelavî dan destpêkirin û yekemîn slogana wan damezrandina dewletek serbixwe ya Kurd bû.

Piştî serkevtina Şoreşa Oktobrê karbidestên Sovyetê ji bo bihêzkirina desthilata xwe li Qafqasyê, hewlek hêja dan. Vî karê han di hemû warî de tesîrek mezin kir li ser rewşa pêşveçûnên di welatên cîran de. Di 3'ê Kanûna Yekem a sala 1917'an de beyanama bi nav û deng a Sovyetê ji bo kedkarên Musilmanên Rûsya û Rojhilat hat belav kirin. Ev beyanama han çareserkirina mesela

---

(23) B. Nikitine: Les Kurdes. Paris, 1956. p. 196.

(24) "Gelên Asya Naverast" bi zimanê Rûsî, Moskova 1957, rûpel: 240.

netewî di Sovyet de ku di praktîkê de jî hat cîbîcî kirin, tesîrek mezin a Şoreşa Oktobrê li ser çarenivîsa netewên bindest, netewên Rojhilata Navîn û bi taybetî li welatên cîran çêkir û vê mesela han ronî kir. Ev mesela han li Kurdistana Îranê bi awakî wisa deng da ku li ser pêşnîyarîya eskerên şoreşger ên Rûsyayê sala 1918'an li bajarê Kirmaşan çend komîte hatin damezrandin. Her di wî wextî de em dikarin tê bigihîjin, ku Şoreşa mezin a Sosyalîst a Oktobrê û sîyaseta Yekîtîya Sovyetê a li hemberê netewan, ka çendîn tesîr kir li ser tevgera rizgarîxwazî netewî ya gelê Kurd.

Sala 1919'an tevgera rizgarîxwazî netewî ya Tirkîyê di bin serokatîya Mistefa Kemal de pêş de çû û hemû Tirkîyê girt nav xwe. Di meha Tîrmeha wê salê de civînek bi rêxistinên netewî û rêxistinên burjuwazîya netewî re çêbû ku di wir de "Komela Parastina Mafê Anadoluya Rojhilat" hat damezrandin. Ev civîna han li Erzirumê hat kirin û hemû grûb û elîtên têgihîştî yên Kurd bi awakî gelek aktîfî tê de beşdar bûn û bi hemû îmkanên xwe ve piştevanîya xebata rizgarîxwazî netewî ya Tirkan a li dijî emperyalîzmê kirin, ji ber ku li ba wan wisa bû bi serkevtina vê xebatê gelê Kurd jî dikare bigihîje mafên xwe yên netewî. Sala 1920'an dema ku Meclîsa Mezin a Netewî ya Tirkîyê li Enqerê civîya, di vê civînê de 72 nûnerên Kurd beşdar bûn ku bi navê nunerên Kurdistanê hevkarî bi Mistefa Kemal re dikirin(25).

Di meha Tebaxa 1920'an de Peymana Sewrê li ser Tirkîyê hat qebûl kirin ku ev beşek ji Peymana Wersaillayê bû. Ev peymana han di alîkî de ji bal Brîtanya Mezin, Frense, Yunanîstan, Îtalya, Romanya, Yugoslavya, Çekoslovakya, Lehîstan (Polonya), Belçîka, Japon, Hîcaz û Ermenîstana Taşnak, di alî din de jî ji bal Sultanê Tirkan hat muhrkirin. Di wê konferansê de grûbek nûnerên Kurd jî di bin serokatîya Şerîf Paşa de beşdar bûn û li ser Kurdistanê ev bendên han ên xwarê di peymanê de cî girtin:

*"**Beşê Sisîyan, Benda 62'an** - Komîsyona Stenbolê ji sê kesan pêk tê, ku Hukumetên Brîtanya, Frense û Italya bi resmî wan destnîşan dikin, pêwîst e heta şeş meh piştî muhrkirina vê pey-*

(25) Nurî Dersimî: Kurdistan Tarihihde Dersim, Halab, 1952, p.125.

*manê ev komîsyona han ji bo wan melbendên ku sinorên wê pişt re wê bên tespîtkirin ku piranîya danîştiwanê wan Kurd in û ketine rojhilatê Çemê Firat û başurê Ermenîstanê û bakurê sinorê Tirkîyê, Surîye û Mezopotamya, wek di madda 27'an II, li gor dereca 2, 3'an hatîye, planek otonomîya mehellî wê pêşkêş bike. Ger li ser meselekê negihîjin biryarek hevdengî, endamên komîsyonê dê bûyerê ragihînin hukumetên xwe.*

*Ev plana han pêwîst e parêzgerîya hemû Asûrîyan û kêmayetîyên netewî û regezên din ên di wan melbendan de ne, garantî bike û ji bo bicîkirina vê armancê komîsyonek ji nûnerên Brîtanya, Frensa, Îtalya, Îran û Kurdan ji bo lêkolîn û biryar dan li ser hemû awa destkarîyek ku li gor şertên peymanê li ser sinorên Tirkîyê û eynî wextî Îranê çêbe, dê van destkarîyan li gor şertên peymanê cîbicî bike.*

***Benda 63'an** - Hukumeta Osmanî ji vir şûn de li gor benda 62'yan ew herdu komîsyonên ku hatine damezrandin piştî sê mehan biryarên pêşkêş bikin dê rîayetê wan bike û teahud dike dê van biryaran bîne cî.*

***Benda 64'an** - Eger heta salek piştî îmzakirina vê peymana han, Kurdên danîştiwanên wan melbendên di benda 62'an de hatine dîyarkirin, di rîya Encumena Komela Netewan de ragehîne ku piranîya danîştiwanên wan melbendan dixwazin ji Tirkîyê cuda bin, encumen jî qeneet bike ku ew dikarin serbixwe bijîn û tewsîye bike ku serxwebûnîya wan bê dan, Tirkîye ji niha de qebûl dike ku vê tewsîya han qebûl bike û dest ji hemû mafên xwe yên di wan melbendan de bikişîne. Bi awakî fireh destberdana Tirkîyê ji van mafên han bi dirêjî dê di peymanek taybetî de bê behskirin ku di navbera Tirkîyê û hevpeymanên mezin de dê bê girêdan. Piştî temambûna destjêberdan û pêkanîna serxwebûnê, eger Kurdên Wilayeta Musilê bi dilxwazî bixwazin bi vê dewleta serxbixwe re bibin yek, dê hevpeymanên mezin qet bi tu awayî îtîraz nekin"(26).*

---

(26) Charles, A.Hooper: L'Îraq et la Société des Nations, Paris, 1928, p. 99-100.

Di vir de ev pirsa han têt pêş ku Brîtanya û Frense ev dewletên emperyalîst ku serokatîya Peymana Sewrê dikirin, çawan bi wê razîbûn ku Kurdistanek otonomî damezre ku li gor wan, dibû pişt re serxwebûna xwe jî bigre. Gelo Brîtanya û Frense wek ji xwe re digotin, bi rastî jî dixwestin gelê Kurd li gor çarde bend pêşnîyarên Wilson, mafê qedera xwe bi xwe tayînkirinê bi dest bixe?

Armanca rastîn ya van herdu dewletan ew bû ku pêşî li belavbûna tesîra Şoreşa Mezin a Sosyalît a Oktobrê bigrin. Dixwestin dewletek paşvemayî ya derebeg durust bikin ku Tirkîyê û Rûsya sosyalîst ji hev cuda bike û bibe noqtek stratejîk li dijî Yekîtîya Sovyetê ya nêzîkî kanîyên petrola Kafkasyê. Di milek din de jî ji hevkarîya navbera Kurdan û Kemalîstan tirsîyabûn, bi vî awayî nedixwestin Anadola Rojhilat (yanî Kurdistan), ku xelkê wê piştivanîya Kemalîstan dikir, cîhê bikin û bi vî awayî cîyê piyê xwe bidin leqandin. Brîtanî ku destekî wan ê zêde di peymanê de hebû, li ba wan wisa bû ku eger dewletek wiha bê damezrandin, dê raste rast di bin desthilatdarîya Brîtanya de be. Aşkera ye Brîtanya dixwest, bi taybetî piştî ku petrol hat dîtin, Wilayeta Musilê jî ji Tirkîyê cuda bike û têke bin desthilata xwe.

Di rastîya xwe de armanca Peymana Sewrê perçe perçe kirina Împaratorîya Osmanî bû, bi awakî wisa ku ew dewletên tên damezrandin raste rast an bi awakî din di bin desthilata emperyalîstan de bin.

Clemenceauyê serokê heyeta nunerên Fransa ji bo parvekirina Tirkîyê muzakerê baş ronî kirîye û wiha gotîye:

*"Baş e, rast e min dest ji Musilê kêşa, lê min wê kir xwarin ku Kilîs bikeve destê min. Qet 'eybek Kilîs û Îskenderunê tune. Ji ber vê yekê min ji Ingilîzan re got: Ji Kilîs û Musilê kîjan ji we re baş e wê bigrin, gotin em Musilê digrin. Min got baş e, hûn Musilê bigrin û ez jî Kilîsê digrim"(27).*

Emperyalîstan bi van bêşermîyan qedera netewan dîyar diki-

---

(27) A.F.Miller: "Piştê Şerê Cîhanê yê Yekem Rojhilata Nêzîk 1918-1923" bi zimanê Çekî, Prag, 1951, rûpel: 22.

rin. Her wiha Clemenceau di axaftinek xwe ya parlamentoyê de vê yeka han îtîraf kir ku eger zanîbûya di Wilayeta Musilê de evqas zêde petrol heye, wî çaxî vê peymana han îmza nedikir (28).

Lê Peymana Sewrê her di destpêkî de wek madenê çînî nazik bû, ji ber ku Hukumeta Sultan ku di riya nunerên xwe re vê peymana han îmza kir, gelek di ser de neçû di piranîya melbendên Anadoloya Rojhilat de desthilatê ji destê xwe kir, Meclisa Mezin a Netewe li Enqerê civîya û Mistefa Kemal wek serokê hukumetê helbijart û peymanê qebûl nekir. Gotina Enqerê rast bû ku got:

*"Peymana Tirkîyê li kargeha Sewrê ya ji alîyê netewan de hat îmza kirin (kargeha han li Sewrê ku qab û qacaxên çînî durust dike) wek hemû berhemên din ên kargehê şikandina wê hêsan e" (29).*

Di rastîya xwe de ev peymana han di pê hev de hilweşîya û piştî havîna sala 1921'an ku eskerên Mistefa Kemal li Sakaryê li hemberê eskerên Yunanîyan bi ser kevtin, bi tevayî qîmeta wê nema. Heta Îlona sala 1922'an nêzîkî temamî axa Tirkîyê ji destê bîyanîyan hat rizgarkirin û pişt re Çirîya Duyem a sala 1923'an rejima paşatî hat hilweşandin, di Tîrmeha sala 1923'an de li Kongra Lozanê peymanek din hat îmzakirin ku li gor wê peymanê Tirkîyê nêzîkî hemû axa xwe parast. Di peymanê de qet bi tu awayî behsa mesela Kurd nehat kirin tenê ewqas tê de bû ku digot pêwîst e rêz bi mafê kulturî û dînî ya kêmatîyan bê girtin.

Bi vî awayî, tu qazanc û qîmet Peymana Sewrê bê wê yekê ku cara pêşîn di peymanek navnetewî de behsa mafên gelê Kurd kirîye, ji bo gelê Kurd tunebû û gelê Kurd bi vê peymanê ku her mirî ji dayîk bûbû ji vê zêdetir bidest nexist.

---

(28) Charles. A. Hooper: L'Iraq et la Société des Nations, p. 18.

(29) Miller, Rojhilata Nêzîk, rûpel: 24.

FESLA SISÎYAN

# PARVEKIRINA KURDISTANÊ

## 1 - Kurd Li Turkîyê

Piştî Peymana Lozanê, dawî bi xebata gelê Kurd nehat, piştê vê peymanê jî çend serîhildanên berfireh ên Kurd li Îranê, Tirkîyê û Îraqê (ku nû hatibû damezrandin) berpa bûn.

Gelek di ser de derbaz nebû Kemalîstan hemû wan sozên bi "Peymannama Niştimanî" ya Tîrmeha sala 1920'an dabûn Kurdan, ku doza rêzlêgirtina mafê kêmayetîyan dikir, jibîr kirin. Kemalîstan çend cîyê piyên xwe qayîm dikirin, ewqas tundtir êrîşê dibirin ser mafên demokratîk ê daniştiwanan û bi taybetî ser mafên netewî yê Kurdan û Ermenîyan. Di ser vê de jî Hukumeta Tirkîyê sîyaseta şovenîst ya asîmîlasyona gelê Kurd girt ber xwe.

Sala 1925'an Serîhildana Kurdistanê li Tirkîyê di bin serokatîya Şêx Seîd de destpê kir. Pêlên vê serîhildana han di demek kurt de belav bûn. Li Helebê û Erzirumê çend komîte hatin amadekirin ji bo şoreşê hatin damezrandin. Komîta Helebê ku Şêx Seîd tê de bû ji hemû komîtên din aktîftir bû, lê Komîta Erzirumê ji tevan zêdetir xwe ragirt[1]. Yek ji wan sloganên berbiçav yên

[1] Vê komîta han di beyanamek xwe de baca ser hevwelatîyan hilda.

serîhildanê "Damezrandina Kurdistanek serbixwe di bin çavdêrîya Tirkîyê û anîna Hukumeta Sultan ser kar" bû[2]. Aşkera ye ev yeka han tenê bi serê xwe belga paşkevtin û sergêjîya serokên wê bû. Ji ber ku bi dilsozîyek bê sinor ji bo rizgarîya Kurdistan têkoşan, guman di wê de nîne ku destê hêzên kevneperest ên Tirkîyê û bi taybetî emperyalîzma Brîtanya tê de hebû. Wek em dibînin herdu jî li dijî damezrandina rejima cumhurîyetê bûn.

Piştî çend şerê xwînawî serîhildan hat tefandin û Şêx Seîd, Dr. Fuat û serokên din derxistin dadgehê û pişt re îdam kirin. Ew serokê dadgehê ku hukmê îdama 53 kesan dabû û wan wek serokê serîhildanê dabû nîşandan, roja 28'ê Hezîrana 1925'an di celsa dadgehê de wiha digot:

*"Di nav we de hinekan nerêtîya îdarî ya hukumetê û hinek ji we jî parêzgerîya xelîfetîyê ji bo vê serîhildanê kir bahane, lê hûn hemû li ser damezrandina Kurdistanek serbixwe hevdeng bûn"*[3].

Nehro rast bû wexta wiha digot:

*"Bi vî awayî Tirk, ku nû di xebata xwe ya rizgarîxwazî de bi ser ketibûn, dest kirin bi lêdana wan Kurdan ku di rîya rizgarîya xwe de xebat dikirin. Bi rastî tiştek ecêb e, ku netewek heta do parêzgerîya mafên xwe dikir, niha destdirêjîya mafê neteweyek din bike û xebata rizgarîxwazî bike xebata ji bo bindest kirina gelên din. Sala 1929'an serîhildanek din a gelê Kurd hilket, lê ev jî di demek kurt de hat tefandin. Lê kî heye bikare xelkekî ji holê rake ku li ser bi destxistina mafê xwe muksur e û amade ye nirxê vê azadîyê bide?"*[4].

Pêwîst e bê zanîn, armanca burjuwazîya Tirk ku beramberê hêz û grubên demokrasîyê riya sîyasetek dîktatorîyê dabû ber xwe, tiştek tabîî bû. Ji ber ku dema burjuwazîya nasyonalîst a bindest

---

(2) M. Pukurilov: "Mesela Kurd" kovara Şer û Şoreş, bi zimanê Rûsî, cilda sêyem, Gulan 1925, rûpel: 147.

(3) L. Rambout, Les Kurdes... , p. 27.

(4) C. L. Nehro: "Awirek li Ser Dîroka Cîhanê", çapa Îngilîzî, cilda duyem, Allahabad, 1935, rûpel: 1108.

li dijî emperyalîzmê xebat dike karekterek wê ya "xweparêzî" heye, lê her eynî nasyonalîst dema serdestîya netewekî bindest dike, akarek kevneperestî û şovenîstî digre û karekterek "destdirêjî" peyda dike[(5)].

Serîhildana 1925'an zerarek mezin da Hukumeta Tirkîyê. Ev yeka han mezintirîn belge ye ku Tirkîyê ji bo tefandina vê serîhildanê pêwîstî bi 35 hezar esker û 12 firokan hebû[(6)].

*"Ev serîhildana han ewqas girîng bû hebûna Tirkan wek dewletek dixist tirsê û ji bo vê Tirk naçar bûn 80 hezar esker di Kurdistanê de bi cî bikin"*[(7)].

Hêzên Tirkîyê wek eskerekî emperyalîst dest avêtin wêran kirina Kurdistanê. Bi hezaran hevwelatîyên bê guneh hatin kuştin ku di nav wan de piranî jin û zarok bûn, 206 gund hatin wêranki-

---

(5) *Bi rastî Kurd amade ye bi hemû awayî qîmet bide azadîyê. Nivîskarê Tirk S.Ustungel vê rastîya han baş dîtîye ku dema dibêje:*

*"Xelkê gundan dibînin ku bi zindî ji merkezê polîs û jendirman vedigerin, lê wan ji hemû gîyana wan qut kirine. Kemalîstan bi dilreşîya hemberê millet de serî ji hemû sultanên xwînxwar sitendine, îcraat û kirinên wan li hemberê kêmayetîyên netewî ku dixwazin bi zorê bikin Tirk, gelek bi hovîtî ye. Lazan ji cîyên wan derxistin grûb grûb Kurdan jî wek Ermenîyan dikujin. Heta niha 100 hezar Kurd bi neheqî hatine kuştun û bi hezaran gundên Kurdan hatine şewitandin û talankirin. Hatin û çûna li wan gundên hatine şewitandin hatine qedexe kirin, lê ev karên han nikarin sîyaseta xwînawî ya hukumeta Enqerê veşêre. Îbrahîm Talkî bû yekem çavdêr û hakimê giştî yê Kurdistanê. Zor, zordestî û kirinên vî mirovî welat xera kir. Em çend komunîst di girtîgehekê de girtîbûn, ku ketibû bin melbenda çavedêrîya giştî. Me dît ku jendirme grûb grûb Kurd dibin derve, gulebaran dikin û pişt re tên nav zindanê û piştînîyên hevrîşm ên xortên Kurd ên kuştî difroşin xelkê".* S.Ustungel; Rîya Xebatê, çapa Çekî, Prag, 1952.

(6) M. Pugurilov; Mesela Kurd...", rûpel: 151.

(7) M. Firuxî, serokwezîrê Îranê yê wextê Şerê Cîhanê yê Duyem. Di navekê re li Enqerê sefîrê Îranê bû, wî di namek nehênî de behs kirîye, ku di meha Hezîrana 1957'an de ji Enqerê ji Wezîrê Derve yê Îranê re nivîsandîye, ev nama han di kovara Dinya hejmara 8'an a sala 1958'an, li Tehranê bi zimanê Farisî hatîye belavkirin.

rin, 8.758 xanî hatin şewitandin û 15.200 kes hatin kuştin[8]. Vê serîhildana han 20 mîlyon lîre zîyan da Hukumeta Tirkîyê[9].

Ev bûn ew riyên gemar ên ku Hukumeta Tirkîyê ji bo tefandina serîhildanê dabûn ber xwe. Kar gihîşt derecek wisa ku rojnama "Vakit" li ser rûpelên xwe, bibê şermî wiha nivîsandîye:

*"Çi cîyê ku serê singûya Tirk lêbe, mesela Kurd nîne"(10)* .

Karbidestên Tirkîyê vê serîhildana han bi giştî ji bo bêdengkirina tevgera demokratîk a welat û bi taybetî ji bo tevgera çîna karker kirin bahane . Hukumeta Îsmet Înönü Qanûna Parastina Asayîşê xist kar, rojnamên komunîstan hatin qedexe kirin ku bi awakî nîv aşkera derdiketin, pişt re sendîkên karkeran ên Stenbol ji holê hatin rakirin û hejmarek gelek zêde ji xelk hatin girtin[11].

Bi vî awayî hêzên kevneperest çarenivîsa gelê Kurd ku ji bo azadî û bidestxistina mafên xwe yên netewî xebat dikir, li gel xebata çîna karker li dijî emperyalîzmê û ji bo riya azadî û demokrasîya welat, bi hev ve girêda:[12]

---

(8) L.Rambout, Les Kurdes..., p. 28.

(9) K. Wasiyalif; "Gîr û Giriftên Kişt û Kal", bi zimanê Rûsî, cilda 9, 10'an.

(10) Rojnama "Weqit" 8'ê Gulana 1925'an.

(11) "Tirkîya Niha", Moskova, bi zimanê Rûsî, 1958, rûpel: 146.

(12) Nivîskarê Tirk Ustungel dêmenek sipehî ya vê rastîyê derxistîye ku dinvîse:

*"Meyla kêmatîyên netewî yên bindest a ber bi komunîstan de zêde ye. Em di navbera çend salan de di nav girtîgehekê de li gel çend mirovên Kurd hepis bûn. Her çendîn hewil dihat dan ku navbera me xera bikin, lê Kurdan riya peywendîyê bi me re peyda dikirin. Rastî ev e ku ger alîkarîya wan nebûya, em dê ji birçîtî û tînîtîyê bimirna. Ji ber ku li girtîgehên Tirkîyê gelek car tê dîtin, ku heqên rojane jî ji bo komunîstan qedexe dikin û çi kesê ku kesekî wî li derveyê zindanê tunebe alîkarîyê jê re bike, halê wî şeperze ye".*

*"Dema em li wir (yanî li Kurdistan-Nivîskar) girtîbûn ne karwan tê re derbaz dibûn û ne teyr di ser de difirîyan. Vêca em li wê Kurdistanê bûn ku bi xwîn, agir û bi şûran wêran kiribûn... Li gel vê jî û di ser hel û mer-*

## A - Mesela Kurd û Daşnak:

Sala 1927'an hemû rêxistinên netewî yên Kurdan di Partîya "Xoybûn"ê de bûn yek ku ji alîyê Kurdên muhacir ên niştecîyên derve pêkhatibû. Piranîya wan derebeg, xwedî milk û rewşenbîr bûn. Sala 1927'an yekemîn kongra vê partîyê li havîngeha Hemdûn li Lubnanê civîya û yek ji wan serokê Ermenîyan F. Papazyan jî di kar û barên kongrê de beşdar bû. Ew partî ji ber teng û kurtdîtinî ya qazancê, dostên serokî û hevpeymanên rasteqînî peyda nekir û nedikarî peyda jî bike. Ji ber ku tenê pişt bi piştivanîya dewletên emperyalîst girê dabû ku ewan nedixwestin ji bo mesela Kurd dexma sîyasî bixin ser Tirkîyê. Her ji ber vê jî Brîtanya karî kar û barên Partîya Xoybûnê bike bin çavdêrîya xwe, ji ber ku ji sîyaseta Hukumeta Tirkîyê razî nebû. Hukumeta Frense jî ji têkoşîna vê partîyê xafil nebû, ji ber ku navbera wan û Tikîyê gelek nexweş bû. Di ser van tevan de jî Partîya Xoybûnê Erraste rast ketibû bin nifûza Daşnakan ku ew ji nasyonalîstîya Ermenîyan a gelek tund pêkhatibû û hemû hewl û bizava wan, dijîtîya Yekîtîya Sovyetê bû. Partîya Daşnak alîkarîya sîyasî, rêxistinî û malî ji Partîya Xoybûn re dikir û her di wê demê de jî xwe parêzgerê Kurdan dihesiband, wek em ê di dawîyê de behs bikin ev bêyî agahdarîya axayê wan İngilîz û Frensizan nebû.

Sala 1930'an Partîya Xoybûnê li navça Araratê karê serîhildanek çekdarî di bin serokatîya Îhsan Nurî Paşa de hilkir. Hukumeta Îranê riya hêzên Tirkîyê da ku ji axa Îranê ve pişt li şerkerên Kurdistanê bigrin û piştî şerekî asê bi bikaranîna hêz, top û firokên zêde serîhildanê tefandin. Li gor hejmarek netemam, ku di vî warî de hatîye çêkerin, 165 gund û 6. 816 xanî hatin wêran kirin.

---

*cên nelibar de jî, me dikarî ne tenê di zîndanê de, li derveyî girtîxanê jî peywendî bi gundîyan re deynin. Vê yeka han bibîr bînin, ku heft derî li ser me hatibûn girtin û di ser vê re jî ew dîwarên pan û bi kevir jî, cardin kitêba Stalîn "Pirsên Lenînîzmê" û "Prensîbên Lenînîzmê" diketin destên me. "* S.Ustungel; Rîya Xebatê", rûpel: 17 û 46

Di ser van hemû kuştin û azardan, îşkence û îdaman de jî, gelê Kurd ferqîtîya navbera Tirk û Tirk, Tirkên kedkar, xebatker û Tirkên xwînxar ên zordar dikir.

Di vir de pêwîst e bê zanîn ku ji bo çi Partîya Daşnak piştgirîya Partîya Xoybûn dikir? Sebebê serekî ew bû ku Daşnakan bi serê xwe nedikarîn tevgerek çekdarî li Tirkîyê saz bikin. Ji ber vê dixwestin îstîfade ji serîhildanên çekdarî yên Kurdan ên dijî hukumeta Tirkîyê bikin, ku dijminên xwe yê serokî dizanîn. Her di wî wextî de, li gor Daşnakan wisa bû ev serîhildanên han li "Ermenîstana" Tirkîyê jî ji bo rizgarkirina wan melbendan ji destê zilm û zora Tirkan bû. Pêwîst e ev yeka han jî bê gotin ku Daşnakan piranîya axa Kurdistana Tirkîyê beşek ji Ermenîstana mezin dihesibandin. Ji xwe ji ber wê bû, ku li gor heyeta nunerên nasyonalîst a Ermenîyan di Kongra 1919'an a Parîsê de wisa bû ku melbendên Kurdan ji başûrê Dîyarbekrê ve destpê dike û wîlayetên din ên rojhilata Tirkîyê hemû Ermenîstan e. Vê carê Daşnakan bi vê hêvîya han piştgirîya serîhildana Kurdan kir da ku Hukumeta Tirkîyê jar bikin û zemînek li bar ji bo xebata rojên bê a Ermenîyan pêk bînin. Di dema damezrandina dewletek serbixwe ya Kurd de jî asoyek nû ji bo xebata Daşnakan a dijî Tirkîyê û Yekîtîya Sovyetê dihat kirin. Ji ber ku li ba Daşnakan wisa bû ku ger dewletek serbixwe ya Kurd bê damezrandin, ji bo têkoşîna wan di riya damezrandina Ermenîstanek mezin a serbixwe de, dibe gavek.

Bi kurtî Daşnakan bi nunertîya Ermenîyên kevneperest, dixwestin daxwazên Kurdan ên ji bo azadî û serxwebûnî bikin pirek ji bo gihîştina armancên xwe yên dijî Yekîtîya Sovyetê. Dema ku ji vê bêhêvî bûn, Daşnakan alîkarîya xwe ji tevgera rizgarîxwazî netewî ya Kurd birîn û heta derecekê jî li dij sekinîn. Lê peywendîya navbera tevgera rizgarîxwazî netewî ya Kurd û Ermenîyan bi tevayî awayek din bû. Dîrok şahidê gelek nimûnên xebata bi hev re ya van herdu netewan e di dijî dijminê hevbeş de û her niha jî hewce ye belgek ronî ya vê dostanîya dûr û dirêj ajotî di rewşa Kurdên Ermenîstana Sovyetê de bê dîtin. Kurdan li vir cara yekem di dîrokê de mafên xwe yên netewî bi dest xistine û li gel gelê Ermenî bi xweşî û dostî dijîn.

## B - Mesela Kurd
## û Partîyên Sosyal Demokrat ên Avrûpa

Daşnakan ku xwe kiribûn berpirsîyar û berdevkên Partîya Xoybûnê, dibû di nav Enternasyonala Duyem de jî her bi vî awayî

hereket bikin, di vir de cîyê wê ye em rewşa partîyên sosyal demokratan a li hemberê mesela Kurd bizanin. Di wan raporên ku Daşnakan dane Kongra Enternasyonala Duyem, ku di Tebaxa sala 1930'an de li Zurixê civîya, wiha dibêjin:

*"Mesela Kurd ji bo enternasyonala me gelek girîng e, ji ber ku mesela Kurd heta niha nehatîye çareserîkirin û tehdîta asayîşa Rojhilata Nêzîk dike...Vê carê di riya mirovên Enternasyonala Sêyem de hewl tê dayîn ku xwe bikin nav tevgera gelê Kurd. Ev hewl û aktîvîte di cîyê xwe de ye, ji ber ku Kurd niha hest bi wê dikin ku karê dinyayê bi wan nemaye. Her awa rûnîşandan û dildanaber ji alîyê me de ji bo Kurdan, dibe sebebê bihêzbûna dijminên enternasyonala Moskov li Kurdistanê"*(13).

Di vir de derdikeve ku serokên Enternasyonala Duyem tu wextî nexwestine parêzgerîyê li mafê gelê Kurd bikin, lê hemûyan jî xwestine riya tevgera rizgarîxwazî netewî ya Kurd biguherin û bixin bin desthilata emperyalîzmê û her di wê riyê de jî kincek dijî gelî û dijî Sovyetê bikin ber. Ev hewl û daxwazên han jî bi tevayî li gel rol û planên emperyalîzmê rê diketin.

"Dubrukr" serokê komîta cîbicîkirina Enternasyonala Duyem rewşa nelibar a partîyên sosyal demokratan beramberê tevgera rizgarîxwazî netewî ya Kurd gelek ronî nîşan daye û wiha gotîye:

*"Berî em bên ser behs û lêkolîna mesela Kurd, ez pê xweşim ku hinek têbînî di derbarê rewşa me di vê meselê de ronî bikim. Ji hemû tiştî girantir ji bo me ev yeka han e ku mesela Kurd ji me re nû ye...Divê em îtîraf bikin ku hewce ye şarezatîyên me yên bê sinor di derbarê kar û barên Avrupayê de hebe, em bi giranîya serè xwe ji gîrugiriftên kar û barên derveyî Avrupayê dikarin derkevin. Di ser van tevan de jî, mesela Kurd di warê karektera xebatê de xwedîyê çend awa û hel û mercên cuda ye"*(14).

Pişt re Dubrukr dibêje:

---

(13) Weşanên deng û behsên taybetî yên Rojhilata Navîn, hejmar: 13-14, Taşkend, 1932, rûpel: 119.

(14) Eynî serokanî.

*Gîrugiriftê duyem ev yeka han e ku em ditirsin problema Kurd ji gîrûgirifteke taybetî ya Tirkîyê derê û Iraq, Îran û Surîye jî bigre û bibe sebebê hinek gîrûgiriftên navnetewî di nav wan welatan de ku peywendîya wan bi meselê ve heye. Rast e nivîsên Partîya Ermenî Daşnak dibêje; tevgera Kurdan dijî Tirkîyê ye, lê kes nikare wekaleta wê yekê bike ku ev wan welatên jorê jî negre û xetera hilketina şer li beşek fireh a Rojhilata Nêzîk pêk neyne"*(15).

Ev yeka han ji me re dide ronîkirin ku sosyal demokratan piştgirîya xebata gelê Kurd dikirin, lê tenê li Tirkîyê, ne li Îraq û Îranê ku ketibûn bin desthilata emperyalîzma Brîtanya û ne li Surîyê jî ku ew jî di bin desthilata Frensizan de bû.

Ka vêca em baştir guh bidin gotinên Dubrukr ku wiha dibêje:

*"Gîrugirifta duyem ji me re ji derveyî van girîngîyek taybetî heye, Enternasyonala Duyem di navekê re riya qedera xwe bi xwe tayîn kirina gelan girt ber xwe, her di wî wextî de ragîhand ku ev mafê han nabe bi çek û bi xwîn bê temînkirin. Ji ber ku ev yeka han dibe sebebê vêketina şer di wan cîyan de û pişt re di hemû cîhanê de. Niha jî ev rasteqînîya han li ber çavê me ye, ku Kurd di riya bidestxistina serxwebûna xwe de şer dikin. Vêca eger em agirê vî şerê xwînawî yê Kurdan xweş bikin, mana we ev nîne ku me ji armanca serekî ya xwe ya di warê mesela rizgarî netewî de daye alîkî?"*(16).

Serokên Enternasyonala Duyem ji xebata gelê Kurd tirsîyane ku bibe xebatek çekdarî li dijî emperyalîzmê di Rojhilata Navîn de. Her wê demê jî ev mesela han li gor Komela Gelan wiha bû:

*""Dewletek wisa tê de nîne ku daxwaza alîkarîyê jê bike. Ji ber vê tenê riya rast ev e ku em bikarin ber bi hel û mercên îro de bimeşin , li gor qeneeta min desttêkirina me di nav mesela Kurd de qîmetek wê ya wisa nîne"(17)* .

---

(15) Eynî serokanî.

(16) Eynî serokanî.

(17) Eynî serokanî.

Di dawîyê de "Ottobawr"ê teorîsyenê xirab ê sosyal demokrasîyê biryara komîta Enternasyonala Duyem xwendîye û di wir de wiha dibêje:

*"Em dîqeta dinyê ji bo wan qetlîaman dikişînin ku Hukumeta Tirkîyê dijî Kurdan dike"*. Bi tundî li ser vê noqta han disekine:

*"Enternasyonala Duyem li dijê bi riya çek û xwînrijandinê sitendina mafê qedera xwe bi xwe tayîn kirina gelan e"(18).*

Piştî şikestina serîhildana 1930'an nifûza Partîya Xoybûnê hêdî hêdî kêm bû û di wê navê re ew dijîtîyên navbera emperyalîzma Brîtanya û Frense yên li gel Hukumeta Tirkîyê hatin çareserkirin, ji vir şûn de êdî ne tenê dev ji Partîya Xoybûn berdan, ku piştî vê karek girîng ji dest nehat, hilweşîya, ji ber ku karê wan bi Daşnakan jî nema.

## C - Sîyaseta Kemalîstan di Asîmîlasyona Gelê Kurd de

Piştî serîhildana 1930'an, Hukumeta Tirkîyê bi tundî rîya ji nav birin û asîmîlasyona Kurdan da pêşîya xwe. Sala 1925'an Qanûnek qebûl kiribûn ku li gor wê, nîzama "awarteya giştî" (orfî îdare) hat damezrandin. Vê awarteya giştî piranîya navçên Kurdistanê digirt û mafê wê hebû hukumeta nîzamî berpa bike û ji navçên cîran ve hêzên eskerî bîne. Di meha Gulana 1932'an de qanûnek hat derxistin ku li gor wê, bi sedan hezar Kurd ji melbendên xwe hatin guhaztin ber bi melbendên wisa ku tenê ji sedê 5'ê nifûsa wê melbendê pêk bîne. Ev qanûna han aşkera wiha dibêje:

*"Ewên zimanê wan ê zikmakî Tirkî nebe, rê ji wan re nayê dan gundan durust bikin, melbendan ava bikin, deste û komelên pîşesazî, dînî û yên din damezrînin. Li gor bîryara Encumenê,Wezîrê Hundur dikare heta ew deste û komelên ewan ku heta niha pêk anîne hilweşîne"(19).*

---

(18) Her eynî serokanî, rûpel: 120.

(19) L. Rambout, Les Kurdes..., p. 33.

Ev qanûna han li dijî Peymana Lozanê jî bû, ku di benda 38'an de dibêje:

*"Hukumeta Tirkîyê soz dide ku temînata jîyan û mafên daniştiwanên Tirkîyê bigre ser milê xwe".* Di benda 39'an de jî dibêje:

*"Ji bo bikaranîna tu zimanekî asteng dernaxe. Hevwelatîyên Tirkîyê dikarin bi azadî her zimanekî di peywendîyên xwe yên taybetî de, yan di nivîsandinên bazirganî, dînî yan rojnamegerî, yan bi her awayî weşanan de, yan di civînên aşkera de bikar bînin"*(20).

Karbidestên Tirkîyê ji berhemên sîyaseta zebr û zorê razî nebûn û ji bo asîmîlasyona gelê Kurd dest bi êrîşek fikrî kirin. Receb Peker ê Sekreterê Giştî yê Partîya Gel a Cumhurîyetê di axaftinek xwe ya di sala 1931'an li zanistgehê kirîye, wiha dibêje:

*"Em wan hevwelatîyan wek xwe hesêb dikin ku di nav me de dijîn û di warê sîyasî û civakî de digihîjin netewa Tirk, lê bîr û bawerîya Kurdayetî kirine serê xwe...".*

Ev sekreterê han, ku li ba wî wisa ye hebûna neteweki netîca bîr û bawerîyek û hest xistina mejî ye, pişt re wiha didomîne:

*" Li gor zanistîya nû wiha ye, ku neteweyek çend sed hezar kes û heta yek mîlyon jî nikare wek netewek serbixwe bimîne"*(21).

Dîyar e ev "zanistîya nû" tenê di xeyala nasyonalîstîya berçavteng ya Tirkan de heye.

Miroveki din ê bi navê Doktor Sekban ji wî jî zêdetir pê de diçe û bi awakî ronî nêrîna xwe bi vî awayî dide dîyarkirin:

*"Wek ez dibînim, ez nizanim ev xelkê han ji bo çi ji asîmîlasyonê ditirse? Pratîk nîşan daye ku asîmîlasyona bê hêzan ji alîyê bi hêzan ve rewşa wan baştir dike. Lê bi şertekî ku ev asîmîlasyona han bi zorê nebe".*

Di cîyekî din de wiha dibêje:

*"Dibê em ewqas dilsoz bin û dest deynin ser wê rastîyê ku bingehek xurt da wê bawerîya me ku dibêje pêwîst e Kurd bi zimanê*

---

(20) Her eynî serokanî, rûpel: 20.

(21) M. Tekînalp; "Kemalîstan", çapa çekî, 1938, rûpel: 228.

*xwe bixwînin, nîne"(22).*

Ehmed Reşîd ku di Akademîya Qanûnê a Navnetewî de li "Lahey"ê mamostek Tirk bû, di broşurek xwe ya bi navê "Li Ser Mafê Kêmatîyên Tirkîyê Rojên Borî û Îro" bi zanetî Kurdan jibîr birîye û wiha dibêje:

*"Dîrokê daye nîşan ku Tirkîyê hemû demê û bi awakî berdewamî rêz li mafê kêmatîyan girtîye".*

Ew mamoste bi awakî bêşermî gihîştîye cîyekî ku dibêje:

*"Gelek caran waqiîyet li gel tiştên ku di qanûnê de hatine behskirin cuda ye, lê di warê mafên kêmayetîyên Tirkîyê de tu wextî tiştek wiha nebûye".*

Ev tiştek e ku mamoste di sala 1935'an de xwestîye ji me re îsbat bike, lê ji ber ku zanîye deng û behsên kuştina Kurdên Tirkîyê di dinyê de deng daye, mecbûr maye vê yeka han bi ser zêde bike û bêje:

*"Ev problema xwînawî ku di navbera Hukumeta Tirkîyê û hinek grûbên civakê de hilket, qet peywendîyek wê bi mafê kêmatîyan ve nîne ku em behs dikin"(23).*

Di ser van tevan de jî ne sîyaseta zebr û zorê û ne jî "êrîşa bi zorî dane qebulkirin" tu qazancek negîhand Hukumeta Tirkîyê.

Dereca berxwedan û dijîtîya Kurdan li hemberî sîyaseta kuştın û birîna karbidestên Tirkîyê, bi awakî aşkera di wê beyanamê de derdikeve ku di sala 1936'an de Mustefa Kemal di Meclica Netewî ya Tirkîyê de xwendîye. Di wê beyanamê de wiha dibêje:

"Girîngtirîn mesela rewşa hindurî ya me gîrûgiriftê Dêrsimê ye (Dêrsim, navçek ji beşê rojavayê Kurdistana Tirkîyê ye-Nivîskar), ji ber vê, ji bo dawî pêanîna van kûnêrên kuştinî, ji bo wê em bikarin bi zûtirîn bîryar bidin; pêwîst e ji bo hukumetê desthilatek fireh û bê sinor bê danîn"(24).

---

(22) Dr. Ch. Sekban, La Question Kurde, Paris, 1933.

(23) Ahmed Rechid, Les droits minoritaires en Turquie dans le passé et le présent, Paris 1935, pp. 4, 15, 17.

(24) N. Dersimî, Kurdistan Tarîhînde..., p. 258.

Rastiya van "kûnêrên kuştinî" di namekê de derdikeve ku xelkê Dêrsimê di Çirya Duyem a sala 1937'an de şandine ji bo Meclisa Komela Netewan û nerazîbûna xwe ji tehdaya Hukumeta Tirkîyê xistine ber çavan. Di namê de wiha tê gotin:

*"Dibistanên Kurdî dane girtin, zimanê Kurdî qedexe kirine, gotina Kurd û Kurdistan ji kitêbên zanistî derxistine, hemû awayên kirinên hovîtî bikaranîne ji bo ku Kurdan naçar bikin, bi jin û keçan ve di projên eskerî yên Anadolê de kar bikin, Kurdan deh kes deh kes rêdikin ji bo melbendên Tirknişîn û nabe li tu cîyekî ji sedî 5'ê danişţiwanan zêdetir bin...û yên din"*[25].

Buhrana aborî ya salên 1929-1932'yan rewşa aborîya kedkarên Tirkîyê û bi taybetî yên Kurdistanê gelek şepirze kir. Feqîrî û bêkarî belav bû û sevîya jîyana gundîyan hinek din hat xwar. Evên han û di ser hemûyan de jî sîyaseta perçiqandin, zebr û zorê û nijadperestîya karbidestên Tirkîyê, di sala 1937'an de bû sebebê vêketina serîhildanek mezin di bin serokatîya Seyîd Riza di navça Dêrsimê de. Hukumeta Tirkîyê eskerek zêde ji bo serbirîna şerkerên Kurdan amade kir û carek din bi hezaran kes tê de hatin kuştin. Li hinek melbendan kuştarîyek gelek mezin hat kirin, gelek melbend jî bi tevayî hatin wêran kirin. Bi navê şaristanîyetê jin, zarok û pîr û kalên destgirêdayî jî hatin kuştin. Ev serîhildana han bi gelek bêmerhemetî hat şikandin û Seyîd Riza li gel deh kesên din bi gunehkirina serokatîya serîhildanê hatin îdam kirin. İ Romanette henek bi eqlê karbidestên Tirkîyê dike ku ew serokên Kurdan ên di riya yekîtîya welatê xwe de xebat dikin, "diz" dizanin, lê serokekî Tirk ku dixebite bîyanîyekî ji welatê xwe derxe, "welatparêz" dihesibînin[26].

Osman Mete yê nivîskarê rojnama "Son Posta" ku di sala 1948'an de, yanî deh sal piştî temirandina serîhildanê çûye Dêrsimê û behsa wê serkevtinê dike ku Hukumeta Tirkîyê di belavkirina şaristanîyetê de bi dest xistîye, wiha dinvîse:

*"... Çend kesên ji wê melbendê ji min re gotin, ku ji derveyî jen-*

(25) Eynî serokanî, rûpel: 296.

(26) İ. Romanette, Le Kurdistan et la Question Kurde, Paris 1937, p. 12.

*dirman û memûrên bacgir pê ve min tu memûrek hukumetê nedîtîye... Min gelek hewil da di nêzîk de rewşa xelkê bizanim û daxwaza dilê wan tê bigehim. Qet tu tiştek bi destê min neket ku bibe belge ku me karek ji wan re kirîye. Li wir ne sen'et heye, ne zîraet û ne bazirganî...Doktor qet dest nakeve û xelk her nizane ka derman çîye û di navbera gundan de bijî tu rê nehatine çêkerin"*(27).

Piştî tefandina serîhildanê jî Hukumeta Tirkîyê bi bahana manevrên eskerî planekî ji bo ji holê rakirina Kurdan hêvî dikir, ku tu carî nimûnek wiha nehatibû dîtin.

Hukumeta Tirkîyê serîhildana sala 1925'an destkirê İngilîzan dizanî û divê ev rastîya han jî bê gotin ku emperyalîzma Brîtanya bi vê serîhildana han xweş bû. Ji ber ku problema Brîtanya û Tirkîyê ya li ser mesela Musilê di Encumena Komela Gelan de dihat axaftin. Pugurilov baş di vê meselê gihîştîye ku dema dibije:

*"... Ji ber wê xerabûna ku li ser mesela Musilê pêkhatîye, hemû awa gevzek di navbera Kurdan û Hukumeta Tirkîyê de biqewime li ser qazanca Brîtanya temam dibe".*

Pişt re wiha didomîne:

*"Bêguman fikra yekxistina Kurdistan yekek ji sebebê vêketina vê serîhildanê bûye, her çendîn ev fikra han di nav girsên xelkê Kurdistanê de gelek belav nebe jî"*(28).

Aşkera ye nabe tesîra bîr û bawerî û hestê ayînî kêm bê dîtin, lê li gel vê jî em dikarin bêjin hêzên palpiştên ji bo serîhildana sala 1925'an, her wek hemû ew serîhildanên di destpêka sedsala bîstan de heta piştî Şerê Cîhanê yê Duyem hilketin, têkoşan ji bo damezrandina dewletek serbixwe ya Kurd û temîn kirina mafên netewî yên gelê Kurd bûn.

Nehro wiha dibêje:

*"Her çendîn kêfa Hukumeta Brîtanya bi wê gîrugiriftê dihat ku Kurdan ji Hukumeta Tirkîyê re derdixistin, lê em nikarin bêjin*

---

(27) N. Dersimî, Kurdistan Tarîhînde ..., p. 325.

(28) M. Pugurilov; "Mesela Kurd...", rûpel: 152.

*destê mirovên Ingilîzan di serîhilanê de hebû, aşkera ye ku mirovên ayînî feydek mezin dane wê serîhildanê û her wiha aşkera ye jî ku hestê netewî yê Kurd rolek girîng di serîhildanê de lîstiye û ew hestên netewî ji hemû tiştik zêdetir tesîrê li hilketina vê serîhildanê kirine"*(29).

Wextê di serîhildana sala 1927'an de Hukumeta Tirkîyê û dewletên emperyalîst derew û hîlên zêde belav kirin ku guya Yekîtîya Sovyet çek û pere dide şoreşgerên Dêrsimê, ev yeka han jî ji bo wê armancê bû ku wisa bi xelkê bidin zanîn ku guya ev serîhildana han destkirê bîyanîyan e û li ba bîr û raya giştî ya Tirkîyê û cîhanê ji bo wan planên xwe yên hovîtî bikin ku karbidestên Tirkîyê li gel Kurdan bikar anîne û li milekî din tirsekê jî ber bi hukumetên Îran û Iraqê ve bînin, ji bo ew jî alîkarîya Tirkîyê bikin û bi hev re Kurdan bêdeng bikin(30). Her di wî wextî de Hukumeta Tirkîyê ji bo xwe nêzîkkirina ber bi Almanya Nazî ve dixwest zemîneki li dijî Sovyetê amade bike.

Di netîcê de meha Hezîrana 1937'an Peymana Se'edabadê di navbera Tirkîyê, Îran, Iraq û Afxanîstanê û aşkera ye di bin çavdêrîya Brîtanya de hat muhrkirin. Ev peymana han ji derveyî ku karekterek wê ya dijî Sovyetê hebû, bi awakî serekî li dijî tevgera rizgarîxwazî netewî ya Kurd jî bû. Benda heftan wiha dibêje:

*"Her yek ji van terefên mezin ên ku vê peymana han îmza kirine, amade ne ku ber bi xwe de hewl bidin ji bo li dij sekinîna serîhildan, yan têkoşînên grûb û komelên çekdarî, yan ew komele û rêxistinên ku dixwazin van dam û dezgên îro têk bidin, ku wezîfa parastina nîzam û asayîşa hemû beşên van sinoran girtine*

---

(29) C. L. Nehro; "Awirek li Ser Dîroka Cîhanê", çapa Ingilîzî, cilda duyem, rûpel: 1108.

(30) Noqta esasî ji bo Tirkan ev yeka han bû ku alîkarîya van herdu dewletan ber bi xwe ve bikişîne, ji ber vê di milekî de Kurdên Îranê gîrugiriftê ji bo Tirkîyê saz nekin û di milek din de jî Kurd nekarin Îranê bikin penageh û cîyên piyên xwe ji bo êrîşanîna li ser Tirkîyê. M. Firuxî: "Nameyek nehênî".

*ser milên xwe"(31).*

Ev peymana han jî wek hemû peymanên din di netîca Şerê Cîhanê yê Duyem de hat gurr kirin. Lê li gel vê jî hukumeta Tirkîyê destê xwe ji sîyaseta xwe ya şovenîstî berneda û qet tecrube ji dersên vî şerî wernegirt, ku guherînek esasî bi ser rûkarê cîhanê de anî.

Rojnama "Son Posta" di 11'ê Nîsana sala 1946'an de bi aşkera daye xuyakirin ku:

*"Tu wextî kêmatîya Kurd, ne wek niştecî û ne koçer, ne xwedî ruhîyeta netewî û bê ruhîyeta netewî, di Tirkîyê de tunebû ye".*

Ev e ew bîr û bawerîya şovenî ku heta îro jî rêbaza sîyaseta hukumeta Tirkîyê dide dîyarkirin.

## 2- Kurd li Îraqê

Di pêş de me bahs kir ku di Şerê Cîhanê yê Yekem de, li gor Peymana Sykes-Picot Rojhilata Navîn bi çend melbend li ser desthilatên dewletên emperyalîst hatin parvekirin û Beynu'lnehreyn ket ber Brîtanya. Di şer de piranîya beşên Îraqê ji alîyê hêzên Brîtanya ve hat îşgalkirin, di 11'ê Adara 1917'an de Bexda hat îşgalkirin û heta dawîya şer hêzên Brîtanya tê de man. Gotinên Lord Curzon slogana sîyaseta Brîtanya ya li Rojhilata Navîn bû, ku digot:

*"Firat sinorê rojavayê Hindîstanê ye".*

Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem gelê Kurd li Îraqê jî dest bi tevgerê kir, di salên 1918 û 1919'an de tevgera rizgarîxwazî ya Kurdistana Îraqê gelek bi hêsanî ber bi pêş de çû û Kurdên melbendên Silêmanîyê di bin serokatîya Şêx Mehmûdê Berzencî de serxwebûna Kurdan îlan kirin. Îngilîz jî bi wê razî bûn ku Şêx Mehmûd bibe hukumdarê wê navçê. Emperyalîstên Brîtanya dixwestin Şêx Mehmûd bi hukumeta Tirkîyê bitirsînin, ku wî çaxî hîn hêzên

---

(31) S. S. Gavan, Kurdistan, Divided Nation of the Middle East, London, 1958, p. 35.

wan li melbenda Musilê de mabûn, her wiha karbidestên beşê Iraqê yê Ereban jî bi vê yekê bitirsînin ku ji ber wê newêribin ji gotina Brîtanya derkevin. Lêbelê ya ku ji bo Şêx Mehmud girîng bû serxwebûna gelê Kurd bû. Ji ber vê gelek di ser de derbaz nebû navbera wî û Ingilîzan xerab bû, şerekî giran li dijî eskerên dagîrkerên Brîtanya destpê kir. Di 9'ê Hezîrana sala 1919'an de şerekî yekcarî giran li Derbendê Bazîyan ê nêzîkî Silêmanîyê qewimî. Piştî vê, Kurdan şerekî qehremanî kirin, di 25'ê Hezîrana 1919'an de Şêx Mehmûd birîndar esîr hat girtin û dadgehek Brîtanya hukmê îdamê dayê, pişt re vî cezayî kirin hepsa muebbed û Şêx Mehmûd sirgûnê Hîndîstanê kirin.

Kurd bi tevayî di şerê dijî emperyalîzma Brîtanya de beşdar bûn û her çend serîhildana wan hat tefandin, lê têgihîştin ku hewce ye li gel hêztirîn dewleta emperyalîst, yanî emperyalîzma Brîtanya jî şer bikin. Gundî hêzên serekî yên serîhildanê bûn û di bin serokatîya xwe ya pêşewayê dînî Şêx Mehmûd de şer dikirin. Ew tenê bi hêvîya wê yekê nebûn ku rizgarîya netewî û sîyasî dest bixin, belko bi hêvîya wê yekê jî bûn ku rewşa wan a civakî jî baştir be. Bêguman tesîrek girîng ya serokatîya Şêx Mehmûd a dînî jî hebû û her ji ber vê jî gundî bi awakî ewqas aktîfî beşdarê şerî bûn.

Di Kongra San Remo de ku 25'ê Nîsana sala 1920'an hat çêkirin, her çendîn temamê gelê Iraqê li dijî vê pêgava emperyalîst bû, lê bi resmî Iraq ket bin destê serokatîya Brîtanya. Girsên gundîyan li gundan mil bi milê burjuwazî û rewşenbîrên bajêr dest bi xebatê kirin, xwenîşandanan berpa kirin û nerazîbûnên xwe dan nîşandan. Ew têkoşîna dawîyê ya di 30'ê Hezîrana 1920'an de, bû serîhildanek çekdarî, gelek di ser re derbaz nebû hemû Iraqê girt û heta dawîya Çiriya Yekem a sala 1920'an dom kir.

Gelê Kurd bi vî awayî ku di serîhildana 1918-1919'an de bû pêşengê tevgera gelê Iraqê, rolek girîng di amadekirina serîhildana sala 1925'an de lîst[32], lê di şerê çekdarî yê serîhildanê de

(32) D.N.Kutlov; "Serîhildana Rizgarîxwazî Netewî ya Sala 1920'an a Iraqê", bi zimanê Rûsî, Moskova, 1958, rûpel: 187.

peywendîyek xurt a tevgera gelê Kurd li gel xebata giştî ya İraqê nebû, ji ber ku di netîca zordarîya emperyalîstan de, gelek zerar û zîyan gihîştê û her di wî wextî de emperyalîzm dijîtîyên biçûk ên netewî yên di navbera Kurd û Ereban de, ji bo jarkirina hestê hevkarîyê di navbera wan herdu netewan de bikar dianî. Piştî çend şerên giran, di dawîyê de hêzên Brîtanya karîn serîhildanê bitefînin.

Pişt re emperyalîstan di 23'ê Tebaxa sala 1921'an de bi rîya referandumê karîn Feysel, ku yek ji endamê binemala Kralîyeta Haşimî bû, bikin kralê İraqê. Cîyê balkêşanê ye ku Kerkuk li dijî bijartina Feysel bû û Silêmanîye jî beşdarîya referandumê nekir (33).

Roj bi roj bêzarîya Kurdan ji İngilîzan zêdetir dibû û karbidest û eskerên Tirkîyê jî dixwestin ji vê bêzarî û nerizayîyê îstîfade bikin û Kurdan ber bi xwe ve bikşînin. Lê emperyalîzma Brîtanya bi vegera Şêx Mehmûd razî bû û di Îlona sala 1922'an de Şêx Mehmûd gihîşte Silêmanîyê, sebebê vê yekê jî ew bû ku di nav Kurdan de nifûza xwe hinekî zêde bike.

Tengî û astenga İngilîzan gihîşte sevîyek wisa ku mecbûr man di 14'ê Îlona sala 1922'an de kongrek Kurdî li Silêmanîyê çêkin û di Çirya Duyem a eynî salê de jî Şêx Mehmûd bû Melikê Kurdistanê. Lê Şêx Mehmûd tenê bi serê xwe ji melbenda Silêmanîyê razî nebû, ji ber ku dixwest hemû Kurdistanê rizgar bike û bi vê jî ji Kerkukê destpê bike, ku demek bû li wir petrol hatibû dîtin. Her ji ber vê jî İngilîzan dijîtîya daxwazên Şêx kirin, lê vê carê nekarîn Silêmanîyê îşgal bikin. Di 4'ê Adara sala 1923'an de piştî çend êrîşên dijwar firokên Hêzên Hewayî yên Paşatîya Brîtanya, di dawîyê de Şêx Mehmûd naçar kirin bajêr bicî bihêle û heta 11'ê Hezîrana 1923'an ku Şêx Mehmûd carek din ji nû de Silêmanîyê rizgar kir, her di bin destê îşgala Brîtanya de bû.

(33) Peywendîya piranîya nêzîkî temamê xelkê Silêmanîyê bi hemû awayî li gel melbendên bin desthilata hukumeta İraqê, dan sekinandin. "Raporek di Warê Rêvebirina İraqê de, ji 1920'an Heta Adara 1922'an", rûpel: 12.

Di 24'ê Tîrmeha 1923'an de piştî muzakerek dûr û dirêj Peymana Lozanê hat danîn û li gor vê peymana han hemû biryarên Peymana Sewrê bi yekcarî hilweşîn. Di vir de ji gelê Kurd re rûyê qîmeta soz û peymanên dewletên emperyalîstan û berî tevan jî yê Brîtanya Mezin ronî û aşkera bû.

Şêx Mehmûd ji Hukumeta Sovyetê daxwaza alîkarîyê kir û di 20'ê Kanûna Duyem a 1923'an de namek ji konsolosê Sovyetê yê Tebrîzê re (li Îranê) nivîsand ku di vê nama han de wiha dibêje:

*"Sala 1917'an dema dinya dengê azadîya rastîn bihîst û zanî ku gel ji destê bindestî û gunehkaran rizgar dibin, hemû gel û netewên cîhanê şad bûn".*

Şêx Mehmûd bi vî awayî didomîne:

*"Îro ku gelê Kurd destê alîkarîyê bi alîyê we de dirêj dike û bi dilsozî dixwaze bi we re bi dostî û biratî bijî, bi kêmasî ev hêvîya me heye ku gelê Kurd mafê xwe yê netewî yê rewa bi dest xe".*

Di dawîya namê de Şêx Mehmûd wiha dinivîse:

*"Hûn ji gîrûgiriftê şersekinandinê agahdar in û dizanin Kurdistana Başûr dijê kê serî hildaye. Her wiha hûn dizanin armanca welatên cînar beramber van cure meselan çawan e. Ne mimkûne hemû tişt bi dirêjî bên nivîsandin. Ji ber ku peywendîya dîplomasîyê di navbera me û Hukumeta Sovyetî de nîne, ku em pê bawer in wê piştivanê xwe dizanin. Li gel vê jî ez dikarim tiştekî bêjim: Li ba hemû gelê Kurd wisa ye ku gelê Rûs rojhilat rizgar dike. Niha ev yeka han ji me re girîng e ku ew jî alîkarî ye bi mesela me re... Gelê me bi lez çaverê dike ku di navbera herdu milan de peywendî bê damezrandin".*

Ev nama han jî belgek din e li ser sevîya dengdana Şoreşa Mezin a Oktobrê di Kurdistanê de, her di wî wextî de nîşan dike ku gelê Kurd ku di rêza pêşî ya xebata rizgarîxwazî ya gelan de bû, qîmet û rola Yekîtîya Sovyetê di xebata milletan ya di rîya azadî û mafê qedera xwe bi xwe tayîn kirinê de jê re ronî bûye.

Xebata Şêx Mehmûd tûşî gelek asteng û zehmetîyan bû, heta di dawîyê de, di 19'ê Tîrmeha 1924'an de hêzên Brîtanya û Iraqê bajarê Silêmanîyê girtin û Şêx Mehmûd naçar bû bikişe çîyan. Qasek şûn de jî wî bi hukumeta Iraqê re li hev kir û di welat de rûnişt.

## A - Mesela Mûsilê

Peymana Lozanê mesela sinorê di navbera Tirkîyê û İraqê de bêçareserî hîşt. Di benda 3'an de wiha dibêje:

*"Heta neh mehan mesela sinorê navbera Iraq û Tirkîyê di rîya navnetewî de di navbera hukumeta Brîtanya û Tirkîyê de dê bê çareserkirin, eger ev herdu dewletên han nekarîn di navbera vî mudetî de li hev bikin, dê meselê pêşkêşî Encumena Komela Gelan bikin"*(34).

Dîyar e, mesele tenê bi serê xwe dîyarkirina sinorê navbera Tirkîyê û dewleta nû hatî damezrandin a İraqê nebû, her wiha peywendî bi hemû Kurdistana İraqê ve hebû. Ji bo emperyalîstan ji tevan jî girîngtir ev bû ku peywendîya meselê bi petrolê ve hebû. Çarenivîsa Kurdên İraqê jî raste rast bi çareserkirina vê dijîtîyê ve girêdayî bû.

Netîcên muzakerên di navbera Tirkîyê û Brîtanya de hel nebûn û ji ber vê, mesela vî sinorî, bû yek ji wan gîrugiriftên Komela Gelan. Di 30'ê Îlona sala 1924'an de Encumena Komela Gelan bîryar da ku ji bo lêkolîna meselê komîsyonek ji sê kesan pêkhatî deyne û ev komîsyona han hemû agahdarî û pêşnîyarên ku ji bo wergirtina bîryarê pêwîst e alîkarîyê bide, pêşkêşî Encumenê bike. Endamên komîsyonê ji kolonel A. Paulis ê Belçîkî, Paul Te-lekî serokwezîrê Macarîstanê yê kevin û karbidestê wezareta derve ya Swêd E.af Wirsén, ku ev eynî wextî serokê komîsyonê jî bû, pêkhatibûn. Vê komîsyona han biryar da ku bi xwe biçin navçê û li melbendê bigerin, ji bo vê mebestê jî di Kanûna Duyem a sala 1925'an de gihîştin Mûsilê.

Hukumeta Tirkîyê pêşnîyar kir ku ji bo xelk nêrîna xwe bide aşkerekirin, referandûm çêbe(35), lê Brîtanya dijîtîya vê pêşnî-

---

(34) Ch.A.Hooper, L'İraq..., p. 70

(35) Question of the Frontier Between Turkey and İraq, League of Nations, Geneva 1925, p. 46.

Ji ber ku piranîya danîştiwanên melbendê nexwendewar bûn, Hukumeta Tirkîyê pêşnîyar kir dengdan bi du cure kartan be, ku yek ji wan ala İngilîz û ya din jî ala Tirkan li ser bê çapkirin.

yariyê kir, ji ber ku peywendîya meselê bi sinor ve hebû ne bi melbendê bi xwe ve. Herdu milan di warê gelên niştecî yên melbendê de lîste û hejmaran nîşan dan ku li gel yek û du cihêbûnek mezin hebûn. Li gor İngilîzan Kurd Arî bûn û qet peywendîyek wan li gel Tirkan nebû. Tirkan jî digot qet ferqek di navbera Kurdan û Tirkan de nîne û çendîn sedsal e ev herdu netewên han bi hev re jîyane û peywendîyên dostane di navbera wan de hebûye.

Ew lîste û hejmarên ku Brîtanya û İraqê pêşkêş kiribûn bi vî awayî bûn:

| | Hejmarên Tirkîyê Sal 1923 | Hejmarên Brîtanya Sal 1921 | Hejmarên İraqê Sal 1922 |
|---|---|---|---|
| Kurd | 263.830 | 424.720 | 494.007 |
| Ereb | 43.210 | 185.763 | 166.941 |
| Tirk | 146.960 | 65.893 | 38.652 |
| Yahudî | 31.000 | 62.255 | 61.336 |
| Yezîdî | 18.000 | 30.000 | 26.257 |
| Koçer | 170.000 | — | — |
| Mesîhî | — | 16.837 | 13.977 |
| Bi hev re | 673.000 | 785.468 | 801.170 |

**Cetvela Hejmara 6**

Lê komîsyon gihîşt netîcek wisa ku li gel van tevan cihêbûnek mezin hebû:

*"Kurd ne Ereb in ne Tirk in û ne Faris in, lê ji van tevan zêdetir nêzîkî Farisan in. Kurd ji Tirkan cihê ne û ev cihêbûna han jî aşkera ye. Ji van jî zêdetir ji Ereban dûr in û cihêbûnek di navbera wan de heye"*(36).

Rapor bi vî awayî didomîne:

*"Eger tenê warê regez bibe esasê netîce wergirtinê, mirov tê ser wê bawerîyê ku hewce ye Kurd dewletek serbixwe damezrîne. Ji ber ku Kurd ji heştan pêncê daniştiwanan in. Dema mesele bi vî awayî bê çareserkirin, pêwîst e Yezîdî jî ku gelek nêzîkî Kurdan e, li gel Kurdan bê hesabkirin. Tirk jî ku bi hêsanî di nav Kurdan*

(36) Eynî serokanî, rûpel: 41.

*de dihelin, ew dem Kurd dibin ji heştan heftê danişţiwanan"*(37).

Ev yeka han bi awakî aşkera dide nîşanî me ku belgên resmî yên Komela Gelan îtîraf bi hebûna Kurd wek netewek serbixwe û her wiha bi mafê ji bo damezrandina dewletek Kurd ya serbixwe anîye.

## B - Li Kurdistanê Monopolên Petrolê

Mesela Musilê bi qazanca emperyalîzma Brîtanya hat çareserkirin, Kurdistana İraqê ji Kurdistana Tirkîyê hat cihêkirin û bû beşek ji İraqa îro. Di wan rojan de bû ku Lord Curzon sond xwar ku tu wextî wan melbendan ji alî petrolê dîqeta wî nekêşaye(38). Di 5'ê Hezîrana sala 1926'an de, di navbera Brîtanya, İraq û Tirkîyê de peymanek hat îmzakirin û mesela Mûsilê li ser qazanca Brîtanya hat çareserkirin. Di peymanê de rê û şûna dîyarkirina sinorê niha yê di navbera İraq û Tirkîyê de hat danîn, lê berî wê di 14'ê Sibata 1925'an de peymanek hatibû îmza kirin, ku li gor vê peymanê îmtîyaza derxistina petrolê li İraqê ji Şîrketa Petrola Tirkîyê re hatibû dan, ku di sala 1929'an de navê wê hat guhertin û bû Şirketa Petrola İraqê. Mudetê vê îmtîyazê, ku peywendîya wê bi melbenda Kerkukê a li Kurdistana İraqê ve hebû, 75 sal bû, yanî heta sala 2000'an bû. Pişt re di sala 1932'an de navbera İraq û Şirketa Petrola İraqê de peymanek di warê petrola Mûsilê de hat girêdan ku mudetê wê heta sala 2007'an bû. Vê carê di sala 1938'an de peymanek din li ser petrola Besrayê hat îmzakirin ku ev jî heta sala 2013'an bû. Şirketa Petrola İraqê û herduyên din, yanî Şirketa Petrola Mûsilê û Şirketa Petrola Besrayê, niha bi awakî serekî di van hersê melbendan de petrol derdixin: Kerkuk, Mûsil û Besra. Lê Kerkuk heta niha jî melbenda serekî ya berhemdarîya petrolê ye. Ji ber ku ji sisîyan duduyê

---

(37 Eynî serokanî, rûpel: 57.

(38) Lord Curzon bi xwe mezintirîn xwedîyê para şirketa petrola Tirkîyê bû. Ji ber vê pêwîst zanî bide xuyakirin :

*"Ji bo şexsê wî, bi tu awayî bûn an nebûna petrolê di vê melbendê de girîng nîne"*. Dîroka Dîplomasîyê, çapa Çekî, cilda sêyem, rûpel: 155.

hemû petrola Îraqê ji vir derdikeve. Şirketa Petrola Îraqê bi van çend şirketên xwarê re pêkhatîye ku her yek ji wan ji %23,75'ê sermaya van şirketan di dest de ye: Şirketa Rouyal Duche Shell, Şirketa Petrola Brîtanya, Şirketa Standard Oil of Nychersin li gel Şirketa Sokuni Mobil û Şirketa Petrola Frense. Ji %5'ê din jî ji Şirketa lêkolîn û beşdar re hat dan ku xwedîyê wê sermayedarek Ermenî yê xelkê Brîtanya K.Gulbangyan bû.

Ji ber vê sermaya Holandê ya Şirketa Rouyal Duche Shell di bin nifûza sermaya Brîtanya de bû, Şirketên Petrola Brîtanya ji nîvî zêdetir (%52,5) sermaya şirketan di destê xwe de girtibûn, her ji ber vê jî li ser Şirketa Petrola Îraqê hakîmîyeta xwe danî bûn(39).

Ev rewşa han li gel mîzana hêzên wê demê ya Rojhilata Nêzîk jî li hev dike (sala 1925). Berî Şerê Cîhanê yê Yekem rewşa Şirketa Petrola Tirkîyê bi awakî din bû: Şirketa Petrola Îranê û Îngilîzan ji %50'yê hîssan di dest de bû, %25 di destê Bank Duche Almanya û %25 jî di destê Şirketa Rouyal Duche de bû. Piştî şikestina Almanya di Şerê Cîhanê yê Yekem de, li gor Peymana nehênî ya Sykes-Picot a di derbarê parvekirina Rojhilata Navîn de (1916), Franse cîyê Almanya girt û bi vî awayî dest ji Mûsilê kêşa. Welatê Amerîka ya Yekgirtî û monopolên Petrola Amerîka û di ser tevan de jî Şirketa Standard Oil, di netîca muzakerek dûr û dirêj û nehênî de karîn beşdarê Şirketa Petrola Tirkîyê bin. Piştî demek dirêj Gulbangyan bi kirêgirtî ji %5'ê beşê Brîtanya jî bi dest xist û ji wê demê ve ev navê han lê hat danîn, ku jê re dihat gotin "Berêz %pênc". Gulgbangyan ku wî wextî Rawêjkerê Malî yê Sultanê Osmanî bû, yekem kes bû ku di sala 1890'an de ji Sultan re got di wê melbendê de petrol heye.

---

(39) Mebest ev nîne ku hewce ye qazanca monopolên Holanda di Şirketa Rouyal Duche Shell de li ber çav neyê girtin. Lê bûyerên piştre nîşan didin ku ev şirketa han zêdetir li gel şirketên din ên Brîtanya re gav avêtîye. Di konsorsiyomên navnetewî de li Îran jî her bi vî awayî ye, ji ber ku Şirketa Petrola Brîtanya ji %40 û Şirketa Rouyal Duche Shell ji sedî 14'ê beşên wê di dest de ye, ku li gor vê têt dîtin ku ji sedî 54'ê beşên wê di bin destê Brîtanya de ye-Nivîskar.

INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE ·

Bi vî awayî mesela serokî, yanî mesela petrolê bi awakî wisa çareserkirin ku li gel kazanca emperyalîstan û mîzana hêzên wan ve rêk û pêk be û piştî vê êdî bi carekê de jî İngilîz û Frensizan mesela Kurd "ji bîr kirin", her wek ku li Lozan jî jibîra wan çûbû. Emperyalîzma Brîtanya, Frensa û şirîkê wan ê nû emperyalîzma Amerîka, gihîştibûn wê neticê ku Kurdên melbenda Musilê nabe di bin fermana Tirkan de bin(40). Ji ber ku wî wextî Mustafa Kemal li Tirkîyê li ser kar bû (sala 1925), ewan nedixwestin derxistina petrolê bikeve xeterîyekê. Ji ber vê Brîtanya Mezin, Frense û Welatê Amerîka ya Yekgirtî li ser îmtîyaza petrolê heryekê ji wan tiştekî bi ber çeng xistin, karê wan bi damezrandina dewletek serbixwe ya Kurd nema û di nav xwe de li hev kirin ku nabe Kurd dewletek wiha damezrîne. Dîyar e Îran û Tirkîyê jî ku Kurd tê de niştecî bûn, dijîtîya dewletek bi vî awayî dikirin.

Lê Brîtanya nedixwest mesela Kurd li Iraqê bi yekcarî bibire û dîyar e bi sîyasetek emperyalîstî jî nedikarî fikra serxwebûnê bi awakî temamî ji bo daniştiwanê melbenda Mûsilê qebûl bike(41). Di milek din de jî armanca dijminê Kurdan li hemberê hukumeta nû ya Iraqê tiştekî xerab nebû, ji ber ku hemû awayên hîşyarkirinê ji bo Feysel û dor û berê wî ku ... eger kar û barên Iraqê li gor kêfa Brîtanya nemeşe, Brîtanya ji bo serxwebûna Kurdan rûyek xweş nîşan dide(42).

Bi rastî Harold Nikolson ê İngilîz baş behsa armanca Brîtanya li hemberê mesela Kurd kirîye, ku dema dibêje:

*"Ew roja me ji Kurdan re digot werin bibin dewlet, qet xwe ji bo vê aciz nekirin lê çi heye ji nişka ve di sala 1922'an de di çarde bendan de doz kirin. Lê bi rastî êdî dereng bûbû".*

---

(40) *"Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê daxwazên Brîtanya qebûl kir. Li gor vê nedibû nîv mîlyon Kurdên melbenda Musilê di bin fermana Tirkan de bin û nedibû dewletek serbixwe jî damezrînin".* (A.Bruksi): "Petrol û Sîyaseta Derve", bi zimanê Çekî, Prag, 1950, rûpel: 80.

(41) Aynî serokanî.

(42) Eynî serokanî.

Yanî ger em bi zimanê beniademan bêjin, gotina wî tê vê manê: Kurd tenê wî wextî "pêwîste" bibe dewlet ku London pê xweş be, ji bilî vê ger dozek wiha kiribe gunehek mezin kirîye û bê lêborîn nabe.

Ka em bizanin rewşa Tirkan çawan bû? Tirkîye di dawîyê de bi xeta Brukselê razî bû ku li gor biryara komîsyonek Komela Gelan a sala 1924'an li Brukselê hatibû derxistin, sinorê başûrê Tirkîyê dîyar kiribû, lê bi yek şertî %10'ê beşên Şirketa Petrola Tirkîyê bidinê(43) û rê jî neyê dan ku ew Asurîyên di Şerê Cîhanê yê Yekem de ji Tirkîyê derketibûn, carek din vegerin Tirkîyê.

*"Ji bo xatirê Tirkan peymanê qet behsa Kurdistan û serxwebûna Kurdistanê jî nekir"(44).*

Tenê qazanca gelê Kurd li Iraqê eva han bû ku zimanê Kurdî di dibistanên seretayî de bû zimanê xwendinê, ew jî tenê li melbenda Silêmanîyê(45). Lê Kurd neketin bin barê vê rewşê. Di Hezîrana sala 1930'an de li gor peymana navbera Iraq û Brîtanya wextê bal bi ser de kêşana (mandaterîya) Brîtanya di Iraqê de temam bû û Iraq goya bû dewletek serbixwe. Biryar jî wiha bû, diviya di havîna 1930'an de helbijartinek çêbe, li gor vê hewce bû parlamento jî di Îlonê de bicive û peymanê tesdîq bike.

Xelkê Silêmanîyê beşdarîya helbijartinê nekirin û di 6'ê Îlona sala 1930'an de xwenîşandanek mezin rêkxistin ku di navbera polîs û xelkê de şer derket, 45 kes hatin kuştin û 200 kes jî birîndar bûn. Bi vî awayî roja 6'ê Îlonê di nav Kurdan de wek roja xebata li dijî emperyalîzm û kevneperestîyê hat qebûlkirin û bû nîşana destpêkirina qonaxek nû di xebata dijwar a dûwarojê de. Şêx Mehmûd ku heta wî çaxî bi çaverîya pêş ve gavavêtinan bû,

---

(43) Pişt re bi wî şertî ku Hukumeta Iraqê nîv mîlyon lîre bide Hukumeta Tirkîyê ji vê bîryarê jî hatin xwarê.

(44) G. Linçivski; "Rojhilata Navîn di Kar û Barên Cîhanê de", çapa Farisî, Tehran, 1958, rûpel: 137.

(45) Li gor qanûnekê, ku di 23'ê meha Gulana sala 1931'an de derket, zimanê Kurdî li hemû Kurdistana Iraqê bû zimanê resmî. Elî Seyîd Guranî, "Ji 'Uman Heta Amêdê", bi zimanê Erebî, rûpel: 114.

carek din ji nû ve dest avêt çek. Xebata çekdarî vê carê heta Adara sala 1931'an domand û Şêx Mehmûd hinek berhemên baş bi dest xist. Heta Şêx Mehmûd hewlê rizgarkirina Kerkûkê jî da, lê ji ber sebebê xîyaneta derebegên Kurdan naçar bû dest ji xebatê bigre.

Sala 1932'an li Çîyayên Berzan li beşê bakurê Kurdistana Îraqê, di bin serokatîya Şêx Ehmed de serîhildanek nû destpê kir. Birayê biçûk ê Şêx Ehmed, Mistefa Berzanî di vê serîhildanê de cara yekemîn kirinên girîng pêşan da. Ev serîhildana han ji alîyê Hêzên Hewayî ya Kralîyeta Brîtanya ve hat tefandin. Bi taybetî piştî vê hemû gundên melbenda Berzanî hatin bombebaran kirin û 1365 xanî hatin şewitandin.

Di sala 1934'an de di bin serokatîya Mistefa Berzanî de ku nû ji cîyê bi dûrxistina xwe ji Silêmanîyê hatibû, serîhildanek nû di Berzan de hilket. Ev serîhildana han gelek fireh bû û Hukumeta Îraqê demek dirêj li gel Berzanîyan ket muzakeran, hinek caran sozê peymanê dida wan û hinek carên din jî êrîşan dibir ser wan, lê tu berhemek muzakerê di holê de nebû û di bihara sala 1945'an de şoreşger naçar bûn dest bi xebata çekdarî bikin. Vê carê gelek kesên ji zabitên Kurd ên di ordîya Îraqê de ketin navê û partîya nasyonalîst "Hêwa" jî alîkarîyek xurt li gel şoreşgeran kir.

Ev xebata han heta Çiriya Diduyan a sala 1945'an domand. Pişt re şoreşgerên Berzanî ji sinor derbaz bûn û çûn Kurdistana Îranê ku wê çaxê xwe ji bo damezrandina komarek demokratîk di melbenda Mehabadê de amade dikir.

## 3 - Kurd li Îranê

Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem di Îranê de jî çend serîhildan berpa bûn ku ji tevan girîngtir Serîhildana Simko ya li navça Urmîyê ya di navbera salên 1920-1925'an de bû. Simko, beşek mezin ji Kurdistana Îranê rizgar kir û piştî damezrandina peywendî li gel Şêx Mehmûd, di sala 1923'an de wî bi xwe li Silêmanîyê Şêx Mehmûd dît. Lê Îngilîzan Simko ji bo şerê Asûrîyan han dan û wî serokê Asurîyan Mar Şem'on kuşt û aşkera ye ev karê han bû sebebê lawazbûna armanca Simko.

Sala 1925'an Riza Xan bû fermanrewa û dîktatorê welat, sîya-

seta zordarî, asîmîlekirina netewên bindest ên Îranê da pêşîya xwe ku yek ji wan netewan Kurd bû. Her ji ber vê jî wî ji holê rakirina Simko girîng zanî.

Heta sala 1930'an Simko çend şer li gel hêzên Îran, Îraq û Tirkîyê kir ku di piranîya wan şeran de bi ser ket. Lê di 21'ê Hezîrana sala 1930'an de bi navê muzakerê li gel hêzên Îranê hat bang kirin bajarê Şino û li wir bi necamêrî hat kuştin.

Piştî vê di payîza sala 1931'an de serîhildanek din di bin serokatîya Cehwer Sultan de, li başûrê melbenda Hemedan li dijî zordarîya hukumeta merkezî berpa bû, lê ev jî wek hemû serîhildanên din bi tundî hat tefandin û kar gihîşte wê derecê ku nûnerê Kurdistanê di parlamentoyê de da xuyakirin ku tiştek bi navê mesela Kurd di Îran de di sahê de nîne û goya Kurd xwe Îranî dizanin û li Îranê ji derveyî vê bîr û rayê bawerî bi tiştek din nayê kirin.

Li Îranê jî wek Tirkîyê Kurd ji hemû mafên xwe yên netewî hat bêparkirin, bikaranîna zimanê Kurdî û heta lixwekirina cilbergên Kurdî jî hat qedexekirin. Gelek kes ji Kurdan ji bo gunehkirina van tiştan ku serî li ber van cure qedexekirinan dananîn, girtin û surgûn kirin. Ev rewşa han heta Şerê Cîhanê yê Duyem ajot.

Ji wî çaxî heta niha ku me behs kir, derdikeve ku ji nîvê duyemê sedsala 19'an heta Şerê Cîhanê yê Duyem, dîroka gelê Kurd ji rêzek serîhildanên armanca bidestxistina azadî û serxwebûnê û ji destpêka sedsala 20'an û ji Şerê Cîhanê yê Yekem şûn de jî xebata ji bo damezrandina dewletek serbixwe ya Kurd pêkhatiye.

## 4 - Sebebên Serîhildanên Kurdan û Armancên Wan

Vêca ka em bizanin sebebên serekî yên wan serîhildanên berfirehî çi bûne ku piranî caran hemû netewa Kurd girtîye nav xwe? Aşkera ye sebebê serekî zordarîya netewî bû. Ji ber ku di milekî de hêdî hêdî hestê netewî di nav Kurdan de belav dibû û di milê din de roj bi roj zordarîya netewî ji alîyê karbidestên wan welatan de tundtir dibûn. Ev zilm û zora netewî bûbû sebebê yekîtîya hemû çîn û tebeqên civaka Kurdewarî yên wek gundî, burjuwazîyê

biçûk, rewşenbîr û derebegan.

Bindestî û kedxwiriya li ser civakên xelkê bi taybetî gundîyan ji alîyê karbidestên hukumetê ve, bac û vêrgîyên giran û barê aborî yên jendirme û ordîyê li ser daniştiwanên gundî, di ser van tevan de zordarîya netewî, komelên fireh ên gundîyan di bin serokatîya serokeşîran, pêşewayên ayînî û derebegan de ji bo serîhildanê han dida[46].

Xebata dijê zordarên bîyanîyan li Kurdistanê heta derecek zêde xebata çînîtî kêm kiribû. Ji ber vê giranîya peywendîya eşîratî di gundan de xebata çînîtî jar dikir. Ji derveyê vê jî ji ber ku derebegên Kurdan gelek car şêx û pêşewayên ayînî bûn, para wan di tehdayî û kedxwarina gundîyan de gelek car dîyar nebû û xebata gundîyan zêdetir li dijî bîyanîyan bû. Li ba derebeg û xwedî milkan jî wisa bû ku ber bi hêzbûna desthilata hukumetê nifûza wan kêm dibe û ji ber vê nedixwestin desthilata wan di gundan de kêm be. Ji ber vê dijîtîya hemû kirinên hukumeta merkezî dikirin ku armanca wan berhevkirina desthilatê di destê xwe de bû. Ger wiha be tiştek tabiî bû ku derebeg piştevanîya tevgerên netewî û serîhildanên çekdarî yên Kurdistanê bikin[47].

Burjuwazîya nûgehiştî yan Kurd jî piştî Şerê Cîhanê yê Yekem bi parvekirina Kurdistanê razî nebû, ji ber ku vê yeka han nifuza burjuwazîya Kurd kêm kir û peywendîya li gel bazirganan û benderên (lîmanên) girîng birrî. Bi vî awayî burjuwazîya Tirk û Ereb burjuwazîya Kurd dabû alîkî û zor lê dihat kirin. Her ji ber vê jî bû ku burjuwazî û rewşenbîrên Kurdan piştevanîya van serîhildanan dikirin ku ji bo damezrandina dewleteke serbixwe ya Kurd dihatin berpakirin.

Piştî Şoreşa Oktobrê, di dema buhrana (qirîza) giştî ya sermayedarî de bîr û bawerîya li dijî emperyalîzmê û alîgirîya riz-

---

(46) Ji bo nasîna karektera (siruştî) derebegên Kurdan, binêre fesla şeşem a vê kitêbê.

(47) *"Bihêzbûna desthilata derebegên Kurdan li dijî memûrên hukumetê, jendirme û ordîyê, ji bo wan ji bîr û bawerîya netewî girîntir bû".* K. Wasilev; "Mesela Zîraetê" cilda 9 û 10'an, Moskova, 1931.

garîya gelan tesîr kir li ser civaka Kurdewarî. Kurdistan ketîye nêzîkî sinorê Yekîtîya Sovyetê û beşek ji netewa Kurd, her çendîn kêm jî be, di axa Yekîtîya Sovyetê de li dijî ku cara yekemîn di dîroka gelê Kurd de mafê xwe yê însanî û netewî bi dest xistîye. Evên han tev bûn sebebê bihêzbûna tesîra bîr û bawerîya Şoreşa Mezin a Sosyalîst a Oktobrê di nav gelê Kurd de.

Bêhêzbûna burjuwazî û rewşenbîran û nebûna proletarya, bûn sebeb ku serokatîya serîhildanên gelê Kurd bikeve destê serokeşîret, derebeg û pêşewayên ayînî. Heta piştî wê jî ku burjuwazîya Kurd xwest xwe bike nav serokatîya tevgerên netewî, lê heta Şerê Cîhanê yê Duyem derebegan serokatîya tevgerên netewî ji xwe re parastin. Sebebê vê yeka han jî paşvemayîna civaka nîv-derebegî ya Kurdewarî bû ku peywendîya eşîretî hîn giranîya xwe tê de parastibû.

*"Yek ji wan astengên tevgera netewî ya Kurd ev bû ku piştî demek dibû serokên wê û heta rêzên wê jî şaristanî û xwendewar bin, hêzên şerker ji eşîret û serokeşîretan pêk dihat ku asoya bîr û bawerîya wan gelek teng bû û heta li ba wan tenê talankirin û jarkirina desthilata hukumetan girîng bû"*(48).

Berhemek ne baş a serokên derebegan û nifûza wan di tevgera netewî ya Kurd de hebû. Ji ber ku gelek caran bi kuştina serokê tevgerê, serîhildan jî ditefîyan. Gelek car jî serokên wan ji ber paşdemayîn û nexwendewarîyê bûne qurbana lîstikan û bi planên emperyalîzmê hatine xapandin û bê wê ku bizanin bûne darê destê sîyaseta emperyalîstan.

Gelek caran jî derketîye ku serokên derebegan dema pê hesîyane kar û bar di eksê qazanca wan a taybetî de diçe pêş, pêşîya tevgera netewî girtine û ger gundîyan jî biryar dabe xebatê bidin domandin, derebegan ji bo parastina qazancên xwe yên taybetî li gel hukumetên merkezî yan nokerên emperyalîzmê bi rê ketine.

Di hemû serîhildanan de gundî hêzên serekî bûne û berî hemû tiştî ew bindestî, hejarî û zordarîya netewî wan ji bo xebatê han

(48) A. Roosevelt, The Kurdish Republic of Mahabad, the Middle East Journal, New York, 1947, p. 268.

daye. Her çendîn ev serîhildanên han xwedî naverokek gundî û karekterek wê ya çînîtî jî hebû, lê ji ber ku peywendîya eşîratî bi hêz bû serîhildan li dijî desthilatên bîyanî bûn û ji ber vê, karekterê tevgerek netewî pê ve hebûn, ku ji alîyê derebegan û serokeşîretan ve serokatîya wan dihat kirin.

## 5 - Komara Mahabad

Sala 1941'an hêzên hevpeyman, ku beşek ji wan hêzên Sovyetî bûn, hatin Îranê, dîktatorîya Riza Şah hilweşîya û azadîya demokrasîyê li welat jîndar bû. Sala 1945'an tevgera netewî gelek serkevtinên mezin bi dest xistin. Di Kanûna Duyem a wê salê de di Azerbeycanê de hukumetek demokratîk di bin serokatîya Firqa Demokratîk a Azerbeycan de damezra. Hukumeta netewî ya Azerbeycanê dest bi reformên sîyasî û civakî kir: Axên xwedî milkên mezin û yên xayînan li gundîyan hat belavkirin û her li gor vê, para gundîyan di berhemên axên kirêgirtî de hat zêde kirin. Her wiha seetên karê rojane yên karkeran bûn heşt seet û dest bi gelek reformên îdarî û civakî yên din hat kirin. Zimanê Azerbeycanî ku heta wî çaxî qedexe bû, bû zimanê resmî.

Ber bi salên şer de hêzên hevpeyman neçûbûn beşê bakurê Kurdistana Îranê, ku merkeza wê bajarê Mahabadê bû. Ji ber vê sala 1944'an piştî vê paşvemayên hêzên polîsên Îranê ji Mahabad hat derxistin, xelkê ji xwe re hukumeta wê melbendê girt dest. Wî çaxî rêxistinek netewî ya bi navê "Komeleyî Jîyaneweyî Kurd" dest bi têkoşînê kiribû.

Di 16'ê Tebaxa 1945'an de li bajarê Mahabadê li ser bingeha Komeleyî Jîyaneweyî Kurd Partîya Demokrat a Kurdistan damezra. Ev partîya han gelek bi zû bû partîya hemû gel û piştgirîya beşek zêde gundîyan, kedkarên bajêr, burjuwazîya biçûk, xwedî milkên navendî û eşîretên welatparêz ber bi xwe ve kêşa.

Girîngtirîn bendên programa Partîya Demokrat a Kurdistan ji van xalan pêk hatibûn: Azadî û xwedmuxtarî ji bo gelê Kurd di çarçova dewleta Îranê de, bikaranîna zimanê Kurdî ji bo xwendin û di kar û barên îdarî de bikaranîna wî wek zimanê resmî, dest-

girtina desthilata bilind a wê melbendê, damezrandina yekîtî û peywendîya biratî li gel gelê Azerbeycan û hemû kêmayetîyên netewî di xebata hevbeş de, baştirkirina rewşa aborî, feyde jê girtina serokanîyên tebîî yên Kurdistanê û pêşdebirina zîraet û bazirganî û geşkirina kultur û laşsaxî, ji bo ku gelê Kurd bikare bi azadî di rîya pêşkevtin û xêr û xweşîya welatê xwe de xebatê bike.

Partîyê qet behsa belavkirina ax û erd nekiribû û tenê behsa vê yeka han kiribû ku dê hewl bê dan berhemên zîraî bi awakî adîlane di navbera gundîyan û xwedî milkan de bê parvekirin.

Di 22'yê Kanûna Duyem a sala 1946'an de komarek netewî ya Kurd, di bin serokatîya Qazî Mihemmed pîşewayê Partîya Demokratê Kurdistan de damezra, ew şexsîyetek civakî û xebatkarek hêja yê gelê Kurd bû.

Ev hukumeta han a netawî ji kêmtirî salekê xwe ragirt, lê her di wê dema kurt de qazancek gelek zêde gîhand gelê Kurd. Yekemîn car zimanê Kurdî bû zimanê resmî, ji bo zarokên Kurdan bi zimanê wan ê zikmakî dibistan hatin vekirin û kitêb, kovar û rojname bi awakî nedîtî hatin belav kirin. Cara yekemîn tîyatroya Kurdî hat damezrandin û jina Kurd cara yekem beşdarê jîyana sîyasî û kulturî ya welat bû. Berî vê raste rast peywendî li gel Yekîtîya Sovyet hatibû damezrandin, bazirganî jî zû pêş de çû. Çi cîyê derebegan bicî dihîştin, gundî dibûn xwedîyê rastîn yê wê axê. Lê li gel vê jî heta di Azerbeycanê bi xwe de jî reforma axê nehat kirin. Di eslê xwe de derebeg û xwedî axan îmtîyaza xwe di Kurdistanê de parastibûn. Memûrên Kurdan cîyê yên Faris û Azerbeycanîyan girtin. Di cîyê polîs û eskerên hukumetê de, hêza eskerî û pesmerge hatin damezrandin.

Mezintirîn destkevtîyên hukumeta demokratîk a Kurdistanê ew bû ku Gelê Kurd piştî demek gelek dûr û dirêj azadîya xwe ya netewî bi dest xistibû. Li Kurdistan û Azerbeycanê çend bingehên şoreşgerî hatin damezrandin, ku ev bûn palpiştî tevgera demokratîk di seranserî Îranê de. Di 23'yê Nîsana sala 1946'an de peymanek hevkarî û dostîtî di navbera Hukumeta Demokratîk a Azerbeycanê û Hukumeta Millî ya Kurdistana Îranê de hat îmza kirin.

Lêbelê wek me di pêş de got hukumetên van herdu melbendan

zêdetirî salekê nejîyan û pişt re kevneperestên Îranê bi alîkarîya raste rast a emperyalîstên Amerîka û Brîtanya gelek bi awakî hovîtî ew ji holê rakirin û li Azerbeycan û Kurdistanê ji zêdetirîn 15 hezar însanên demokrat hatin kuştin.

Piştî goya mehkemeke nihênî di roja 10'ê Xakelêweyê (Adar; roja Newrozê yekê meha Xakelêwe têt hesibandin-Elîşêr) sala 1326'an (30'ê Adara 1947'an) de pêşewayê gelê Kurd Qazî Mihemmed li gel Seyfî Qazî pismamê Pêşewa û Wezîrê Bergirî yê Komara Mahabad, Sedrî Qazî birayê Qazî Mihemmed û endamê parlementoya Îranê hatin îdam kirin. Piştî vê qasekî şûn de eskerên dewleta Îranê û jendirmên wan ji bo xerabkirinê di Kurdistanê werbûn.

Lê Berzanîyan ku piştevanekî girîng ê hukumeta netewî ya Kurd bûn, çek dananîn û di bin serokatîya Mistefa Berzanî de ku berî wê Fermandarê Hêzên Komara Mahabad bû, li gel hêzên Îranê ket şerekî sext ê asê yê bê mîzan. Emperyalîzma Amerîka di wî şerî de bi dana çek û pisporên eskerî, alîkarîya hêzên Îranê kir û heta konsolosê Amerîka George Alin bi xwe li gel Rezmara yê Serokê Eskerên nîzamî yê Îranê serî li cepha şerê Kurdistanê da(49).

Berzanîyan berxwedanek sext û azayane kir, heta serokê Ordîya Îranê da xuyakirin ku ordîya nû ya Îranê heta niha li gel dijminekî evqas bi hêz şer nekirîye. Wî wextî Şah fermanê da ku bi hemû hêzên xwe ve li Berzanîyan xin û di fermana xwe ya roja 29'ê Reşemeya 1326'an (20'ê Adara 1947) de wiha dibêje:

*"Bi firokan temamê bingeh û rêbazên koç û koçbarî ya malên Berzanîyan (yanî jin û zarokan-Nivîskar) û her wiha topxanên wan bombebaran bikin.*

*Dibê heta 15'ê Xakelêweya 1327'an (3'ê Nîsana 1947'an) dawî bi şer bê û karek wisa bikin ku Berzanî nekarin derbaz bin û ji vê zêdetir heyaya esker neçe"(50).*

---

(49) F. Stipanov; "Kovara Dema Nû", hejmar 24, 8 Tîrmeh 1949.

(50) N. Pisyan; "Ez Mehabadî Xonîn ta Kiranehayî Rûdî Eres" bi zimanê Farisî, Tehran, 1948, rûpel: 103.

Piştî vê, Berzanîyan zerarek mezin dan ordîya Îranê û vegerîyan Îraqê ku li wir jî Nûrî Seîd bi agir û hesin pêşwazî li wan kir, bi neçarî kal, pîr, jin û zarokên xwe li melbenda Berzan bi cî hiştin û bi xwe jî nêzîkî 500 çekdar ve di bin serokatîya Mistefa Berzanî yê serokê bi nav û deng ê Kurd de ji sinorê Tirkîyê derbaz bûn û ji nû de hatin nav axa Îranê. Hukumeta Îranê eskerek mezin (nêzîkî deh hezar eskeran) bi top, firoke û hemû cure çek ji bo liserîdana Berzanîyan amade kir, lê şerkerên Berzanîyan bi alîkarî û piştevanîya gelê Kurd karîn mesafa 300 kîlometran bi şer derbaz bin û piştî şerekî gelek giran, ji Çemê Arasê derbaz bibin û biçin Yekîtîya Sovyetê. Ev şerkerên han ên aza heta serkev-tina şoreşa 1958'an a Îraqê venegerîyan welatê xwe.

Her çend Komara Mahabadê ji salekê zêdetir dom nekir, lê qîmetek wê ya dîrokî ya girîng hebû. Ne vala ye ku A.Roosevelt dinvîse:

*"Peydabûn û guherînên Komara biçûk ya Mahabadê û dîroka wê ya kurt û tufanî û ji holêrabûna wê ya ji nişkave, yek ji ronîtirîn bûyerên dîroka nû ya Rojhilata Navîn e"*(51).

Girîngîya tevgera 1945-1946'an di vê de ye ku yekemîn tevgera netewî û demokratîk a dîroka gelê Kurd bû. Ev tevgera han tevgerek li dijî emperyalîzmê bû ku ji bo qazanca gel û li dijî zordarîya netewî û di rîya rizgarîya netewî ya hemû gelê Kurd de hatibû berpa kirin. Her di wî wextî de tevgerek li dijî kevneperestîyê jî bû û ji bo belavbûna demokrasîyê di jîyana giştî ya hemû civakê de hewil dida û ji bo temînkirina mafê wekhevî ji bo girîngtirîn sinif û tebeqên gel, burjuwazîyê biçûk, rewşenbîran û kedkarên bajêr têdikoşa. Her ji ber vê jî hemû sinif û tebeqên gel tê de beşdar bûn.

Wek me di pêş de jî got, piştî Şoreşa Oktobrê çend tevger û serîhildan di Kurdistanê de berpa bûn. Lê tevgera 1945-1946'an a Mahabadê tenê bi serê xwe tevgerek bû ku bû beşek ji xebata li dijî emperyalîzm û faşîzmê ya gelan. Ji derveyê vê jî ev tevgera han

---

(51) A. Roosevelt, The Kurdish Republic..., p. 247.

ne tenê bû beşeke girîng ji xebata demokratîk a çîna karkerên Îranê, herwiha bû beşek ji tevgera demokratîk a navneteweyî, yanî ya proletarya jî.

Di nav wê tevgerê de gîyanek navnetewî ya bihêz dihat xuyakirin ku hestê dostayetî yê beramberê netewên din û rêz û xoşewîstî ji bo cîranê xwe yê mezin Yekîtîya Sovyetê têkelî nav bû. Hemû ev karekterên han bûn sebebê vê ku ne tenê hêzên şoreşgerên Îranê, belko hêzên netewî yên seranserê cîhanê jî parêzgerîya tevgera Kurdistanê û ya Azerbeycanê bikin.

Ev tevgera han di vî milî de jî girîng bû ku karî cara yekemîn di dîroka Kurdistanê de hukumetek netewî ya Kurdî damezrîne ku di qonaxa jîyana xwe ya kurt de bi ronî ji gelê Kurd re îspat kir tenê hukumetek dikare xizmeta gel bike û qazanca gel biparêze, ya ku di nav gel de cîyê xwe girtibe. Ji ber vê gelê Kurd ne tenê li Îranê, herwiha ji derveyê Îranê jî heta îro gelek bi rêz Komara Mahabadê bibîr tîne.

Her di destpêka tevgera Mahabadê de Kurdên Berzanî yên Iraqê çûn balê û her wiha çend nuner ji Kurdistana Tirkîyê û navçên Kurdnişîn ên Surîyê jî serî lê dan, bi awakî ku Komara Mahabadê bû hilgirê ala tevgera hemû gelê Kurd û yekîtîya netewî ya Kurd xwe tê de da nîşan û bû sebebê bihêzbûna guherîna hemû netewa Kurd, bi taybetî Kurdên Îranê.

Hemû destkevtîyên tevgera Mahabadê berhemên vê yeka han bûn ku Partîya Demokrat a Kurdistanê serokatîyê dikir. Ev Partîya han a pêşverû programek demokratîk ji xwe re danîbû û baştirîn û peşkevtîtirîn ji sinif û tebeqên gelê Kurd, bi taybetî burjuwazîya biçûk, rewşenbîr û xwedîyên milkên biçûk di nav xwe de berhev kiribû. Ev partîya han têgihîştibû ku gelê Kurd li Îranê bê yekîtî û hevkarîya li gel herdu netewên din ên Îranê û rêxistinên wan ên pêşverû; Partîya TUDEH a Îranê û Firqa Demokratîk a Azerbeycanê nikare serbikeve, ji ber vê, cîbicîkirina vê yekîtî û hevkarîyê yek ji wan wezîfên xwe yên herî girîng danîbû. Heta niha jî Partîya Demokrat a Kurdistanê pêşengê gelê Kurd e û pêşkevtîtirîn sinif û tebeqên gelê Kurd di Kurdistana Îranê de di nav rêzên xwe de berhev kirîye. Gîyana tevgera Mahabad ku ji yekîtî û belavkirina demokrasîyê ji jor de pêk hatibû, dostîtîya Yekîtîya Sovyetê û ordugahên sosyalîstî ji derveyê welat hêdî

hêdî bi ser tevgera netewî Kurd de ser kevt[52]. Ev hestê han heta niha jî li hemû perçên Kurdistanê dîqetê kêşaye ser tevgerên netewî yên Kurd. Bi vî awayî Komara Mahabadê destpêka qonaxek nû bû di dîroka xebata gelê Kurd de ku heta niha jî dom dike.

Emperyalîzma Amerîkayê ku bi dest de hebûna çekê atomî pişta wê sitûr bû, hukumeta kevneperest a Îranê han da ku li dijî hukumeta Azerbeycan û Kurdistanê şer saz bike ku ev yeka han yekemîm tovên têkilhevîyê yên li ser sinorê Sovyetê û destpêka dema "şerê sar" bû. Ji bo ku Yekîtîya Sovyet nû ji şerê malwêrenkerîya cîhanê rizgar bûbû, nedikarî piştivanîyê li hêzên demokrasî yên Îranê bike. Gelek mixabin tehlîlên nerast jî li ser rewşa Îranê kir ku bingeha wê diçû digihîşt wê sîyaseta şaş a dema ku ferdperestî bi rê ve diçû, ku vê yekê jî tesîrek xirab li ser rewşa bûyeran kir. Aşkera ye çend sebebên girîng ên hundurî jî hebûn ku

---

(52) Em dikarin di tesîra tevgera Mahabad û pêşewayê wê ku bi destê dijmin hat xeniqandin, di vê pêşçavxistina W. Douglas de baştir têbigehin:

"...*Xortekî Kurd û jina xwe di rîyekê de dimeşîyan ku dar û ber li kerê xwe kiribûn, mirov siwarê kerê bû û jina wî jî bi ser û rûyekî xweş li rexêwî dimeşîya. Me silavê lê kir û min jê pirsî:*

*- Hûn xelkê ku ne?*

*Bersîvê da me: Xelkê cîyekî dûr ji bakurê me, nêzîkî Xoyê.*

*- Hûn li vir çi dikin?*

*- Em Kurd in, em ê herin zîyareta gora Qazî Mihemmed. Di deng, hêrs û amadebûna wî de parêzgerîya wî derdiket. Her wiha ji çavên wî û xencera ber pişta wî de dîyar bû ku çi kesê ku riya vê sefera han li ser wî bigre, dê li dij derkeve.*

*Heqê mirov heye ku mirov bêje; gora Qazî Mihemmed zîyaretgahek e ku her heftê bi sedan Kurd berê xwe didinê. Îdama vî Kurdê qehreman her tenê wî ji holê rakirîye, ne ku bîr û bawerîya serxwebûna Kurd. Rastî ev yeka han e ku bi kuştina wî, ev bîr û bawerîya han bihêztir bûye. Ew gundîyên sade ku ji bo rêzgirtina bibîranîna Qazî Mihemmed bi sedan kîlometre rê dimeşin, Qazî mirovekî baş dizanin ku jîyana xwe di riya bicîanîna daxwazên wan de feda kirîye*"

W. Douglas, Strange Lands..., pp. 63-64.

rê ji bo êrîşa dijmin xweş kirin. Wek nimûne nebûna yekîtîyê di pratîkê de di navbera hêzên demokrasî yên Îranê de tesîrek zêde di wê serkevtina hêsan de hebû ku kevneperestên Îranê bi dest xistin. Di nav Kurdistanê bi xwe de jî Hukumeta Mahabadê qet sloganek (diruşm) bi wî awayî hilnedabû ku qazanca gundîyan biparêze ku ji %80'yî ji daniştiwanên Kurdistanê ne. Heta axa wan derebegên mezin ên ku Kurdistanê terk kiribûn û dijminatîya Hukumeta Demokratîk a Kurdistanê dikirin, bi awakî resmî li gundîyan belav nekirin. Di vî warî de Kurdistan gelek ji Hukumeta Demokratîk a Azerbeycanê paşvemayîtir bû.

Serokanîyên vê sîyaseta zîraî ya Hukumeta Kurdistanê tenê karektera tevgerê nebû, ku ji çarçova tevgera netewî û demokratî derneketibû, her wiha ev yeka han li gel terkîba civakî ya damezrênerên Partîya Demokrat a Kurdistanê jî bi rê diket. Hewce ye em tilî deynin ser vê rastîya han ku beşek zêde xwedî milk ên Kurdistana Îranê tesîreke wan a rêk û pêk di dijminatîya emperyalîzm û kevneperestîyê de hebû. Her wiha hewce ye vê yeka han em bigrin berçav ku ji %50'ê damezrênerên Partîyê ji xwedî milkên biçûk, xwedî milkên navendî, serokeşîr û endamên eşîretan pêk hatibûn.

Sebebek din jî ev yeka han bû ku beşek zêde ji axa Kurdistana Îranê nehatibû rizgarkirin. Madem wiha bû Partîya Demokrat a Kurdistanê ji ber hinek sebebên taktîkî nedikarî reformek axê ya esasî bike, ev yeka han jî ji bo rakêşana xwedî milkên navendî, xwedî milkên mezin û eşîretên Kurdistana Îraqê bû. Pêwîst e ev yeka han jî ji bîra me neçe ku xebata çînayetî di gundê Kurdistanê de wî çaxî ewqas pêş de neçûbû.

Di rastîyê de tenê beşê bakurê Kurdistana Îranê di destê Hukumeta Netewî ya Kurdistanê de bû ku ev tenê %30'yê Kurdistana Îranê ye û beşê xwarê yê Kurdistanê ku sahek wê ya fireh heye, di destê hukumeta merkezî ya kevneperst de mabû. Her ji ber vê jî bû ku karî êrîşek eskerî ya bi lez bîne ser bingeha Hukumeta Demokratîk a Kurdistanê.

Di ser van tevan de jî bawerîkirina sozdanên bê esas ên hukumeta merkezî û ew rastîya ku gelek serokên jêhatî yên sîyasî û rêxistinî tunebûn, bûn ji wan sebebên hilweşandina Komara Mahabadê.

## 6 - Kurd li Surîyê

Surîya ku berî Şerê Cîhanê yê Yekem beşek ji İmparatorîya Osmanî bû; ket bin destê Frense, her çendîn heta demek dirêj piştî çareserkirina mesela Musilê jî, di sala 1925'an de, mesela di navbera Tirkîyê û Frense de nehatibû çareserkirin. Her wek me di pêş de got vê yeka han Frense gîhandibû wî cîyî ku di xebata dijê Tirkîyê de alîkarîya Partîya Xoybûnê dikir û dixwest tevgera netewî ya Kurd ji bo armanca xwe bikar bîne, bi rastî piştî şikestina Tevgera Şêx Seîd a sala 1925'an, Surîye bû penageha wan Kurdên ku ji Tirkîyê banz didan û ber bi Kurdên birayên xwe yên Surîyê ve diçûn. Lê dijîtîya navbera Tirkîyê û Frense a li ser peran û sinor, di dawîyê de hat çareserkirin û di sala 1929'an de li Ankarê peymanek hat girêdan, li gor vê peymana han Tirkîyê beşek ji navça Kurdistanê ji Surîyê re hişt.

Piranîya Kurdên Surîyê li melbendên sinorê Surîyê, İraq û Tirkîyê niştecî ne û her wek me di pêş de got rewşa aborî û civakî ya wan jî ji Kurdên welatên din cihê nîne.

Berî destpêkirina Şerê Cîhanê yê Yekem û piştî şer jî Kurdên Surîyê xwedî çapemenî bûn, lê di salên piştî şer de rewşa wan gelek hat guherandin. Dîyar e qet başbûnek bingehîn bi ser rewşa Kurdan de nehatîye, lê çiqas hêzên demokrasîyê destkevtîyên mezin bi dest dixistin û heta demokrasî di welat de zêdetir belav dibû, asoya temînkirina mafê netewî ya gelê Kurd ronîtir dibû. Di milek din de jî çi dema kevneperestan êrîşî hêzên demokrasîyê kiribin, piştî vê, êrîşek jî birine ser rêxistinên Kurdan, ku daxwaza mafê netewî yê Kurd di Surîyê de dikin. Ev roj jî ku karbidestên Surîyê sîyasetek li dijî emperyalîzmê dane pêşîya xwe, Kurdên Surîyê her wek berê ji hemû mafên xwe yên netewî bê par in. Di ser vê de jî karbidestên Surîyê tiştek bi navê serhejmarê kirine û dixwazin nêzîkî 100 hezar Kurd ji hevwelatîya Surîyê bêpar bikin. Evên han li gor qanûna reforma axê heqê wan nîne ax bikirin û mafê wan ê kar kirin û xwendinê jî tune. Van Kurdên han ji bo cîbicîkirina "Kemera (kembera) Erebî" ji melbendên Cizîrê (ku petrol jî tê de derketîye) ji şûnewarên wan tên kirin û tên şandin şûnewarên dûr, li sehrayê tên cî kirin.

## 7 - Kurd li Yekîtîya Sovyetê

Sala 1813'an piştî Peymana Gulistan a ku di navbera Îran û Rûsya de çêbû, hinek melbendên Kurdistanê ketin ber axa Rûsya. Kurd li wilayeta Elizabeth Paul dijîyan, pişt re li gor peymana 1828 a Turkmençayê, beşek ji Kurdên wilayeta Êrîvanê û pişt re Kurdên Qers û Erdehanê jî ketin ber Rûsya.

Piştî Şoreşa Oktobrê, li gor peymana navbera Rûsya Sovyetî û Tirkîyê ya di 21'ê Adara 1921'an de, melbenda Qers û Erdehanê hat dayîn Tirkîyê û li Yekîtîya Sovyetê ji zêdetirîn çend hezaran pê ve Kurd neman ku piranîya wan li Komara Ermenîstana Sovyetê li melbendên Talîn û Elegezê dijîn û hejmara wan piştî Şerê Cîhanê yê Duyem digihîşt 26 hezar kesan.

Her çendîn hejmara Kurdên Yekîtîya Sovyetê kêm in, lê cardin jî wek netewe tên hesêb kirin, dibistan û çapemenîyên wan hene. Sewîya dereca jîyana wan jî ji sevîya jîyana Kurdên welatên cîran bilintir e. Kurdên Yekîtîya Sovyetê xwedî nivîskar, şair, zana û hunermendên xwe ne û cara yekemîn azadîya rasteqînî û mafên wan ên netewî bi dest ketîye û bi awakî aktîfî (çalakî) beşdarîya durustbûna civaka nû ya Sovyetê dikin.

BEŞÊ DUYEM

# ABORÎYA KURDISTANÊ

FESLA ÇARAN

# NÊRÎNEK GIŞTÎ LI SER ABORÎYA KURDISTANÊ

## 1- Çend Dêmenên Giştî di Warê Aborî de

Kurdistan welatekî zîraetê ye ku peywendîyek derebegî ya bi hêz tê de heye û heta niha jî di beşekî zêde yê Kurdistanê de li gundan peywendîyên eşîretî mane. Li gel vê jî di navbera du şerê mezin ên cîhanê de û bi taybetî piştî Şerê Cîhanê yê Duyem sermayedarî û peywendîya sermayedarî jî gihîştîye Kurdistanê û bûye sebebê peydabûna bajar û navendên bazirganî û sanayîyê(1).

Petrola Kurdistanê monopolên emperyalîst ên petrolê ber bi xwe ve kêşan, berhemdarîya petrolê li Kurdistanê destpê kir û sanayîyek mezin a petrolê tê de hat damezrandin ku tenê sanayîya giran a Kurdistanê ye. Bi awakî serekî li Kerkuk petrol tê derxis-

(1) Hejmara nifûsa bajarên Kurdistanê ji destpêka sedsala 20'an ve sê caran hîn zêdetir bûye, wek nimûne hejmara danîştiwanê Kirmaşan 50 hezar kes bûye û niha bûye 150 hezar kes-Nivîskar.

tin ku di destê monopola Şirketa Petrola İraqê de ye(*). Li Kurdistana Îranê; Kirmaşanê, li Kurdistana Tirkîyê; Sêrtê û li Kurdistana İraqê Xaneqînê; hukumet bi xwe petrolê bikartînin û di destê monopolên bîyanî de nînin.

Tiştê ecêb ev e, bê wê ku di sanayîyê de burjuwazîya Kurd a netewî peyda be, proletarya Kurd a sanayîyê peyda bûye. Ev jî wê rastîya me behs kir îspat dike ku berhemdarîya petrolê yan di destê şirketên emperyalîstan de ye, yan jî raste rast di destê dewletê bi xwe de ye.

Sanayîyên din ku yek ji wan derxistina madenan e û her wiha sanayîya biçûk e ku tenê eşyayên nav malê û yên berdest pêktînin, ewqas pêş neketine ku bên berçav. Sanayîya hundur û folklorî jî ji derveyî tevnên mafuran, qet qîmetek wan a zêde nîne. Ji ber vê, Kurdistan li gel wan hemû warîdatên serwetên tabiî, heta niha jî di warê aborî de yek ji feqîrtirîn navça Rojhilata Navîn e.

Heta niha jî zîraet liqa serekî ya aborîya netewî ya Kurdistanê ye û xwedîkirina heywanan jî girîngtirîn milê berhemdarîya zîraetê ye. %64'ê warîdata netewî ji çandinîyê bi dest dikeve û %26 jî ji sanayîyê ku ji vê jî %20 yê petrolê ye(2) û tenê ji %10'ê warîdata netewî ji beşên din ên aborîya netewî yên wek sanayîya avayî, xanî çêkirin û bazirganîya mubadelê peyda dibe.

Di beşê zîraetê de berhemê çandinî %30 û berhemê heywanan %34'ê waridata netewî pêk tîne. Xwedîkirina heywanan li hemû navçên Kurdistanê heye û her çendîn peywendîya sermayedarî li Tirkîyê ji Îran û İraqê zêdetir ber bi pêş de çûye jî li Kurdistana Tirkîyê rewş qet neguherîye. Ji ber ku heta niha jî xwedîkirina heywanan beşê serekî ya berhemdarîyê ye.

*"Warîdata serekî li Anadola Rojhilatê (yanî Kurdistanê-nivîskar) ji heywan, rûn û hirîyê peyda dibe"*(3).

---

(*) Binêre: Nota vê îşareta han a fesla yekem.

(2) Me ji berhemê petrolê wê beşê girtîye berçav, ku di welat de dimîne, ne hemû berhemê petrolê ye, ji ber ku beşê wê yê zêde diçe welatên emperyalîst-Nivîskar.

(3) B. Darkut; "Coxrafya Tirkîyê" çapa Rûsî, Moskova, 1959, rûpel: 102.

Hem danişτiyên nîvkoçer ku tenê rîya îdara wan xwedîkirina heywanan e û hem ew gundîyên ku ber bi xwedîkirina heywanan re çandinîyê jî dikin, di xwedîkirina heywanan de gelek usta û jêhatî ne. Pêwîst e bê gotin ku roj bi roj hejmara koçeran kêm dibe û niha li Kurdistanê ne wek hejmarek kêm be, nemaye. Di melbendên ku heywan tên xwedî kirin ên nîvkoçeran de çandinî gelek kêm e. Ji ber ku beşê piranîya erdên wan çêrîngeh û zozan e û li wan cîyên ku çêrîngeh bi destê şivanan nakeve, belgên daran dikin alifê mî û bizinan[4].

Wan melbendên ku ji derveyî xwedîkirina heywanan çandinî jî tê kirin, berhemên çandinîyê di dereca diduyan de ye û li gor berhemê heywanan her ew e ku tenê alîkarîya valatîyên pêwîstîyên hundurî dike. Tenê li cîyên axên kêlayî(ajotî) û deştan qîmeta berhemên çandinîyê heye, ku ji derveyî pêwîstîyên navçê beşek ji berhemên wê ji derve re jî diçe. Awayê berhemdarîyê gelek îptîdaî ye û li gundan peywendîyek xurt a derebegîyê heye. Ji ber ku piranîya axê, milkê derebegên dewlemend e(*).

Wasitên çûn û hatinê, li Kurdistanê gelek kêm in. Di zivistanan de peywendîya piranîya bajaran ji hev tê qutkirin û befr rîyan digrin. Ji derveyê vê jî piranîya riyan teng û bê ser û ber in. Riya hesin jî li Kurdistanê kêm e, li Kurdistana Îranê riya hesin qet nîne û cîyên din jî riyên hesin gelek kêm û girîngîyek wan a gelek st-ratejîk heye. Di Gola Wanê û Urmîyê de jî awakî çûn û hatinîya deryayî heye, lê wasitên çûn û hatinê gelek kevin û jikarketî ne. Berî Şerê Cîhanê yê Yekem çend keştîyên (gemîyên) Rûsyayê di Gola Urmîyê de kar dikirin. Çûn û hatinîya hewayî jî tenê ji bo armanca eskerî heye.

Kedkarên bajêr û gundîyên Kurdistanê ku ji %80'yê nifûsê ne, di sê aliyan de bindestîya wan heye: Di aliyekî de di bindestê em-

---

(4) Mî û bizin bi awakî wisa hînê xwarina belgên dar û beran bûne, ku qet pêwîstîya wan bi alifek din nîne;
F.Balsan; Les Surprises du Kurdistan, Paris, 1945, p.85.

(*) Ev rewşa han piştî firotina milkên derebegên mezin ji gundîyan re, heta derecek zêde guherîn - Nivîskar.

peryalîstên İngilîz û Amerîka, di aliyê din de yê çîna fermanrewa ya Tirkîyê, Îran û İraqê û piştre jî di bindestê derebegên Kurdan de ne. Ev yeka han, rûyê giştî yê civaka Kurdewarî ya niha ye.

Karektera taybetî ya aborîya Kurdistanê eva ye ku yekgirtî nîne û di navbera çar welatan de hatîye parvekirin, madem wiha ye, sinorên sîyasî yên van welatan tenê axa Kurdistanê parve nekirine, herwiha aborîya wê jî ji hev perçe kirine û bi vî awayî her perçekî Kurdistanê di hêla aborî de ji perçê din cihê bûye û her perçe pişta xwe daye aborîya wî welatê ku Kurdistan bi ser xwe ve kiriye. Li gel vê jî sinorên çîyayî yên Kurdistanê serî li ber tu desthilatê nedanîne û di wan navçan de bazirganî bi awakî qaçaxî bi taybetî di navbera Kurdistana İraq û Îranê de gelek zêde ye û heta tesîrek wê ya aborî ya berbiçav jî heye.

Aborîya wan welatên Kurdistan di nav xwe de parve kirine, bi aborîya welatên din ve û bi taybetî welatên emperyalîst ve girêdayî ye, aborîya Kurdistanê jî bi aborîya van welatan ve girêdayî ye. Eva jî ji me re vê yekê ronî dike, ku pêşdeçûna aborî ji bo çi heta vê derecê ne li rê ye û wek hev nîne. Kurdistan li hemû van welatan melbendek dûredest e. Eger ev welatên han ên Kurdistan ku di nav xwe de parve kirine xwe di warê aborî de welatek paşkevtî bihesibînin, ji derveyî İraqê, melbendên Kurdnişîn li tev van welatan navçek paşkevtî ya van welatan e.

Belê bi vî awayî dêmenek giştî di warê aborîya Kurdistanê de me xist ber çav. Dîyar e di vê behsê de cîyê wê nîne, ku em bi dirêjî behsa rewşa aborî ya heryek ji perçên Kurdistanê bikin û bi rastî jî di hêla pêşdeçûyîna aborî û civakî de ferqek mezin di navbera perçan de nîne. Ji ber vê em ê bi dirêjî behsa rewşa aborî ya Kurdistana Îranê bikin ku bi awakî giştî ev yeka han ji bo rewşa aborî ya Kurdistana İraqê û Tirkîyê jî rast e. Madem wiha ye, netîca giştî ya behsa me ne tenê Kurdistana Îranê ye, belko hemû beşên din ên Kurdistanê jî digre nav xwe. Bêguman hinek şaşîtîyên vê riya ku me bijartî hene û hinek alîyên wê yên xirab jî, lê li gel vê jî dêmenên wan ên giştî yek in. Her yek ji perçên Kurdistanê hin hel û mercên xwe yên aborî yên taybetî jî hene wek hin hel û mercên cihê di hinek noqtên taybetî de, ku bi awakî serekî peywendîya wan bi aborîya wan welatan ve heye ku ew

beşê Kurdistan pê ve hatîye girêdan. Lê ev cihêbûnên han ku em naxwazin di vir de li ser bisekinin, tesîrekê nakin li ser rûyê giştî yê rewşa aborîya Kurdistanê.

## 2 - Hinek Zanyarî Ji Kurdistana Îranê

Hejmara nifûsa Kurdistana Îranê digihîje 3 mîlyon û nîvan, yanî ji %17'ê hemû nifûsa Îranê ye(*). Wek me di pêş de jî got pîvana Kurdistanê ji %7,5'ê hemû pîvana Îranê ye, ev jî tê wê manê ku nîsbeta nifûsa Kurdistanê serê kîlometre çargoşê 28 kes e, ku zêdetirîn du car zêdetir bi nîsbeta nifûsa Îranê ye, ku serê kîlometre çargoşê dike 12 kes. Li gel vê jî rewşa aborî gelek nazik e, ji ber ku ji %4'ê projên sanayîyê û ji %4,5'ê hemû karkerên sanayîya Îranê di Kurdistanê de ye(5).

Kurdistana Îranê di warê zîraet de melbendek girîng e, ji ber ku ji %20'ê hemû berhemên zîraeta Îranê ji Kurdistanê derdikeve(6).

Ji %85'ê nifûsa Kurdistanê yanî 3 mîlyon kes li gundan dijîn û li gor serîhejmara sala 1958'an ji van tenê %32 karê berhemdarîyê dikin(7).

---

(*) Binêre: Fesla yekem mijara nifûsê.

(5) "Îrana Îro", rûpel 140. Eva han tenê melbenda Hemedanê digre nav xwe, ne ew beşê Kurdistanê ku dikeve bakurê Mahabadê. Ji xwe eger bi serê xwe aborîya van herdu melbendan em bigrin berçav, em dikarin wan hejmarên jorê bi tevayî deynin -Nivîskar.

(6) Nîsbeta berhemên zêraetê ya Kurdistana Tirkîyê li gel hemû Tirkîyê sedî 15 ye û wextek Kurdistana Îranê radeyek zêde danewêle (nîsk, nok, genmê şamî..Elîşêr) ji bo melbendên din yên Îranê dişand, Kurdistana Tirkîyê ji derveyê heywanan qet tiştek din naşîne ji derveyî Kurdistanê. Li Kurdistana Îraqê rewş hinek baştir e, ji ber ku berhemên hinek hasilatên gelek girîng ên Kurdistana Îraqê ji yên Îraqê zêdetir in, wek nimûne Kurdistana Îraqê ji sedî 50'ê genim û ji sedî 30'ê cehê Îraqê berhem tîne. Berhemên titûnê jî di hemû Kurdistanê de, li gor sala 1958'an ji 5 hezar tonan derbaz bûye -Nivîskar.

(7) Rojnamên Îranê yên sala 1959'an.

%15'yê nifûsa Kurdistanê yanî nêzîkî 500 hezar kes li bajaran dijîn, ji van jî ji %30'an kêmtir yanî nêzîkî 150 hezar kes di sanayî û karên berhemdarîyên din de kar dikin[8].

Hewce ye em vê rastîya han jî bigrin berçav, ku çi di hêla çandinî û çi jî di hêla sanayî de azînên (metodên) berhemdarîyê tev destpêkî ne, wî çaxî em bi rehetî dikarin tê bigihîjin ku çima warîdata netewî li Kurdistana Îranê ewqas nizm e. Li gor lêkolîna me, warîdata navendî(ortalama) ya serane di salê de dike 80 dolar. Li Kurdistana Îranê jî wek perçên Kurdistanê ên din %80'yê warîdata netewî ji berhemên zîraetê peyda dibin û %10 jî ji sanayîya petrolê û sanayîyên din[9].

Li Kurdistana Îranê jî, berhemê.xwedîkirina heywanan beşê herî girîng ê berhemê zîraetê ye. Ji ber ku %45'ê warîdata netewî ji wî pêk tê û berhemê çandinî tenê %35'ê warîdata netewî pêk tîne.

Di bazirganîya derve de jî, berhemên zîraetê beşê zêde yê îxracata Kurdistanê ne. Ji berhemên din tenê beşekî kêm petrola xam ji Kurdistana Îranê diçe ji derve.

Piranîya berheman ji xwedîkirina heywanan tên çêkirin û ji tevan girîngtir rûn, hirî, post û heywan in. Bi vî awayî Kurdistana Îranê heta niha jî ne her ji bo bazara cîhanê, herwiha ji bo hundurê Îranê bi xwe jî melbendek berhemdar a berhemên zîraetê û madên xam e.

## 3 - Seviya Berhemên Çandinîyê

Hemû pîvana Kurdistana Îranê, ku dike 124 hezar kîlometre çargoşe, 5 mîlyon hektarê wê kêlayî ye (ajotî ye, hatîye çandin) ku dike %40'ê hemû axa wê. Nêzîkî 4 mîlyon hektar jî yanî %32'ê hemû axa wê çêrîngeh e û yê din çîya û zozan e. Lê li gel vê jî tenê

---

(8) Eynî serokanî.

(9) Berhemê serane yê petrolê li Kurdistana Îranê dike 0,2 ton ku ev jî li gor hemû Îranê ku dike heşt ton, nîsbetek gelek nizm e. (Çapa Kurdî)

%24'ê axa kêlayî, yanî mîlyonek û 200 hezar tê kêlandin, ku ji %9,6'ê hemû pîvana Kurdistana Îranê ye[10].

Aşkera ye sevîya teknîka çandinîyê jî nizm e. Ji ber ku azînên serekî çendîn sedsal e nehatine guhertin û ax her bi alet û edewatên kevin tên kêlandin, ku bi keda milê gayan û li hinek cîyan jî bi hesp, hêstiran (qatir) tên kirin. Cotek ga salê nêzîkî 3-4 hektar ax dikêle.

Ziblên kîmyayî tenê li hinek cîyan û li gundên dor û berên bajaran tên bikaranîn û ji derveyê vê ji bo berhemên serekî yên wek genim, ceh, nok, nîsk, genmê şamî (li Kurdistana Îranê ji nok, nîsk, genimê şamî û yên wek wan re "danewêle" têt gotin-Elîşêr) û birinc nayê bikaranîn.

Teknîka nû çarçovek teng netê de nayê bikaranîn. Li hemû Kurdistanê ji deh tiraktoran zêdetirîn nîne, ku piranîya van jî li melbenda Kirmaşan. Pêwîst e bê gotin ku di çandinîyê de bikaranîna makînan û bi taybetî tiraktor zêdetir dibe sebebê birçîbûn û feqîrtîya gundîyan, ji ber ku tenê xwedî milk dikarin tiraktor bikirin, ew jî di cîyê gundîyan de kar pê dide kirin û gundî naçar dibin ji bo peydakirina kar gundên xwa bi cî bihêlin. Ev jî ji derveyî zêdebûna ordîya bêkaran berhemek din nayne. Di hinek rewşên din de gundî naçar dibin wek karkerekî zîraetî bi heqdestek kêm kar ji axê re bikin, yan zevîyên baş ji axa re bihêlin heta ew bi tiraktoran bê kêlandin û ew jî zevîyên herî xirab (yên kes nakêle û dêmên bê av) bikêlin û behrek (parek) milkî ya zêde bidin axa. Bi vî awayî tiraktor di destê axa de dibe sebebê perçiqandin û mêtina gundîyan û di rastîyê de makîne dibe bela serê gundîyan. Ev jî belgek dine ji bo wê rastîyê, ku mekanîzekirina çandinîyê bi bê pêşdebirina sanayîya welat kosp û astengên zêde bi xwe re tînin. Niha li Kirmaşan ku axayan çandinîyên xwe mekanîze kirine, gundîyan derdixin û ew jî naçar dibin pena dibin ber bi bajaran ve[11]. Di ser van tevan de jî berhemdarîya karê çandinî li

---

(10) Me melzemên li ser Kurdistana Îranê piranî ji serokanîyên Îranî û her wiha ji serhejmarên Komela Netewe Yekgirtî wergirtîye -Nivîskar.

(11) K.Zirîngar; "Ayindeyî Dahat û Şehrihayî Ma" bi zimanê Farisî, Tehran, 1958, rûpel: 17.

Kurdistanê heta niha jî gelek kêm e.

Berhemên çandinîyê li Kurdistana Îranê bi pê hektar nayê hesabkirin, li ser binetovî tê hesabkirin. Wek nimûne li gor rija zevî (berhemdarîya zevî), ji 100 kîlo tov 400 heta 2 000 kîlo berhem tê hildan. Lê berhemê asayî sed kîlo tov di navbera 500 heta 700 kîloyan de ye.

Cetvela hejmara 7'an sevîya berhemê kîloyek binetovê genim di melbendên cuda cuda de ronî dike[12].

| Melbend | Zeviyên avî | Zeviyên bejî |
|---|---|---|
| | | 5-8 |
| Urmiyê | 5-15 | 4-6 |
| Mahabad | 5-10 | 8 |
| Sine | 5-6 | 4-6 |
| Dîwandere | 4-6 | |
| Kirmaşan | 10-20 | |

**Cetvela Hejmara 7**

Berhemê navendî yê hektarek ax dike 600 heta 800 kîlo[13].

Li Kurdistana Îranê genim, ceh, genimê şamî, nok, nîsk, lûbî, baqle û çeltîk tên çandin û ji çandinîyên sanayîyê jî titûn, pincarê şekir, pembo, gulberoj û kuncî tên çandin û sebze û danîna dar û beran jî li Kurdistanê zêde ye. Girîngtirîn berhemên daran hinar, bayîv, bindeq (findiq), pîste, gûz, sêv, tirî, zebeş (şûtî), gindor (petêx) û girike ye. Li Kurdistana başûr darên lîmon û porteqalan jî tê danîn.

---

(12) A.Lambton, Landlord and Peasant in Persia, London 1953, p.365. Ji derveyê vê end serokanîyên din.

(13) Kovara "Tehran Ekonomist", 17-11-62 û 6-12-1962, bi Farisî.

# 4 - Avdanî

Li gor hinek reqemên hatî dan, ji %60'ê axa çandî ya Kurdistanê, ku dike mîlyonek û 200 hezar hektar, avî ye û %40'ê din jî bejî ye. Ev yeka han nîşan dide ku li Kurdistana Îranê av gelek zêde ye(14) û her wiha nîşan dide ku gîrûgirîftê avê gelek girîng e(15).

Her ji ber vê jî di dîyarkirina milkan de av rolek gelek girîng dilîze, ji ber ku av bi piranî di destê axa de ye.

Li gor dînê Îslamê av nîmetek Xwedê ye û kirrîn û firotin li ser nîne, lê çi heye li gel vê jî ew cîyên ava wan kêm e destdanîna li ser ava bîr û coyan ne qedexe ye(16).

Dîyar e ew cîyên ava wan gelek zêde ye bi vî awayî heqek tune û nikare bibe jî, sebebê wê jî ev e ku av ji bo çandinîyê gelek girîng û bi feyde ye û damezrandin û ber bi pêş de birina projên avdanîyê jî karê kesekî, du kes û heta hinek caran karê civakekê jî nîne.

Li gor rê û adetên Îslamê çemên mezin ên wek Firat û Dîclê ku ava wan zêde ye, milkê hemû musilmanan e û heqê hemû kesekî heye bê ku pirsê ji kesekî bikin bend û coyan ji bo axa xwe ber bigrin. Lê di warê van rûbarên ku ava wan zêde nîne ew axên ketine nêzîkî van avan, ji wan axên hinek ji van avan dûrtir baştir in. Li Kurdistana Îranê ew gundên ketine alîyê serê rûbaran bi hemû awayî ji yên din baştir in, ji ber ku daniştiyên wan gundan çiqas bixwazin ewqas dikarin avê bikar bînin û ew gundên ketine xwartir, her mafê wan heye ku paşvemayên avan bikar bînin. Dîyar e di vî warî de orf û adetê kevin ên dîrokê jî tesîrek zêde kirine.

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHEQUE

---

(14) Nîsbeta axa avî ya Îranê ji sedî 28'ê hemû axa kêlayî ye û her çendîn li Kurdistanê av gelek zêde ye jî, lê kirinên ji bo avdanîyê gelek pêş de neçûne. Cîyên ku av zêde ye ax nîne û di deştan de jî ku ax ji bo kêlanê zêde ye ava wê temam nîne. Ji ber vê meseloka Kurdî dibêje: *"Li cîyê av heye ax nîne û li cîyê ax heye av nîne"* -*Nivîskar.*

(15) Girîngîya avê di gotina "avdanî" de derdikeve, ku ji avê hatîye û meselek Kurdî dibêje: *"Erda bê av ne erd e"* -*Nivîskar.*

(16) Xwedîyê vî heqî nikare avê ji rêbiwar û heywanan bibire, lê ji bo avdanê bi bê pirsa wî, kes nikare avê bi kar bîne -Nivîskar.

Wek nimûne eger axa gundên xwarê di pêş axên gundên serve hatibin kêlandin û bi bê girêdana bend û binavên nû, nikarin wan zevîyan bikêlin, heqê gundên serve nîne bend û golên avê çêbikin û nehêlin ava wan ber bi xwar de biçe û heqê kesekî jî nîne riya coyan biguhere[17].

Benda 159'ê qanûna medenî wiha dibêje:

*"Axên dor û berên rûbaran nabe ji bo cara yekem bên kêlandin, eger hinek caran ava zêde hebe û zerarê negihîne xwedîyê wan axan ku berî wê kêlabin"(18).*

Benda 158'an jî wiha dibêje:

*"Ew axên di pêş de hatibin kêlandin, mafê pêşkevtina wan li ser wan axan heye ku pişt re hatibin kêlandin"(19).*

Lê hinek car ev pêş û paş xistina han probleman bi xwe re tînin û di wan deman de ew axên nêzîktirê serokanîyên avê ne berî wan axan dikevin ku ketine xwarê rûbar, her wek ev yeka han di benda 156'ê qanûna medenî de hatîye[20].

Bikaranîna wan avên bend û coyan ku li ber çeman hatine girtin, heqê wan kesan e ku girêdane. Eger bend perçe axek bigre ku yê axa be û vêca behra milkî nedabe, gundîyan bê heq dide xebatê û bendên wan bi wan dide xerakirin. Eger ax bi xwe jî ya gundîyan be, ji xwe re bi muşterekî bendan girêdidin û hemû avê bi kar tînin.

Ava bîran li gor roj yan seetan tê parvekirin û hemû gundî li gor hel û mercê cîyên xwe di heftîyê de çend seet yan çend roj av jê re tê amade kirin. Bi piranî, axa nator (bekçî, heres) tesbît dike û hinek caran jî gundî dibijêrin. Gîrûgiriftê avê havînan û salên hişkeber bi giştî gelek sext û dijwar dibe, ji ber ku ew axên ji serokanîyên avan dûr in, ne her beşek kêmtir ji avê bi ber dikeve, belko ev beşê han heta digihîje ser kar beşek zêde jê dibe hilm(bu-

---

(17) Meselokek Kurdî heye wiha dibêje: *"Av di coya xwe de diçe" - Nivîskar.*

(18) Qanuna medenî ya Îranê.

(19) Eynî serokanî.

(20) Eynî serokanî.

har) û bi hewa de diçe û ji ber vê ev rewşa han gelek tesîr dike li ser berhemên salane, gelek caran dijîtîyek biçûk problemek mezin jê derdikeve û hinek caran jî xelkê melbendekê bi giştî li dijî xelkê melbendek din radiwestin.

Kêfa axan bi van cure dijîtîyan tê. Dijîtîya gundan û nebûna avê dikin sebeb ku hîn zêdetir firseta xwe li gundîyan bînin. Ji ber ku di meha Cuzerdanê (Gulan-Hezîran) de tenê heftîyekê çandin neyên avdan, xisara keda salekê a gundîyan dibe, bi vî awayî gundî ne tenê bi axê, bi avê jî tê girêdan. Axa û her wiha memûrên dewletê jî bi taybetî jendirme ji bo bêhêzkirina yekîtîya gundîyan û li dijî hev danerawestandinê ji problem û tengasîyên avê îstîfade dikin.

Li Kurdistana Îranê avdanî zêdetir ji çem û bendan tê kirin û ji ber vê jî av gelek e, li kêm cîyan gol û bîr tên bikaranîn. Li hinek melbendan, wek Miyanduwab û Kirmaşan di van dawîyan de bi karanîna pompên mekanîkî û bîrên artezîyenan di çarçovek teng de destpê kirîye. Bi kêm hewildanekê û xwe acizkirinekê, li Kurdistana Îranê ewqas av tê temînkirin, ku berhemên wek mereze û tiştên pêwistiyên (lazimiyên) avê bên çandin.

Behsa avê wek yek ji van sebeban e ku di dîyarkirina dereca behra milkîyetê de bi tesîr e, ku em ê pişt re behs bikin.

FESLA PÊNCAN

# NÊRÎNEK GİŞTÎ Lİ SER DÎROKA CIVAKA KURDISTANÊ

## 1 - Pêşdeçûyîna Dîroka Milkîyetê

Berî em bên ser lêkolîna peywendîya cotkarên îro yên Kurdistanê, em ê kurte nêrînekê li ser pêşdeçûyînên wan peywendîyan bigerînin.

Ne tiştekî gelek kêm be em peywendîyên zîraetê yên berî Îslamê nizanin. Wek em di Împaratorîya Medan a di sedsala 7'an a berî zayînî de dibînin, koletî bi awakî klasîkî li Kurdistanê nebûye, ji ber ku wek piranîya welatên rojhilatê, awayê dewleta koledarî li gel du awayên milkîyetê hebû, ku ji milkîyeta dewletê û milkîyeta muşterek (milkîyeta bi hev re, milkîyeta civakî - Elîşêr) pêkhatibû. Çandinî jî ji hêla avdanîyê de bi bendan hatîye kirin, ku peywendîyek wê ya zêde bi wan herdu awayên milkdarîyê ve hebûye. Ji ber ku ew xerca ji bo damezrandina alet û edewatên avdanîyê pêwîst bû, tenê bi îmkana dewletê yan di destê grûbekê yan di destê civakekê de bû. Engels wiha dibêje:

*"Şertê yekemîn ê çandinîyê danîna dezgên avdanîyê ye, ku çend grûb ji civakê, yan çend navçe yan jî hukumeta merkezî bi rê ve*

*dibe"*(1).

Dewletê îstîfade ji milkîyeta muşterek werdigirt û bi awakî rêk û pêk bac û xerc distand û ji bo vê mebestê bi grûb û civakan re peyman girêdida, ku li gor vê peymana han grûb û civak û endamên wan mecbûr dibûn axên xwe biçînin. Bi vî awayî dewletê riya vê yeka han jî digirt ku endamên van civakên han axên xwe di cî de bihêlin. Dîyar e ev jî tê vê manê ku girêdana van gundîyên han bi vî awayî bi axên wan ve di rastîya xwe de azad ne bûne, lê girêdana civak û endamên wan bi axê ve her di wî wextî de dibû sebebê zêde berhemê ji(2).

Ev herdu awa milkîyeta han heta sedsala sêyem ku di destpêka Hukumdarîya Sasanîyan de dêmana aborî ya derebegî derket, li kar bû. Di paş wê de jî cardin bi tevayî civakên wê ji nav neçûn û;

*"Aşkera ye ku di dema serkevtina Îslamîyetê de jî awakî ji nîzama muşterek her maye"(3).*

Peydabûna derebegî li Kurdistanê xwedî karekterekî taybetî ye, ku ew cure koletî ye ku derebegî di dawîyê de hatîye, li Kurdistanê bi tevayî geşbûnek nekirîye û ev yeka han bûye sebebê vê yekê, ku mulkdarîya muşterek zêdetir berfireh be. Ji ber ku bi peydabûna derebegî re mulkdarîya muşterek ji nav neçûye, wek di wan welatan de ku derebegî hatîye cîyê wê koletî geşkirinek cîgir bû, belko piştê vê jî çend sedsal maye û nîzama muşterek heta demek gelek dirêj li ser bingeha milkdarîya giştî damezraye.

---

(1) F. Engels: "Çend Name di Derbarê Sermayê de", bi zimanê Çekî, Prag, 1957, rûpel: 54.

(2) *Li gor hinek belgan ku digîhin sedsala yekem a pêş zayînî, peywendîya wan bi firotina rezên tirî li Kurdistana Îranê -Medya Rojava- ve heye, kirîn û firotina rezê tirî li ser bûye, lê razîbûna cîranan şertê sergirtina kirîn-firotinê bûye. Wî çaxî kiryar dibû bi endamek civakê û ya wekî yên din hemû mafên wî hebûn û soz dida ku axê bi başî bikar bîne, ger endamek wezîfa xwe bi başî bi cî neanîbûya bi tundî dihat cezakirin".* Dîroka Cîhanê, bi zimanê Rûsî, cilda duyem, Moskova, 1955, rûpel: 433.

(3) A. Lambton, Landlord..., p. 2.

Wesîlên avdanîya dewletê û derebegên mezin li Kurdistanê ji co, bend û bingehên avan pêk hatibûn û ev bûne yek ji wan sebeban ku ax ji destê gundîyan derketîye û tesîrek wisa kirîye ku derebegî zêdetir bi pêş de here.

Berî êrîşa Ereban hêdî hêdî awayê derebegî cîyê xwe girtîye û kêlîna axê ketiye destê van grûbên han: 1-Şah, 2-Binemalên paşatî, 3-Mirovên dînî, 4-Fermandarên eskerî, 5-Memûrên dewletê, 6-Axa ku ji wan re azad digotin. Kedkarên bindest jî ji gundî, kolan[4] û zenetkaran pêkhatibûn.

Bingeha milkê derebegan zêdetir ew bû ku padîşah di heqê xizmetekê de wek maaş dida serokên eskerî, yan memûran.

*"Fermanrewayan eskerên xwe bi wê radigirtin û maaşê memûran ji wan re dihat dan, ku yên ax ji wan re dihat dan."*[5].

Ewên di vê rîyê re ax bi destê wan diket, tenê mafê wan ê xwarina berhemê wê axê hebû. Ne xwedîyê wê axê bûn.

Gundîyan wî wextî du cur xerc didan; yekem, divîyabû nîv an ji sisyan yekê berhemên xwe yên salane bidana dewletê yan xwedîyê milk. Duyem, hemû ew kesên ku temenê wan di navbera bîst û heta pêncî salan de bûn, serane didan dewletê[6].

Mana vê ev e ku di navekê re piranîya axê ya dewletê bûye, dewletê hem pîtax distand û hem jî kirya axê û:

---

[4] S. A. Îgzarov di gotara xwe ya bi navê "Nêrînek Etnografî li Ser Kurdên Wilayeta Êrîvanê", rûpel: 18'an de wiha dinivîse: *"Di nav Kurdan de şûnewarê koletîyê nîne"*. Lê di gelek serokanî û belgên din de derdikeve ku awa menzerek koletîyê hebûye û yek ji van herdu awayan xwe nîşan dane: 1-Ew kolên di şer de esîr dihatin girtin, 2-Kolên hundurî welat ku di qonaxa dawîyê de kirîn û firotina wan hatîye qedexekirin. Li gel vê jî li Kurdistanê koletî wek awayek aborî nebûye -Nivîskar.

[5] A. Lambton, Landlord..., p. 10.

[6] Di hezarê duhemê berî zayînî de li melbenda Nuzê, 17 kîlometre başurê rojavayê Kerkukê ye, dibû xelk di cîyê bikaranîna axê de xizmetek din ji padîşah re bikin. Lê nedikarîn axên xwe bifroşin yan bidin kesekî din. Her ji kurên binemala xwe re jî. "F.R.Stil: Sewda û Mameleyî Ax li Nuzê", Filadelfiya, 1943, rûpel: 15. (Ji kitêba A. Lambton Landlord..., p. 11'an hatîye wergirtin).

*"Di vî halî de gundî li dijî axan nedirawestan, belko li gel dewletê hem wek axayekî û hem wek fermanrewayekî parêzger bûn û her wek li Asya belav e, xerc û milk diketin ser hev, yan em dikarin bi vî awayî bêjin; xercek tunebû ku li gel wan cure milkan cudabûnek hebe"*(7).

Mirovên dînî, esilzade û memûrên dewletê bi xerc û pîtax ve mijûl bûn.

Lê gundî her wek paşvemayên kolan giranîyên din li ser milê wan bûn. Ew mecbûr bûn di projên mezin ên avdanîyê, danîna piran û rê û banan de bi bê heq kar bikin. Bi vî awayî gundî di bin barê bindestî, perçiqandin û koletîyê de dinalîn. Di vir de derdikeve ku li gel vê rantê ku wek aynî dihat dayîn, rantek din jî bi awakî bê heq ji gundî dihat sitendin, lê ranta aynî bi awayê serekî, bindestî û perçiqandina gundîyan bû.

Di dema êrîşa Ereban a di sedsala 7'an de, cure awakî muşterekî li Kurdistanê mabû û gundên Kurdistanê peywendîyên eşîretî ji bo xwe parastibûn.

Di dema xelîfên Ebbasîyan de, di sedsala 8'an de heta sedsala 10'an, gundîyên sade milkên xwe didan dewletê, yanî didan xelîfe, di wan deman de hemû milkê padîşah û binemala paşatîya Sasanîyan û her wiha milkê wan axên ku bi Ereban re şer kiribûn, bûbû yên xelîfe. Her di wan deman de axên mirovên dînî û awirgên(adirgên) Zerdeşt jî bûbûn yê "beytu'lmal" a Îslamê, yanî di rastîya xwe de ya xelîfe.

Bi vî awayî dewlet, ku di şexsê xelîfe de xwe îspat dikir, bûbû milkdarê herî mezin. Ev milkîyeta han heta derecek zêde xwedî karekterek derebegî bû û di rastîyê de derebeg çîna fermanrewa bûn û ewên ji dewletê jî werdigirtin, bi ser esîlzadan, memuran û yên din de parve dikirin.

Bi milkîyeta dewletê re hinek ax jî di destê derebegan de bûn ku piranîya wan asîlzadên Ereban bûn. Ev Erebên han di dawîya serkevtinê de dest danîbûn ser van axan. Her wiha hinek ji derebegên hundur jî mabûn ku ji bo parêzgerîya mal û milkê xwe alîkarîya Ereban kiribûn. Heqê derebegan hebû axên xwe bifroşin

---

(7) K. Marks: "Sermaye" bi zimanê Çekî, cilda sêyem, Prag, 1956, rûpel: 338.

yan bi mîratî di cî de bihêlin. Di wan deman de awayek nû yê milkîyeta derebegî jî peyda bû, ku ji milkên mizgeftê pêkhatibû û ji xwendevanên dînî û wan cure tiştan re hatibû amade kirin. Ev axên han ên amadekirî nedibû bên firotin û ji kesekî din re bêndan.

Di sedsala 11'an de Îqta'î(8) wek awakî milkîyetê peyda bû. Derebeg di pêş de bi vî awayî bû ku dewlet beşek ax dida hinek kesan heta ku sax be, yan heta demekê jê re dihat dîyarî kirin ku îstîfadê jê bike. Eva han heta dereceкê wî awayî bi bîr tîne, ku gelek demek dirêj di pêşîya Îslamîyetê de hebû. Dîyar e derebegî peydabûna bi vî awayê iqta'îyê ve bi hêz bû û ev awa milkdarîya iqta'îyê heta sedsala 12'an dom kir û her di wî wextî de jî axan di hemû riyan re dest danîn ser paşvemayên axên neparvekirî yên grûbên gundan. Bi vî awayî di dawîya sedsala 11'an de xelkên gundan, ku xwedîyê axên neparvekirî bûn, ji hêla aborî de bi derebegî ve girêdayîbûn, her di wî wextî de xurtbûna awayê derebegî hêdî hêdî bû sebebê bêhêzî û kêmbûna dewleta merkezî. Eger heta wê demê bac û vêrgî û berhemên axê bi sebebê dezgayek taybetî ve raste rast ji danişţiyan û bi taybetî ji gundîyan dihat sitendin, ji wî çaxî şûn de hêdî hêdî ew desthilat ket destê derebegên mezin û walîyan.

Ji sedsala 12'a heta destpêka sedsala 13'an, yanî di dema hukumeta Selçukîyan de hinek guherandin bi ser awayê derebegî de hat. Wî awayê ku ax ji hinek kesan re dihat dan ku berhemê wê bikar bînin û ax jî her ya dewletê be, bû ya xwedîyê wan û heqê wan hebû bi mîratî ji mîratgirên xwe re bihêlin. Di netîca bi vî awayê iqta'î de berhemên çandinîyê hinek pêş de çûn, ji ber ku xwedîyê milkan wek carên berê ji wê neditirsiyan ku axa wan ji wan bê sitendin û êdî daxwazek wan bi wî awayî tune bû ku bi carekê de dizî û pizîya axê bikin. Niha hîn zêdetir hewla zêdekirina berhemê didan û axa xwe bi awakî xêr û berekettir bikar dianîn. Aşkera ye vê yeka han bi tu awayî barê giran ê derebegan ê li ser milê gundîyên bindest kêm nekir û gundî bi awakî temamî bi wan ve hatin girêdan. Tenê gundî ku ne berpirsîyar bûn ji

---

(8) Iqta'i gotinek Erebî ye, ku di mana perçe ax de ye. Gotina iqta'î bi Erebî di mana derebeg û iqta'îye jî di mana derebegtî de ye.

sisîyan yek yan nîvê berhemê xwe bide, lê gelek zêde bar û wezîfên din jî li ser milê wan bû.

Piştî êrîşa Moxolan rewşa wan hinek hat guhertin, xanê Moxolan û xizmên wan beşekî zêde ji axa wan îşgal kirin[9]. Her wiha hinek derebegên nû yên Moxolan jî peyda bûn ku gelek bi bê merhemetî gundîyan dimêtin û diperçiqandin.

Di wî wextî de awayê iqta'i gihîşt qonaxa herî bilind. Derebegî cîyê xwe girt û gundîyan bi tevayî bi axê ve girêda. Em dikarin derebegên xwedî milk ên wê demê bikin çar grûb:

1- Esîlzadên eskerî ku ji xanên Moxol, Tirk û Kurd (xan di mana gotina serekeşîr de ye -Nivîskar) pêk hatibûn.

2- Derebegên hundur ku memûr nebûn.

3- Mirovên dînî yên mezin.

4- Memurên dewletê.

Gundî gelek bi tundî dihatin perçiqandin û hinek wext naçar bûn %80'î yê dexil û danên xwe bidin dewletê yan milkdaran[10].

Şepirzetîya rewşa çandinîyê li milekî û li milê din nizmbûna warîdata dewletê[11] di xelasîya sedsala 13'an û destpêka sedsala 14'an de Xazan Xan anîye ser wê yekê, ku çarekê ji vê rewşa nelibar re bibîne û îstîfadekê jê werbigre. Wî dest avêt nav karê xerc û vêrgîyê û sevîyek jê re danî, ku berhevkirina bacê ji xelkê bi neqdî yan qîmeta malê li ser hebûneke taybetî bê dîyar kirin û ji bo dana wê wextek kifşkirî jî jê re hebe[12], her wiha ji bo kêmkirina bindestîya gundîyan a ji alîyê eskeran de û ji holê rakirin, yan kêmkirina bac û vêrgîyên bazirganî û pîşesazîyan jî tedbîr jê re hat standin[13].

Her wî wextî li gor derece û rutba eskerên Moxolan, beşek zêde ji axa dewletê li ser wan hat belav kirin, di vir de jî dewletê milk-

---

(9) Ji wan axan re "încu" dihat gotin -Nivîskar.

(10) Dîroka Cîhanê, cilda sêyem, Moskova, 1957, rûpel: 581.

(11) Y. P. Petroviski: "Werzêrî û Peywendîya Cotkaran li Îranê di Sedsala 12 û 14'an de", bi zimanê Rûsî, Moskova, 1960, rûpel: 55.

(12) Eynî serokanî, rûpel: 58.

(13) Eynî serokanî, rûpel: 59

darîya axê ji xwe re parastibû, di vir de mafê wan tenê yê xwarin û hiştina bi mîratî ya axê hebû, mafê ku bikarin wê axê bifroşin tunebû. Gundîyan hemû bac û vêrgî û kirêya axê didan xwedîyê iqtayan û ewan jî beşek hatinên xwe didan dewletê.

Ev guherînên han ên Xazanxan heta derecek zêde, bû sebebê jîndarîya çandinîyê û zêdebûna berhemê û bilindbûna warîdata gundîyan û ji ber vê jî warîdata dewletê jî ber bi pêş de çû, lê wek di cetvela hejmara 8'an de derdikeve cardin negihîştibû sevîya berî êrîşa Moxolan.

Warîdata salane ya dewletê bi Dînarê Îlxanî

| Melbend | Berî êrîşa Moxolan | Di navbera salên 1340-1350'an de |
|---|---|---|
| Dîyarbekir û Dîyarrebî'e[14] di destpêka sedsala 13'an de | 10.000.000[15] | 1.925.000[15] |
| Kurdistan di destpêka sedsala 12'an de | 2.000.000[16] | 201.500[16] |

**Cetvela Hejmar 8**

Di dema Moxolîyan de çandinî gelek daket û mîktara axên çandîyê li hinek cîyan hat ser ji dehan yekê mîktara carên berê (17).

Destkarîya Xazanxan jî heta derecekê karî rewşê baştir bike,

---

(14) Ev melbenda han ji beşê başûrê Kurdistana Tirkîyê û beşê bakurê Kurdistana Îraqê ya niha pêk hatîye -Nivîskar.

(15) H.Mestûfî: Nizhetu'l-Qilub", rûpel: 120.

(16) Eynî serokanî, rûpel: 127.

(17) Y.P.Petroviski, eynî serokanî, rûpel: 55, 70.

her di wê demê de ji bo cîgirtina peywendîyên derebegî jî hinek hewlên nû hatin dan: Wek nimûne; rê nehat dan ku tu gundîyek cîyê xwe biguherîne, eger kesek bi dizî jî biçûya, heta 30 sal pişt re jî divegerandin û her li ku bigirtina bi zorê dianîn cîyê wî.

Êrîşa Tîmurê Leng bû sebebê nizmbûnek nû ya sevîya aborî. Di wê demê de awayê iqta'î jî formek din a nû peyda kir ku ji "sîyrgal" pêk dihat, ferqa nabera sîyrgal û iqta'i di vir de bû, ku sîyrgal mîratî bû, kesê ku siyrgal jê re dihat dan her di wî wextî de jî dibû fermanrewayê hemû kar û barê melbendê(18).

Xwedîyê siyrgal wek xwedîyê iqta'î ji hemû xerc û vêrgîyan muaf bû û ji hêla qanûnî û îdarî de mesulîyeta wî hebû. Ev yeka han jî bû sebebê zeîfbûna desthilata dewleta merkezî û serkevtina desthilata derebegên mezin.

Derebegî her wek di Şerefnamê de jî hatîye gotin, di sedsala 16'an de ber bi pêş de çû. Ji alîyek din de heta derecekê zeneetkarî ji zîraetê cuda bû û ev jî bû sebebê ber bi pêş de çûna bazirganîya hundurî û peywendîyên nav bazarê, ji wî wextî ve ji bo hinek xerc û vêrgî pere dihat stendin. Avayîsazî jî di wê demê de pêş de çû û koşkên emîr û derebegan hatin çêkirin. Bi kurtî di wan deman de milkdarîya derebegî rûnişt û peywendîyên derebegî li seranserê Kurdistanê cîyê xwe girtin.

Di dema Sefewîyan de bi awakî nû iqta'î peyda bû ku jê re "tîwl" dihat gotin, li gor tîwl dewletê heqê milkdarîya axekê yan beşek ji milkdarîyê dida kesekî. Gelek caran tîwl peywendî bi xizmeteke dewletê ve hebû û xwedîyê tîwlê heta demekê vê xizmeta han ji dewletê re kiribûna tîwla wî di destê wî de bû. Awayek din ê tîwlê jî wiha bû ku mirov di temamê jîyana xwe de heqê wî yê tîwlê hebû, lê piştî mirina wî tîwl wek mîrate ji mîratgirên wî re nedima.

Dema Şah Ebbasê Yekem, di sedsala 17'an de, ji bo zêdekirina berhemên çandinîyê hinek gavên nû hatin avêtin û xerc û vêrgî hinek hat kêmkirin. Lê ev gavên han jî zêdetir bûn sebebê belavbûna çarçova axên dewletê û binemala padişahtîyê, her wekî hejmar û mîktara milkê mewquf ê Şîîyan jî zêde kir. Bi giştî

---

(18) Di zimanê Moxolî de bi mana "mafan" e -Nivîskar.

rewşa aborîya welat û sevîya jîyana gundîyan gelek baştir bû, di wê demê de padîşah ax û çêrîngehan li eşîretan parve kir, ku beşê her yek ji wan bi "yurt" dihat navkirin, ku di zimanê Moxolî de bi mana "'erd" e.

Piştî hukumdarîya Sefewîyan û di netîca êrîşa Afxanîyan a di sedsala 18'an de, carek din sevîya aborî nizm bû, feqîrî û belengazî ji gundîyan re dîyarî hat. Wisa li rewşê hat ku êdî kesek ji derveyê vê nema û ev yeka han bû sebebê bihêzbûna dijîtîyên gundî û eşîretan. Di sala 1743'an de li melbenda Xoyê û Salmasê, Kurdan li dijî zêdebûna bac û vêrgîyan serî hildan(19).

Di dema Kerîm Xanê Zendî de (1752-1779) ji bo demeke kêm çandinî baştir bû û gundî jîndar bûn. Pişt re demek din bi ser de hat ku nizmbûna aborî tê de berdewam bû, heta dema Hukumeta Qaçarîyan, sedsala 19'an, bi carekê tundtir bû. Wî wextî hêdî hêdî welat ket bin desthilata dewletên kolonyalîst. Cetvela hejmara 9'an ji me re aşkera dike ku çawan nizmbûna rewşa aborî, nizmbûna dewletê jî bi xwe re tîne.

| Sal | Waridat bi mîlyon Frank(20) |
|---|---|
| 1803 | 159 |
| 1815 | 75 |
| 1850 | 57 |
| 1889 | 40 |
| 1899 | 41 |

**Cetvela Hejmar 9**

Armanca serekî ya tîwldaran di wê sedsalê de eva han bû ku tîwle bibe milkê wan û di rojên bên de ji wan neyê sitendin.

(19) Y.P.Petroviski: "Nêrînek li Ser Dîroka Peywendîyên Derebegî li Azerbeycan û Ermenîstanê", bi zimanê Rûsî, Leningrad, 1949, rûpel: 335.

(20) M.B.Wuluntir: Di Sedsala 20'an de di Îranê de Berbipêşdeçûna Aborî û Mesela Werzêrî", bi zimanê Rûsî, Bingehê Weşanên Dewletê, 1921.

Dewlet û padîşah jî zêdetir pêwîstîya wan bi peran hebû. Ji ber ku bi sebebê mesrefên dîwanxanê û seferên Nesreddîn Şah li ser Avrupa, butça dewletê bi carekê tuşî jarîyê bû. Di vir de padîşah hinek gavên ji bo baştirkirina rewşa xezînê avêtin, îmtîyazên zêde dan destê dewletên bîyanî û deynek (qerz) zêde giran bi taybetî ji Rusya Çarî wergirt. A em dixwazin behs bikin ev e, ku padîşah dest bi firotina malê dewletê kir û vê yekê firsetek baş da destê xwedî tîwleyan ji bo ku bibin xwedîyê axa xwe.

Bi vî awayî milkdarîya derebegên mezin gelek bi rehetî ber bi pêş de çû ku di netîca vê rêbazê de di dawîya sedsala 19'an de ev çend cure milkîyet tên dîtin: milkîyeta derebegan, milkîyeta dewletê, weqif, milkîyeta eşîretan û milkîyeta gundîyan. Milkên gundîyan jî du cure bûn, yek ji wan ev bû ku axa gund a çend malên gundîyan bû, ku jê re milkîyeta biçûk dihat gotin, a din jî ew bû ku her gundîyek xwedî perçek ax bû. Li Kurdistanê ev cure milkîyeta han bi vî awayî bû; ew axên ku di eslê xwe de padîşah parve kiribû, yan pişt re ji dewletê hatibûn kirîn û bûbûn milkê mîratê, di navbera mîratgiran de dihat parve kirin û hêdî hêdî her çend hejmara mîratgiran zêde dibû ew beşê axa ku ji wan re dima biçûktir dibû. Bi vî awayî wisa lê hat, ku nevî (torin) û nevîçirkên xwedîyê milkên mezin bûn gundîyek ku her yek ji wan perçek axa biçûk ji wan re ma.

Hinek caran eşîretên koçer di erdek "azad" de niştecî dibûn û wir ji xwe re dikirin milk û endamên eşîretê axê di nav xwe de parve dikirin û herkes perçe axek dibijard û dibûn gundîyên serbixwe.

## 2 - Kurdistan Wek Beşek ji Bazara Cîhanê

Ji destpêka nîvê duhemê sedsala 19'an ve hinek sebebên derve tesîr kirin li ser peywendîyên zîraet û pêşveçûna welat. Ev yeka han jî di dema bihêzbûna nifûza sîyasî û aborî ya welatên mezin ên bîyanî û bi taybetî ji alîyê başûr de emperyalîzma Brîtanya û ji bakur de jî Rûsya Çarîtî bû.

Di wê navê re û ji destpêka sedsala 20'an şûn de, Kurdistan bû beşek ji bazara cîhanê. Bazirganîya derveyê Îranê bi hêsanî ber

bi pêş de çû û di nîva duhema sedsala 19'an de, bû deh car hindî carên din[21]. Di sedsala 20'an de jî ji 370 mîlyon qiranan (sala 1900'an) gihîşte 1100 mîlyon qiran (sala 1913)[22].

Peywendîya Kurdistanê bi bazara cîhanê re tesîr kir li ser hemû warên jîyana aborî û civakî ya civaka Kurdewarî. Peywendîya bazaran ber bi pêş de çû û durustkirina bajar bi awakî zû destpê kir ku nimûnên wê nehatibûn dîtin. Daxwazîyek zêde ji bo hinek tiştên mamul peyda bûn, ku evên han ji berhemên daristanan, çandinî û bi taybetî berhemên ji heywanan tên girtin yên wek hirî, post, heywan û hêkan bûn. Her wiha pembo, mafur û berhemên daristanan ên wek ketîre û mazî, em dikarin bihejmêrin. Di sala 1863'an de Kurdistan bi bahayê 455 hezar ruble hirî, bihayê 5 mîlyon ruble[23] gîyayên teknîkî û berhemên daristanan şandîye ji derve[24], her wiha her salê ji 3 mîlyonan zêdetir serî bizin û mî dişand Stenbol, Heleb, Bexda û Tiflîsê. Di destpêka sedsala 20'an de salê 20 mîlyon hêk ji Kurdistanê diçû bendera (lîmana) Samsunê ya ser Behra Reş[25]. Li gor rapora Konsolosê Brîtanya, ku di sala 1903'an de şandîye, her salê li Kirmaşan ji 20 hezar heta 22.400 perçe hûr û rûvî hatîye firotin[26] û di destpêka Şerê Cîhanê yê Yekem de ji melbenda Mahabadê bi bihayê 636 hezar ruble rûn, hirî, post û tiştên din ji Rûsya re çûye[27]. Tiştên ji Kirmaşan, Sine û Mahabadê derdiketin salê sê mîlyon ruble dikirin

---

(21) L. N. Tikranov: "Di Derbarê Peywendîya Civakî û Aborî ya Îran de", bi zimanê Rûsî, Tiflis, 1905, rûpel: 11.

(22) Kovara "Rojhilata Şoreşgêr", bi zimanê Rûsî, 1927, hejman: 3.

(23) A. G. Akopov: "Di Derbarê Cêgirbûna Netewî ya Kurd li Îran de", Moskova, 1952, rûpel: 225.

(24) Eynî serokanî, rûpel: 251.

(25) Foreign Office, No. 62, Armenia and Kurdistan, London 1920.

(26) M. Cemalzade: "Genc Şaygan", bi zimanê Farisî, Berlin, 1917.

(27) A. G. Akopov: Eynî serokanî, rûpel: 227.

[28]. Evên han tev belgên ber bi pêş de çûna zû ya bazirganîya derve ya Kurdistanê ne.

Şertê bingehîn ê kirîn û firotina axê, milkîyeta gundî bû.

*"Xwedî milkîyet bi tevayî ew nîne ku ax di destê xwedî de be, belko ew e, ku bikare bifroşe jî"*[29].

Hinek ax bi awayê kirîn û firotinê ji destê gundîyan derdiketin û piranîya wan jî ji alîyê xwedî milkîyeta derebegî, bazirganan û mirovên dînî ve dihatin îşgalkirin. Di nîvê duhemê sedsala 19'an de, ji ber netîca hatina sermaya bîyanî bazirganên hindur hêdî hêdî riya dana xebatê ya sermaya xwe bi pîşesazîya hindûr ve girê dan, ji ber sebebê bazara pêşkevtî ya derve sermayên xwe gelek zû zêde dikirin. Ev rewşa han bû sebebê wê ku bazirgan bi awakî berfirehî dest bi kirrîna axê bikin û axên dewletê û yên xwedîyê axên taybetî bikirin. Li gel vê jî guherîna milkîyeta sermayedarîya bazirganan, peywendîyên derebegî di hêla çandinîyê de neguherand.

Peywendîya Kurdistanê bi bazara cîhanê ve peydabûna cihêtî ya çînîtî di gundan de hêsantir kir, ji ber ku di milekî de ax ketin bin destê grûbên kêm û di milekî din de feqîrî û belengazî bi ser hezaran gundî de girt, yan li gundan bûn şivan, gavan û berxvan û yan jî ji bo peydakirina kar, berê xwe dan bajaran û li wir bûn nîv proletarya.

*"Berbipêşdeçûna bazaran, pere, faîz, milkîyata axê û tefecîtî di milekî de bû sebebê berhevbûna servet û pere di destê çînek biçûk de û di milekî din de jî bû sebebê feqîrîya civakên xelkê û zêdebûna hejmara belengaz û lêqewmandiyan"*[30].

Pêwîst e ev yeka han jî bê gotin, ku hinek ji gundîyên Kurdistanê di netîca van guherînên çînîtî de bûn bazirgan û xwedî kar. Lê hej-

---

(28) M. Asilkoviski: "Raporek ji Sefera Wilayetên Rojavayê Îranê", bi zimanê Rûsî, Tiflis, 1913, rûpel: 274-268-652.

(29) F. Engels: "Serokanîya Xêzanê", çapa Înilîzî, Moskova, 1955, rûpel: 315.

(30) F. Engels, eynî serokanî, bi Çekî.

mara van gelek kêm bû. Di vir de rastîya gotina Lenin derdikeve ku dibêje:

*"Eger em melbendên cihê muqayese bikin, em dibînin ku di hinekan de xwedî kar di gundan de di nav gundîyan de peyda bûne, di navekê re di nav hinekên din de proletarya gund durust bûye. Bêguman li Rûsya wek hemû welatên sermayedarî tesîra rewşa duyem ew ferq û cihêtî li ser hejmarek zêde ji gundîyan û hejmarek zêde ji melbendan jî, ji tesîra milê yekem zêdetir e"(31).*

## 3- Çêbûna Eşîretên Kurdan

Di nîverasta Sedsala 19'an de koçer ji sisîyan yekê nifûsa Kurdistanê bûn. Ji ber vê, da em bikarin tesîra peywendîya welat bi bazara cîhanê ve li ser pêgehîştina eşîretan bi başî bikolin, pêwîst e em bi kurtî behsa awayê giştî ya peywendîyên eşîratîyê bikin.

Eşîret bi awakî gelemperî xwedîyê axê û yên koçer jî xwedîyê çêrîngehê bûn, ew ax û çêrîngeh ji alîyê padîşah de ji wan re hatibû dîyarîkirin, yan di wextê niştecîbûnê de dest danîbûn ser. Hinek caran jî eşîretan ax ji hev distendin.

Eşîret di Kurdistanê de ji "bere" yan "qebîlan" (tîr, tîre) pêk tên, ku ew jî bi binemal û binemal jî li ser baban tên parvekirin. Serokê eşîretê; mezin, mîr yan beg e û serokê berê jî axa ye. Desthilatek bê sinor a beg û axan a qanûnî û îdarî hebû, di hemû kar û baran de axa bi xwe qerar dida, lê rîsipî û mirovên maqûl ên berê jî tesîra wan li ser biryarên axa hebû. Xanîyê axa ji hemû xanîyan mezintir bû û nîşanek taybetî li ser bû. Piştî mirina axa kurê wî yê mezin diket cîyê wî û eger kurê wî tunebûya, rîspîyên eşîretê serokek nû dibijartin. Di nav hinek eşîretan de adet wiha ye, ku hemû bi hev re serokên xwe dibijêrin. Wek nimûne Eşîreta Ciwanro serokên xwe ku jê re Sultan dibêjin, di civînek aşkera de, ku ji kesên wan ên bi temen (bi 'umir) pêk tên, dibijêrin û hinek caran

(31) V. I. Lenin: "Pêşdeçûna Sermayedarî di Rûsya de", bi Çekî, Prag 1952, rûpel: 110.

mimkûn e ku jin jî bibin serokeşîr(32). Serok, rêveberîya hemû kar û bar dikir, dibû heta musaeda jin mahrkirinê û.h.w. jî bide... Ax û çêrîngeha serokeşîr nîne, lê heqê wî/wê di hemû pêşkevtinekê de heye (di nav hevalan de yekem e) her wê navê re hinek îmtîyazên wî/wê jî hene, wek vê ku beşek dîyarîyên ji hirî, rûn, penîr, goşt(33) û berhemên din ên zîraetê werdigirt. Di nav eşîrê de em dikarin sê grûbên serekî ji hev cîhê bikin: Serok û xizmên wî/wê(34) ku evên han beşê xwedî îmtîyaz ê eşîretê ne. Grûba duyem ku ji ya yekem zêdeter in, ji xizmetkarên serok û binemalên xwe pêk tên û ji wan re xulam tê gotin û hemû kar bi wan tê kirin. Grûba sêyem ku ji tevan girîngtir in kîtleya giştî ya eşîretê ye. Li vir ev îzaheta han pêwîst e ku ev beşbûna han di hemû hal û karê de bi vî awayî nabe. Di nav hemû eşîretan de ji derveyî van şêx, mela û seyîd hene. Eger em merovên dînî li gel gundîyan muqayese bikin hinek cudabûn di navbera wan de hene. Di nav endamên eşîretê bi xwe de jî gelek ferqên cihê hene, ku ji tevan girîngtir cihêbûna serwet û malî ye û ev jî li gor vê ye ku her kesek çend serî heywanên wî/wê hene.

Rolek girîng a vê ferqî û cihêbûna han heye di wan cîyan de ku heta niha jî milkîyeta ferdîtî tê de peyda dibe. Ji ber ku mimkun e hejmarek kêm heywanên hin ji endamên eşîretê hebe, serokê eşîretê û hinek kesên din dikarin hejmarek zêde mî û bizin rabigrin(35). Ev ferq û cihêbûna han di nav Kurdan de ji sedsala 16'an de heye. Şerefname behsa Kurdên "reş" û "spî" dike û heta niha jî ev

---

(32) Wek Adîle Xan, ku berî Şerê Cîhanê yê Yekem seroka eşîreta mezin a Caf bû -Nivîskar.

(33) M. S.Ivanov: "Kurtîyek ji Dîroka Îranê", bi zimanê Rûsî, Moskova, 1952, rûpel: 119.

(34) Xizmatî di jîyana eşîretî de bi tevayî nîşanek serekî nîne -Nivîskar.

(35) *"Heywan bi awakî adîlane di nav Kurdan de nehatîye parve kirin. Em dibînin hinek kes xwedî hejmarek gelek zêde heywan in û gelek ji wan jî hene taqe bizinek wan nîne"* K. N. Simirnov: "Seferek bi Kurdistana Bakur de, sala 1904, Deng û Behsên Qafqas", beşê 17'an bi zimanê Rûsî.

mesela han meşhûr e ku axa ji gundî re dibêje:

*"Ez maqûl im lê tu kurmancê ser reş î"*[36].

Endamên eşîretê ji derveyî wan dîyarîyên ku pêşkêşî serokeşîrê xwe dikirin, hewce bû xerc û vêrgîya dewletê jî bidin. Du cure xerc li ser eşîretên mezin hebûn: Ji derveyî wan bac û vêrgîyên ku li ser heywan û çêrîngehan hatibû danîn, hewce bû eşîret eskeran jî bidin û hinek caran hemû îhtîyacîyên eskerî jî li ser bû. Wek nimûne hesp û cil-bergên hêzên eskerên siwarî li ser eşîretan bû. Gelek caran eşîret dihatin naçarkirin ber bi xizmeta eskerî de jîyana eskeran jî temîn bikin[37]. Cetvela hejmara 10 wê bac û xercê nîşan dide ku ji eşîretan dihat sitendin.

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Ji bo serîyek bizin û mî | | 0,5 | heta | 1 | qiran[38] | |
| " | " guhdirêj | 1 | " | 5 | " | |
| " | " dewarên mezin | 1 | " | 5 | " | |
| " | " yeksim | 2 | " | 15 | " | |
| " | " deve | 5 | " | 50 | "[39] | |

**Cetvela Hejmar 10**

Di destpêka sedsala 20'an de ku xercên eskerî li ser eşîretan bûn, di cîyê xerc û bacên axê de bi vî awayî seraneya heywanan didan:

Ji bo her serîyek bizin û mî: ji 0,75 heta 1 qiran

Ji bo her serîyek guhdirêj, ga, çêlek û mange (dewarên mezin): 10

---

(36) Z. Şemilov: "Di Derbarê Derebegî di Nav Kurdan de", bi zimanê Rûsî, Êrîvan, 1936, rûpel: 23.

(37) Di destpêka sedsala 19'an de, di şerê navbera Îran û Rûsyayê de ji sisîyan yekî ji hêzên Ebbasê Mîrza eskerên xeyrî eskerî (nîzamî) bûn, ku hemû Kurd bûn û Ebbasê Mîrza xerc û bac ji ser wan hildabû (B. Aviryanov: "Kurd", rûpel: 10). Di sala 1885'an de ji 35 hezar nefer eskerên Îranê 20 hezar kesên wan Kurd bûn.

(38) Wî wextî ruble 3,5 qiran bû.

(39) L. F. Tikranov, eynî serokanî, rûpel: 39.

qiran.

Pevguherînên tiştan jî di nav eşîretên nîvkoçer û eşîretên koçer de bi derecek berbiçav ber bi pêş de çûbû. Sebebê wê yê serekî jî ev bû, ku:

*"Berhemên eşîretên koçeran ên wek şîr, goşt, post, hirî, mû û her wiha rîs û xalîçe, cacim û. h. d. ji yên xelkê zêdetir bûn, ji ber vê ku malzemên wan ên seretayî zêdebûn roj bi roj bikaranînên xwe zêde dikirin. Ev yeka han bû sebebê wê ku cara yekem pevguherînên berdewamî peyda bin"(40).*

Ji derveyê xwedîkirina heywanan di nav eşîretan de, pîşesazîyên wek marangozî, hesingerî, colayî (berik, xalîçe, çuwal û.h.w.d. çêkirin-Elîşêr), tevindarî, raxistinî û çêkirina cilbergan jî ber bi pêş de çû û her yek ji wan eşîretan ji ber sebebê van guherînan karîn cîyek li zozan û cîyek jî li bingehên xwe yên zivistanê ji xwe re texsîs bikin. Eşîretan dikarîn tiştên xwe di riya zozan de, li cîyên xwe yên zivistanê yan li dor û berê zozanan bifroşin û lazimiyên xwe bikirin. Guherînên peran di nav Kurdan de gelek belav bû û wisa lê hat, ku serwet û perên serokeşîretên dewlemend bi hejmara serî-kerîyên pez nedihat muqayesekirin, belko hinek caran bi pere û zêr û zîv dihat hesab kirin.

*" Di nav eşîretên koçer de cara yekem guherînên pere ber bi pêş de çû. Ji ber ku berhemên wan tev tiştên guhertinê bûn, ku tesîr li guherîna raste rast dikir, vêca hemû jî li gel civakên bîyanî dan û sitendin hebûn, ku eva han jî alîkarîya kirîn-firotina berhemê dikir"(41).*

Peywendîya Kurdistanê bi bazara cîhanê re guherandinek girîng bi ser rewşa hundurî ya eşîretan de anî. Ji ber ku daxwaza (taleba) berhemên heywanan bû sebebê berbipêşdeçûna peywendîyên kirîn-firotinê di navbera eşîretan û dinya derve de û di vê rîyê re cihêbûnên mezin di warê pere û serwetê de di navbera

---

(40) F. Engels: "Serokanîya Aîle", çapa çekî, rûpel: 309.

(41) K. Marks: "Sermaye", cilda yekem, Londra, 1920, rûpel: 61.

endamên eşîretan de peyda bûn[42]. Her wî wextî şûn de li pey gerîna çêrîngehan zêde bû, ji ber ku zêdebûna kerîyên pez û dewlemendî hestê pêwîstîya bi ax û çêrîngehên zêde pêkanîbû. Ev mesela han hêdî hêdî bû sebebê vêketina problem û dijîtîyan di navbera eşîretan de û di netîca kêmbûna çêrîngehan de, serokeşîretan dest danîn ser çêrîngehan û kirin ên xwe.

Yek ji van netîcên pêgehîştina peywendîyên alûgor û kêmbûna çêrîngehan, ev yeka han bû ku hêdî hêdî eşîret niştecî bûn. Di dawîya sedsala 19'an û destpêka sedsala 20'an de niştecîbûna eşîretên Kurdên koçer û durustkirina gundan bi awakî nedîtî pêş de çû. Sala 1925'an komîsyona Komela Gelan ku hatibû şandin Kurdistanê , di rapora xwe de dibêje...niha nêzîkî piranîya temamê Kurdan niştecî bûne[43] û beşek kêm nebe li ser sinorê navbera Îraq û Îranê, koçer nemane, ji ber vê niha bi tu awayê nabe ku Kurd koçer bên binavkirin[44].

Di navbera wan herdû şerên cîhanê de hukumeta Îranê sîyaseta niştecîkirina eşîretên Kurdan a bi zorê da ber xwe. Vê sîyaseta han netîcên gelek zêde xirab ji Kurdan re anî: deh hezar kes ji endamên Eşîreta Celalî, ku li ser sinorê Îran, Tirkîyê û Yekîtîya Sovyet dijîyan birin li naverasta Îranê bi cî kirin, sala 1941'an tenê ji van çend sed kes vegerîyan cîwarên xwe, yên din ji holê hatibûn rakirin. Bi şev di mizgeft û tewlan de dihatin hepskirin û bi roj jî bi darê zorê bi wan kar dihat kirin[45]. Bi vî awayî niştecîkirina Eşîreta Lor "nav û dengê" General Ehmed Axaxan

---

(42) Hinek serhejmarên destpêkî ji me re wisa didan nîşan, ku *"di dawîya sedsala 19'an de ji sedî 32,5'ê endamên eşîretên koçeran xwedîyê qet tu pez û dewaran nebûn û ji sedî 17,5'ê wan jî xwedîyê qet tu awayî heywanan nebûn"*. (G. Akopov; "Di Warê Cîgirbûna Netewa Kurd..".

(43) A.Lambton, Landlord..., p.290.

(44) Wilçîvskî bi şaşîtî dibêje: *"Tenê li navça Mahabad (di nav Kurdên Mukrî de) 100-140 hezar koçer hene"*. L.Wilçivski: "Kurdên Mukrî" Li Civak û Bingeha Etnografya Asya Nêzîk, bi zimanê Rûsî, cilda yekem, Moskova, 1058, rûpel: 183 -Nivîskar.

(45) Gelawêj: "Peywendîyên Zîraetê li Kurdistana Îrana îro", bi Azerbeycanî, Baku, 1955, rûpel: 66.

derket, û heta naznavê "Qesabê Loristanê" lê hat dan. Li gel Eşîreta Gelbax jî her bi vî awayî hat kirin, ew jî ji Kurdistanê hatin rakirin û şandin Hemedan û Îsfehanê û heta Yezd a naverasta Îranê û hukumetê grûbek Tirkmen di cî û warê wan de bicî kir.

*"Di van veguhestinan de ewqas ezîyet û îşkence dan wan, ku çendîn meh serî hildan, di pal û çîyan de şer kirin"*(46).

Aşkera ye bi vî awayî niştecîkirin bi tu awayî li gel parastina qazanca rojên bên a eşîretên Kurdan bi rê nediket, belko ev guheztinên han ên bi zorê tenê ji bo qazanca burjuwazîya Îranê bûn, ku pêwîstî bi bazarek "cîgirtî" hebû û dixwest ew yekcarî niştecî bibin û wê bazarê bi wan pêk bînin. Qaçaxîya bazirganî ya derveyê sinor û kirinên hukumeta merkezî ya Îranê eşîretên Kurdan naçar kiribû ku hemû lazimiyên xwe di nav welat de bikirin. Ji ber ku nedikarîn ji derve bînin(47) Îranîyên xwedî milk ên li Kurdistanê û her wiha Kurdên xwedî milk jî qazanca wan di van niştecîkirinan de hebû, ji ber vê sebebê ku gundîyan bi axa xwe ve girê didan. Ji bo karbidestên dewletê jî zêdebûna warîdata dewletê ji bac û xercan û gumrugê di vê hêlê de girîng bû û dîyar e ji bo bacgirtinan jî wiha rehetir bû, ku wezîfa xwe di gundan de cîbicî bikin, ne di wan cîyên bilind ên Kurdistanê de bi pê eşîretan kevin. Qazanckirina bazirganîya derveyî sinor û pêşîgirtina çûn û hatina eşîretan, bû sebebê kêmkirina kaçaxîya tiştên bîyanî û zêdebûna warîdata dewletê ji gumrugê. Ji derveyê vê nivîsandina xortan ji bo xizmeta eskerîyê ku nû hatibû damezrandin, ji wê yekê rehettir bû ku ew eşîret koçer bûna(48).

Piştî parvekirina dawî ya Kurdistanê û girtina sinorî, bi tay-

---

46) A. Lambton, Landlord..., p. 285.

(47) H. Moltake, Briefe über Zustande und Begebenheiten in der Turkei aus den Jahren 1835-39 Berlin 1941, pp. 277,279. Ji kitêba Nikitine, Les Kurdes.., p. 186, hatîye wergirtin.

Pêwîst e bê gotin ku eşîretên koçer ên Kurd heta Şerê Cîhanê yê Yekem sinoran tiştek girîng nedizanîn -Nivîskar.

(48) Eşîretên Kurdan ji sê tiştên şaristanîyetê ya nû serxweş nebûn; xizmeta eskerî, xerc û bac û gumrug.

betî yê di navbera Îran û Tirkîyê de, riyên eşîretan ên di navbera zozan û şûnewaran de hatin girtin. Ji ber ku piştî cîbicîkirina van herdu pêgavan, eşîretên nîv koçer ku bingehên wan ên zivistanan bi ber welatekî û yên havînan jî bi ber welatekî din ket, yan bi carekê de derbazbûna ji sînor li wan hat qedexekirin, yan naçar bûn perekî gelek zêde bidin ji bo van cîyan. Piştî kêşana xeta sînor, hat dîtin ku eşîretek di navbera du yan çend welatan de hatîye parvekirin. Wek Eşîreta Herkî, ku bi ser Îran, Tirkîyê û Iraqê de belav bûn, Eşîreta Şikakan jî di navbera Tirkîyê û Îranê de hat parvekirin. Lê hinek hel û mercên maddî niştecîbûna eşîretên Kurdan demekê bi paş de xist: Yekem, mehrumbûna ji hel û mercên li bar ji bo xwedîkirina heywanan yên wek ji çêrîngehên baş, av, hewaya xweş û.w.d..Vê hel û merca han eşîretan han dida (teşwîq dikir) ji bo ber bi wan cîyan ve bar bikin, ku av û hewaya xweş û çêrîngehên baş hene. Duyem, axên kêm ên avî (berav) û tunebûna dezgên bi ser û ber ên avdanîyê yên wek co, bend ku di Kurdistanê de şerteke çandinîyê ye. Ji derveyî van, sebebên aborî jî hebûn, ew jî ev bûn ku nedixwestin biçin bin bandorîya dewletê û her dem di koç û koçerîyê de bin. Lê ev sebebê han piştê cîgirtina dewletê û bihêzbûna merkezîyeta dewletê hêdî hêdî kêm bû. Li gor van tiştên me behs kirin ronî dibe ku ji bo çi di destpêka Şerê Cîhanê yê Yekem de, hejmarek kêm nebe, eşîretên koçer li ser sinorê Îran û Iraqê nemabûn.

Îro eşîretên koçer gelek kêm in û wek di cetvela hejmara 11 an de derdikeve, hejmara gundên wan û daniştiyên gundên wan di van sedsalên dawîyê de gelek zû zêde bûne.

| | Hejmara gundan | | Hejmara daniştiwanan(49) | |
|---|---|---|---|---|
| Melbend | Sala 1851 | Sal 1951 | Sala 1851 | Sala 1951 |
| Bane | 8 | 161 | 1125 | 15.000 |
| Merîwan | 14 | 111 | 1040 | 17.800 |
| Hewraman | 9 | 121 | 605 | 9.250(*) |

**Cetvela Hejmara 11**[50]

---

(49) Hejmara bi hev re ya xêzanên her malekê pênc kes hatîye hesab kirin û serokanîyên eslî tenê hejmara malan nîşan didin -Nivîskar.

Niha li Kurdistana Îranê 7.500 gund hene[51], ku hinek ji wan biçûk in û ji 5 heta 10 malan pêk tên. Hinek wan jî mezin in û hezer heta du hezar mal tê de dijîn. Gundê navîn ê Kurdî bi gelemperî ji 50 heta 100 mal e. Madem wiha ye, em dibînin ku sevîya navîn a nifûsa gundên Îranê 368 kes e[52], tê dîtin ku piranîya nifûsa Kurdistanê (2 mîlyon 760 hezar kes, yanî %93'ê) niştecî ne. Ev yeka han nayê wê manê ku peywendîya eşîretî di nav wan de nemaye, eşîret û peywendîya eşîretî niha jî heye, lê niştecîbûna eşîretan dike hêdî hêdî van peywendîyên han ji holê rake. Ji ber ku serokeşîr, ne tenê dest datînin ser çêrîngehan, her wiha axên kêlayî (ajotî, kolayî) jî îşgal dikin û dibin xwedî milkekî derebeg û ew axên ji alîyê dewletê ve ji eşîretan re hatîye dan, hêdî hêdî dibin milkên taybetî yên serokeşîretan.

Ev bûyera han gelek berî nîvê sedsala 19'an destpê kirîye û bingeha wê diçe digihîje wan peywendîyên derebegî yên ku di sedsala 16'an de peyda bûne. Lê wek me dît qonaxên pişt re hinek karekterên taybetî tê de hebûn ku dikarîn tesîrek li ser bikin û ber bi pêş de bibin. Di wan çend sedsalan de ku eşîret niştecî bûn, sê cure peywendîyên derebegî bi hev re hebûn:

1-Awayê çandinî, ku di nav eşîretên niştecî de belav bûbûye.

2-Awayê têkelî ku di nav eşîretên nîv koçer de hebûye.

3-Awayê xwedîkirina heywanan ku di nav eşîretên koçer de hebûye.

Ev sê awayên han her sê jî li ser aborîya tabîî bûne ku bingeha berhemdarîyê lazimiyên nav malê bûn. Derbazbûna ji awayê koçerî ser bi awayê nîv koçerî demek dirêj kêşaye û tê xuyakirin ku awayê koçerî li Kurdistanê heta derecekê zêde cîgir û rûniştî

---

(*) Di sala 1967'an de hejmara gundên Bane gihîştibû 203'an, ku 28.080 kes tê de dijîyan û hejmara gundên Merîwan û Hewraman bi hev re gihîştibûn 290, ku 84.177 kes tê de dijîyan -Nivîskar.

(50) 'E.Gelawêj, eynî serokanî, rûpel: 68.

(51) (Ev nota binî ya han di orîjînalê kitêbê de nîne -Elîşêr)

(52) Hejmara navîn li gor lêkolîna serokanîya pêşî ya "Îrana Îro" hatîye çêkirin -Nivîskar.

bûye. Lê ew awayê jîyana ku di nav eşîretên nîv niştecîyan de heye, zû derbazbûne ser awayê jîyana eşîretên niştecî. Ji ber ku awayê jîyana nîv niştecîtî gelek muhkem nebûye.

Guherîna awayê jîyanekê ser bi awayek din bi vî awayî ye: Eşîretek koçer axa eşîretek din îşgal dike, yan dikire û dike bingeha havîn û zivistana xwe, di navekê re ji derveyê van herdu bingehan, cî ji xwedî milkên taybetî, yan ji dewletê kirê dikirin. Hêdî hêdî wisa lê hat ku beşek ji eşîretan havînan jî li bingehên xwe yên zivistanan man û paşê jî cî diguherin û bi vî awayî eşîret dibû nîv niştecî. Hinek caran beşek ji eşîretên nîv niştecî li bingeha zivistanan û beşek din li bingeha havînê rûdiniştin, di vî haletî de pez û dewarên wan eşîretan li zozan û cîwaran diman bê wê ku biçin zozanan û vegerin binecîyên xwe. Di herdu haletan de tenê çend kes ji endamên eşîretê bi pez û dewaran re mijûl dibûn û di qonaxa dawîyê de hejmara wan ên bi pez û dewaran re mijûl dibin, hêdî hêdî kêm dibûn, heta wisa lê dihat ku çend kes agahdarîya hemû pez û dewarên eşîretê dikirin û yên din hemû niştecî dibûn. Bi vî awayî dibûn sê grûb:

1-Ew derebegên xwedî milk ku ax, çêrîngeh û heywanên wan hene.

2-Ew gundîyên ku niştecî ne û axa xwedî milkan dikêlin.

3-Şivan.

Peywendîyên eşîretî di qonaxa koçerî de heta sedsala 19'an jî bi hêz bûn, lê di qonaxa nîv niştecîbûnîyê de hêdî hêdî bê hêz bû û di qonaxa çandinîyê de, ku hêdî hêdî peywendîyên cotkarî damezran, qasek şûn de bi hindikî nebe peywendîya eşîretî nema.

## 4- Guherîna Terkîba Aborî

Dabeşbûna kar û milkîyeta taybetî, bûn sebebê dabeşbûna eşîretê bi du beşan; dewlemend û feqîr, yanî derebegên xwedî milk, gundî û şivanên bindest. Êdî slogana "azadî, wekhevî û biratî" ku peywendîya eşîretî li ser hatibû damezrandin, bi tevayî bê qîmet bû û yekîtîya di navbera erk û maf li ber hev raketin. Peywendîya eşîretî hilweşîya. Jihevcihêbûn û veqetandina gundîyan bi bê westan berdewam bû. Heta wisa lê hat ku mafên

wan bûn yên serokeşîr û derebegan û berpirsiyarîyên wan jî ketin ser milê endamên eşîretê.

Dema ku Kurdistan bû beşek ji bazara cîhanê, di pratîkê de milkîyeta eşîretê li ser wan axên ku ji wan re hatibû dîyarkirin hilweşîya û milkîyeta taybetî cîyê wê girt. Heta di wî halî de jî ku eşîret niştecî bûye û berî ku mijûlê çandinîyê bûye serokeşîret bûye xwedî milkê derebegî û endamên eşîretê bûnê cotkarên fermanber.

Wisa bû ku gundî bi eşîretan piştsitûr bûn û wek gundîyên din kirîn û firotin li ser wan tunebû, lê riya wan jî nedihat dan ku bi azadî ji cîyê xwe bar bikin(53).

Li gel parvekirina kar, bûyerek girîng a din jî peyda bû, ku ji cihêbûna pîşesazîyê ji zîraetê pêk hatibû. Bi vî awayî ku pîşesaz li bajaran rûnişt, hêdî hêdî bû grûbek girîng ji daniştiyên welat. Di milekî din de jî hatina lehîya malên (kelpelên) bîyanî, bû sebebê têkçûna hejmarek ji pîşeyên (sen'etên) hundur ên Kurd, lê parvekirina kar alîkarîya bihêzbûna bazara nav xwe kir. Lenîn di vî warî de wiha dibêje:

*"Berbipêşdeçûna parvekirina civakî ya kar qonaxa esasî ya nuveyên pêkhatina bazara nav xwe ya sermayedarîyê ye"*(54) .

Peywendîya Kurdistanê bi bazara cîhanê re her wek hemû wan welatên ku di hêla aborî de paşvemayî ne, hinek karekterên xwe yên taybetî hene. Çimkî bazirganî li gel bazara cîhanê bi awakî raste rast nebûye, bi wasita bazirganîya Faris, Tirk, Ermenî û Rûsya bûye. Bi vî awayî bazirganên mezin li Stenbol, Heleb û Tiflîsê berhemên hundurê welat ji bazirganên biçûk ên Kurd dikirîn û hinek car bi wasita wekîlên xwe yên taybetî raste rast bi xwe ji berhemdaran dikirîn û pişt re difrotin bazara cîhanê. Bazirganên Kurdan tiştên bîyanî jî raste rast bi xwe re nedianîn. Her

---

(53) Gundîyên Kurdistana Îranê heta şoreşa 1907-1911 'an, eger bixwestina ji gundekî biçin, dibû perek bidana axa heta ku riya barkirinê bidê. Li navça Gerûs û Kurdistan (yanî navça Sine -Nivîskar) adet wisa bû ku gundî ji bo guherîna axa xwe hewce bû 30-80 qiran bide. (M. Cemalzade: "Gincî Şayegan" bi zimanê Farisî, rûpel: 21.

(54) V. I. Lenin: "Pêşdeçûna Sermayedarî", rûpel: 26.

çendîn burjuwazîya bazirganî ya Kurd gelek zû ber bi pêş de çû, lê cardin pişta xwe bi bazirganê netewa desthilatdar ve girê dabû. Heta îro jî rewşa wan her bi vî awayî ye.

Pêwîst e bê gotin ku ew peywendîya xurt a derebegî ku li Kurdistanê hebû, astengek bû li ser riya berbipêşde çûna bazara hundur, ji ber ku berî hemû tiştekî awayê berhemdarîya tabîî heta derecek zêde di warê berhemanînê de belav bû, ku tesîrek vê ya xirab ji bo berbipêşdeçûna bazarê heye.

*"Civak, di wextê berhemdarîya tabîî de ji çend bingehên aborî yên wek hev pêk tên (wek xêzanên cotkar ên patriarki, civakên gundî yên destpêkî û aborîya derebegayetî) û her yek ji van bingehên han çendîn curekarîya aborî bigrin ser milê xwe, her ji derxistina maddên destpêkî ve bigre, heta bigihîje awayê dawîyê, ku berhema madê bikaranîn û mesrefkirinê dibe"*(55).

Bi rastî tenê mîktarek kêm hindik berhemên sanayîyê ji derve dihat anîn. Ji ber ku beşê zêde qumaş û pêlav (sol) di nav xwe de durust dikirin. Vê carê ji ber bindestîya giran, taqeta kirînê ya gundî û şivanan gelek kêm bû û îmkana beşê zêde ji daniştiyan tunebû tiştên bîyanî bikrin. Ji derveyî van şerê dirêj ê di navbera Rûsya Çarîtî û Iranê, Rûsya Çarîtî û Tirkîyê de, bêemînîya rîya karwan û qefîlan jî, pêşî berbipêşdeçûna bazara hundur û peywendîya bazirganîya li gel welatên din girt. Her ev yeka han tenê bes e ku riya hatin-çûna taybetî ya rîya hesin bi wî awayî pêwîst nebû, bi taybetî li melbendên çîyayî, ku beşê piranîya Kurdistanê digre û di dîroka Kurdistanê de jî piranîya îxracata hundur di wan de ye. Ger wiha be ecêb nîne ku dereca sevîya bazirganîyê li navça Kirmaşan, Sine û Mahabadê, ku hejmara nifûsa wan digihîşt mîlyonekê, serê her kesekî tenê sê rûble bûne[56].

Di eksê van hemû asteng û kospan de jî cardin peywendîya Kurdistanê bi bazara cîhanê re, bû sebebê peydabûna çînek nû ya bazirganê biçûk û faîzxwerê Kurdan, yanî burjuwazîya nû ya Kurd kemilî. Her çendîn ev burjuwazîya han bê hêz bû û pişta xwe bi

---

(55) Eynî serokanî, rûpel: 25

(56) M.Wasilkovski, serokanîya navê wê derbazbû, rûpel: 27, 465, 65.

burjuwazîya netewa serdest ve girêdabû jî.

Ev guherînên ku me behs kirin, wek niştecîbûna piranîya eşîretên Kurdan, cihêbûna pîşesazî ji çandinîyê, peydabûna bajaran, berhemanîna tiştan a zêdetir ji bo bazarê û ew ferqîtîya çînîtî ku li gundan peyda bû, hemû bûyerên nû bûn, ku di sedsala 19 û 20'an de ketin nav civaka Kurdistanê. Lê ev hemû guherînên han her çendîn gelek jî girîng in, nekarîne peywendîya derebegî di warê çandinîyê de di gundên Kurdistanê de ji holê rakin.

Şoreşa 1907-1911'an nekarî armanca xwe bicî bike û guherînên pişt re jî kûr û fireh nebûn û nekarîn bingeha peywendîya çandinîyê biguherînin. Rewşa şoreşgêrî û serîhildanên piştî Şerê Cîhanê yê Yekem jî qet guherînek bi ser vê rewşê de neanî. Wek nimûne di sala 1928'an de li Îranê qanûnek di derbarê tapûkirina hemû axan de derket, ku tê de wiha dibêje:

*"Qîmeta axê deh carî yek ji sisîyan berhemê li ser hev ên sê salên dawî ya axê ye".*

Yanî qîmeta axê bi berhemê deh salan a axê hatîye hesêb kirin (57). Aşkera ye tu gundîyî nedikarî axê bi wê qîmetê bikire, ku berhemê deh salan ê axê ye.

Bi vî awayî padîşah, derebeg û serokeşîr tenê nebûn xwedîyê qanûnî yên wan axan ku di pêş de milkê wan ên taybetî bûn, her wiha bûn xwedîyê qanûnî yên wan axan jî ku ji gundîyan kirîbûn, yan bi hezar hîle-pêlan ve ji destê wan derxistibûn.

Ew yek tenê bes bû ku ew kes şahîdek derew, yan tapûyek derew bi îmza melayekî (ku dîyar e bertîl dabe) bîne, ji bo wê axê bi resmî li ser xwe bide nivîsandin. Gelek caran derebegan gundîyên nexwenda bi vî awayî dixapandin, tilîya wan li tapuyê dixistin ku tê de dihat nivîsandin ev axa ku di destê min de ye, ya axa ye. Gundîyên devgirêdayî jî tilîya xwe lê dixistin, bê wê bizanibin

(57) "Qiwanînî Mesûbeî Meclisî Şurai Millî", cilda şeşan, rûpel: 3-4, bi zimanê Farisî. Pêwîst e bê gotin ku qîmeta axê li Îranê li gor qazanca deh salan a axê hatîye hesêb kirin û heta niha jî ev adeta han li Kurdistanê, ku banka û pere deyndan (qerdan, qerzdan) bi faîz rûneniştîye, her maye - Nivîskar.

ka çi îmza dikin. Ji ber ku wextê derketina qanunê, gundîyên çîyan tiştek jê fam nedikirin, dema ku ji wan re dihat gotin êdî her tişt derbaz bûbû ku axa wî milkê axa hatibû nivîsandin. Serokeşîretan jî her di vê riyê re dest danîn ser milkên eşîreta xwe, ewan jî bêyî ku endamên eşîretê tiştek bizanin, hemû ax li ser navê xwe dabûn nivîsandin.

Bi vî awayî milkîyeta muşterek wek awakî milkdarîya axê ji holê rabû û niha ji milkê têkel û paşvemayîyek gelek kêm û ne li hinek navçan be, nayê dîtin. Niha li Kurdistanê ev pênc awa milkdarîya axê hene:

1- Milkîyeta axayan.
2- Milkîyeta padşah (Şah).
3- Milkîyeta dewletê.
4- Milkîyeta weqfê (ayînî).
5- Milkîyeta gundîyan(58).

---

(58) Rewş li Kurdistana Tirkîyê û Iraqê hinek cihê ye. Dîyar e li wir milkîyeta padşayî nîne. Lê milkîyeta dewletê gelek zêdetir e. Her çendîn gundîyên Kurdistana Tirkîyê ji gundîyên Kurdistana Îranê zêdetir xwedî ax in, lê cardin jî milkîyeta derebegî li Kurdistana Iraqê û Tirkîyê bi awakî serekî milkîyeta axê ('erd) ye - Nivîskar.

FESLA ŞEŞAN

# AWAYÊN MILKÎYETA AXÊ

Zanyarîyek kêm di derbarê parvebûna axê di navbera grûbên cur bi cur de di dest de heye. Yên di derbarê navçên cihê yên Kurdistana Îranê de ne, zanyarî bi vî awayê xwarê ne:

| Milkê xwedî milkan | Milkê dewletê û Şah | Milkê mewquf | Milkê eşîretan | Milkê gundîyan |
|---|---|---|---|---|
| %78(1) | %10 | %2 | %2 | %8 |

**Cetvela Hejmara 12**

Li ser Îranê bi gelemperî evqas hatîye zanîn, ku dîyar e di derbarê Kurdistanê de jî rast e, nîşan dide ku zêdetir ji %60'ê aîlên gundîyan ne kêm û ne zêde, axa wan tune û ji %23'an jî ji hektarek

(1) Ansîklopedîya Mezin a Sovyetê dibêje %66-70'yê axa Kurdistana Îranê di destê derebegan de ye.

kêmtir axa wan heye[2]. Li gor vê ji %56'ê axê di destê %1'ê nifûsa gundan de ye. Hewce ye em vê yeka han jî jibîr nekin ku piranîya xwedî milkan li gundan rûnanin û ew xwedî milkên ji %38,8'ê axê di destê wan de ye, tenê ji %0,2'yê nifûsa gundan pêktîne.

## 1 - Milkên Xwedî Milkan

Wek me di pêş de got, milkê xwedî milkan digihîje %78'ê hemû axên avî (berav). Esasê vê milkîyeta peywendîya derebegî û bêgûman di Kurdistanê de awayê serekî ya milkîyetê ye. Em dikarin xwedî milkan bikin du grûbên girîng:

a) Xwedî milkên mezin ku heryek ji wan zêdetirî gundekî wan heye û ya hîn ji wan jî digihîje 100 gund û hîn zêdetir jî. Ji %80'yê milkên xwedî milkan ên Kurdistana Îranê di destê vê grûba han de ye.

b) Xwedî milkên navendî zêdetirî gundek destê wan de ye.

Li Kurdistana Îranê nîsbeta milkê xwedî milkên mezin, hem li gel mîqyasa xwedî milkên biçûk û hem bi ser hev de li gel mîqyasa axê, ji navçê heta navçê ferq heye: li navça Urmiyê, Serdeşt û Bane ku gundîyên dewlemend beşek zêde ax di destê wan de ye, nisbeta axa xwedî milkan nizmtir e. Li navçên din ên wek navça Miyandiwaw, Sine û Kirmaşan nisbeta wan bilintir e û li hinek cîyan digihîje ji %90'ê hemû erdê. Li van navçan tevan axên birijtirîn (bertirîn, berekettirîn) ên navçê û baştirîn serokanîyên avan jî di destê wan dene.

Ew kesê ku xwedî gundekî ye, her wext xwedî milkê navendî nayê hesêbkirin, ji ber ku gelek caran gund ji çend malan pêk tên û bi dehan hektar axa wî heye. Ev cure gundên han li hemû melbendên Kurdistanê pir in. Di vî halî de pêwîst e ev xwedî milk wek xwedî milkê biçûk bên hesêbkirin ne xwedî milkên navendî. Hinek caran jî tenê xwedî gundek xwedî milkê mezin tê hesêbkirin, ev jî dema ew gund ji 500'î heta 2000 mal be, yan ji 500'î heta 1000 hektar axa wî hebe. Ev cure gundên han jî di Kurdistanê de kêm

(2) Iran Today, 1950 Tehran, p. 61

nînin. Madem wiha ye eger em bixwazin em dikarin ferqîtîya di navbera xwedî milkên mezin û navendî de nîşan bikin, wê demê hewce ye em bêjin xwedî milkên mezin ew e, ku bi kêmasî 300 hektar axa wî ya avî heye(3).

Mezintirîn xwedî milk li Kurdistanê grûbek gelek kêm e ku hinek binemalên Faris û Azerbeycanî jî di nav de hene. Li melbenda Makoyê:

*"Beşê zêde axa kêlayî ya çend kesên xeyrî Kurd e, ku li Tehran, Paris û Londra rûdinin"(4).*

Ji xwedî milkên dewlemend ên Kurdistana navîn û xwarê ku em dikarin Qubadîyan, Asefwezîrî, Senendejî, Emîrahtşamî, Palîzî, Zengene û Efşar bihejmêrin, her yek ji van nêzîkî 100 heta 400 gundan heye, yanî nêzîkî 10 hezar heta 50 hezar hektar ax dike. Di dawîya sedsala 19'an de derebegek tenê bi serê xwe ji 250 gundên melbenda Kirmaşanê xwedîyê zêdetirî 100 gundan bû(5).

Li Kurdistana Îranê desthilatek (îqtîdarek) zêde di destê derebegan de heye. Ew gundîyan re'eyata xwe dizanin û desthilata xwe wek şêx û serokeşîretan bi awakî nerewa bikartînin û gelek bi tundî xelkê di bin dest de digrin. Ji ber vê jî ku eger peywendîya eşîretî di nav wan de hebe, dikarin vê bindestî û perçiqandina tundî a li ser endamên eşîretê, di bin perda "serokatîya bab-bapîran" û "parastina qazanca eşîretê" de veşêrin. Heta niha jî piranîya endamên eşîretê derebegan serok û şêxên xwe dizanin û li ba wan wisa ye, tim li ber emrê wan bin û rêzê (îhtîramê) ji wan re bigrin. Xwedî milk, merkeza ayînî wek şêx yan serokê terîqetê ji bo pêşîlêgirtina gundîyan û tefandina problema çînîtî bikar tînin. Pêwîst e bê gotin ku derebegên xwedî milk pişt û pala serekî ya

---

(3) Ev nîsbeta han li melbendên cuda cuda tê guhertin. Wek nimune ew kes li melbendek wisa be 200 hektar axa wî hebe, ku xwedî milkê dewlemend hezar hektar di dest de hebe, divê xwedî milkê navîn bê hesab kirin, lê li melbendek ku piranîya axê di destê gundîyên dewlemende be, xwedî milkîyetek mezin tê hesab kirin - Nivîskar.

(4) Duoglas: "Welatek Dûr û Gelekî Dost" rûpel: 68.

(5) H. Binder, Au Kurdistan, en Mesopotamie en Perse, Paris 1887, p. 351.

hukumeta kevneperest a merkezî û emperyalîzmê ne û rêvebirina hukumetê jî di destê wan de ye û derecên payebilind di hukumetê de dagîr kirine. Ger wiha be tiştek tabîî ye, ku desthilata xwe dijî gel û bi taybetî li dijî gundîyan bikar bînin.

Li gel pêşdeçûna peywendîyên bazarê, derebegên Kurdistana Îranê rolek din jî girtin destê xwe; xwedî milk bû faîzxwer (tefecî), tov û pere bi şertên gelek giran bi deyndarî dide gundîyan. Hinek caran xwedî milk bazirganîyê jî dike û di vî halî de ji xwe re berhemên heywanan ji eşîretan dikire û dibe bajêr. Bi kurtî gelek caran derebeg hem serokeşîret hem şêx, hem bazirgan û hem jî desthilata sîyasî di dest de ne. Sebebê tev vê desthilata derebegî ya Kurd jî her ev e. Serokanîya desthilata wî tenê ew milk nîne ku werdigre, her wiha fermanrewatîya sîyasî û aborî ya li ser gundîyan dibe yek. Bi vî awayî derebeg axayê hemû melbendê ye û axatîyê li ser gundîyên serbixwe û xwedî milkên biçûk jî dike.

*"Nifûza derebeg wek hemû wan mezinatîyên din bi wan milkan ve nîne ku dikeve dest, belko li gor hejmara re'eyatîyê ye û ev jî ji xwe re bi hejmara wan gundîyan ve girêdayî ye ku milkê wî bi xwe heye"*(6).

Pêwîst e behsa vê rewşa han a taybetî jî bê kirin ku peywendîya eşîretî ji bo wan derebegan ku di nav eşîretê de serokê taîfe û qebîlan in, dibe sebebê wê ku li dijî gundîyan yek û du bigrin. Ew di akar û kirinên xwe de li dijî gundîyan bi tevayî yekdeng û yekgirtî ne. Wek nimûne derebegên eşîreta "Gewrk" ku li melbenda Mahabadê bi dehan gund di destê wan de ye, li ser vê yekê rê ketibûn, ku eger derebegek gundîyekî derkir, ên din di tu gundên xwe de rê nedinê. Ev yeka han nîşan dide ku serokeşîret û derebeg di warê aborî û sîyasî de li dijî gundîyan in.

Desthilata derebeg, bi giştî li ser riya pêşdeçûna çînîtî û pêşketina civaka Kurdewarî astengek mezin e.

Li Kurdistanê tenê derebeg xwedî milk nînin, her wiha bazirgan û faîzxwer jî her yek di rîyekê de karîbûne ax ji gundîyan dagîr bikin yan bi qîmetek erzan ji destê wan derînin.

Ew xwedîyê milkan ku hinek ji wan hem derebeg hem serokeşîr hem şêx hem faîzxwer û bazirgan in, karekterek wan a taybetî jî

---

6) Karl Marks: "Sermaye" cilda heştan, London, 1920, rûpel: 741.

heye, ew jî ev e, ku ji derveyî şêxan yek ji wan li gundan rûnanin. Hinek ji wan havîn û payîzan ji bo çavdêrîya genim û bêderan (bênderan) tên gundan, lê piranîya wan riya xwe bi gund naxin û her li bajaran û bi taybetî li Tehran, yan hinek caran li welatên derve yên wek Avrûpa û Amerîkayê dijîn. Di cîyê xwedîyê milk de mubaşirek wî heye ku nunerê wî yê raste rast e, yan jî muxtar kar û barê wî bi rê ve dibe.

Çiqas ji destê mubaşir bê ewqas zêde zilmê li gundîyan dike û diperçiqîne. Ew, her karê wî bi wî yekî ye ku milkekî zêdetir bi destê wî bikeve. Hinek caran tenê ewqas dide xwedî milk ku sevîya navîn a milkan e û ya din ji xwe re hiltîne. Her ji ber vê li Kurdistana Îranê gelek caran tê dîtin ku mubaşir piştî demekê dibe xwedî milk.

Ev awayê han jî belav e ku xwedî milk axê ji bo demeke sê sal yan şeş sal bi îcare dide bazirgan û delalên bajêr. Dîyar e ev yeka han tiştekî ji peywendîya derebegî ya gundan naguhere. Sevîya wan milkên ji xwedî milk re tên dan, li gor rûyê berhemê sala borî têt hesêb kirin û li ser vê bingehê îcaredar bi hemû îmkanên xwe ve têdikoşe ku derewek zêdetir bike û gundîyan bişelîne, bi bêyî wê ku qet sermayekê têxe kar, yan metodek awayê nû bikar bîne.

Bi vî awayî jî heye, ku xelkê gund û bi taybetî xwedî milkên navîn û gundîyên dewlemend ji bo salekê, yanî ji baharê heta payîzê axê îcar dike. Di vî halê han de tenê giringî dide ser berhem û gelek car mimkun e ku di netîca hişkesalîyê de îcaredar tûşî zîyanek zêde dibe.

Bi vî awayî jî mimkun e ku ax ji sermayedarên wisa re tê îcar dan ku ev axên han li ser milê wan karkeran têt ber berhemê, ku ji melbendên dûr bi taybetî yên wek Azerbeycana Îranê ve ji bo karkerî tên. Ev awayê han jî li navça Urmiyê û Miyandiwawê û bi taybetî ji bo berhemên sanayîyê tê bikar anîn. Di vî halî de bikaranîna ziblê kîmyevî û makînên çandinî yên nû jî belav e.

## 2 - Milkên Dewletê

Milkîyeta dewletê bi vî awayî piştî şoreşa 1907-1911'an peyda bû. Berî vê padîşa xwedî selahîyeta bê sînor bû û axa dewletê bê lam û cîm hemû milkê wî bû. Li Kurdistana Îranê bingeha axa

dewletê milkê wan kesan e ku li dijî hukumetê şer kirine û dest bi ser milkê wan de hatîye girtin[7].

Riza Şah (1925-1941) li hemû Îranê bi taybetî li dor û berê Kirmaşan dest bi ser ax û zevîyên dewletê yên herî baş de girt. Beşeke din ji axa dewletê jî serokeşîretên niştecî û derebegên mezin dest danîn ser. Wek me di pêş de got ax pêşî yê bi awayê "tîwl" ji eşîretên koçer re hatibûn dan û pişt re bûn milkê dewletê. Eşîretan di cîyê ax wergirtinê de esker didan dewletê. Piştî sala 1930'an eskerîya îcbarî gihîşt Kurdistana Îranê, serokeşîrên niştecî û derebegan beşek zêde axan îşgal kirin[8]. Niha milkê dewletê digihîje nêzîkî %4'ê hemû axên kêlayî yên Kurdistana Îranê û piranîya van axan ketine navça Mêrgever û Tirgeverê (ku nêzîkî 100 gundan e), li Miyandiwaw û Kirmaşanê jî şeş gundên dewletê hene û heta sala 1933'an tam sed gundê dewletê li melbenda Piştko hebûn, ku pişt re Riza Şah dest danî ser. Li nêzîkî Newtîşa jî çend gundên dewletê hebûn ku pişt re bûn ên Eşîreta Sencabî.

Peywendîya cotkaran û dereca wan milkên ku dewlet dixe ser re'eyan, gelek dimîne bi rewşa milkên taybetî. Karbidestên milkên dewletê bi vî awayê xwarê ber bi xebatê de diçin; yekem, nunerê dewletê wezîfa mubaşir ji ser milan hiltîne û beşek ji milkan li gor adet û cîyê melbendê dide hukumetê. Duyem, dewlet her sal beşê milkê xwe tîne ber firotinê û tu qîmetek bi milkan nade. Sêyem, hinek caran dewlet milkên xwe ji bo demek dirêj (3-6 sal) dide îcare, êdî îcaredar wek milkê xwe li ser kar dike û ji ber vê hewil dide çendîn ji destê wî bê, ewqas berhem ji erdê hilde, ku ev jî dibe sebebê perçiqandin û mêtina zêde ya gundîyan. Gelek caran mimkun e ku îcaredar kur yan nevîyê (torinê) xwedîyê eslî yê wê axê be, di vî halî de peymanek taybetî li gel

(7) Wek nimûne li Tirgever û Mergever li rojavayê Urmê, milkê ku şêxên Şemzînan (ku nevîyê Şêx Ubeydullah in) dest danîne ser tam sed gund in -Nivîskar.

(8) *"Li Kurdistanê gelek melbend milkên xezînê bûn, lê çend beş jê hatin firotin û çend beşên din jî xwedîyê axên cînar dest danîn ser, niha çend melbendwên kêm nebin di destê dewletê de nemaye"* A.Lambton, Landlord., p.256.

dewletê tê kirin. Ev cure milkdarên han ji ber xatirê bab û bapîrên (kal) xwe, yan ji ber şêxîtî û dereca ayînî rêzek wan a gelek zêde ji alîyê xelkê de heye û axa wan bi dehan yekê milkên wan îcar dikin. Hinek car eger guhên wan li ber gulmista (mista) dewletê be û dest ji akarê bapîrên xwe helbigrin, ji dehan yekê jî kêmtir jê distînin. Lê eger hukumet hîs bi vê bike ku bi serîhildana bab û bapîrên xwe tê de maye, her zû riya vegerînê nade, ji ber ku bibe tirsek ji bo dewletê. Piranîya axên van cure kesên han dikevin nêzîkî ser sinoran û ew li hêvîya firsetekê ne ku tola bab û bapîrên xwe yên ku hatine îdam kirin bistînin. Li beşê başûrê Kurdistana Îranê li nêzîkî sinorê Îranê û Iraqê ku gelek serokanîyên petrolê tê de hene, emperyalîzma Brîtanya rolek gelek xirab tê de lîst. Wezareta Derve ya Brîtanya zor dibir ser Îranê ku milkên nêzîkî serokanîyên petrolê li beramberî perekî gelek kêm, ku hinek car ji %1'ê milkan kêmtir bû, ji derebegên durust û dostên Brîtanya re bê îcar kirin. "Qubadîyan" ku derebegekî Kurd ê mezin bû û li Îranê bi xizmetkarîya sîyaseta Brîtanya ve dihat naskirin, dest danî ser piranîya axê(9).

Milkên dewletîyan dibin sebebê vê yekê ku hukumet destê xwe bavêje pêsîra xelkê Kurdistanê û çavê milkdaran bitirsîne, ku eger bixwezin li dijî dewletê serîhildin, dest deyne ser milkên wan û bike yê dewletê.

Her çendîn hukumetê karibûye çend mezrayan nimûne li ser axa dewletê durust bike û metodên babetên nû tê de bixe kar û ji bo gundîyan bike nimûne, lê xwe qet bi vê aciz nekirîye. Ji sala 1955'an de hewil daye van axên han bifroşe ku bêyî wê yekê ku wan îmkana pêkanîbe da van axên han li ser gundîyên hejar parve bike. Di rastîyê de dewlet bi kirinên xwe alîkarîya zêdebûna axa xwedî milkên mezin dike.

## 3 - Milkên Padîşa

Piştî Riza Şah dest bi biserdegirtina axan û zeptkirina hezaran hektar axê ji xelkê kir, li Kurdistanê bû mezintirîn milkdarê de-

(9) Rojnama "Rehber" 27 Hezîran 1946.

rebeg. Wan axên salên piştî 1930'an dagîr kir, baştirîn û birijtirîn (bibertirîn, berekettrîn) axên bakurê Îran û Kurdistanê bûn.

Sala 1941'an, piştî wê ku dewletên hevpeyman hatin nav axa Îranê, Riza Şah naçar bû ji ser text bê xwarê û Îranê bi cî bihêle. Nerizayî û bêzarî ji Riza Şah gihîştibû radeyekê ku parlamentoyê di Hezîrana 1942'an de qanûnek qebûl kir, li gor vê qanûnê hamû milkên Şah ji xwedîyê wan ên berê re hat dan. Lê sala 1949'an hukumeta kevneperest a Îranê bi bahana destdirêjîya ser jîyana Şah karî ji bo demekê tevgera gelê Îranê bitefîne û rêxistinên demokratîk di welat de qedexe bike. Vê yekê firsetê da Şah ku carek nû şûn de axê bistîne. Di 11'ê Tîrmeha 1949'an de qanûnek nû hat derxistin, ku hemû axan ji bo text û taca paşatî distend û li gel vê jî wisa hatibû danîn ku warîdatên wê ji bo armanca ayînî û civakî bên xerc kirin. Di navbera salên 1951-1953'an de ku tevgera rizgarîxwazîya netewî serkevtinên gelek mezin bi dest xistibûn, Doktor Musadiq îdarek ji bo serokatîya milkên dewletê û padşahî danî. Lê cara duyem di netîca derba kevneperestî û ser bi emperyalîzmê de, di 28'ê Gelawêja sala 1332 (Tîrmeha 1953'ê zayî-nî)'an de cardin Şah vegerîya. Ew milkên han ên ku ji 1277 gundan pêkhatibûn ku şeş hîsse yên Şah bûn(10) û 706 gund ku kêmtir ji şeşedangîyan milkên Şah bûn, 1975 çêrîngeh, 2381 taximên xanî û ber, karge, dikan, otel û tiştên din hatin vegerandin(11). Pîvana milkên Şah zêdetirî ji 2,5 mîlyon hektar bû ku 2 mîlyon 303 hezar kes tê de niştecî bûn. Wî çaxî warîdata hemû wan gundîyên li ser axa Şah bûn 175 mîlyon qiran bû, warîdata salane ya milkê padîşahî digihîşt 550 mîlyon qiranan(12).

Şah, li Kurdistana Îranê li melbenda Piştko û Kirmaşan xwedî axeke zêde bû, Riza Şah, heta Şerê Cîhanê yê Duyem axeke zêde li melbenda Newtelanî Newtî Şah (yanî Cîyê Petrola Şah. Ji

---

(10) Li Kurdistana Îranê hemû gundên biçûk an mezin şeşdang tên hesêb kirin -Nivîskar.

(11) Rojnama Etla'at, hejmar 24.7.1953.

(12) Rojnama Etla'at, hejmar 12.5.1953. Ne vala ye ku tê gotin, warîdata serane yan gundîyekî li ser milkê Şah li gor van reqeman dike 750 qiran, yanî salê 10 dolar -Nivîskar.

mintiqa Kirmaşanê re têt gotin-Elîşêr) hebû, ku lûlên (borî, kêzîn) petrolê ji bo rafînerîya Kirmaşan tê de dihat birin[13] niha li Kurdistana Îranê ji %4'ê axa kêlayî ya Şah e.

Sala 1953'an Şah biryarê da ku axa xwe bifroşe gundîyan, lê propagandek gelek zêde ber bi vê re da meşandin, ku goya axê li ser gundîyan parve dike. Di navekê re her gundîyek, ew jî zêdetir gundîyên dewlemend, 5 heta 20 hektar ax werdigirtin û diviyabû di navbera 25 salan de, salê 460 heta 2 000 qiran bidin[14] û li ser hev qîmeta her hektarek ax digihîşt 3 000 qiranan. Heta niha Şah nêzîkî 250 000 hektar, yanî %10'ê axên xwe firotîye û di beramber de nêzîkî 10 mîlyon dolar bi dest ketîye[15]. Şah ew perên ji firotina van axan û axên din bi dest dixe, beşek ji wî radizîne bankên Swisr (Îsviçre) û Amerîkayê û beşekî din jî di hinek liqên bi feyde yên sen'et de bikartîne. Bi vî awayî tenê desthilata sîyasî di destê Şah de nîne, her wiha bûye bingehek aborî ya xurt ku dest bi ser hemû liqên aborî yên welat de girtîye. Ger wiha be ne ecêb e ku Şah serokatîya grûba derebeg a fermanrewa bike ku pîyek wan emperyalîzma Amerîka û ya Îngilîz e.

---

(13) *"Riza Şah nedixwest axa xwe bifroşe şirketa petrola Brîtanya û ya Îranê, daxwaz ji şirketê kir, ku bi salî jê kirê bike. Piştî çend sal muzakeran peymanek îmza kirin, ku li gor wê; hemû salan şirketê 12 hezar lîran didayê (her çendîn ax hemû li ser hev 6 hezar lîreyê Sterlîn nedihêja - Nivîskar). Ev peymana han heta sala 1941'an wek xwe ma ku şirketê vê peymanê hilweşand û axê kirî. Qîmeta wê jî hukumetê dîyar kir" M.Fatih: "Pêncî Sal Ew Neft Îran" bi zimanê Farisî, Tehran, 1956, rûpel: 308.*

Ji xwe ev yeka han ku Riza Şah di salên piştî 1930'an de bi wê hişkîyê ji bo çend hezar lîre dijîtîya şirketa petrolê dikir, ji bo mîlyonan lîre malê miletê ku şirketê ji petrola Îranê bi dest dixist, mûyek wî nehejîya. Şirketek ku di rastîya xwe de di nav dewletekê de dewletek bû -Nivîskar.

(14) Rojnama Etla'at, hejmar 24.11.1957.

(15) C. Ersincanî Wezîrê Zîraetê, sala 1961'an ji nûçegerê rojnama Fransî Le Monde re wiha digot: "Parvekirina axa Şah bi ser gundîyan de şaş e, ji ber ku ew gundîyên ku qet wasitek wan a zîraetê nebû, naçar bûn axên xwe bifroşin derebegan. Le Monde, 24.5.1961.

## 4- Axên Weqfê

Me di pêşîyê de got ku axên mewqufê (weqif) di cîyê wan axan de ne ku hibbeyê mizgeft, medrese û mirovên ayînî hatine kirin û kirîn û firotin li ser van axan nîne û tu wextî dest bi van axan nayê dan. Pişt re mirovên ayînî dest danîn ser beşek zêde ya axa gundîyan û wek malê mewqufê hesêb kirin. Niha du cure axên mewqufê hene:

1- Ew axên çandinîyê ku kirine weqf ji bo ku warîdata wan ji bo armancên ayînî û civakî bên xerckirin, wek çêkirina dibistanan, mizgeft, kolana bîran û tiştên wek van babetan. Serokatîya van cure axan di destê mirovên ayînî yên mezin de ye.

2- Ew axên çandinî yên hatine sipartin mirovên ayînî, bi wî şertî ku piştî mirina xwedîyê weqfê warîdata wan ji bo nevî û nevîçirkan be. Di vir de armanca xwedîyê weqfê ev e ku axa wî neyê firotin û ji nevî û nevîçirkên wî re bimîne, yan ev e ku warîdata wan bi awakî rewa û adîlane di nav wan de bê parvekirin.

Dîyar e li Kurdistana Îranê şêx dikarin bi gelek awayên hîle û pîlan axên mewqûfê dagîr bikin. Niha rewşek wisa pêk hatîye ku piranîya axên mewqufê bûne milkê şêxan û li hemû Kurdistana Îranê tiştek kêm nebe axên mewqufê nehatîye xistin bin çavdêrîya Wezareta Kulturî. Ew jî ji çend gundan pêk hatîye ku heta şoreşa 1907'an di bin desthilata mirovên ayînî de bûn. Şêx di hemû navçên Kurdistanê de xwedî axên fireh in, her niha şêxên Nehrîyê li melbendên nêzîkî sinorê Îran, Iraq û Tirkîyê xwedîyê bi sedan gundan in û şêxên Tewêle û Biyare li melbendên Silêmanîyê li ser sinorê Iraq û Îranê nêzîkî 400 gund di destê wan de heye.

Binemala Şêx Burhan li melbenda Miyandiwaw dest danîne ser 50-60 gundan ku berê mewquf bûn. Wek adet her terîqetek xwedîyê tekyek taybetî ye bi milk û alîkarîya mirîd û derwêşên wê terîqetê tên xwedîkirin. Ev tekyên han wek nimûne li bajarê Mahabadê bi dehan karwanseray û dikanên wan hene. Yek ji wan adetê kevin ê Kurdistanê ev e ku dewlemendên wê aş, rez, bax û dikanan dikin weqf.

Va ye mudetê 300 sal e axa weqfa melbendên Mahîdeşt û Kirmaşan di destê seyîdên şî'e yên Iraqê de ne. Bi vî awayî milkên mewqufan di rastîya xwe de bûn milkên taybetî yên mirovên

ayînî, ev jî wek me di pêş de got ji sala 1928'an şûn de dest bi zeptkirina van milkan hatîye kirin û heta niha jî her didome.

Axên mewqufê ji maliyat, xerc û bacê jî muaf in, ji ber ku wisa hatîye danîn ku warîdatên wan ji bo kar û barên giştî û civakî tê xerckirin. Li gel vê jî şêxên mezin vê hîla han ji bo muafîyeta axên xwe ji maliyatê bikartînin û derebegên mezin jî her bi vî awayî bi wan re hevaltîyê dikin. Lê ew gundîyên li ser axa mewqufê kar dikin û xwîdan dirêjin, eynî wê perçiqandinê dibînin ku gundîyên li ser axa derebegan dixebitin. Di ser vê de jî gundî ji bo netîcek ayînî bistîne hîn zêdetir xwe aciz dikin û zehmet dikişînin. Di wextê hewl û rabûna gundîyan de ji bo baştirkirina rewşa jîyana xwe, ew bi navê ayîn û qazanca giştî hewlê bêdengkirina wan didin.

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

## 5 - Axa Gundîyan

Li Kurdistana Îranê tenê ji %8'ê axên kêlayî di destê gundîyan de ye ku dike 96 hezar hektar û gundîyên xwedî ax jî nêzîkî ji %10'ê nifûsa gundî yên Kurdistanê pêktîne. Di vir de em pêwîst dizanin behsa hinek karekterên taybetî yên van cure milkîyetan bikin.

Berî hemû tiştekî ji hektarekî heta sê hektaran axa piranîya van gundîyan heye ku dike cîyê cotekî û tenê beşek kêm ji gundîyan 5-20 hektar axên wan hene ku ew jî gundîyên dewlemend in[16].

Li hinek melbendên wek Urmiyê û heta derecekê jî Miyandwaw û Seqizê, gundî xwedîyê axên nerm û yên kêlayî nînin, tenê rez û baxên wan hene.

Ew axên di destê gundîyên navîn de ne, piranîya wan bejî (dêm), zuwa, dûr, gelek xirab û kêm rij (bê bereket, kêm ber) in.

Beşê piranîya wan axên dor û berê bajaran ên wan gundîyên dewlemend in, ku yan li bajêran rûdinin û dixebitin, yan jî memûrên dewletê ne. Ev rewşa han di piranîya melbendên nêzîkî

---

(16) Binêre: destpêka fesla heştan a vê kitêbê.

bajêr ên di nîveka Kurdistanê de ber biçav dikevin.

Gelek asteng û kospên li ser riya gundîyên navendî hene ku di dora avê de gelek caran heqên wan ji wan tên sitendin. Di temînkirina metodên çandinîyê de dest-kurt in. Gelek caran heye gundî xwedî ax e lê heywan û cot nîne, eger ferek gayê wî pîr be yan bimre, bi carekê de tûşî naçarîyê dibe. Cote gayek (amolek ga, du heb ga -Elîşêr) ) li Mahabadê ji 6 heta 8 hezar qiranan e, cotê kêlanê jî ji 8 heta 12 hezar qiran e. Ji ber vê, gundîyek ger bikare ferek ga yan aletek kêlanê bikire, hewce ye tonek du ton genim bifroşe, li gor vî hesabê ku kîloya genim bide bi sê qiranan. Yanî ewê ji sêyekan an ji nîvekarîyê ku ji sê hektar ax bi destê gundî dikeve, ew jî bi wî şertî sal xweş be û rij baş be. Ji xwe eger hişkesalî yan afatek bi ser de bê, ku li Kurdistanê gelek caran tê dîtin, gundîyê navîn bi carekê de tuşî naçarî û hejarîyê dibe, ji bilî wê ku axa xwe bifroşe û di milkê milkdarên mezin de nîvekarî û sêyekberîyê bike, yan bibe karkerê zîraetê pê ve tu riyek li ber namîne, yan jî ger ew berê xwe bide bajêr û jîyanek nemirnejî ji xwe re peyda bike. Di van salên dawîyê de ev mesela han bi carekê de pêş de çûye, xwedî milk û faîzxwer di netîca destkurtî û belengazîya gundîyên navîn de, ku nekarîbûye deynê xwe bidin, dest danîne ser axên wan.

## FESLA HEFTAN
# AWAYÊ RANTA AXÊ

Me di pêş de behs kir ku piranîya axên Kurdistana Îranê (%70) di destê xwedî milkên mezin de ye. Lê ev nayê wê manê ku berhemdariya mezin di zîraetê de heye. Ji ber ku heta niha jî peywendîya derebegî û eşîratî di holê de maye, berhemdariya zîraetê li ser berhdariya biçûk hatîye jîyandin. Sebebê vê jî ev e ku wasita herî girîng a berhemdarîya cotkarîyê yanî ax, a wan kesan e ku karekî li ser nakin û ew gundîyên li ser axê kar dikin, ne kêm û ne ji zêde, xwedîyê wê axê nînin. Ev yeka han karektera peywendîya cotkarîya Kurdistana Îranê ye.

Xwedî milkên mezin, axê wek milk didin gundîyan û ev yeka han ji wan re gelek girîng e. Beşê piranîya van xwedî milkan li bajaran dijîn û qet guh nadin warê berhemdarîyê, yanî qet pere li axên xwe xerc nakin û gundî naçar e ji xwe re cot û wasitên cotkirinê temîn bike. Piranîya axan bi vî awayî ber bi şapê de diçin.

Gundî ranta aynî dide xwedî milk û çendîn sedsal e ev awayê perçiqandin û mêtinê li Kurdistanê belav e. Curekî din ê ranta ev e ku gundî kar ji xwedî milk re dike. Ev awayê han jî gelek tê dîtin, lê li Kurdistanê ew awayê kilasîk nîne ku gundî di heftîyê de çend roj li ser axa xwe kar bike û ya din di axa derebeg de. Ji ber ku di Kurdistanê de wisa tê dîtin ku gundî karê cotkarîyê ji bo

xwedî milk nake, belko di cîyê vê de bi eynî rant hinek kar û barên din ji bo axa cîbicî dike:

*"Her çendîn ranta aynî ji hemû awayên rantan zêdetir belav bûye, lê cardin heta derecek paşvemayê awayê kevin, yanî ranta kedê (emek rant) an bê kar jî li gel e, vêca xwedî milk dewlet be yan yek din mesele her wek xwe ye"*(1).

Bi kurtî ranta aynî li Kurdistanê awayê serekî yê milkîyetê ye û ev li gel peywendîya zîraeta niha ya Kurdistanê jî bi rê dikeve, ku nû ji peywendîyên derebegî derbazî peywendîyên sermayedarîyê dibe:

*"Peydabûna awayê ranta aynî di şiklê xurtîya xwe de pêwîstî aborîya tabîî ye, her çendîn paşvemayî (bermayî) di piştî peydabûna awayên pêşkevtinên berhemdarî û peywendîyên berhemdarîyê re her dimînin jî"*(2).

Eynî rant di gundan de dibe sebebê kûrbûna cihêtîya çînîtî:

*"Cihêtî di rewşa aborîya berhemdarîyê de xwe raste rast zêdetir dike"*(3).

Sebebê wê ev yeka han e ku ranta aynî:

*"Li gor ranta kedê zêdetir îmkan dide berhemdarîyê, ji ber vê dema ku karê zêde jê re zêdetir be, ku berhem yên wî ne, wek berhemên wî karî ku lazimîyên herî pêwistî temîn dike"*(4).

Wek em ê ji vir şûn de behs bikin li Kurdistanê rewş bi awayekî din e. Ji ber ku wezîfek gelek giran li ser milê gundîyan e ku divê bi awayê ranta kedê cîbicî bike û netîca vê yekê nabe zêde kar ji xwe re bike. Ger wiha be ranta kedê li ber ranta aynî de astengek e li ser riya zêdebûna berhemên zîraetê û gundîyan di hejarî û belengazîyê de radigire. Her di wî wextî de ji bo kemla bazara hundurî û peywendîya berhemdarîyê bi giştî tesîrek wê ya xirab heye.

Heta niha di Kurdistanê de ji derveyî wan cîyên ku çandinên teknîkî (wek pincarên şekir û titûn) berhem tînin, awayê rant-

---

(1) K. Marks; "Sermaye", bi zimanê Îngilîzî, cilda sêyem, Moskova 1959, rûpel: 775.

(2) Eynî serokanî.

(3) Eynî serokanî.

(4) Eynî serokanî.

darîyê bi pere pêş de neçûye. Lê di ser tev hinek kosp û astengan de jî ranta pere berbipêş de diçe û ranta kedê kêm dibe. Her ji ber vê em ê berê behsa ranta aynî bikin û piştî vê, ranta pere û dawîyê jî ranta kedê. Dîyar e ev di eksê cîyê hev de hatina van hersê awayê rantan e[5].

## 1- Ranta aynî: awayê şirîkatî

Ranta aynî li Kurdistana Îranê li gor nezma şirîkebeşî e. Pêwîst e bê gotin ku nezma şirîkebeşî jî usûlek derebegî ye, ne sermayedarî ye û usûlek e bi tevayî li ser parvekirina raste rast a berhemê di navbera gundî û xwedî milk de ku xwedî milk axatî dike û gundî jî bi alet-edewatên xwe axê hiltîne. Cot jî hinek car ê axa û hinek caran jî yê gundî ye:

*"Ger wiha be li alîyekî gundî xwedîyê wê sermayê nîne ku ji bo karpêkirinê muhtacî sermayedarîyek temam e û li alîyek din jî ew para ku xwedî milk werdigre nikare di rantek paktir de razîne"*[6].

Sebebê wê jî ev e ku di vir de ax tenê bi serê xwe wek wasita sereki ya berhemdarîyê girîng nîne ku xwedî milk dide, belko hinek wasitên din ên berhemdarîyê jî girîng in ku yên gundîyan in:

*"Ew gundîyê ku li gor nezma şirîkebeşî cotkarî dike, çi ji bo xwe kar bike û çi bi kirêgirtî bike, beşek ji berhemên wî jê nayê birîn ku wek karkerek kar kirîye, belko ji ber vê ye ku hinek wasitên berhemdarîya sermaya wî ya taybetî ye. Li milek din jî ew beşê xwedî milk dibire, hemû yê wî nîne ku xwedî ax e, belko beşek ji*

---

(5) Li Kurdistana Tirkîyê peywendîyên sermayedarî di berhemdarîyê de û di behra ranta sermayedarîyê de gelek berbelavî heye û ji ber vê ranta kedê di çarçovek teng de maye. Li Kurdistana Iraqê jî awayê behra milkî ya axê heta derecek zêde wek ya Kurdistana Îranê ye û heta niha jî awayê serekî yê behra rantî li Kurdistana Tirkîyê û Kurdistana Iraqê jî her wek Kurdistana Îranê her ranta aynî û li gor awayê şirîkatî ye.

(6) K. Marks; "Sermaye", cilda sêyem, rûpel: 783.

*ber wê ve ye ku sermaya xwe daye gundî"*[7].

Yanî rola faîzxwerîyê heye. Lê zîraeta muşterek berî hemû tiştekî pêwîstîya wê bi vê heye, ku hewce ye gundî xwedîyê wasitên berhemdarîyê be "heta eger gelek xirab jî bin"[8] pişt re dibê ew gundî hejar be û neçar be axa xwedî milk bikêle:

*"Divê ew gundî gelek naçar û belengaz be heta wê koletîyê qebûl bike"*[9].

Xwedî milk an nûnerê wî li gor wê ku cotkar çend cotên wî, yan çend serî xêzan heye, axê bi rant dide. Li Kurdistanê cîyê cotekî 3-5 hektar ax e, lê li melbendên Bûkan digihîje 5-7 hektar ên avî û 8-10 hektar ên bejî[10]. Li beşê başûrê Kurdistana Îranê cîyê cotekî ji wê axê re dibêjin ku 900-1500 kîlogram genim jê bê hildan [11]. Ger wiha be pîvana wê di navbera 2,5 heta 10 hektaran de ye. Li beşên bakur û başûrê Kurdistana Îranê axa bejî bi nîvekarî nayê dan. Ev jî ji ber wê ye ku bejî gelek in û pişt re bejî ketine ser gir û çîyan û dana xebata wan gelek dijwar e. Her wiha îcaredar jî gelek qîmet pê nadin, ji ber ku bi kevir in û berhemên baş nadin:

*"Cotkarek ku ax îcare dike heqê wî heye di temamê jîyana xwe de bikêle û dikare vî heqê han wek mîrate jî di cî de bihêle"*[12].

Di du halan de ev heqê han ji îcaredar dikare bê sitendin: 1- Eger derket ku ax nayê bikaranîn. Wek wê nikaribe cot peyda bike. Di vî halî de ax jê tê sitendin û ji kesekî din re tê dan. 2- Eger kesek din amade be bi awakî wisa axê bikêle ku qazanca xwedî milk zêdetir tê de hebe. Ev bûyerên han zêdetir li ser axên bereket û bi rij tên dîtin, ji ber ku îcaredarek ku xwedî cotê baştir e û xwedî kesên zêdetir e û bi taybetî kesên wî yên kar zêdetir in,

---

(7) Eynî serokanî.

(8) Lenin, "Berhemên Helbijartî", bi zimanê Çekî, cilda 15'an, rûpel: 81.

(9) Eynî serokanî

(10) 'E. Gelawêj ; "Peywendîyên Çandinî...", rûpel: 93.

(11) A. Lambton, Landlord, p. 368.

(12) Eger îcaredar bimre û kur di pê de nemîne, heqê keçê yê kêlana axê nîne. Lê di nav eşîretan de ku peywendîyên eşîratî bihêzin, ew xêzan axê ji xwe re digre û heqê kêlana axê digihîje mêrê keçê -Nivîskar.

baştir dikarin ber ji axê bistînin. Aşkera ye xwedî milk jî li yekî wiha digere. Di netîcê de axên baş hemû dikevin destê gundîyên dewlemend. Axên dor û berên avdanî ku ziblê heywanan lê têt kirin bi rijtir in, xwedî milk ji xwe re dikêle yan dide nunerê xwe û bi karkerîya cotkarî xebat dikin. Di van dawîyan de hinek xwedî milk ên melbendên Kirmaşan û Miyandiwaw hînbûn ku tiraktorê bikar tînin ku bi karkerîya cotkarî kar pê dikin û ew bi vî awayî hemû axên ku di destê îcaredaran de ne ji wan distînin û wan naçar dikin biçin gundên din, yan berê xwe bidin bajaran.

Li Kurdistana Îranê ax, ku bi rant(kirê) tê dan, xanîyek jî pê re ye û wextê di vî haletê jorê de axa gundî jê bê sitendin, xanî jî jê tê sitendin û hewce ye wî xanîyî ji wî kesê tê ser axê re vala bike.

Qerar û sozek bi devkî di navbera xwedî milk û gundî de heye. Ev cure qerar û lihevkirin ku qanûna medenî ya Îranê jî îtîbarê pê dike, peywendîya wê bi du tiştan ve heye: Yekemîn, ev e ku her alîyek ji bo bikaranîna axê çi datînin. A din awayê parvekirina berhemê ye. Hem li Kurdistana Îranê, hem li Îranê û hem jî li Rojhilata Navîn bi giştî tesîra çend sebeban di parvekirina berhemê de heye. Dîyar e rola sebebê aborî ya herî girîng e, lê ew sebebên ku peywendîya wan bi hel û mercên taybetî yên melbendên cihê ve jî hene; wek orf û adetên netewî, ayînî û yên din.. her yek bi serê xwe rolekê dilîze. Tenê em bi lêkolîneke kûr û fireh a bi yek û yek li ser van sebebên han, dikarin mesela esasî ya peywendîya çandinîya Kurdistana Îranê ronî bikin. Ew jî ji mesela ranta aynî pêk tê ku awayê serekî yê perçiqandin û mêtina bi mîlyonan gundîyên bê ax e.

Em ê "pênc hoyên" esasî bikolin, ku ji ax, av, cot, tov û kar pêkhatine. Hewce ye em di pêş de vê yekê jî bêjin ku mebesta me ew nîne ku em wek piranîya nivîskarên Îranî û yên bîyanî qîmeteke nedin vî milî û wî milî ji derveyî van pênc sebeban ku qîmeta wan kêm bikin, yan jibîr bikin. Ji ber ku qet gûman tê de nîne ku li Kurdistana Îranê esasê parvekirina berhemê li ser van pênc sebeban hatîye danîn, yanî berhem li gor van pênc sebeban tê parvekirin û herkes li gor van sebeban ku di kar û barê zîraetê de xistîye kar, para xwe ji berhemê werdigre.

Tiştek ronî ye ku ax ji yek wan pênc sebeban tê hesêb kirin û li gor wê behsa ku di derbarê avdanîyê de hat kirin, tê dîtin ku av ji

bo axên avî qasî axê girîng e. Aşkera ye ev qîmeta han hewce ye ji bo kar jî bê dan ku di berhemdarîyê de beşê herî girîng ê îcaredar e. Ji xwe aşkera ye cot jî yek ji van sebeban tê hesêbkirin, bi taybetî eger hejarî û belengazîya gundîyan li berçav bê girtin, ew çax cot dibe serwetek serekî. Pêwîst e ev jî bê gotin, ku wasitên cotkarîyê jî her li gel cot tên hesabkirin, aşkera ye ji bo gundîyekî hejar ev wasitên han jî gelek girîng in. Çimkî her çendîn li gor teknîka nû derecek gelek zêde esasî ye, lê tenê wesîla axkêlana gundî ye.

Hesabkirina tov ji van yek pênc sebebên esasî, zêdetirîn pêwîstî bi ronîkirinê heye. Wek em ê pişt re bibînin, hewce nake em bi taybetî berhemên teknîkî wek sebebên din bi girîngî hesêb bikin. Lê li gel vê jî pêwîst e behsa ehemîyeta tov di Kurdistana Îranê de bê kirin, ji ber ku berhemê axê li gor pîvana wê nayê hesab kirin, lê li gor tovê tê hesêbkirin. Ax hemû bi hev re 5-7 car hindî tov berhemê tîne. Bi vî awayî eger berhemê hektarek axê 840 kîlo genim be, berhemê sê hektaran 2520 kîlo ye, ku ji vê 360-504 kîlo tov e, yanî ji pêncan yek yan ji heftan yekê temamê berhemê ye. Genim bi gelemperî di payîzan de tê avêtin. Em wisa hesêb bikin ku gundîyek ji yekî 2-3 berhem werdigre, yanî 1680 kîlo. Eger ew gundî ji pêncan yek yan ji heftan yekê berhemê ji bo tovê sala bê hilde, hewce ye dest ji %20 heta 30'yê para xwe vekişîne. Ku wiha be her wext nikare ji xwe re tov temîn bike, ji ber ku genimê her beşê nanê şeş mehan dike û ji ber ku di wextê din de birçî nemîne, hewce ye ji bo îdara xwe deyn bike. Ji derveyê vê di Kurdistana Îranê de cure genimek biharan tê avêtin (beharo, -li Kurdistana Tirkîyê hinek navçan jê re bihare tê gotin -Elîşêr) yanî rast di wî wextî de ku gundî zirav lê qetîyaye û nanê wî yê tisî jî nîne. Wek em ê pişt re jî bibînin, eger ax baş û bi rij be xwedî milk tov didê û eger xirab be nadê.

Di vir de girîngîya tov derdikeve ku gelek car tê dikeve rêza her çar sebebên din, carên wisa jî hene ku ji tevan girîngtir e. Niha em ê bên ser behsa awayê parvekirina berhemê di navbera xwedî milk û gundîyan de li navçên cihê cihê yên Kurdistana Îranê. Ji bo berhemên girîng, yanî genim û ceh çend esas hene, ku xwedî milk û gundî li ser vê dimeşin. Behsa sevîya milkên berhemên din û berhemên teknîkî em cihê dikin.

## Nîvekarî

Xwedî milk axa avî dide gundî û tov jî pê re didê û kar ji serî heta binî li ser milê gundî ye. Di vir de, li gor wî esasê me behs kir, xwedî milk sê beşê berhemê di beramberê ax, av û tov de ji berhemê dibire û du beş jî di cîyê kar û cot de ji gundî re dimîne. Wek nimune li gundê Serokanîyê navça Laçan xwedî milk ji %20'ê berhemê hildigre û pişt re yê din nîve nîv bi gundî re parve dike. Li Peswê ku tenê deh kîlometre jê dûr e, xwedî milk nîvê tov dide û cardin piştî vê ji %20 jê heldigre, qasê mayî jî di nîvî de parve dike, ev jî tê wê manê ku milk di vî gundî de zêde ye. Sebebê vê jî ev e, ku axa Peswê ji ya Serokanîyê bi rijtir e, ji derveyî vê jî gund yê serokeşîrê Mamiş e ku mezintirîn derebegê wê melbendê ye.

Li navça Sine jî li melbendên nêzîkî bajêr xwedî milk nîvê berhemê distîne Li gundê Kukê û Qasimlo yên navça Urmiyê, xwedî milk nîvê tov dide û nîvê berhemê jî distîne. Eger xwedî milk di vê melbendê de hemû tovî bide du beşê berhemê heldigre. Nîvekarî zêdetir di axên avî û yên bi rij de heye.

## Ji Sisîyan Yekê Ber (Sêyekberî)

Di vir de ax, av, cot û tov li ser xwedî milk e û kar jî li ser gundî ye û li ser bêderan (bênder) berhem dikin sê beş, du beş ji bo xwedî milk û beşek jî ji bo gundî. Ev orf û adet li gundên çîyan ên melbendên Sindos heye. Gundî di vir de tenê karkerek cotkarî ye ku ji xwe re nexwedîyê tu tiştekî ye û di axa xwedî milk de ked dirêje û zarok û xêzanên wî jî alîkarîya wî dikin. Ev adetê han bi awakî kêm di hemû melbendan de heye, lê di wan cîyên ku cotkar zêde ne, ev adeta han kêm e. Bikaranîna vî awayî bi meyla xwedî milk ve girêdayî ye û di axa xwedî milkên mezin de kêmtir tê dîtin. Pêwîst e bê gotin ku ev awa ranta aynî li hemû cîyan û heta bi hev re li gel awayên din tê dîtin.

## Sê Par (Sê Beş)

Di vir de, ax û av li ser xwedî milk e û ji sisîyan yekê berhemê jî werdigre; wek ku li Zîndeşt a li melbenda Salmas belav e[13]. Li

(13) Duglas. rûpel: 7.

melbenda Mahabadê hin wext tenê ji %30'ê berhemê werdigre ne ji sisîyan yek, her wekî ev yeka han di milkê Eşîreta Qerepapaxan a li melbenda Sindos de belav e. Di vir de sebebê kêmbûna para xwedî milk bihêzbûna peywendîyên eşîretî ye, ji ber ku Qerepapaxan di wê melbendê de tenê bi serê xwe eşîretek şî'î ya Azerbeycanî ne û çarmedorê wan eşîretên Kurd ên sunî ne, hestê piştgirîya hev di nav wan de xurt e. Li başûrê Kurdistanê yanî li melbendan Kirmaşanê gundî ji sisîyan yekê berhemê werdigre û kar jî hemû li ser wî ye(14).

## Ji Dehan Dudu

Di vir de, xwedî milk ax û avê dide û ji %20'ê berhemê werdigre. Ev cure parvekirina han di navça Sine û melbenda bakur de zêde heye, her wek gundê Serokanî ya melbenda Laçan ku me nû behs kir. Lê di van salan de ku av jî nîne, cardin xwedî milk pênc yekê xwe distîne. Berhemên bejîyan jî li Kurdistanê her bi vî awayî tên parve kirin. Wek nimûne li Deştebêl a navça Urmê xwedî milk ji pêncan yekê berhemê distîne, lê zîraet di wê melbendê de di dereca diduyan û xwedîkirina heywanan di dereca yekem de ye.

Hinek caran xwedî milk ji pêncan yekî jî kêmtir distîne, wek li Jawer a nêzîkî Sine ku tenê ji panzdehan didu distîne, yanî ji pêncan yek jî kêmtir. Ji ber ku axa wê kevir in û rija wê kêm e(15).

Bi vî awayî usûla ji dehan dudu zêdetir di wan melbend û cîyan de ya ku axa wan bêrij e û xwedîkirina heywanan tê de heye, belav e. Di piranîya wan melbendan de berhem ji 5-6 carê tov derbaz nabe.

## Birinc

Di birinc çandinê de av, tov û ax li ser xwedî milk e û berhem jî

---

(14) Ji axên dêman xwedî milk ji sisyan yek werdigre û gundî du par, lê di axên avî de xwedî milk di şûna av û axê de ji pêncan didu distîne û gundî jî ji pêncan sisê di cîyê kar, tov û cot de werdigre. M.Danşur: "Dîtnîha û Şinîdnîhayî Îran", bi zimanê Farisî, cild 2, 1950, rûpel: 231

(15) A.Lambton, Landlord, p. 310.

di nîvî de tê parvekirin. Lê hinek cîyên wek Nelos a melbenda Lacan xwedî milk ji %20 berhemê ji xwe re heldigre û pişt re ya din bi gundî re parve dike. Di birinc çandinê de, ku pêwîstîya avê û kar zêdetir e, ew pênc sebebên ku me behs kirin hesabek deqîqtir li ser tê kirin, ji ber vê kêm caran tê dîtin wek li Qesrêşîrîn, gundî ji sisîyan diduyê berhemê werdigre. Di vî halî de hemû xercên cotkarî bi tov ve li ser gundî ye.

Bi vî awayî parvekirina berhemê li hemû navçên Kurdistana Îranê bi taybetî li melbendên bakur belav e. Li gor wî esasê ku me behs kir divîya xwedî milk di şûna av û axê de ji pêncan dudu yanî ji panzdehan şeşê berhemê werbigre, ne ji sisîyan yekî yanî ji panzdehan pênc. Sebebê kêmbûna beşê xwedî milk di sevîya panzdehan yek de ev e, ku hêza kar kêm bi dest dikeve, ji ber ku piranîya nifûsa Kurdistana Bakur (mebest bakurê Kurdistana Îranê ye -Elîşêr) bi xwedî kirina heywanan ve mijûl e, hejmarek kêm nebe kes cotkarîyê nake. Her wiha li başûr jî ~~îr~~ melbenda Kirmaşan hêza kar kêm bi dest dikeve.

## Berhemên Sanayîyê:

### a) Pincarê Şekir

Li Kurdistana Îranê li bakur li dor û berê Urmiyê, li Miyandiwawa navîn û li başûr; dor û berê Şahabad , pincarê şekir tê çandin û berhemek girîng jê tê hilgirtin. Di vir de ax û av li ser xwedî milk e û berhem di nîvî de tê parvekirin. Qîmetek wisa ya tov nîne ji ber ku zêdetir, fabrîqên şekir didin. Lê li wan melbendên ku heta niha peywendîya derebegî tê de bi hêz e, ne feydek kêm be tiştek bi destê cotkar nakeve. Ji ber ku xwedî milk bi tena xwe peymana çandina pincarên şekir bi fabrîqên şekir re îmza dike û qanûna medenî ya Îranê vî heqê han nedaye cotkaran ku bi xwe peyman îmza bikin. Xwedî milk alîkarî ji fabrîqê distîne ku cotkar ji vê mehrûm e. Pişt re fabrîqe ji bo her tonek pincar 780 qiran (nêzîkî du dolar) û 6 kîlo şekir dide ku cotkar ji vê jî tiştekî kêm distîne û îstîfade kirina cotkar ji vê behrê jî dimîne li ser însafa xwedî milk.

Ji ber vê, qazanca pincar ji bo xwedî milk gelek e, li hinek gundan heta cotkaran naçar dikin di cîyê berhemên din de pincar

tenê ji wan re bavêjin. Li Xelîfelyan a navça Sindûs bejîa ku gundî xwedîyê kar û barekî xwe yê bi lez ê cotkarîyê ye, xwedîyê axê ewî ji ser van cûre karên wî yên ku hewcedarî kirina bi lezê re dide alîkî û bi zarok û xêzanên wî ve karê aşêvîya pincaran pê dide kirin.

Li melbenda Miyandwaw ew xwedî milkên bi traktor in, axa gundîyan bi traktorên xwe dikêlin û ji wan kirê distînin. Fabrîqên şekir, bi traktorê hektarek ax 780 qiranan dikêlin ku dike qîmeta tonek pincar.

## b) Titûn

Li hemû melbendên Kurdistana Îranê tê çandin. Lihevkirina xwedîyê axê û cotkaran ji bo parvekirina berhemê titûnê li ser van herdu bingehan e: yek ew e ku berhem di nîvî de têt parvekirin û ax û av li ser xwedî milk e -di vir de jî qîmeta tov kêm e-, cot û kar jî li ser cotkar e. Ev awayê han wek nimûne li gundê Peswê yê melbenda Laçan belav e. Piştî jêkirina titûnê karek gelek zêde dimîne, ku ev jî ji şaran kirin (ji bo hişkirinê rêz kirin), hişkkirin, paqij kirin û dagirtin e. Her wek di pincarê şekir de xwedî milk li gel karbidestên hukumetê rê dikeve û alîkarîyek ji xwe re distîne û çavê cotkar dimîne li destê axa, di titûnê de jî ji bo ku dewleta Îranê kirîna titûnê ji xwe re texsîs kirîye, kirîn û firotina wê ji derveyê dewletê qedexe ye. Madem wiha ye titûnvanî jî ji bo cotkar gelek zehmet û ezîyet e û qazancek gelek kêm dikeve dest (16). Her ji ber vê jî xwedî milk bi zorê cotkaran naçar dike titûnê jê re bavêjin, wek ev yeka han li Peswê ya Laçan belav e, eger cotkarek ne amade be titûnê bavêje, tê naçarkirin ku perê berhemê titûna xwe bide xwedî milk. Ev awa berhem parvekirin jî li melbenda Şinoyê belav e, ku baştirîn titûna Îranê li vir çêdibe.

Di çandina titûnê de gelek caran ranta kedê "karkirin" jî tê xistin ser ranta aynî, wek vê ku: xwedî milk cotkar naçar dike eger dema ku ji xwe re genim û ceh davêje, bê wê ku di cîyê wî karî de tiştekî bide cotkar cîyê titûna xwe jî bi wî dide kolan. Karê din jî karkerê zîraetê dike ku nîvê berhemê titûnê werdigre. Ev adeta

---

(16) Serokeşîret perê titûnê ji xwe re werdigre û tiştek jê nade gundî. "Îrana Niha", bi zimanê Rûsî.

han li Nelos a melbenda Şino û Leçyane ya melbenda Sindûs heye.

Li melbenda Urmiyê ku titûnek zêde tê avêtin, berhem dibe sê par; beşek a xwedî milk, beşek a wî cotkarê ku axê dikêle û beşê din jî ji wî karkerê çandinîyê re ye ku di karê titûnê de dixebite.

Ranta titûnê ji ya danewêle (nok, nîs, genmê şamî û.h.d.) pirtir e û ji ber vê ew cotkarê ku titûnê davêje, her wek yên pincarê şekir davêjin, zêdetir tê perçiqandin û mêtin. Di vir de pêwîst e em behsa karekterek taybetî ya milkîyeta titûnê bikin, ew jî ev e ku her çend awayê ranta aynî dikeve ber awayê şirîkatî, lê di vir de berhem di navbera xwedî milk û cotkar de nayê parvekirin, belko ji dewlet re tê dan ku di cîyê titûnê de pere dide. Ku wiha be, di rastîya xwe de xwedî milk, ranta pere distîne û ev bi xwe derbazbûna ji qonaxa ranta aynî bi qonaxa ranta pere e û tesîra çandina berhemê sanayîyê li ser peywendîyên zîraetê û peydabûna cihêbûnê di nav cotkaran de nîşan dide. Her çawan be em niha dibînin, li Kurdistanê di wextê çandina pincarê şekir û titûn de ranta pere tê dan.

### c- Pembo

Piranîya pembo li başûrê Kurdistanê tê avêtin û berhemê wê dikin sê beş ku du beş ji cotkar û beşek jî ji xwedî milk re ye, eger dema ku renta axê pere be.

## Baxên Fêkîyan (Meywan)

Li hinek cîyan darên fêkî hemû yên xwedî milk in, her wekî li Hersîn û Kengawerê li nêzîkî Kirmaşan belav e(17). Eger dar yên cotkar bi xwe jî bin, wek li melbenda Mahabadê belav e, divê ranta axê bide xwedî milk ku ji %20'ê berhemê pêk tê. Hinek caran jî xwedî milk baxê fêkîyan bi kirê dide baxvan. Li Hesenavaya Sine baxvan ji sisîyan yekê berhemê werdigre û du beşê din jî yê xwedî milk e(18). Li melbenda Piştko jî darên bê ber ên wek bî û sipîndar li sê beşan tê parvekirin, du beş cotkar û beşek xwedî milk distîne(19). Li hinek melbendan tu heqê cotkar li ser dar û da-

---

(17), (18), (19) A. Lambton, Landlord, p.324.

ristanan nîne, heta eger bi destê xwe jî danîbe. Her ji ber vê ye ku li Kurdistanê daristanên bi dest hate danîn kêm in. Daristanên tabîî jî -ku li Kurdistanê zêde ne- hemû kes dikare bi azadî ji bo şewitandin an xwarina fêkîyên wan jê îstîfade bike[20].

Li hinek melbendên din heqê cotkar li ser wan dar an baxan heye ku ji xwe re danîbe, lê nikare ji derveyî xwedî milk bifroşe kesekî din, dema ku bixwaze ji wî gundî biçe, divê yan dest ji heqê xwe berde yan bi qîmetek kêm bifroşe xwedî milk. Ev jî tê wê manê ku cotkar ji ber sebebê vî heqî bi wî gundî ve girêdayî ye û di rastîya xwe de xwedî azadîya malbarkirinê nîne.

Li navça Urmiyê cotkar darê bê ber dadiçikîne ku beşê wê yê zêde spîndar e, nîvê berhemê jê re tê dan. Her ji ber vê jî piranîya daristanên bidest danî di vê melbendê de ne.

Li bakurê Kurdistanê berparêzên (bostanên, bîstanên, parêzên) wek xîyar, xîtik, zebeş (şûtî), gindor (petêx) û sebze bi nîvî tên parvekirin, lê li başûrê Kurdistanê wek nimûne di sala 1949'an de berhem dihat sê parkirin, du beş ji xwedî milk re û beşek ji bostanvan re[21].

## Sebebên Din ên Parvekirina Berhem

Me di pêş de got ku awayê serekî yê ranta aynî li Kurdistana Îranê awayê şirîkatî ye û girîngbûna pênc sebeban di hemû awayên parvekirinên berhem de ronî kirîne, lê ji derveyî van hinek sebebên din hene, ku tesîra wan li ser awayê parvekirina berhemê heye.

Yekemîn rija axê ye, ji ber ku her çiqas ax baş be û berhem zêdetir jê bê hildan, para xwedî milk zêdetir e. Lê di wan melbendan de ku ax baş nîne cotkar bi ezîyet û kedek zêde nebe, nikare berhemek zêde berhev bike, xwedî milk mecbûr e bi beşek kêm razî be.

Sebebê din kêm û zêdebûna karkerê cotkarî ye, ji ber ku çiqas pîvana hejmara karkerên cotkarî li gor axên avî zêdetir be, para

(20) Li melbenda Merîwan 14 awa ber ji darê mazî hildigrin. Rizimera: "Coxrafyayê Nîzamîyê Kordestan", Tehran, rûpel: 35.

(21) A.Lambton, Landlord, p.324.

xwedî milk ber bi jor de diçe û her çiqas kêmtir be, ber bi xwar de tê. Vê carê li wan cîyan ku piranîya nifûsa wan mijûlî xwedîkirina heywanan e, para xwedî milk ji berhemê zîraetê kêmtir e.

Di pêş de me behsa girîngîya dezgên avdanîyê kir. Xwedî milk dema ku bikare avê yek ji wan pênc sebeban hesêb bike, wê çaxê hewce ye temînat bide di hişkesalan de jî ax bê av nemîne, heger ne, nikare wê qîmetê ji bo axê deyne ku bîne rêza sebebên din. Dema ku ax birij be û co-bendên avdanîyeke wê ya baş jî hebe û hêza kar jî zêde be, xwedî milk hewil dide ji xwe re tov jî dide û eger tov bide nîvê berhemê werdigre û eger hemû tov bi xwe bide ji pêncan sisîyê berhemê dikeve dest. Dîyar e hesabê xwedî milk rast e û li ser bikaranînê hatîye danîn. Em wek nimûne xwedî milkekî digrin ber çav ku du perçe axa wî heye, yanî "A" û "B", ku ya yekemîn ji çaran yek jê re dimîne û ji bo ku ya duyem bi rijtir e ji diduyan yek e:

| Perça "A" Xwedî milk | Tov | Berhem | Beşê xwedî milk | Beşê cotkar | Behra milk |
|---|---|---|---|---|---|
| tov bide | 150 | 600 | 360 | 240 | 210 |
| (kîlo) | | | 3/5 | 2/5 | |
| Cotkar tov | | | | | |
| bide (kîlo) | 150 | 600 | 200 | 400 | 200 |
| | | | 1/3 | 2/3 | |

Ev yeka han nîşan dide ku eger xwedî milk ji bo axa xirab tov bide, tenê deh kîlo zêdetir bi dest dikeve. Ji xwe eger em hesabê vê jî bikin ku gelek awa afatên tabîî tesîrê li berhemê dikin, vê carê ji me re baştir derdikeve ku ji bo çi xwedî milk hez nake tov ji bo van cure axan bide. Ji derveyê vê jî ji xwedî milk re 150 kîlo genim dimîne ji biharê re ku cotkarê belengaz û birçî dikare wî 150 kîlo genimê ji bo ser bêderan di hemberî 200 kîlo, yan zêdetir genim de deyn bike. Ger wiha be, eger xwedî milk tov nede, ji vir 200 kîlo behra axê werdigre û di vir de jî 50 kîlo qazanca deyn e, di halekî de dema ku tov bigihîje 210 kîloyan , bi navê pare bi dest dikeve.

Lê di perça axa "B" de ku rij zêdetir e, gelek ferqa rewşê heye.

| Perça "B" | Tov | Berhem | Beşê xwedîyê milk | Beşê cotkar | Behra milk |
|---|---|---|---|---|---|
| Xwedîyê milk tov bide (kîlo) | 150 | 1500 | 900<br>3/5 | 600<br>2/5 | 750 |
| Cotkar tov bide (kîlo) | 150 | 1500 | 500<br>1/3 | 1000<br>2/3 | 500 |

Ev hesabê han ji me re ronî dike ku ji bo çi xwedî milk pê xweş e tovê axên baş li ser wî be, ji ber ku di para wî de 250 kîlo ferq dike, yanî eger tov bi xwe bide, %50 zêdetir dikeve dest ku tov nede.

Me di pêş de behsa vê yekê kir ku dûrbûna axê ji bajêr û bazarê bi awakî giştî tesîr dike li ser awayê parvekirina berhem di navbera cotkar û xwedî milk de. Yanî hindî ax ji bajêr dûr be, para xwedî milk kêmtir e û hindî nêzîk be ewqas zêde ye. Ger wiha be, di çarçova zîraeta muşterek de xwedî milk ji derveyê ji behra milk a eslî çend awa behra milk a din jî li gor hel û mercên axê werdigre.

Di berhemên sanayîyê de, wek titûn û pincarê şekir, xwedî milk dikare bi gelek hîle û pîlan para xwe zêde bike, wek me di pêş de got ew cotkarên titûn û pincarê davêjin, bi tundtirîn awa tên mijandin. Hinek car para cotkar di berhemê danewêle de jî bi wê beşê ve tê girêdan ku ji berhemên sanayîyê dikeve dest. Wek nimûne xwedî milk soz dide ji axa avî jî ji sisîyan yekê jê bistîne, bi wî şertê ku cotkar titûnê jê re bavêje ku du parên wê ji xwedî milk re dimîne.

Ji derveyê van jî pêwîst e orf adetê navçan, peywendîyên eşîretî yên din, di parvekirina berhemê de li ser bingeha muşterekî li ber çav bê girtin. Ev orf û adetên han zêdetir qazanca xwedî milk diparêzin. Lê hinek caran jî dikare xizmeta qazanca cotkaran bike, bi taybetî di wî wextî de ku esasê "wekhevî"yê di holê de mabe. Di hinek wan melbendan de ku cotkar xwedî ax e, wek Bane ya li

ser sinorê Iraqê, adet wiha ye ku ji %10'ê berhemên xwe bidin "Xan", ev adetê han ne li melbenda dûrketî be nayê dîtin. Li hinek cîyên din cotkar her çend xwedîyê axê bi xwe ye, neçar e tiştekî bide axa, lê ev êdî wek beşek ji berhemê nîne.

Her li gel çinîn û amadekirinê nûnerê xwedî milk li ser disekine[22] dema ku bêder hat ber hasilê, berhem li pêş çavê xelkê bi beşdarbûna cotkar û nûnerê xwedî milk tê parve kirin. Li hinek melbendan, wek Sindûs û Mahabadê ji bo çavdêrîya parvekirina berhem "serkar" tê kifşkirin.

Li gor lihevhatina cotkar û xwedî milk û li gor sevîya milkan, berhem dikin du yan sê beşên wek hev û pişk davêjin, lê hinek caran xwedî milk an nûnerê wî kîjan parê bixwazin wî parî werdigrin. Gelek caran roja bêder hildanê, dibe cotkar mêvandarîyek baş ji bo xwedî milk, nûnerê wî û hejmarek zêde ji xelkê wan avayîyan re bike ku bûne beşdarê bêder hildanê.

## 2- Ranta pere

Me di pêş de got ku ranta pere di Kurdistana Îranê de heta niha bi tevayî belav nîne, lê gelek bi tundî berbipêş ve diçe û hêdî hêdî cîyê ranta aynî digre.

Ranta pere li ser awayê sermayedarî ava nebûye ku di wir de sê çînên cihê; xwedî milk, sermayedar û karker di çandinîyê de kar dikin. Belko ew ranta pere:

"... *Rantek axê ku bingeha wê tenê guherîneke ku bi ser ranta aynî de têt, her ew cure guherîn e ku bi ser ranta kedê de têt*"[23].

---

(22) Riya çavdêrîyê tiştek gelek sade ye. Nûnerê xwedî milk muhrek mezin ji dar durust dike ku jê re "şeql" (nîşan) dibêjin . Ev muhra han bîst santîm dirêj û bîst santîm jî pan e û nîşana xwedî milk li ser hatîye kolandin. Hemû demên ku bêder berhev dibin nûnerê xwedî milk der û dorê bêderê bi wê şeqlê muhr dike. Heta roja din sibê eger ew muhr bê xerakirin, nîşana wê yekê ye ku gundî dizî kirîye û çi tiştan ku nûnerê axa deyne dibê gundî qebûl bike -Nivîskar.

(23) K.Marks: "Sermaye", cilda sêyem, rûpel: 777.

Ev ranta han ku cotkar piştî firotina berhemê bi pere dide xwedî milk, bi taybetî dema têkçûna derebegîyê û pêkhatina peywendîyên sermayedarîyê ye. Rewşa vê ranta pere ku li Kurdistana Îranê belav e, pêwîst e behsa van karekterên wê yên xwarê bên kirin: Yekem, ranta pere di netîca ranta aynî û ranta ked de di holê de ye û zêdetir wek tekmîla yên din e. Duyem, ev awayê han di berhemên serekî de wek ên nok, nîsk û.h.d. nayê dîtin ku heta niha jî awayê şirîkatiyê wek awayê ranta aynî awayê herî girîng e rantê ye. Ranta pere zêdetir di berhemên sanayî û bostanvanîyê de heye û gelek caran di xwedîkirina heywanan de jî tê dîtin.

Di pêş de me dît ku ranta ya du berhemên girîng ên sanayî wek titûn û pincarê şekir bi wî awayî tê dan ku berhemê wan li gor zîraeta muşterek tê parve kirin, lê xwedî milk jî û cotkar jî para xwe bi peretî werdigrin. Dîyar e ev ranta aynî nîne, lê her di wê demê de nebûye ranta pere ya rastîn jî. Ji ber ku ev peywendîyên han ku mafê navbera xwedî milk û cotkar dîyar dikin, nehatine guherandin:

*"Ranta pere ew e ku ew peywendîya kevn e ku di navbera re'yet û xwedî milk de hebûye û ku mafê wan dide xuyakirin, diguhere û dibe peywendîya peran a temam ku li gor qanûnê li ser dimeşin û ew dem cotkar tenê îcaredarê axê ye"*(24).

Her ji ber vê jî ji qonaxa derbazbûna ranta aynî ber bi ranta pere tê hesab kirin. Ji bo çandina pembo ranta pere werdigre û ji bo her perçe axa ku bigihîje hezar mêtro çargoşe behra milkî digihîje hezar qiranan(25).

Ranta pere her wiha di bostanvanîyê û di berhemên fêkîyan de belav e, wek li Nelos ku xwedî milk salê 100 hezar qiran kiriya rezan werdigre. Li dor û berê Miyandiwaw darên berî yên cotkaran e û di sala 1945'an de ji bo her 100 metro çargoşe qiranek daye (26), li Urmiyê jî ku baxvanî zêde ye, bi vî awayî orf û adetek di

---

(24) K.Marks: "Sermaye", cilda sêyem, rûpel: 778-779.

(25) Zanyarîyên li ser pemboyê Hozistan in ku li başûrê Îran e û cîranê Kurdistana Îranê ye.

(26) A.Lambton, Landlord, p. 324.

holê de ye.

Ranta pere li gundan ji xanîyan jî tê sitendin, her çendîn cotkar ji xwe re xanî çêdikin û xwedî milk ji dar û kêranan pê ve tiştek nadin, lê cardin jî xanî ji serî heta binî yê xwedî milk e, di vir de ronî dibe ku ji bo çi cotkar kêmtir guh didin rêk û pêkîya xanîyan û di netîca vê de rewşa cî, war û xanî-beran li gundên Kurdistanê ewqas paşdemayî ne. Li melbenda Mahabadê ji her xanîyekî ji 50 heta 300 qiran distînin û li hinek cîyên din cotkar qet nadin, lê kesên bê ax ên di gundan de rûdinin salê ji 20 heta 120 qiran didin. Li melbenda Menguran a nêzîkî Mahabadê cotkar kiriya xanî nadin, lê yên bi xwedî kirina heywanan ve mijûl in û tenê zivistanan tên nav gund, dibê salê ji 30 heta 70 qiranan bidin. Mimkun e kiriya xanî gelek kêm bê ber çav, lê nabe em jibîr bikin ku xanî li ser xwedî milk ji derveyî dar û penceran (kulekan) pê ve tiştek nebûye mal û di ser vê de jî piranîya xanîyan tenê yek ode ne û pişt re ew cotkarê di gund de niştecî ye divê hemû awa karan ji bo xwedî milk bike. Di alîkî din de jî karkerê çandinîyê ji bo ku sevîya jîyana wî gelek nizm e, gelek bi zehmetî dikare vî 50 qiranî jî temîn bike.

Kiriya dikanan li gundan gelek giran e, li Peswê salê dikanek digihîje 15 000 qiranan û li Qelatan 10 000 û li Xelîfelyan jî digihîje 20 000 qiranan. Xwedî milk li Bokan û Sindûs xwedîyê bi sedan dikanan in. Çend sal berî niha hejmara nifûsa Bokan tenê 3 000 kes bû, lê 300 dikan li wir hebûn ku ev û xanîyên wan jî tev de milkên derebegên tayfa Ilxanîyan bûn. Li Sindûs jî rewş her bi vî awayî bû. Hejmara nifûsa Sindûsê jî tenê 5 000 kes e, lê bi sedan dikan tê de ne. Xwedî milk rê nade tu kesekî ku tiştên firotinê li ser hev bikêşe, belko divê tiştên firotinê hemû li meydaneke taybetî bên kêşandin ku xwedî milk salê 23 000 qiran jê distîne.

Xwedî milk îcarek gelek zêde jî ji qehwexanan distînin ku li ser riyên karwanan çayê difroşin; wek nimûne axayê Dêybokir a nêzîkî Mahabadê ji du qehwexanên wiha salê 7 000 qiran distîne.

Belavtirîn awayê ranta pere îcare ye ku li Dîbokrê xwedîyê her cotekî divê salê ji 500 heta 1 000 qiran bide. Li hinek melbendan îcare ji cot tê sitendin, yanî kesê ku du cotên wî hene, divê du îcare bide, ranta pere di vir de cîyê ranta aynî digre. Sala 1945'an li Kengawr a navça Piştkoyê îcare gihîştibû 3 kîlo rûn, 3

mirîşk û 200 qiranan û li Hesenawa ya nêzîkî Sine gihîştibû 1,5 kîlo rûn, 4 mirîşk û 100 qiranan.

Gelek caran kiriya çêrîngehan jî bi pere tê sitendin, ev jî hinek caran mîqtara wê hatîye kifşkirin û hinek caran jî li gor kêm û zêdebûna heywanan, yanî ji çîyan tê sitendin ku salê ji sê qiran heta 20 qiranan e, ev kiriya han jî gelek caran li gora ranta aynî ye. Çîya li gor îhtîyaca derebeg û xwedî milkan tê dîyar kirin(27). Eger derebeg biçe paytext an derveyê welat, kirê li gor hejmara heywanan, an li gor serwet û hebûnên çandinîyê tê dawa kirin. Li melbenda Seqiz kiriya ji çêrîngehan serê malê dike 150 heta 200 qiran.

Wek me di pêş de got pere rent nîşana jiholêrabûna derebegî û kemilîna peywendîyên sermayedarî ye. Li Kurdistana Îranê prosesa jiholêrabûna derebegî, di çandinîyê de girîngbûna ranta pere bi hev re ye. Berbi pêşdeçûna peywendîyên bazarê rola ranta pere zêde dike. Lê ev peywendîyên han bi xwe jî pêş de çûna ranta pere tundtir pêşde dibe û ev ranta han jî rê ji bo behra milkî ya sermayedarî xweş dike.

## 3- Ranta Kedê û Koletîya Gundî

Li hemû cîyên Kurdistanê ranta ked tê dîtin û awayê herî belav ê vê rantê jî kar e. Cotkar divê bi hemû awayî kar û barekî çandinî, ulam (angarya) û wek van ji xwedî milk re bike.

Di melbendên cur bi cur de ferqa sevîya karkirinê heye, li hinek cîyan heft roj û hinek cîyên din digihîje du mehan, xwedî milk çi dema ku bixwaze dikare ulam (bê heq xebat -Elîşêr) rake û her çend peywendîya derebegî bi hêztir be ulam xurtir û dirêjtir e. Ji ber vê ew cîyên peywendîyên guhertinê tê de peyda bûne, bi taybetî nêzîkî bajaran ulam yan bi tevayî guherîye, yan gelek kêm bûye.

---

(27) Li pişt çîyayên Loristan *"...Bizin û mî du şax , guhdirêj sê şax û yeksim çar şax tên hesêb kirin."* Lambton, 290.

Li Hesenawa ulam li ser cot têt hesêbkirin û di salekê de ji heft rojên karê gundî û çar rojên karê guhdirêj (ker) pêk tê. Ji derveyî vê jî gundî divê du rojan di baxê xwedî milk de kar bike[28]. Ew melbendên ku xwedî kirina heywanan tê de belav in divê gundî hemû îhtîyacên ji bo heywan û dewarên derebeg temîn bikin, her wek ev awayê han li Serokanî ya li melbenda Lacan tê dîtin. Ew gundên ku eger gundî hazir be titûnê bavêje, ku qazanca xwedî milk gelek tê de heye, gelek kêm ulam pê dide kirin û eger şitil li ser xwedî milk be (ku ew dem beşê wî yê di titûnê de zêdetir e), ulam bi yek carî ji ser gundî radibe. Li Peswê xwedî milk bi dehan hektar ji baştirîn axa xwe dike titûn û bi ulam hasilata wê hildide. Li hinek melbendên din wek Urmiyê gundîyek titûnê bavêje, ji sisîyan yekê berhemên çandinîyê di şûna wê de werdigre. Li Peswê xwedî milk gundîyan neçar dike ku cîyên titûnê bi cotên xwe jê re bikêlin, pişt re karkerîya çandinîyê bikin ku beşek ji berhemê para wan dikeve. Li ser vê jî heqê xwedî milk heye havînan bi her cotkarekî 40 roj ulam bide kirin.

Li Nelos a li melbenda Şino cotkar neçar e ji derveyî axa xwe 3 heta 5 hektaran ax bi ulam bikêle, ku pişt re gundîyên bê ax didin xebatê[29]. Ji derveyê vê jî hemû xizmeta axê ya xwedî milk li ser gundîyan e. Li hemû gundên Kurdistana Îranê çi wextê kêfa xwedî milk bê dikare gundîyan bibe ulam.

*"...Li melbenda Seqiz ev yeka han jî li ser gundî ye ku çend rojan bi xwe û bi guhdirêjê xwe ve karê xwedî milk bike û çi dema ku xwedî milk daxwaz bike, divê li ser axa wî kar bike. Bi vî awayî çi wexta ku xwedî milk bixwaze axa wî bê kêlan an genimên wî bên dirûtin (çinîn) û an jî her karekî din ê çandinîyê bê kirin, dikare gundîyan ji ser kar û kespên wan bide alî û bibe ulam û ji nan pê ve tu kiryekê nede wan"*[30].

Li hinek melbendên Mahabadê û Sindûsê awayek ulam heye ku jê re dibêjin bendevanî (bend girêdan), li Xelîfelyan (melbenda

---

(28) A.Lambton, Landlord, p. 331.

(29) Gelek caran gundî ew axa ku ji mela re hatîye dan, divê bê heq bikêle -Nivîskar.

(30) A.Lambton, Landlord, p. 331.

Sindûsê) her gundîyek dibê di navbera çar mehan de miroveki ji bo bendevanîyê û 880 kîlo genim bide. Bendevan her karî ji xwedî milk re dike, ji hemalîyê bigre heta pakkirina bîr û yên din. Hejmara bendevan li gundê Qumqelayê digihîje 60 heta 80 kesan. Lê eger gundî li gor ji sisîyan yek kar bike, bendevanî ji ser tê rakirin. Li hinek melbendan ji derveyê bendevanî çend awa ulamên din jî hene.

Di nav eşîretên nîv koçer de ulam yan qet nîne, yan tenê hin kar û barên sade û hêsan in, li wan melbendên ku her xelkê wê mijûlî bi xwedîkirina heywanan e jî, wek Deştebêl, ulam nîne. Kesên ku heywan xwedî dikin ên melbenda Mengur a li navça Mahabadê jî tu awa ulamek li ser wan nîne.

Gelek caran gundî ji bo gelek awa karên xwedî milk û dewletê dibin ulam, her wekî bi hezaran gundî ji bo çêkirina riyên dewletê ulam hatine rakirin. Di van dawîyan de ku xwedî milkan jî otomobîlan kirîne gundîyan neçar dikin rê ji bo otomobîlên wan çêbikin. Li Peswê, 18 kîlometre rê bi gundîyan dane çêkirin û li Nelosê jî 15 kîlometre rê ji bo otomobîla xwedî milk bi gundîyan dane çêkirin.

Ew xwedî milkên li bajaran rûdinin, xanîyên xwe û yên xizmên xwe jî bi ulam rakirinê çêdikin. Eger em bi kurtî awayên karê ulam bidin xuyakirin, ev lîsta han a xwarê dertê ku hîn jî ne temam e:

1- Çêkirina xanî û rê ji bo dewlet û xwedî milk.

2- Paqijkirina bîran û her kar û barekî avdanîyê.

3- Guhertina beşek berhemên xwedî milk ji ciyekî ber bi ciyekî.

4- Kêlana çend perçe ax ji derveyê wê ku gundî ji xwe re bikar tîne.

5- Berhevkirin û kêşana alifên zivistanê yê pez û dewarên xwedî milk.

6- Bikaranîna nêzîkî hektarek axa xwedî milk.

7- Divê her kesê xwedî cot, sê-çar meh bendevanekî bide ji bo kar û barên xwedî milk.

8- Xwedîkirina çend serî heywan ji xwedî milk re.

9- Amadekirina heywanê bar çi dema ku xwedî milk ji bo guhestinekê bixwaze.

10- Kesek xwedî heywanek siwariyê be, çi dema ku xwedî milk

daxwaz bike divê bidê.

11- Berhevkirin û anîna şewata zivistanê ji xwedî milk re, wek dar ku carên wisa hene çend kîlometre ji gund dûr e, yan tepik ku ji rêxa heywanan tê çêkirin.

Ev lîsta han nîşan dide ku ulam wek girîngtirîn bermayên peywendîyên derebegî ye, heta niha jî di Kurdistanê de maye û astengek li ser riya pêşketina welat e. Ger wiha ye di awayê renta aynî de wextê zêde gelek kêm e û cotkarên Kurdistana Îranê ji ber ulam gelek wextê wan nîne karên zêde ji xwe re bikin.

Ev hel û mercên ku me behs kirin, dibin sebebê nizmbûna berhemên çandinîyê û girêdana gundîyan bi xwedî milk ve, heta wê derecê di cîyê xwe de sekinîna peywendîyên çandinî ku ev jî dibe astenga peydabûna cihêtîyê di navbera tebeqên gundîyan de, usûla ulam jî di ser wan hemû bindestî û mijandinan de alîkarîya xebata çînîtî di gundan de dide.

Cotkar wek kolan divê van xercên zêde yên xwarê wek berhem an pere bidin xwedî milk:

1- "Merane" (pez), ku ji 10 qiran (tûmenek) an li gor serê her yek bizin an mîyê girtina mîqtarek rûn e.

2- "Firûcane" (mirîşk), salê 5 heta 10 mirîşk e.

3- "Hêlkane" (hêk), hejmarek hêk e ku li gor demsalan tê guhertin.

4- "Tepalane" (tepik, sergîn) salê 200 heta 500 sergîn e.

5- "Rûnane" (rûn), girtina 2 heta 16 kîlo rûn e . Xwedîyê mîyan divê hirî, penîr û tiştên din jî bidin.

6- "Gurîsane" (piştî, bar), kirîya gurîs e ku dike 50 qiran.

7- "Mêwanane" (mêvan), wextê mêvanê axa yan yê nunerê wî hebe ku li Kurdistanê her wext zêde ye, divê gundî mêvanane bide ku ev yan pere ye yan tişek din e. Ji derveyê vê divê di bicîkirina mêvanan û xwedîkirina heyvanên mêvanan de jî beşdar be, lê xwarina mêvanan li ser xwedî milk e.

8- "Cejnane", her cejnekê, bi taybetî cejna remezan û qurbanê divê gundî bi navê cejnê dîyarîyekê ji xwedî milk re bibe.

9- "Serxoşane" (serxweşî, te'zîye), dema ku kesek ji mirovên xwedî milk bimre, divê bi navê serxweşîyê dîyarîyek jê re bê dan.

10- "Sûrane" ji bo ku gundîyek bikare jin ji kur, birazî yan xwarzîyê xwe re bîne, divê dîyarîyek bi qîmet bi navê sûrane ji bo

axa bibe. Ew melbendên ku xwedî kirina heywanan tê de hene, ev dîyarîya han kavir, tenekek rûn, beran û heta hesp jî dibe û li cîyên din pere ne.

11- "Cerîme", eger gundîyek bi xebera axa neke, yan zîyana gundîyekî din bike, axa tiştek bi navê cerîme jê distîne.

12- Eger gundîyek bimre û mîratgirên wî/wê tunebe, xwedî milk dest deyne ser mîrata wî/wê, hinek caran mîratgirên wî/wê yê qanûnî jî hene, lê cardin axa beşek ji mîrata wî/wê distîne.

13- Hinek caran tê dîtin ku gundî li ser bê emrîyek biçûk a xwedî milk bi tevayî tê talankirin.

14- "Bêgarane" (ulam) eger gundîyek hazir nebe biçe ulam, divê ulam bide û di wî halî de jî her ulam pê didin kirin.

Ji derveyî van wezîfan ku xwedî milk dixe ser milê cotkaran, hinek wezîfên din jî li beramberê avayîyê li ser milan e.

Berî hemû tiştî divê em behsa van tiştan jî bikin ku cotkarek dide mirovên dînî:

1- Mela, ji her gundîyekî 160-240 kîlo genim û ji gundîyên bê ax jî 50-80 kîlo genim maaş distîne. Eger mela bixwaze ji xwe re karek bike, perçe axek jê re tê dan ku ranta jê nayê sitendin û gundî jî bi wasitên xwe jê re dikêlin.

Di meha Remezanê de mela "fitre" (serfitre) werdigre ku ji bo her serek xêzan du kîlo genim e û eger kesek genimê wî/wê tunebe bide, perê du kîlo genim dide.

Di cejna qurbanê de ku gundî qurbanan serjê dikin postê heywanê didin mela.

2- Ewên mirîd û derwêşên şêxan in pêwîst e salê carekê ji mala şêx re dîyarî bibin ku li gor îmkana wan kesan ferq dike.

3- Di piranîya gundên Kurdistanê de mizgeft hene ku xizmet û parastina wê li ser gundîyan e. Her gundîyek divê li gor orf û adetên melbendê salê 16-30 kîlo genim bide micewrê mizgeftê[31].

Feqî xwedîkirin jî li gel mizgeftê ye, li her mizgeftekê 5-15 feqî

31) Di rojên înan de micewr li ser malan digere û nan û xwarin werdigre û rojên cejnan hemû kes divê beşek ji xwarinên xwe têke nav firaqa micewr. Di Kurdî de ji bo tiştên têkel dibêjin "delêyî çiştî micewr e" (tu dibêjî xwarina micewr e -Elîşêr) -Nivîskar.

hene ku mela dersa wan dibêje û gundî wan xwedî dikin.

Hinek wezîfên din jî li ser gundîyan e ku salê carekê divê bicî bînin:

1- 80-320 kîlo genim didin muxtar, ku nunerê dewletê yê resmî ye û zêdetir xizmeta qazanca xwedî milk dike. Her ji ber vê jî xwedî milk ji bo xwe jê re maaş distîne.

2- 50-160 kîlo genim didin kwîxe (keya, kahya) ku hakimek bi sînor e û di rastîya xwe de dardestê xwedî milkê wî gundî ye. Heqê kwîxe li hemû melbendên Kurdistanê ne wek hev in.

3- 16-80 kîlo genim didin "gizîr" ku berpirsîyarê ragirtina orf, adet û nîzam û rêk û pêkkirin û parastina bîran û van awa karan e. Ev jî bi piranî li Kurdistanê dibe çavdêrîya xwedî milk li ser gundîyan.

4- Ji her perçe axekê divê 20 kîlo genim ji "serkar" re bê dan, ku li ser bêder û parvekirina berhemê disekine. Li hinek cîyan serkar nîne, kwîxe cîyê wî digre û netîce jî jê tê sitendin. Lê eger serkar dîyar bike, çi kesê wê wezîfê bicî bîne, çi kwîxe be yan yekî din, xwedî milk 20 kîlo genim ji her perçe axekê werdigre.

5- Şertê Şivan (şerte şwan), ku ji bo bizin û mîyê du kîlo genim e, ji bo dewarên mezin çar kîlo û ji bo heywanên yeksim jî 16 kîlo genim e û ji bo şivan û gavanan tê dan.

Ev ew wezîfe bûn ku gundîyên Kurdistana Îranê li gor orf û adetên welat divê cîbicî bikin. Piranîya van wezîfan li hemû melbendan hene, lê hinek ji van tenê li hinek navçan tên dîtin. Dîyar e ew cîyên peywendîyên derebegî tê de bihêz in mîqtar zêdetir e û seviya wan jî bilindtir e, wek li melbenda Lacan. Li wan cîyên ku peywendîyên derebegî bêhêz in û wan cîyên ku dikin peywendîyên sermayedarî berbipêş de biçin, ev di çarçovek tengtir de ne. Lê li gel van jî ev wezîfên han bi giştî alîyekî girîng ê peywendîyên çandinî yên Kurdistana Îranê ne.

Li gundên Kurdistanê bûyerek din jî heye ku peywendî bi wî awayê derebegî ve heye, ku di peywendîyên çandinîyê de di holê de ye. Meselek Kurdî heye dibêjin: "Eger xwedî milk xwedîyê gundekî ye, re'yet xwedîyê sed gundan e", yanî re'yet dikare bi azadî ji gundekî din barbike here gundekî din. Di vî warî de gotina "xweş nişîn" jî tê bikar anîn, ku mebesta wê ev e; gundî dikare bi kêfa xwe cîyê rûniştinê ji xwe re hilbijêre û bi xweşî tê de bijî.

Lê divê di vî warî de li vê gotina han jî[32] û mesela pê ve jî bê nêrîn, ku daxwaza cotkaran, ne ew e ku goya bi rastî wiha ye.

Di pratîkê de azadîya cotkaran a barkirinê ya temamî nîne. Hewce ye em bizanin ku çi tişt dibe astenga wê ku cotkar bi azadî bar bikin. Ew melbendên ku peywendîyên eşîrî tê de bihêz in cotkar nikare wezîfa ser milê xwe li hemberî eşîret û gundîyan bicî bîne û ji derveyê vê jî bi dilê xwe nabe ji wî gundî bar bike ku pişte pişt ji wir banzde.

Vêca di vir de hinek sebebên aborî jî hene. Cotkar çiqas di gund de bijî heqê wî yê çandina ax û bikaranîna avê heye û di beşek ji wan dar, daristan, rez û baxan de heye, ku ji xwe re danîye. Eger ji wî gundî jî bar bike hemû van heqên xwe winda dike, li gundekî din jî zehmet e ev heqên han bi dest keve.

Pişt re, gelek caran gundî deyndarê xwedî milk e û ji ber ku nikare deynê xwe bide, neçar e li gund bimîne û ev jî riyek e ku bi hemû awayî xwedî milk ji bo zêdetir perçiqandin û mêtina gundî îstîfade bike.

Hinek sebebên ne aborî jî di vî warî de tesîr dikin, wek wan zor û zordestîyan ku xwedî milk[33], jendirme, qanûnên dewletê û yên wek van bikartîne ku ev tev bi hev re azadîya gundî kêm dikin û zêdetir neçar dikin bi axê ve bê girêdan.

Demsala baharê baştirîn wext e ji bo barkirina gundîyan, ji ber ku zexîre û şewata xwe ya zivistanê qedandîye û li cîyê nû jî bi hêsanî dikare peyda bike. Lê xwedî milk qazanca xwe di wê de dibîne ku gundî payîzê biçe û ji ber vê dixwaze payîzê der bike heta zexîre û şewata wî ya ji bo zivistanê di cî de bimîne ku nikare li gundek din wan temîn bike. Her ji ber vê jî gundî dikeve bin hemû şertên xwedî milk, tenê ji bo wî payîzê derneke. Baha-

---

(32) Li gor Şemilov manayek din a vê gotinê heye ku ji gotina "jîn" hatîye sitendin û eslê wê " xweş nejîn" e. (Şemilov, rûpel: 39).

Her çendîn ev mana han ji deqa gotinê dûr e, lê di rasteqînîya xwe de nêzîktir e -Nivîskar.

(33) Di pêş de me got ku xwedî milk li dijî gundîyan alîkarîya yekûdu dikin û eger cotkarek ji gundekî bar kir, xwedî milkên wê melbenda wî li gundên xwe ranagirin -Nivîskar.

ran jî gundî hewil didin eger ji bo wan li hev bê, bi şev bar dikin û xwedî milk jî ji bo pêşî lêgirtina çûna gundîyan şevên baharan heres datîne.

Ev li hember sekinîna malbarkirina gundîyan, dibe asteng li ser riya pêşkevtina gundîyên Kurdistanê, ji ber ku hêzên kar nikare bi azadî bigere.

Peywendîya derebegî astengek e li ser riya pêşkevtina bazirganîya û li piranîya gundên Kurdistanê bi bê musaeda xwedî milk tu kes nikare bi bazirganîyê re mijûl be. Heta fêkîfiroşên bîyanî jî nikarin biçin gundan, bi taybetî eger baxên xwedî milk hebin.

Li hinek cîyên din wek Peswê ya Lacan, cotkar nikare mirîşk û hêk jî ji derveyî axa bifroşe kesekî din. Xwedî milk dikanên gund bi qîmetek gelek zêde didin kirê, lê gelek caran îcaredar jî qazanc dike, ji ber ku ji wî zêdetir heqê kesî yê kirrîn û firotinê nîne. Ev adet û bermayên han tev bi gelemperî li hember sekinandina berbipêşdeçûyîn û bi taybetî pêgihîştina peywendîyên kirrînfirotinê dikin û her di wê demê de astenga li ser riya peydabûna peywendîyên sermayedarî yên nû li gundên Kurdistanê ne.

Gelek caran keça Kurd bê musaeda xwedî milk nikare mêr bike, bi taybetî eger bixwaze bi kesekî re mêr bike ku xelkê gundekî din e, yan ji eşîretek din e, xwedî milk dikare li hember derkeve, yan daxwaza perek wisa li babê wê bike ku kes keça xwe nedê û mêrkirina keça wî bi ser nekeve.

## 4- Ranta Xwedîkirina Heywanan

Me di pêş de behs kir ku xwedî kirina heywanan li Kurdistana Îranê gelek girîng e. Ji %4'ê waridata netewî pêk tîne. Li wan melbendan ku xwedî berhemên heywanan in, hinek bûyerên nû di peywendîyên çandinîyê de tên dîtin. Piranîya heywanên Kurdistanê mî û bizin in û tenê Ermenî û Asurî berazan xwedî dikin.

Ew perçe kerîyên (birrên) mîyan ên li hemû navçên Kurdistanê tên dîtin, hemû yên xwedî milkên mezin, derebeg û serokeşîretan in û sebebê vê jî ev e ku xwedî çêrîngehên baş in, em gelek xwedî milkên mezin dibînin ku hezar, heta du hezar serî mî û bizin xwedî dikin.

Serhejmarên Kurdistana Îranê nîşan didin ku ji %0,6'ê nifûsa gundan xwedîyê şeş mîlyon serî mî û bizinan e, di muqabilê vê de ku li hemû Kurdistanê deh mîlyon serî pez heye, ev yek tê vê manê ku %60 ya wan e. Piranîya xêzanên gundîyan 5 heta 10 serî heywanên wan heye, xwedî milk xwedîyê zêdetirî hezar serî pez e.

*"Li melbenda Seqizê...her çendîn av û hewaya wê baş e, ji çend serîyan pê ve heywanên piranîya gundîyan nîne"(34).*

Dîyar e li melbendên din jî her wiha ye.

Awayê perwerdekirina heywanên gundîyan jî ji ya xwedî milk cuda ye. Ji ber ku gundîyek feqîr ku jîyana mal û zarokên xwe bi başî nikare pê temîn bike, nikare bi awayekî baş heywanan jî perwerde bike. Bi yek nêrînê li her gundekî mirov bi hêsanî dikare heywanên xwedî milk û yên gundîyan ji hev cuda bike, bi taybetî di heywanên şaxî de. Ev rastîya teorîya Lenin nîşan dide ku dibêje:

*"Aşkera ye ku gundîyek nîv hal ku ax bê feyde di dest de ye û di hemû waran de bi zincîra koletîyê ve ye, nikare cisnê heywanek piçek baş xwedî bike. Ji ber ku dema ku cotkar birçî bû, ku ji bo vê jî nabe em cotkar hesêb bikin, bêguman heywanên wî jî birçî dibin"*(35).

Eşîretên niştecî û nîvniştecî şivanan ji pezên xwe re digrin, ku herkes li gor zêde û kêmbûna pezên xwe heqê şivanan dide. Bêcî nîne ku hatîye gotin; şivanî li Kurdistanê gelek karek zor û bi mesulîyet e, ji ber ku cîyên wan gelek asê ne û wehş jî gelek zêde ne.

Şivanek ji 200 heta 500 serî mî û bizin xwedî dike û di hemberî vê de 10 heta 14 serî heywan didinê(36). Li melbenda Sindûs şivanek salê ji 3 heta 5 hezar qiranan pere, belindirekê, du hirî, nan û cil (kinc) distîne.

---

(34) A. Lambton, Landlord, p. 358.

(35) Lenin: "Berhemên Helbijartî", bi zimanê Çekî, cild 15, rûpel: 111.

(36) A.Lambton, di rûpela 358'an de dibêje: *"Bi giştî wisa dîyar e; îcarên (kode) ji çêrîngehan gundîyan naçar dikin ku kêmtir heywan xwedî bikin".*

Ji ber vê yekê xwedî milk gelek caran li çêrîngehan xanî nade kesên xwedî pezên zêde, hinek caran gundîyên xwedî pez jî naçar in xercek zêde bidin xwedî milk, her ji ber vê jî hejmareke kêm heywan xwedî dike û ji ber vê ye jî ku sevîya heywan xwedîkirinê wek hemû kar û barên çandinîyê di Kurdistanê de gelek nizm e.

Bi kurtî em dikarin bêjin ku hem piranîya çêrîngeh û hem jî ya mer'a û mêrgan, ên xwedî milk in û kêm ji çêrîngehan ên dewletê ne ku ew jî kodek (ji îcara zozanan re kode tê gotin -Elîşêr) zêde ji van çêrîngehan distîne.

Di nav eşîretên nîvkoçer de, ku pez û heywanên wan zêde ne, peywendîyek muşterek a taybetî heye, ku jê re "hobe" (deh kon) dibêjin û ji ber vê hinek ji rojhilatnasan vê bûyera han gelek girîng dîtine, em jî pêwîst dizanin ku hinekî li ser bingeha vê bûyera han bisekinin(37).

Di dawîya sedsala 19'an û destpêka sedsala 20'an de ku eşîret, peywendîyên eşîretî û jîyana koçeratî hatîye qonaxa helweşandin û têkçûnê, hobe peyda bûye û bûye peywendîyek girîng di navbera xwedî heywanan de. Hobe, ji kombûna hejmarek xwedî heywanên gundekî an çend gundan pêk tê ku baharan ji bo çêrandina heywanên xwe diçin zozanan û havînan li wir dimînin û payîzan bi hev re vedigerin û herkes diçe gundê xwe û hobe belav dibe. Di wextê hobe û hawarê de hemû gîr û girift diçin ber destê mezintirîn rîspîyê hobenişînê ku jê re "serhobe" yan "serxêl" dibêjin. Aşkera ye hevkarîya di navbera van hobenişînan de tenê di çarçova heywan çêrînê de ye û karên din ên wek heywan dotin, penîr çêkirin, hirî birîn û yên din wek van.. her kes a xwe bi xwe dike.

Endametîya hobê bi dilxwazî ye û ji her xwedî heywanekî re vekirî ye û peywendîya hobê bi qebîle û eşîretê ve nîne. Ji ber ku peywendîya eşîretî şertek pêwîst ê endametîya hobê nîne. Pişt re wek me behs kir hobe tenê rêxistinek demî (muwaqet e)ye û peywendîya di navbera endamên wê de jî her demî ye, di navbera 6 heta 8 mehan de ye, yanî ji destpêka baharê heta payîzê ye.

(37) Binêre Nikitin: "Kurd", rûpel: 149-151.

Esasê peydabûna hobê ev e; gundîyê sade ku zêdetirîn xwedî bîst serî heywan e, nikare tenê bi serê xwe çêrîngehek kode bike. Ji ber ku çêrîngeh ji bo bi sedan heta bi hezaran mî û bizinan tê kode kirin. Loma gundî neçar e li gel xêl bi rê keve û pişt re çend xêlên din dibin yek û hobeyekê pêktînin. Sebebek din jî ev e, ku gundî tenê bi serê xwe nikare wan heywanên xwe yên kêm bibe zozanan û ji ber vê diçe ba hobê, ku 15-20 mal an zêdetir tê de dicivin.

Serhobe li hemû endamên hobê wek hev dinêre û ji hemû endaman li gor hejmara heywanên wan îcare distîne. Eger piranîya hobê ji eşîretekê be, serokê wê eşîretê dibe serokhobe, lê ger ne wiha be dewlementirîn endamê hobê dibe serokhobe. Yanî serokhobe tenê kesê rîspî nîne, ji ber ku hinek îmtîyazên wî yên taybetî hene; wek ku endamên hobê ji bo xizmeta pez û dewarên xwe dibe ulamê û hobenişîn li gor îmkanên xwe xerc didin û di wextê mêvandarîyê de dîyarî jê re dibin. Hemû endamên hobê divê heywan, rûn, hirî û tiştên xwe yên din di rîya serokhobe re bifroşin, ku ji vê waridatek zêde bi dest dikeve. Serokhobe bi bazirganekî re li hev dike û hemû berhemên hobê li ser hev difroşe. Ev cure dan û sitendin (tîcaret) li ser sedan hezar û hinek caran ser mîlyonan dan û sitendin dibin. Dîyar e bazirgan jî di bedela vê delalîyê de devşêrînîyek baş dide serok(38). Bi vî awayî serok ji heywanên xwe û ji yên xelkê hobê qazancek bêhejmar bi dest dixe û gelek caran heye bi vê dibe xwedî mîlyon(39).

Di vir de em têdigihin ku peywendîyek wekhevî di navbera endamên hobê de nîne û di eksê wê de bi awakî gelemperî wek di gotinê tenê de ye, ferqa kuratîya çînîtî û cihêbûna zengînî û peran tê de zêde ye. Di hobê de sê grub tên dîtin; serokhobe û xizmên wî, xwedîyên pez û xwedîyên heywanên kêm. Bi vî awayî di hobê de awakî nû yê paşvemayên eşîretên koçerên me tên ber çav.

---

(38) Li melbenda Deştebêl ku Eşîreta Herkîyan li wir dijî, serok di cîyê vê delalîyê de 8-10 ton birinc ji bazirgan werdigre -Nivîskar.

(39) Serokeşîretê Herkî ku serokê hobeyek mezin a li ser sinorê Îran û Iraqê ye, mezintirîn dewlemendê wê melbendê tê hesêbkirin û dibêjin barê çend hêstiran (katir) lîrên wî hene -Nivîskar.

Li gel van jî em dikarin bêjin ku hobe di berhemdarîya xwedîkirina heywanan de awayekî alîkarîyê ye û di eksê hinek milên wê yên xerab ên wek awayekî perçiqandin û mêtina endamên wê yên sade ji alîyê serokhobe ve nebe, dikare bibe bingeheke ji bo alîkarîya rastîn ku bikare ne her tenê di berbipêşdeçûna xwedîkirina heywanan, her wiha berbipêşdeçûna berhemên mezin ên xwedîkirina heywanan de jî rolek girîng bilîze. Dîyar e ev karê han pêwîstî bi wê yekê ku desthilat bikeve destê hêzên demokrasîyê ve heye û divê beşek aborîya pêşkevtî ya dewletê pêk bê ku tesîra wê li ser hemû aborîya welat hebe.

## 5- Ranta Sermayedarî

Ev awa ranta nû dike di Kurdistana Îranê de pêş de biçe. Li gel vê jî heta li wan cîyên ku heye, karekterek wê ya gelek taybetî heye, ji ber ku xwedî milkên mezin her di eynî wextê de sermayedar e jî. Behra milkîya sermayedarî zêdetir di warê pîşesazî de tê dîtin, bi vî awayî ku xwedî milk traktor û makînên çandinîyê yên din distîne û hêdî hêdî gundîyan ji gund derdike, yan wan dike karkerê çandinî yên kirêgirtî, her wek niha li melbenda Miyandiwaw û Kirmaşan tê dîtin. Di van dawîyan de awayê şirîkatî ya mezin jî li hinek navçên Îranê cî girtîye, lê heta niha negihiştîye Kurdistana Îranê.

Ji ber vê, peywendîya sermayedarî kêmtir bi pêş de çûye û sermayedar û bazirgan kêmtir sermaya xwe di warê çandinîyê de dixin kar, heta niha jî xwedî milk û sermayedar li Kurdistana Îranê di şexsê yek kesî de tên dîtin. Sermayedar eger bixwaze sermaya xwe di çandinîyê de bixe kar, bi sebebê peywendîya derebegî ya gund ve tuşî astengên bê hejmar dibe. Ji derveyî van sebeban jî sermayedarên xeyrê Kurd, Kurdistan melbendek sînorî û ji merkezê dûr dizanin û dilê wan li ser tirsê ye, ji ber ku tê de gelek alozî hene û destê dezgên îdarî nagihîje hemû cîyan.

Mimkun e carnan xwedî milk gundekî xwe bi awayê sermayedarî bi rêve dibe û traktor û karkerên çandinîyê tê de dide xebatê, lê her di ber vê re li gundekî din ranta aynî werdigre û li gor nîzama derebegî gundîyan ji bo xizmeta xwe dide xebatê. Wiha jî

heye ku xwedî milk van herdu awayan di gundekî tenê de bikar tîne, yanî ji bo axa baş û bi rij karkerên çandinîyê digre, lê di axên din de behra milkî ya derebegî werdigre û makînên çandinîyê dike sebebê zexta li ser gundîyan û neçar dike ku bi awakî xweşî axê jê re bikar bînin. Eger wiha nebe rewşa civakî ya gundîyan dikeve tehlîkê û divê yan gund jê re bicî bihêlin, an bibin karkerê zîraetê. Ji ber vê gundî bi çavên dijminatî li traktorê dinêre, her wek karkeran ku di destpêka peydabûna sermayedarîyê de li makînan dinêrîn. Di vir de riyek din a vî awayî jî heye: dema ku gundî heta do li gor ranta aynî ax dikêla û hemû cure karek jî jê re dikir, îro dibe karkerê kirêgirtî, êdî bi yekcarî nîrê li ser milê xwe dide alîkî. Vê carê ev kiriya han ku îro bi xwe bi xêzanên xwe ve werdigre ji qîmeta wê berhemê zêdetir e ku li gor ranta aynî diket dest. Sebebê wê jî ev e ku di netîca bikaranîna makînan de berhemdarîya kar bi pêş ketîye. Her wiha xwedî milk jî tenê ranta axê bi dest nakeve, belko ew qazanc jî dikeve dest ku sermayedarek ji karê xwe qazanc dike.

Lê pêwîst e em bibîr bînin ku karkerê çandinîyê gelek bi tundî tê mêtin, ji ber ku di navbera 7-8 mehan, ji meha Adarê heta Çirya Yekem, ji serê sibê heta êvarê kar dike. Yanî di bahar û havînan de ji seet çar-pêncan heta heft-heştê êvarê û bi kurtî rojê 14-16 seet kar dike. Xwedî milk gelek caran di cîyê karkerê çandinîyê de jin û zarokan bi kirê digre, ji ber ku kirêyek gelek kêm dide wan. Di derbarê zarokan de Lenîn rast gotîye ku dema dibêje:

*"Gelek caran tenê ji bo nan û cil-bergên xwe zehmetî dikişînin ne ji bo tiştekî din."*(40).

Li melbenda Urmiyê û Miyandwawê kirêgirtî gelek baş distînin, di rastîyê de li wir hemû kar ew dikin û heta derecek zêde kiryek baş jî distînin ku rojê dike 50-60 qiran. Ji bo wan karan ku pêwistî bi zanîn û jêhatîyê heye, wek tirî givaştin û doşab (dims, mot) kelandinê, carnan rojaniya wan digihîje 80-100 qiranan, lê tenê baharan wextê rez kolanan û payîzan jî wextê berhem

(40) Lenin: "Berhemên Helbijartî", cilda sêyem, rûpel: 227.

hilgirtinê kar heye, wextên din tiştek nîne. Di van herdu melbendan de ku dewlementirîn ji melbendan tên hesêbkirin, karker kêm in ji navçên din kirêgirtî tên vir û piştî temambûna kar bi perek kêm ve vedigerin gundên xwe, lê ev perê hanê kêm jî ji wan re gelek e. Ev rastîya han zêdetir ji me re di mesela derxistina şîrê gûnîyan de ronî dibe(41) ku ji cîyên gelek dûr û bi piranî ji Kirman tên ku 2 hezar kîlometre ji Kurdistanê dûr e. Ev karkerên han ji alîyên şirketên bazirganî ve tên kirêkirin û kiryek kêm û beşek ji berhemê werdigrin. Dîyar e evên han li melbendên wan tu karek bi destê wan nakeve, heke ne, 2 hezar kîlometre li pêy kar nedihatin.

Ew melbendên ku di gera pê kar de belav e, rewşek pêşkevtina çandinîyê jî dixe ber çav:

*"...Ji ber ku: 1- Ew diçin melbendekê ku kiriyek zêdetir bi destê wan dikeve û wek kirêgirtîyekî halê wan baştir e. 2- Ketina pê kar, awayê kirê girtina zordarî û kirê kar kirinê têk dide."*(42).

(41) Li ba wan wisa ye Îran tenê welatek be ku eşya ji derve bîne, gunî li naverasta Kurdistanê wek Sine (li melbenda bakur a wek Mahabadê diçin). Ev mada han di çêkirina qumaş û sen'etên kimyayî de tê bikaranîn.

(42) Lenin: "Berhemên Helbijartî" cilda sêyem, rûpel: 242.

FESLA HEŞTAN

# AVABÛNA CIVAKÎ Û SEVIYA JÎYANA XELKÊ GUND

## 1- Avabûna Civakî ya Gundîyên Kurdistanê

Bi alîkarîya lêkolînên ku di pêş de hatin kirin, em dikarin bi awakî giştî terkîba civakî ya gundîyên Kurdistanê derxînin. Baştirîn rê ji bo ji hev cihêkirina tebeqên cihê ev e ku li gor milkîyeta wasitên berhemdarîyê, yanî berê li gor mezinaya axê, hejmara heywanan û bi taybetî cot û wasitên çandinîyê û hejmara karkerên kirêgirtî beş bikin.

Eger em vê pîvana han di melbendekê de bikar bînin ku berhemên zîraetê beşê serekî yên berhemdarîya çandinîyê ye, ev grûb û tebeqên xwarê tên xuyakirin:

1- Xwedî milkên mezin.
2- Xwedî milkên navîn.
3- Cotkarên dewlemend (Malikanên biçûk).
4- Cotkarên navîn.
5- Cotkarên bê ax.
6- Karkerên çandinîyê.
7- Hinek tebeqên din.

## 1- Xwedî Milkên Mezin

Ji %64'ê axa çandinîyê di destê van de ye û li ser hev her yek ji van xwedîyê 300 hektar ax in ku ev axên han baştirîn axên melbendên xwe ne. Xwedî milkên mezin tenê ji %0,3'ê nifûsa gundan pêk tînin û bi xwe û xêzanên xwe ve hejmara wan digihîje 10 hezar kesan. Ev grûbek biçûk in ku hemû hewl û kirinan ji bo parastina peywendîya çandinîyê ya niha dikin û bi giştî dibin asteng li ser riya pêşketina civaka Kurdistanê. Xwedî milkên mezin li gundan najîn û piranîya wan xwedîyê zêdetirî gundekî ne[1].

## 2- Xwedî Milkên Navîn

Ji %14'ê axa çandinîyê ya Kurdistanê di destê van de ye û kêmtir ji %0,6'ê nifûsê ne, yanî 20 000 kes in. Ev xwedî milkên han li gundan dijîn û serokatîya ax û zevîyên xwe dikin, lê bi xwe karê çandinîyê nakin. Evên han an xwedî gundekî temam, an yê beşek mezin ji gund in, pîvana axa van di navbera 30-50 hektaran de ye.

## 3- Malîkanên Biçûk[2]

Evên han ji %6'ê axa kêlayî (ajotî) di destê wan de ye û ji %1,5'ê nifûsa gundîyan in. Pîvana axa malikanên biçûk di navbera 5-20 hektaran de ye, ku li gor awayê şirîkatî didin gundîyan yan jî ji xwe re karkerên çandinîyê didin xebatê.

## 4- Cotkarên Navîn

Cotkarên navîn her yek ji wan xwedî perçek axa biçûk e ku ji bo xwe bikar tînin û wasitên wan ên kêlanê bi xwe jî hene. Evên han kar ji bo xwedî milkan nakin û axa wan a zêde nîne ku bi ranta bidin. Piranîya cotkarên navîn dikarin jîyana xwe û ya xêzanên xwe temîn bikin. Ev grûba han li Kurdistana Îranê kêm e û ji %3'yê nifûsa gundan e, yanî 90 hezar kes in ku ji %2'ê axa kêlayî di destê wan de ye.

---

(1) Binêre beşê duyem ê fesla şeşan: Milkê xwedî milkan.

(2) Niha jê re dibêjin "kulak", lê bikaranîna gotina kulak ji bo wan şaş e û nabe li Kurdistanê ev malîkanên han ên biçûk burjuwazîya gund an kulak bên hesêb kirin -Nivîskar.

## 5- Cotkarên Bêax

Evên han zêdetirîn hejmar û girîngtirîn grûb in ku bi zîraetê ve mijûl dibin. Hejmara wan digihîje 2 mîlyon 160 hezar kesan û ji %72'yê nifûsa gundan pêk tînin. Em dikarin van bi ser du grûban de parve bikin; yekem, (nêzîkî ji %42'an)[3] ew in ku cot, wasitên çandinîyê û ji 5 heta 10 serî heywanên wan hene û her yek ji van 1-3 hektar ax diajon (dikêlin). Grûba duyem, ji %30'ê[4] nifûsa gundan in û her yek ji wan nêzîkî hektarek ax bi behra milkî diçînin. Eger cotê wan tunebe, yan bi qazme axê dikêlin, an bi cot û wasitên xwedî milk, yan jî xwedî milk van cotkaran di destê yekem de bê heq dide xebatê û ax jê re dikêle û pişt re berhemên wê li gor awayê şirîkatiyê parve dikin.

## 6- Karkerên Çandinîyê

Karkerên çandinîyê ne xwedîyê ax e û cot û ne jî xwedîyê wasitên çandinîyê ne, tenê ji bo devşilîya zarokên xwe xwedîyê du-sê serî heywanên biçûk in. Karkerên çandinîyê ji %10'ê nifûsa gundan e û hejmara wan digihîje 300 000 kesan, ev bi kiryek kêm kar dikin (ku piranî bi pere ye) û feqîrtirîn tebeqa nifûsa gundîyên Kurdistanê ne.

## 7- Hinek Tebeqên Din:

Evên han axa wan nîne, hinek çerçî, bazirgan û pîşesaz in û hinek jî mirovên ayînî, mamoste û yên din in... û hemû li ser hev ji %5'ê nifûsa gundîtîyê ne û hejmara wan digihîje 75 hezar kesan.

Cetvela xwarê rewşa tebeqên cihê yên gundîyên Kurdistanê û nisbetê esasî yê pêkhatina nifûsa wan nîşan dide. Girîngtirîn noqta ji me re ronî dibe ev e ku ji %82'yê kedkarên gundî yên Kurdistanê bihostek axa wan nîne û di ber vê re ji %78'ê axa çandinîyê ya grûbek biçûk e ku tenê ji %1'ê nifûsa Kurdistanê ne. Em dikarin

---

(3) Di kitêba Wilçifski: "Kurdên Mukrîyan" de hejmara %45 ji bo melbenda Kurdistana Navîn nivîsandîye. Komela Etnografya Asya Navîn, bi zimanê Rûsi, Moskova, 1958, rûpel: 192.

(4) Eynî serokanî.

vê yeka han bi girîngtirîn netîcek bihesibînin ku di vê cetvelê de tê dîyarkirin. Dîyar e kêmasî û ji sedî sed nerastîya reqeman, netîca vê rastîya han naguherîne.

Li gor milkîyeta axê terkîba civakî ya gundnişînan[5].

| Grûb | Endamê wan[6] | Nisbeta wan li gel nifûsê | Nisbeta axên kêlayî di destê wan de | Pîvana axa ku serê malekê dikeve(bi hektar) | Hemû pîvana wan axên di destê vê grûbê de ye |
|---|---|---|---|---|---|
| Xwedî milkên mezin | 10.000 | %0,3 | %64 | 300'an zêdetir | 768.000 |
| Xwedî milkên navîn | 20.000 | %0,6 | %14 | 30-50 | 168.000 |
| Malikanên biçûk | 45.000 | %1,5 | %6 | 5-20 | 72.000 |
| Cotkarên navîn | 90.000 | %3 | %2 | 1-3 | 24.000 |
| Cotkarên bê ax | 2.160.000 | %72 | --- | --- | --- |
| Karkerên çandinî | 300.000 | %10 | --- | --- | --- |

**Cetvela Hejmara 13**

(5) Ev hejmar me ji gelek serokanîyan wergirtine - Nivîskar.

(6) Li ser wî hesabî ku li ser hev hejmara xêzanên malekê li Kurdistana Îranê pênc kes e.

Karê serekî yê ji %10'ê nifûsa gundî, xwedî kirina heywan û berî hemûyan jî mî û bizinane. Di wan melbendan de ku xwedîkirina heywanan milê girîng ê berhemdarîya çandinîyê ye, em dikarin li gor van çend grûbên xwarê bidin xuyakirin:

1 - Xwedî pez û çêrîngehên mezin.
2 - Xwedî pezên navîn.
3 - Xwedî heywanên biçûk.

Hejmara heywanan li Kurdistana Îranê digihîje 10 mîlyon serî ku 2 mîlyon serî dewar in (ga, çêlek, mange û.h.d) û yên din (8 mîlyon serî) mî û bizin in. Cetvela hejmara 14 cihêtîya navbera xwedî heywanan li gor hejmara heywanên her grûbekê (ji derveyî dewaran) nîşan dide[7].

| Grûb | Hejmar | Nisbet li gel nifûsê | Nisbeta heywanên heyî | Hejmara heywangerîyê | Hejmara heywanan serê aîla |
|---|---|---|---|---|---|
| Xwedî pezên Mezin | 20.000 | %0,6 | %60 | 6.000.000 | 1000'an zêdetir |
| Xwedî Pezên navîn | 120.000 | %4 | %18 | 1.800.000 | nêzîkî 75 |
| Xwedî Heywannên biçûk | 150.000 | %5 | %2 | 200.000 | 5-10 |

**Cetvela Hejmara 14**

Ev cetvela han bi ronî nîşan dide ku %60'ê mî û bizinên Kurdis-

---

(7) Di derbarê çêrîngehan de hejmarên bawerî pê kirî di destê me de nînin û piranîya çêrîngehan milkê xwedî pezên mezin û milkdarên mezin in. Ji ber vê di vir de hejmar li gor gotinan hatine danîn. Di van dawîyan de hukumet ketîye hewildana millîkirina çêrîngehan.

tanê yên grûbekê ye ku ji %1'ê nifûsa gundî kêmtir e û tenê ji %6'ê xwedî heywanan e. Xwedî heywanên biçûk û şivan jî ku zêdetirî ji %50'yê xwedî heywanan in, tenê ji %2'yan heywanên wan hene. Li gor vê ji bo grûba yekem serê her kesekî 300 serî heywan dikeve, di grûba sêyem de her kesek tenê serîyek heywan jê re dikeve.

Dîyar e di xwedîkirina heywanan de jî rewş eynî wek a çandinîyê ye. Li beramber grûbek kêm ku çendîn birr (kerî, col) pezên wan hene, piranîya xwedî heywanên biçûk ji çend serîyan pê ve gumana tiştekî nakin. Di nav xwedî heywanan de jî grûbek mezin xwedî pez heye ku li ser hev serê malê 75 serî heywan dike. Hebûna jîyana vê grûba han a mezin bi du tiştan ve girêdayî ye: yekem ev e ku peywendîya eşîratî wek me di pêş de got heta niha jî di nav xwedî heywanên nîvniştecî de bihêz e û heta niha jî li hinek cîyan çêrîngeh malê hemû eşîretê ye. Ya duyem ev e, ku xwedîkirina heywanan di çîyayên Kurdistanê de rehet e û mesrefa wan kêm e. Ji derveyê van peywendîya di nav hobê de jî ku di nav xwedî heyvanan de heye, alîkarîya hebûna vê bûyera han dike.

## 2- Rewşa Cotkaran

Li gor lêkolîna me ya taybetî[8] xwedî milkên mezin nêzîkî ji %20'ê warîdata netewî werdigrin û waridata serane ya vê grûba han salê dike 5 600 dolar. Xwedî pezên mezin jî ku nêzîkî ji %24'ê warîdata netewî werdigrin, warîdata wan a serane dike 3 300 dolar. Xwedî milkên navîn jî nêzîkî ji %5'ê warîdata netewî werdigrin, yanî zêdetir ji 500 dolaran warîdata serane. Sevîya bi hev re ya warîdata malikanên biçûk salê 120 dolar e û warîdata salane ya cotkarên navîn jî digihîje 60 dolaran û ya salane ya xwedî pezên navîn jî ji 160 dolaran derbaz dibe.

---

(8) Di pîvana danîna warîdata netewî de, me awayê berhemdarîyê li ber çav girtîye û ji bo danîna xercê maddî jî me qîyasa wan karan girtîye ber çav, ku ji bo hemû Îranê hatine kirin, her wiha ji bo dîyarkirina beşê her grûbekê di warîdata netewî de jî awayê berhemdarîyê me li ber çav girtîye -Nivîskar.

Ya ji me re ji tevan girîngtir e, rewşa jîyana cotkarên bêax û karkerên çandinîyê ye, ku ev her du grûbên han ji %82'yê nifûsa gundî pêk tînin.

Ev her du grûbên han di feqîrî û belengazîyek cergbir de dijîn, ji ber ku ev koma kedkar a gundî, ji derveyî vê mêtinî û perçiqandina ku bi tundî tam dikin, di netîca vêrgîyên ne di raste rast de mêtinîyek ne raste rast jî tam dikin. Dewlet titûn û pincarê şekir ji xwe re paxan kirîye ku piştê genim girîngtirîn berhemê welat in. Wek nimûne karbidestên ħukumetê li gor başî û xerabîyê titûnê dikin çar par û dikirin:

Dereca yekem kîloya wê 48 qiran, ya diduyan 5-16 qiran û bihayê ya navîn ku hukumet ji bo kîloyek titûn dide 20 qiran e. Di hemberî vê de kîloya vê titûna han bi 200-450 qiranan difroşe ji derve. Li bajarê Urmiyê hukumet kîloya titûnê bi 27 qiranan dikire û bi 450 qiranan difroşe[9].

Di cigare çêkirinê de jî rewş bi vî awayî ye. Ji kîloyek titûn 800 cigare tê çêkirin. Eger em ji sedî sed bihayê titûnê yê ji bo xercê jî bixin ser, 800 cigare bi 40 qiranan çêdibe. Di beramberê vê de erzantirîn cure cigare (ku cigara Şino ye û ji titûna Şino tê çêkirin) 20 libên wê bi 10 qiranan e, yanî 800 cigare dike 400 qiran. Madem wiha ye ji kîloyek titûn 360 qiran dikeve destê hukumetê, ku em dikarin 80 qiran qazanc ji dewletê re hesêb bikin. Lê hukumet li gor vî awayî, ji kîloyek titûn 280 qiran qazanca safî werdigre ku di riya vêrgîya ne di raste rast a cigarê de ji cêba kedkaran kêm dibe.

Sevîya navîn a berhemê titûnê li Îranê 14 hezar ton e(10) ku li Kurdistana Îranê ji %25, yanî 3.500 ton berhem tîne. Ew warîdata zêde ya dewletê tenê ku ji axa Kurdistanê tê wergirtin digihîje 980 mîlyon qiranan, ev jî ji beyanamên dewletê derdikeve ku dibêje: sala 1958'an warîdata sanayîya titûnê û cigarefirotinê gihîştîye 2.250 mîlyon qiranan[11].

---

(9) "Îrana Îro", rûpel: 164.

(10) Economic Developments in the Middle East, 1958-1959 U.N. New York 1965. p. 55.

(11) Weşanên Banka Millî ya Îranê, 1959.

Dewlet di kirîna pincarê şekir de jî her vî awayî bikar tîne. Ji bo her tonek pincarê şekir 780 qiran û şeş kîlo şekir dide ku li ser hev dike 900 qiran. Pincarê şekir jî bi awakî navîn ji %15'ê wî dibe şekir û li gor vê, ji her tonek pincar 150 kîlo şekir çêdibe ku dewlet vî bi 3 hezar qiranan difroşe. Li gor vî hesabî ku girantirîn xercê bikaranîna tonek pincar 300 qiran e, tê dîtin ku dewlet ji her tonek pincarê şekir 1500 qiran qazanc dike.

Di sala 1958'an de Îran 730 hezar ton pincarê şekir berhem anîye(12) ev jî nîşan dide ku hukumet ji 1.000 mîlyon qiranan zêdetir qazanc kirîye. Di ber vê re ku Kurdistana Îranê berhemê ji %20'ê pincarê Îranê tîne, tê dîtin ku Kurdistan salê 200 mîlyon qiran waridat dide hukumetê(13).

Me ev nimûnen han ji ber vê yekê anîn da em wan awayên hatinan ronî bikin ku çînên serdest yên Îranê ji bo mêtina ne raste rast a cotkarên Kurd bikar tînin.

## A) Faîz

Xwedî milk û bazirgan li hemû navçên Kurdistana Îranê ji bo şelandina cotkaran, xwarina çendîn awa faîz bikartînin ku ji hemû awayan belavtir "selem" e. Li gor vê, cotkar warîdata xwe ya çandinîyî ya rojên bê, bi selem difroşe bazirganên bajêr. Sebebê vê jî ev e ku warîdata cotkar ewqas nîne ku sala xwe pê bibe serî. Bazirgan bihayê berhemê bi aynî didê û bi vî awayî cotkar bi bazirgan ve tê girêdan û naçar dibe ku hemû lazimîyên xwe ji dikana wî bistîne. Dîyar e bazirgan berhemên sala bê bi qîmetek erzan ji cotkar dikire û di ber vê re kel û pel (eşya) jî, bi taybetî yên sanayî bi qîmetek giran difroşê.

Ev awa faîz xwarin li navçên bakurê Kurdistana Îranê û bi taybetî li Mahabadê gelek belav e. Li Mahabadê ku hejmara nifûsa wê ji 20 000 kesan derbaz dibe, du hezar dikan hene(14), yanî li ser

---

(12) Economic Developments...p.54.

(13) Qazanca safî ya hukumetê sala 1959'an ji 300 mîlyon qiranan zêdetir bûye. (Weşanên Banka Millî ya Îranê, sal, 1959).

(14) Binêre behsa Mahabad li "Ferhenga Coxrafya Îran" bi zimanê Farisî, cilda çaran, Tehran, 1949-1953.

hev ji bo deh kesan dikanek. Eger em hesabê vê jî bikin ku hejmara xêzanê her malekê pênc kes be, dibe 10 hezar kes, yanî ji %50'yê nifûsa bajêr dikandar in. Aşkera ye ev bûyerek gelek bal kêş e û ji hel û mercên taybetî yên Mahabadê pêk hatîye, ji ber ku bûye merkeza melbendek fireh ku hejmara nifûsa wê nêzîkî 300 hezar kes e, her wiha peywendîyek bazirganî ya tund ya Mahabadê jî, bi awakî qaçaxî li gel Iraqê heye.

Sebebek din ê peydabûna vê bûyera han a bal kêş, faîz xwarin e. Ji ber ku burjuwazîya bazirganî ya Kurd li gor selem feyde werdigre ku ne tenê dibe sebebê hejarî û çarereşîya cotkaran, her wiha tesîrek xerakirî li ser ber bi pêş de çûna wasitên berhemdarîyê jî dike. Ji ber ku bazirgan hemû sermayên xwe di vî awayê faîz girtinê de bikar tînin ku qazancek gelek baş ji vê dikeve destê wan û qet guh nadin projên sanayî ku hejmara wan li Mahabadê gelek kêm e.

Awayekî din ê faîz girtinê ku gelek belav e, ev e ku xwedî milk zivistanan û biharan genim bi deyn difroşin cotkaran û li ser bêderan di cîyê vê de pere werdigrin. Ji ber vê jî ku Îslamîyetê faîz heram kirîye, metodên hemû awayên kirîn, firotin û qazancek zêde jî ji bo xwedî milk tê de ye. Di baharan de xwedî milk 300 kîlo genim difroşe cotkar ku di wî waxtî de kîloya wî bi çar qiranan e û li gor vê cotkar 1200 qiran dibe deyndarê wî. Li ser bêderan jî genim tê ser sê qiranan û li gor vê cotkar ji bo dana vî 1200 qiranî, divê 400 kîlo genim, yanî 100 kîlo ji deynê xwe zêdetir bide xwedî milk.

## B) Sevîya Jîyana Cotkaran

Her kes vê yeka han qebûl dike ku warîdata çandinîyê ya Kurdistana Îranê tenê têra para bi kêmasî lazimîyên jîyanê nake. Wek Hemedanî dibêje:

*"Gundîyên Kurd di hejarîyek cergbir de dijîn".*(15)

Prof. Behramî dibêje:

---

(15) A. S. Hamdanî : "Coxrafya Kurdisan" bi zimanê Farisî, rûpel: 73.

*"Gundî li Kurdistanê qet tiştekî wî nîne".*((16)

Li gor nivîsandina rojnama nîv resmî Atla'at, warîdata xwedî kesek cotê bê ax ku tenê bi cotekî dike, hemû sal 1695 qiran ji lazimîyên jîyanê kêmtir e(17). Rojnama Atla'at lazimîyên malek çar nifûs di salê de 11.640 qiran hesêb dike, yanî ji bo kesek 40 dolar (18), lê sevîya navîn a xêzanên maleke Kurd a xwedî pênc nifûs, warîdata salane ya kesekî dibe 30 dolar.

Waridata serane ya cotkaran ku li gor lêkolîna me ji %72'yê nifûsa gundîya ye, di salê de digihîje 26 dolaran û warîdata karkerên çandinîyê ji vê jî kêmtir e û tenê salê 15 dolar e. Waridata salane ya xwedî heywanên biçûk ên Kurd jî her tiştek wiha ye.

Bi van 26 dolaran (yanî ji 1 950 qiranan kêmtir) gundîyek dikare van tiştên xwarê bikire:

---

(16) T. Behramî : "Coxrafya Kşawerzî Îran" bi zimanê Farisî, rûpel: 517.

Lê Wilyam Douglas ê Hakimê Bilind ê Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê ji bo beşê başûrê Kurdistanê vê nimûna han a xwarê nîşanî me dide:

*"Axa Ebdulla nîne û çandinîyê jî nake, şeş serî dewar, 15 serî pez û xwedîyê deh serî xêzan e. Lê Îmanî ku ew jî bê ax e, çandin nake, pênc serî dewarên mezin û bîst serî pezên wî hene û tenê du serî xêzan e. Huseyn jî bê ax e, lê zevîyek ji bo çandina genim ji bazirganekî Hurremabadê bi rant wergirtîye û %20'ê berhemê para wî dikeve ku sala borî para wî tev li ser hev 300 lîrê Sterlîn bûye, çar serî dewar û 30 serî pezên wî hene û xwedîyê pênc serî xêzan e... Teqî jî bê ax e û çandinîyê jî nake, du mange (madek) û bîst serî pezên wî hene û çar serî xêzan e".*

(17) Rojnameya "Italaat" 2'yê Hezîranê, 9'ê Hezîranê, 16'ê Hezîrana 1953.

(18) K. Ziringar di kitêba Ayendeyê Dêhat we Şehrehayî ma" de dibêje hatina salane ya cotkar ji 8.000 qiranan derbas nabe. Tehran, 1958, r. 17

| | | |
|---|---|---|
| Sê mêtro qumaşê sitûr ê erzan ji bo zivistanê: | | 300 qiran |
| Sê mêtro qumaşê tenik ji bo havînê, yanî kiras ji bo yek mirovî ku dike: | | 50 " |
| Cotek pêlavê (sol) lastîk | : | 100 " |
| 150 kîlo arvan (ard) | : | 750 " |
| Kîloyek çay[19] | : | 150 " |
| 12 kîlo şekir | : | 300 " |
| Şeş kîlo penîr | : | 300 " |
| Li ser hev | : | 1950 qiran |

Di vê cetvelê de derdikeve ku ev warîdat çendîn kêmtir ji bo lazimîyên bi kêmasî yên jîyanê. Li gor vê warîdatê divê cotkar tenê bi nanê tisî jîyana xwe bi rê ve bibe, di rastiyê de jî her wiha ye. Ji derveyî van divê bi şev di tarîtîyê de rûnê, ji ber ku destê wan naçe neftê ku çira vêxin. Madem wiha ye nikare zarokên xwe bide xwendin, derman ji wan re bikire û heqê doktorê wan bide. Vêca niha sevîya jîyana karkerên çandinîyê û cotkarekî ku salê zêdetirîn ji 15 dolaran derbaz nabe, divê çawan be![20]

Cî, rê û avayîyên cotkaran ronîtirîn menzerên hejarî, kar û ezîyeta gelê Kurd nîşan didin, piranîya xêzanên gundî tenê odek wan heye. Hendi Binder ku di sedsala borî de hatîye Kurdistanê wiha dinvîse:

*"Du odên ji derveyî van herdu odan, yek ji wan 3,5 mêtro dirêj, 3 mêtro pan û 2 mêtro bilind bû, di wir de mirovek bi jina xwe ve, keça xwe, xizm û du zarokên xwe, cotek ga, du guhdirêj û çar serî mîyên xwe ve dijîya."*[(21)]

Gelek mixabin ji wê demê heta îro guherandinek gelek zêde bi ser vê rewşê de nehatîye.

---

(19) Çay girîngtirîn vexwarina Kurdistanê ye û her malek nêzîkî ji sisîyan yekê warîdata xwe ji bo çay û şekir xerc dike - Nivîskar.

20) Warîdata karkerên çandinîyê dike 80 put genim (her put 16 kîlo ye), yanî nêzîkî 35 dolaran. (Wilçivski: "Kurdên Mukrîyan"" rûpel: 192).

((21) Hendi Binder, Au Kurdistan, en Mesopotamie et en Parse, Paris 1887, p. 35.

Lêkolîna li ser rewşa cotkaran gelek bi ronî wê ferq û cihêbûnê nîşan dide ku di navbera nifûsa gundîyan de heye, em dibînin ji %1'ê nifûsê ji %44'ê warîdata netewî werdigrin, lê ji %87'ê nifûsê warîdata wan têra para sadetirîn lazimîyên wan ên jîyana rojane nake. Sevîya warîdata serê xêzaneke xwedî milkên mezin 5 600 dolar, yanî 300 carê warîdata karkerên çandinîyê yan xwedî heywanên biçûk e ku ev jî 15 dolar e. Belê, ev e rewşa îro ya Kurdistana Îranê.

## 3- Berhemdarîya Çandinîyê û Sîyaseta Çandinîyê

Çandinî li Kurdistana Îranê li ser berhemên biçûk hatîye damezrandin, lê heta niha jî bi tevayî îstîfade ji axên kêlayî û heta axên avî nehatîye kirin, di salê de tenê ji 4'an 3'yê axên ber avan tê çandin, ku pîvana wan dike mîlyonek û du sed hezar hektar. Divê ew axa îsal genim li ser bê avêtin, sala bê neyê çandin, yan jî bibe cîyê hêşînayî. Ji ber ku qût (ber) nagire û awayê çandinîyê gelek îptîdaî ne û eger axek du sal li ser hev bibe genim, çandin an qet tê de hêşîn nabe, yan berhemek yekcarî kêm jê tê. Ji ber vê warîdata salane ya axê gelek nizm e.

Berhemê hektarek axa çandinîyê bi kental (100 kîlo)

| Welat | Genim | Ceh | Pincarê şekir | Titûn[22] |
|---|---|---|---|---|
| Belçîka | 36,7 | 34,1 | 419 | ---- |
| Frense | 22,8 | 20,2 | 287 | 19,5 |
| Kanada | 14,1 | 13,7 | 256 | 16,4 |
| Amerika | 13,4 | 14,8 | 367 | 16,4 |
| Tirkîye[23] | 11,5 | 13 | 160 | 8 |
| Kurdistana Îranê[24] | 7 | 5 | 113 | 4,3 |

**Cetvela Hejmara 15**[25]

Ev cetvela han bi başî derdixe ku berhemdarîya karê çandinîyê li Kurdistanê ne her tenê ji welatên sermayedarî yên pêşkevtî, her wiha ji Tirkîyê jî ku cîranê nêzîk ê Kurdistanê ye, gelek nizmtir e. Me di pêş de ronî kir ku sebebê bingehîn ê vê rewşa han ew peywendîyên çandinîyê ne ku niha li Kurdistanê, di holê de ne û ev peywendîyên han bûne astenga berbipêşdeçûna hêzên berhemdar di çandinîyê de.

Awayê çandinîyê yekcarî îptîdaî ye, di rastîyê de çendîn sedsal e neguherîye. Kêlana axê her bi aletên kevn e ku bi gayan tê kêşandin û tenê 10-12 santîm ax radike[26]. Kutana berhemê jî karekî gelek zêde dixwaze. Li Kurdistanê ji bo vî karî du rê hene, yekem "cercer" (cencer) e û ya din jî "gêre" ye. Cercer, erebek biçûk a ji dar e ku çend perçên hesin ên tûj bi du darên gilover ên nav re hatine qayîm kirin, cotek an ferek ga dikêşe, ji ber vê giranîya wê gelek nîne, mirovek li ser rûdine û heywan li ser (oranê, kiloşe) digerin û hûr dikin. Di wextek normal de kutana hektarekî oran (800-1000 kîlo) hefteyek dikişîne.

Gêre jî ew e ku çend serî dewaran (5-10 serî yan zêdetir) bi hev ve girê didin û singekî di nîvê bêderê de diçikînin ku jê re darbine dibêjin, serekî gêrê bi vî singî ve girê didin û di dora bêderê de diçin û tên, heta oran hûr dibe. (Hinek caran gayekî hîn dikin ku bê wê darbinê daçikînin û binya gêrê pê ve girê bidin, bi xwe di nîvê bêderê de disekine û gayên gêrê li dora wî diçin tên, ji vê re "regabine" dibêjin) (Ji vê re li hinek navçên Kurdistana Tirkîyê "mêç" dibêjin -Elîşêr). Ev riya han ji ya berê jî îptîdaîtir e û wextek zêdetir jê re dixwaze. Meselek Kurdî heye dibêje:

---

(22) "Belgên Berbipêşdeçûna Aborî li Derve", bi zimanê çekî, Prag, 1958, rûpel: 543.

(23) Li gor Economic Developments in the Middle East 1958-1959. Ew zanyarîyên di derbarê Îranê de ku di vir de hatine danîn, me kir esas ji bo hejmarên xwe di warê Kurdistana Îranê de.

(24) Li gor ; "Micele Îqtisadî Îran", Çirya Duyem, Kanûna Yekem 1962.

(25) Li gor "Rewşa Çekoslovakya di Aborîya Cîhanê de", bi zimanê Çekî, Prag, rûpel: 69.

"Heta gêre çêdibe, xwîn dibe av".

Daneba (şane kirin) ji vê jî îptîdaîtir e, ji ber ku gundî tenê bi alîkarîya bayê havînê ka û lib (dan) ji hev cuda dike, bi wî awayî bêderê dide bayê û ka diçe û lib di cîyê xwe de dimîne. Hinek caran çend roj ba nayê, yan gelek bi qiwet e. Wî wextî gundî divê li ba bêderê rûnê ku heta bayê bi ser û ber tê. Ji hev cihê kirina bi vî awayî jî zerarek gelek zêde dide genim û dibe sebebê kêmbûna berhemê.

Kurdistana Îranê di hêla xwedîkirina heywanan de melbendek girîng e û xwedîyê hel û mercek li bar e jî. Dîyar e zêdetir xwedîkirina mî û bizinan belav e û xwedîkirina heywanên mezin zêdetir li wan cîyên ku çandinî beşê serekî yê berhemdariya cotkarîyê ye, tê dîtin. Xwedîkirina beraz jî ji ber sebebê ayînî ji alîyê filan ve nebe nîne û ew jî gelek kêm e.

Xwedîkirina heywanan jî li Kurdistanê bi awayê îptîdaî ye û bi jîyana nîvniştecîyên xwedîyên pez ve girêdayî ye. Gelek caran tê dîtin ku derd û êş bi hezaran serî mî dikûje û çendîn birr (kerî) pez telef dike.

Hejmara mî û bizinan di her sed hektar axa çandinîyê de[27]

| Welat | Hejmara sala 1955-56 |
|---|---|
| Holand | 18,8 |
| Dewletên Amerîka Y. | 8 |
| Arjentîn | 30,6 |
| Tirkîya | 49,1 |
| Kurdistana Îranê | 160 [28] |

**Cetvela Hejmara 16**

(26) Wilçivski: "Kurdên Mukrîyan", bi zimanê Rûsî, rûpel: 188.

(27) "Belgên Berbipêşdeçûna Aborî li Derve", Prag, 1958.

(28) Ev hesabê han li ser pîvana axa kêlayî hatîye kirin û hinek car di her 100 hektar axa çandinîyê de, gelek ji vê jî zêdetir pez û mal tê xwedî kirin.

Berhemên heywanan bi giştî bi awakî ne li rê bi pêş de diçe û berbipêşdeçûn gelek sist e, hinek caran gelek ber bi jor de diçe û hinek caran jî gelek tê xwar. Wek nimûne sala 1959'an li Îranê 12 hezar ton hirî hebû, li beramberê vê berhemê sala 1960'an tenê 10 hezar ton bûye[29]. Berhemdarî bi awakî zêde ne aborî ye û bi riyek gelek îptîdaî ye û qet qîmet bi rê û cîyên leşsaxîyê nayê dan û her ev jî bûye sebebê wê ku Kurdistan beşek kêm ji berhemên xwe bişîne derve ku ev jî zêdetir rûn e. Tiştên Kurdistanê yên din ku dertên derve heywan, hirî, post, hûr û rûvî ne.

Sebebek din ê paşvemayîna berhemên çandinîyê, nebûna pispor û zanayên wek muhendîsên çandinîyê û beytar û yên din e. Hukumeta Îranê ji bo çareserkirina vê rewşê heta niha tu gavek bingehîn navêtîye. Karbidestan her çendîn sebebê berbipêşdeçûna çandinîyê û xwedîkirina heywananan gelek girtine dest, lê tu wextê di sevîyek destpêkî de hewla pêgihandina pispor û zanayan nadin, heta niha jî pêşdebirina metodên ku tên bikaranîn bi awayê qirna navîn in. Pêwîstîya pispor û zanan di wextê belavbûna êş û derd di nav heywanan de û di wextê afatên tebîî de bi başî derdikeve ku vê demê hemû berhemê salekê di navbera demek kurt de têk diçe.

Nizmbûna sevîya berhemdarîya çandinîyê ku bûye sebebê hejarîyek bê binî ya bi mîlyonan cotkaran, gunehên peywendîyên çandinîyê û sevîya nizm a wasitên berhemdarîyê û nebûna pispor û zana ne[30].

Ew xebata berdewamî ya gelê Kurd a ku di riya azadî û serxwebûnê de kirîye û peydabûna bîr û bawerîya bilind a dema nû bi taybetî li gundên Kurdistanê û bi giştî hemû Îranê, gundîyên Kurd ji bo dijîtîyek bê wêne han daye. Piştî Şerê Cîhanê yê Duyem

---

(29) Rojnama "Keyhan" hejmara 9'ê Sibata 1961.

(30) Yek ji aborîzanê (ekonomîst) burjuwazîya Îranê nezanîna gundîyên Kurdan dike sebebê paşvemayîna berhemdarîya zîraetê û ji bo hînkirina wan vê yekê pêşnîyar dike; "cotkarên ji derveyî Kurdan biguhêzin bibin gundên Urmiyê û Mahabadê" T. Behramî: "Coxrafya Îqtîsadî Îran", rûpel: 165.

cotkar bi tundî ji bo bi destxistina mafên netewî yên gelê Kurd di xebata dijî emperyalîzmê de beşdar bûn û her wiha ji bo parastina qazanca gundîyan jî tevgerek cotkarî ya serbixwe pêk anîn[31].

Di zivistana sala 1952'an de serîhildanek gundîyan li melbenda Bokan berpa bû û gelek zû belav bû û hukumetê neçar kir ku di cî de ji bo parastina derebegan amade be. Li beşê başûrê Kurdistana Îranê jî çend tevger hilketin û rojnamên ser bi hukumetê ve bi qestî wiha dinivîsandin:

*"Gundîyên Kurd zengilê parvekirina axê lê dixin"*[32].

Van rojnaman bangî derebegan dikirin ku hişyar bin:

*"Ji ber ku asoya xwînawî ya şoreşê ji dûr ve dîyar e" "Kurdistan bûye komunîst"*.[33]

Karbidestên Îranê bi tundî li gel daxwazên çareserkirina gîrûgiriftên gundîyan sekinîn. Niha da em bizanin riya çareserîkirinê ya ku burjuwazîya millî peyda kiribû çi bû ku di navbera salên 1951-1953'an de desthilatê girtibû dest?

Di 16'yê Çirya Yekem a sala 1952'an de parlamentoya Îranê

---

(31) Gerokê Îranê M.Danişwer di sala 1950'yan de wiha nivîsîye: *"Yek ji wan derebegên dewlemend ên dor û berê Kirmaşanê nediwêrîya biçe gundên xwe. Ji ber ku bindestî û perçiqandina derebegan mil dabû ber gundîyan ku bikevin nav Partîya Tudeh"*

Danişwer, di gotûbêjek xwe de ya bi gundîyan re ku digihîne me, ev yek pirsîye:

*"Ji bo çi hûn ketin nav Partîya Tudeh?"*

Gundîyan wiha bersîv dane:

*"Dema hukumeta Riza Şah derebegek bi navê Heyatî dest bi ser hemû ax û baxên me de girtibû û hemû rojê gundîyan dibir ulam û xizmeta xwe bi wan dida kirin.. Rojekê me bihîst ku partîyek heye parêzgerîya hejar û zorlêkeran dike. Ji ber vê en: çûn nav Partîya Tudeh da parêzgerîya me ji wan bike û di saya vê partîyê de gelek zû de ye me rûçikê Heyatî nedîye".*

M. Danişwer: "Ditniha w Şinîdnihayê Îran", bi zimanê Farisî, Tehran, 1950, rûle; 14 û 241.

(32) Kovara " Tufan Xerb", Gulan 1952.

(33) Kovara (Senendej), Gulan 1952.

qanûna %20 qebûl kir ku Hukumeta Musadiq pêşkêş kiribû. Li gor vê qanûna %20'î, warîdata derebegan dikir du par, parek dida cotkaran û para din jî ji bo lazimîyên avayîyan dihat xerckirin. Her di wî wextî de hukumetê dest bi firotina axa Şah û dewletê ji bo cotkaran kir. Êdî bi tu awayî behsa parvekirina axa derebegan an kêmkirina serwet û hebûna wan nehat holê.

Lê heta qanûna %20 jî nehat cîbicîkirin û nivîskarê vê behsê bi çavê xwe dît ku li Mahabadê xwedî milkan çawan asteng ji bo cîbicîkirina vê qanûna han derdixistin. Piştî millîkirina petrolê yek ji xwedî milkên mezin, ji memûrekî dewletê re yê ku hatiye %20'î jê bistîne wiha gotîye:

*"Ez wek Îranîyekî petrola para xwe didim Îngilîzan, lê ez ne amade me libek genimê xwe bidim. Ji Musadiq re bêjin bila dest ji ser min hilde."*

Piştî bûyera 1953'an ku grûbek kevneperest di bin serokatîya Şah de hat ser kar, hukumetê qelebalixek zêde di warê îslahata axê û bilindkirina berhemên çandinîyê û. h. w. de destpê kir. Şah dest bi firotina axên xwe kir û daxwaz ji xwedî milkan jî kir ku li ser riya wî bimeşin. Lê netîca vê gelek xirabîyên mezin bi xwe re anî û gelek zû gundîyan wan axên ji Şah kirîbûn firotin û ev axên han ket destê xwedî milkên mezin.

Di sala 1960'an de qanûnek ku hukumetê di warê sinordanîna ji bo milkdarên axê pêşkêşî parlamentoyê kiribû, hat qebûlkirin. Di pêşekîya wê de sebebê qebûlkirina vê qanûnê wiha hatîye xuyakirin: "zêdekirina berhemê û temînkirina edaleta civakî". Li gor vê qanûnê heqê her xwedîmilkekî hebû ku 800 hektar axa bejî û 400 hektar axa avî ji xwe re bihêle (madda duyem). Heqê xwedî milk hebû hemû milkê xwe ji bo demek nedîyarkirî ji xwe re biparêze, bi wî şertî ku makînên çandinîyê tê de bixe kar. Xwedî milkan hemû axên wan gundan ku diketin ber avan, ji xwe re girtin û heqê xwedî milk hebû salek piştî danîna qanûnê du carê wê ya qanûn jê re danîbû, yanî 1 600 hektar axa bejî û 800 hektar ya avî bide mîratgirên xwe. Her wiha xwedî milk heqê wî hebû ew axên ku ji xwe re dihêle berê ji xwe re helbijêre û pişt re qîmeta axên din ji berhem werbigre.

Dîyar e vê qanûna han nedikarî peywendîyên derebegî ji holê rake. Ji ber ku xwedî milkan dikarîn 400 hektar axên avî ji xwe re

bihêlin.

Sinifên serdest yên Îranê tevî derebegan ku desthilatek wan a gelek zêde di dezga hukumetê de hebû, di bin zexta bîr û raya giştî de neçar bûn vê qanûna han qebûl bikin û mebesta wan a eslî ji danîna vê qanûnê kêmkirina hîşyarîya gundîyan, hestê şoreşgerî yê civakê, rê xweşkirin ji bo zêdekirina hejmara burjuwazîya gund û kulakan bû, ji ber vê bûn bingehek kevneperstî dijê cotkaran û li dijî wê rêbazê ku ber bi îslaha demokratîk dimeşîya. Firotina axên Şah û ya dewletê jî her ji ber vê mebestê bû.

Lê xwedî milkên mezin û derebegan mil nedan ber vê qanûnê jî û qanûn her murekebek bû li ser kaxez û tesîrek nekir li ser rewşa çandinîyê[34].

Di bahara sala 1961'an de Elî Emînî "mirovê îslahata şoreşgerî" bû serokwezîr. Wezîrê çandinîyê yê kabîna Emînî di gotûbêjek li gel muxabîrê rojnama "Le Monde" de wiha digot:

*"Ez şaşîtîyên Şah ducarî nakim. Şah beşek axa xwe bi ser gundîyan de parve kir, ku ne tovê wan hebû û ne traktorên wan, neçar bûn carek din axa xwe bifroşin derebegan. Em naxwazin milkdarên mezin ji bo qazanca gundîyan ji holê rakin".*

*- Dîyar e birayê berêz di bîra te de nîne, ku axayê Emînî bi xwe xwedî milkê mezin e."*

*- "Vêca çî ye? Ez bi xwe berpirsîyarê îslahata axê me û ez soz didim ku di navbera mehekê de cîbicî bikim."*[35]

Rast e piştî du mehan serokwezîr gotina wezîrê çandinîyê xelat kir û di civîna xwedî milkên mezin de wiha got:

*"Ez yekî ji we me... hûn gelek ber bi şaşîyê de diçin eger li ba we wiha ye ku em ê axa we ji we bistînin û dest deynin ser. Daxwazek*

---

(34) Di destpêka sala 1962'an de ev qanûna han hat guherandin û yeka din derket, ku ew jî her bi zû di Sibata sala 1963'an de tê de destkarî hat kirin. Lê cewher û armanca qanûnê qet neguherî û yek ji wan qanûnan axa Şah nedigirtin ku zêdetirî ji du mîlyon hektar baştirîn axa Îranê bûn.

(35) Le Monde, 27.5.1961.

*wiha li holê nîne. Em niha li ser îslahatekê difikirin ku bi alîkarîya xwedî milkan bê cîbicîkirin."*(36)

Sinifên serdest ên Îranê îspat kirin ku nikarin bi tu awayî guherînek bingehîn bi ser peywendîyên derebegî de bînin, awayê cîbicîkirina îslahata axê bi başî vê rastîya han nîşanî me dide, li gor qanûna axê tenê ji sisîyan yekê milkê xwedî milkan tê parvekirin, yanî nêzîkî ji 50 hezar gundan 15 hezar gund. Li gel vê jî heta nîvê Adara 1963'an tenê 2 hezar gund hatin belavkirin. Ji xwe peywendîya vê qanûnê ya bi Kurdistana Îranê ve jî ew bû ku îslahata axê li vir qet bi rêç (şop) jî nehat dîtin û ew gundên hatin belavkirin, hejmara wan ji hejmara tiliyên destan ne zêdetir bûn.

Sîyaseta çandinîyê ya hukumeta Îranê, zêdetir bû sebebê hejarî û belengazîya gundîyan û em dikarin bêjin bû sebebê raste rast ê nizmbûna berhemê zîraetê. Wek nimûne, sala 1960'an hukumeta Îranê peymana kirîna 300 hezar ton genim bi Dewletên Yekgirtî yên Amerikayê re îmza kir, li hemberî vê heta wê salê Îran ji wan yek welatan bû ku genim dişand ji derve. Sala 1956'an wezîrê hundur ê wê demê kirîna 2 hezar ton rûn ji Dewletên Yekgirtî, bi vê yekê pîne dikir:

---

(36) Partîya Tudeh ji bo îslahatek axê ya bingehîn di hemû Îranê de xebat dikir û vê yekê jî bi tevayî di xebata li dijî xwedî milkan de piştgirîya gundîyan dikir û hewil dida ji bo yekgirtina gundî û karkeran, ji ber vê slogana "ax a wî ye ku dikêle" cîbicî bike. Partîya Demokrat a Kurdistana Îranê jî di programa sala 1956'an de wiha daxwaz dike:

*"Axa dewletê û ya xwedî milkên mezin û dijminên gel bê heq li ser gundîyên hejar û gundîyên bê ax de bê parvekirin. Berên berhemê bi awakî adîlane di navbera xwedî milk û gundîyan de bê parvekirin, divê qanûnên nû ji bo her navçekê bê danîn û pêwîst e hukumet alîkarîya gundîyan bide ji bo bikarin wasitên çandinîyê ji xwe re temîn bikin, pêwîst e ji bo demên dirêj û faîza kêm deyn ji wan re bê dan, pêwîst e zû hewil bê dan ji bo proja giştî û berbelav wek durustkirina bend û kolandina bîrên artezîyen û damezrandina dezga avdanî û mekanîzekirina çandiniyê. Nabe deynê gundîyan ji derebeg, xwedî milk, dijminên gel û faîzxweran re bê dan. Divê ulamî li seranserê Kurdistanê bê hildan".*

*"Hukumet muwafeqet li ser kirîna 3 hezar ton rûn ji derve kirîye û gumrukê jî ji ser rakirîye, heta ew kesên ku rûn ji derve tînin bikarin bi qîmetek erzan bînin nav bazarê... Niha kîloya rûnê Kirmaşan li bazara Tehranê bi 100-110 qiranan tê firotin. Vêca divê hûn li çaverîya dîtina netîcê bin".*

Ew riya dabû ber xwe bê qanûnî bû û hukumetê kirîna kel û pelên paşvemayên Amerîkayê dabû pêşîya xwe û berhemên hundur ên welat pê dihat şikandin. Ji ber ku genim û rûn giringtirîn berhemên çûna derve yên Kurdistanê ne ji bo navçên din ên Îranê. Di vir de derdikeve ku sinifên di îktîdarê de çawan guhên xwe li qazanca gelê Kurd girtine(37).

Xwedî milkên mezin di beramberê vê de ji %20'ê warîdata netewî werdigrin, li gor qanûna 1958'an tenê %1'ê nirxê axê wek vêrgî didin dewletê(38). Madem wiha ye ne vala ye ku ew vêrgîya ku di salên 1959-1960'an de tenê ji %3'yê warîdata dewletê bû(39). Ku ev tenê ji %5 û 9'ê hemû vêrgîya raste rast a Îranê bû.

Cetvela hejmara 17'an nîşan dide ku peywendîyên kevneperestî yê zîraetê û sîyaseta hukumetê sebebê sistî û bi serê xwe gihaştina berhemên zîraetê ye.

Sevîya gihaştina berhemdarîya zîraetê li Îranê
(Li gor wî hesabî ye ku di navbera wan salên
1952-1953-1956-1957 bi 100 bê hesêb kirin(40)

---

(37) Em dikarin nimûnek din jî ji sîyaseta dijî gel a hukumeta Îranê nîşan bidin, di sala 1960'an de bi bihayê 8,2 mîlyon qiran penîr ji Holanda û Danimarka hatîye. Rojnama Etla'at 18.7.1961.

(38) Weşanên Banka Millî ya Îranê, juyiyeî 1958, rûpel: 34.

(39) Eynî serokanî 1959-1960, Tehran.

(40) (41) Economic Survey of Asia and the Far East, 1962, U. N. New York 1963, p. 192.

| Sal | 52-53 | 53-54 | 54-55 | 55-56 | 56-57 | 57-58 | 58-59 | 59-60 | 60-61 | 61-62 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Bi giştî berhem darî | 90 | 98 | 99 | 104 | 109 | 122 | 122 | 125 | 117 | 125 |
| Tiştên xwarinê | 91 | 98 | 98 | 104 | 109 | 123 | 123 | 124 | 113 | 121 |
| Danewêle | 91 | 99 | 95 | 98 | 116 | 120 | 115 | 128 | 110 | 123 |
| Serana tiştên xwarinê | 96 | 100 | 98 | 101 | 104 | 115 | 112 | 113 | 100 | 105 |
| Serana danewêle | 96 | 102 | 96 | 96 | 111 | 112 | 106 | 116 | 98 | 107 |

**Cetvela Hejmara 17**[41]

Sevîya hemû zêdekirina berhemdarîyê li ser hev a di wan neh salan de salê %3,7 bûye. Eger em zêdebûna nifûsê ya bi zûyî jî bigrin ber çav, zêdekirina berhemên çandinîyê di van navan re, salê ji bo kel û pelên xwarinê dike %0,6 û ji bo danewêle (nok, nîsk, genimê şamî û.h.w.d..Elîşêr) dike %0,8. %5'ê berhemê çandinîyê jî her di cîyê xwe de sekinîye. Ya bala mirov dikişîne nizmbûna sevîya zêdebûna berhemên çandinîyê ye. Ji ber ku li hemberê vê sevîya zêdebûnê di çar salên destpêkî de ji %4'an zêdetir bûye, di salên dawîn de di cîyê xwe de sekinîye û di wan deman de tenê %0,5 zêde kirîye.

(41) Annuaire statistique 1961, N.U. New York 1962, p.90.

FESLA NEHAN

# SANAYÎ, BAZIRGANÎ Û REWŞA MALÎ

## 1- Sanayî

Ewên ku di vî warî de tên zanîn, vê yeka han ronî dikin ku temamê ew sermaya di 518 fabrîke û kargehên Kurdistana Îranê de hatîye bikarxistin, digihîje mîlyarek û 746 mîlyon û 846 hezar qiranan, yanî 32 mîlyon dolar, ku ji %3,8'ê hemû wê sermayê pêk tê ku di pîşesazîya Îranê de ketîye kar(1).

Eger em hejmara wan karkerên ku di petrola Kirmaşanê de kar dikin jî bixin ser hejmara karkerên van fabrîkan û kargehan, bi hev re hejmara van kesên ku di warê sanayîyê de kar dikin, digihîje 7 500 kesan, yanî ji %2'yê hemû nifûsa Kurdistana Îranê. Ji ber ku mesele ronîtir be, pêwîst e em vê jî bêjin ku projên sanayîyê yên Kurdistana Îranê tenê %2'yê wan motoran bikar tînin ku di Îranê de hatine bikarxistin û tenê ji %1,9'ê elektrîka hemû Îranê xerc dikin(2).

Eger em pîşesazên ku di kargehên xwe de mafuran çêdikin û her wiha yên cîyên kerpîç û tuxle çêkirinê, garajên baran, naklîyat,

(1) Li gor serhejmartina taybetî têkoşîna pîşesazî û madenan di sala 1958-1959'an de, Tehran, 1960.

(2) Îrana Îro, rûpel: 140.

karkerên projên mekanîkî û sanayîyan jî bixin ser, ew dem hejmara karkeran digihîje 40 heta 42 hezar kesan, yanî ji %1,2'yê nifûsê.

Ne dûr e ev agahdarîyên kêm ên jorê ji bo ronîkirina rewşa pîşesazîya Kurdistana Îranê bes be. Di rastîya xwe de tenê sanayîya nû sanayîya petrolê ye ku ji derxistin û rafînerîya petrolê pêk hatîye ku heta sala 1951'an di destê Şîrketa Petrolê ya Îngilîz û Îranê de bû, piştî millîkirina petrolê şirketa millî petrola Îranê girt destê xwe. Lê sevîya derxistin û rafînerîya petrolê gelek baş pêş de diçe. Sebebê derxistina petrolê ya berê millî kirinê bi awakî sistî ew bû ku Şirketa Petrolê ya Îngilîzan ji bo ku petrola Kurdistanê nediçû ji derve û tenê di hundirê welat de dihat bikaranîn, qîmetê ne dida zêdekirina berhemê petrola Kurdistana Îranê.

Piştî millîkirina petrolê jî konsorsîyûmên cîhanî, cîyê şirketên petrola Îran û Îngilîzan girtin û bûn asteng li ser riya zêdekirina petrola Kurdistana Îranê ku di destê dewletê de bû. Ew petrola di hindurê Îranê de têt bikar anîn, salê dike 3 mîlyon ton, ku dewletê (sala 1960) ji %10'ê berhem anîye û yê din ji konsorsîyûman dikire.

Heta sala 1959'an tiştek din jî rola xwe di vê sanayîyê de lîstîye, ew jî têkelkirina bîrên petrola Kirmaşanê li gel ên Kurdistana Iraqê ye ku li melbenda Xaneqîn petrol tê derxistin û di pompexanên wê de tên pompekirin. Petrola Xaneqînê heta sala 1959'an (ku hat millîkirin) di destê monopolên emperyalîstan de bû û qazanca monopolan di vê yekê de bû ku nehêlin berhemê petrola Kirmaşan bê zêdekirin.

Sanayîyên din ên wek berhemdarîya şekir, pêşdebirina pembo, fêkî hişkkirin û kerpîç û tuxle çêkirinê, gelek kêm bi pêş de ketine.

Ji %17'yê nifûsa Îranê li Kurdistanê rûdinin, çi heye para Kurdistanê di berhemdarîya sanayîyê de ji %3'an derbaz nabe. Ji xwe eger em vê yeka han jî bigrin ber çav ku Îran bi xwe di rêza welatên paşvemayî de ye, bi başî sevîya paşvemayîna aborî ya Kurdistana Îranê ji me re ronî dibe(3).

---

(3) Kurdistana Tirkîyê jî her çendîn hejmara nifûsa wê ji %19'ê hemû nifûsa Tirkîyê ye, %3-5'ê hemû berhemdarîyên pîşesazîya Tirkîyê para

## Rola Beşê Giştî -Dewlet-

Di pêşdebirina sanayîya petrolê de bûyerek gelek ecêb dikeve berçav ku di eksê sevîya giştî ya berhemdarîyê de ku gelek zû pêş de diçe, derxistina wê petrola ku di destê dewletê de ye, bi rastî di cîyê xwe de sekinîye yan ewqas kêm pêş de çûye ku hêjayî behskirinê nîne.

Derxistina petrolê li Îranê (bi hezar ton)

| Sal | bi giştî[4] | Para dewletê li Kurdistana Îranê[5] |
|---|---|---|
| 1955 | 17,070 | 240 |
| 1956 | 26,481 | 226 |
| 1957 | 35,129 | 220 |
| 1958 | 40,243 | 248 |
| 1959 | 45,023 | 255 |
| 1960 | 52,064[6] | 300 |
| 1961 | 58,800[6] | — |
| 1962 | 63,900[6] | 420[6] |

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

**Cetvela Hejmara 18**

Di vê cetvelê de derdikeve ku berhemdarîya petrolê bi giştî di navbera salên 1955 û 1962'an de %3,5 e û çendîn pêş de çûye, lê berhemê para dewletê ji %75'an zêdetir nebûye û sala 1962'an

---

wê ketîye, di vir de derdikeve ku Kurdistana Tirkîyê jî gelek paşdemayî ye.

Li Kurdistana Iraqê rewş cihê ye, Kurdistana Iraqê di hemû hel û mercên di barê coxrafya û pêşdeçûna sanayîya petrolê de ji navçên herî pêşkevtî yên Iraqê ye. Ji derveyê vê jî Iraq di berhemdarîya sanayîya petrolê de, zêdetir ji %50'yê berhemê pîşesazîya Iraqê ye.

(4) Economic Developments in the Middle East 1958-1959, New York, p.72.

(5) Middle East Economic Digest, February 1963, London.

(6) Li gel vê ku berhemê petrola Îranê di sala 1970'an de ji 190 mîlyon ton derbaz bûye, berhema petrola Kurdistana Îranê nîv mîlyon ton e.

berhemê para dewletê 420 hezar ton e, yanî ji %8'ê para di nav Îranê de tê bikaranîn û ji %1'ê berhemê yê konsorsîyûmê ye.(*)

Sevîya rafînerîya petrolê gelek ji ya derxistinê jî kêmtir pêş de çûye. Sala 1950'an berî millîkirina petrolê, pompexana Abadan 24 mîlyon ton petrol yanî %76'ê hemû berhemê wê salê rafînerî kirîye, lê piştî millîkirinê monopolên navnetewî yên petrolê zû çend pompexane li çend cîyên din danîn û bi taybetî di Avrûpa rojava de çêkirin. Niha para zêde ya petrola Îranê bi xavî (xamî) diçe ji derve. Sala 1961'an pompexana Abadan tenê 16,8 mîlyon ton petrol rafîne kirîye ku ji %28'ê berhemê salane bûye.(*)

Bênîsbetîya di navbera para dewletê û ya monopolên emperyalîst de di tiştekî din de jî derdikeve. Ne tiştek veşartî ye ku hukumeta Îranê di bin sîya Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê de dezge û bingehên beşê dewletê difroşe sermayedarên welatê xwe.(7) Dîyar e monopol jî di van welatên paşdemayî de -çi sîyasetek netewî bigre ber xwe, çi jî sîyasetek girêdayî emperyalîzmê- hez ji çareserîya beşê dewletê nakin. Sebebê vê li hember sekinandinê jî ew rola girîng e ku beşê dewletê di wan welatan de ku pêş de diçin, rolekê dilîzin. Ji ber ku cîyê pêyek girîng ê aborîyê ye ji bo hêzên dijê emperyalîzmê di welat de.

Her ji ber vê jî hemû ji ber van bahanan e ku şarezatî û aktîvîta dewletê gelek nîne, bi tundî parastina beşê dewletê dike. Me got ku hukumet dikir fabrîkên dewletê bifroşe xelkê. Damezrênerê plankirinê di rapora xwe ya hejmara 12'ê Adara 1960'an de pêşnîyar kirîye ku dewlet fabrîkên xwe bifroşe, ji ber vê bahanê ku goya berhemên wan kêm e qazanca wan zêde nabe. Ev rapora han piştre dibêje :

*"Zeman nîşan daye ku sermayên taybetî îmkana wan a danîna sanayîya welat ji sermaya dewletê zêdetir e".*(8)

---

(*) Di sala 1970'yan de hemû rafînerîyên Îranê li ser hev kêmtir ji %15'ê berhemê petrola Îranê rafînerî kirine -Nivîskar.

(7) Hukumetê navê firotina fabrîkên dewletê danîye "millîkirin", ji bo ku millet bikire -Nivîskar.

(8) Rapora damezrayê plankirinê, hejmar 12, bi zimanê Farisî, Tehran, 1960, rûpel: 93.

Lê guherînên van dawîyan ên Îranê qet tiştek wiha nîşan nadin. Ji ber ku programa sanayîdanînê bi tu awayî cîbicî nebûye û ew sanayîya ku îro jî heye, bi tevayî bi beşê dewletê ve girêdayîye. Serokanîya qazanc nekirina fabrîkên dewletê û nizmbûna sevîya berhem dibê di cîyekî din de bê dîtin; fabrîkên dewletê bi awakî serekî di salên 30'an de hatine damezrandin û ji wî wextî ve jî wasitên wan nehatine guherandin. Vêca ew burokrasî û bertîlxwerî ku di dezgên dewletê de belav bûne, bûne sebebê nizmbûna sevîya berhemê û zerarê. Madem wiha ye, mesele neşarezatî û nezanîna dewletê nîne, belko bêserûberî di navbera erkên dewletê û terkîba dezgahên dewletê de ye. Em dikarin sanayîya titûnê wek nimûne bidin; dewlet di vir de kargehek di dest de ye ku nûtirîn xwedî wasitên berhemdarîyê ye û qazancek baş jî jê tê girtin, di pratîkê de jî qazanca ji rafînerîyê ya dewletê di sala 1958'an de gihîştîye 30 mîlyon qiranan.

Ev rapora me behs kir nîşan dide ku temamê ew sermayên ji alîyê sermayedaran ve di sanayîyê de hatine bikaranîn, di sala 1958 û 1959'an de di navbera 30-40 mîlyon dolar de bûn, yanî ji 60'an yek heta 80'yan yekê warîdata netewî ya sala 1958'an. Madem wiha ye, gelo kî dikare bêje ku sermaya taybetî ya welat ji bo sanayîyê tê bikaranîn? Tecrubên gelek dewletan nîşan didin ku beşê dewletê di sanayîdanîna wî welatî de ku di warê aborî de paşvemayî ye û her wiha ku ew welat wek Îranê sermaya wan a taybetî kêm e, rolek wan a gelek giring heye. Di welatên paşdemayî de çi bîr û bawerîya ku dijîtîya beşê dewletê bike, yan qîmeta wê kêm bike û rola beşê giştî kêm bigre, xizmeta monopolên emperyalîstan dike.

Piranîya wan pîşesazîyên îro ku di Kurdistanê de hene, ya beşê dewletê ne û di rastîyê de behsa burjuwazîya sanayî ya hindur her di holê de nîne. Wek em di van dawîyan de dibînin burjuwazîya netewî ya Kurd di esasê xwe de burjuwazîya bazirganî ye, ev burjuwazîyek faîzxwer e ku zêdetir bi awakî ne raste rast cotkaran dimije. Her ber bi vê re burjuwazîya Kurd pişta xwe daye burjuwazîya mezin a Îranê û wek yekek ji xelekên burjuwazîya Îranê di Kurdistanê de rûniştî ye.

Karektera faîzxwerîya vê çînê zêdetir li bakur ronîtir derdikeve û dema em ber bi başûr ve tên kêmtir tê dîtin. Ji ber ku li vir

burjuwazî di çarçovek berbelavtir de mijûlî bazirganîyê ye, li Kirmaşan hinek sanayîyên biçûk jî tên dîtin. Kirmaşan tenê bajarê Kurdistana Îranê ye ku oda bazirganîyê (tîcaret odasi) tê de heye.

## 2 - Bazirganî û Rewşa Malî

Alozîya peywendîyên civakî, di bazirganî û nîzama malî ya welat de bi ronîtî derdikeve. Ji ber ku peywendîyên bihêz ên derebegî û heta derecekê jî peywendîyên mezinîya babî (patrîyarkî) astengek mezin li ser riya kemilîna bazara hindûr pêkanîne. Parvekirina kar a bê denge jî di navbera beşên cur bi cur ên aborîya netewî de tesîrek wê ya xerab heye û di bûna holê de ya aborîya tabîî û pêşdeneçûna peywendîyên bazarê de jî, bi taybetî di hinek melbendan de, astengek duyem e ya ji bo pêşdeçûna bazara hindûrî. Vêca hinek rê û cade û nebûna riyên hesin jî dibin sebebê zeîfîya peywendîyên bazirganiyê di navbera navçên Kurdistanê de û hemû melbendên Kurdnişîn hewl didin ku van cure peywendîyan li gel melbendên xeyrê Kurdnişîn ên cîran û li gel paytext bihêz bikin[9].

Peywendîya Kurdistana Îranê bi bazarên cîhanê re û derxistina petrol û bikaranîna hejmarek ji xelkê di derxistin û parvekirina petrolê de û pêşdeçûna zû, ya bi bazirganîya derve û rûniştina dewleta merkezî, hemû evên han alîkarîya pêşdeçûna bazara hundur dikin.

### A) Bazirganîya Derve

Bazirganîya derve bi awakî serekî li gel welatên sermayedarî yên mezin e ku bi vê sebebê sîyaseta xwe ya aborî li ser Îranê ferz dikin û dibin sebebê wê ku Îran rola welatek berhemdar ya madda xawyar bilîze.

(9) Dirêjahîya hemû riyên otomobîlan dike 1 600 kîlometre, yanî kîlometrek rê ji bo her 75 kîlometre çargoşe -Nivîskar.

Bazirganîya Îranê ya derve bi mîlyon dolar(10)

| Sal | Îxracat ji derve-yî petrol | Îxracata petrolê | Hemû îxracat | Para petrolê di hemû îxracatê de | Îtxalat | Kêm û zêdayî |
|---|---|---|---|---|---|---|
| 1957 | 111 | 258 | 369 | %69 | 320 | +49 |
| 1958 | 105 | 304 | 409 | %74 | 446 | -37 |
| 1959 | 102 | 659 | 761 | %86 | 555 | +206 |
| 1960 | 105 | 794 | 899 | %88 | 577 | +322 |

**Cetvela Hejmara 19**

Ev cetvela han nîşan dide ku welat pişt bi îxracata petrolê girêdaye, petrol ku derxistin û firotina wê di destê wan monopolên cîhanî yên petrolê de ye ku di konsorsîyûman de yek û du girtine. Her wiha nîşan dide ku ev rêbaza han heta tê, zêdetir cîyê xwe digre. Ji ber ku di sala 1960'an de petrol ji zêdetir %88'ê hemû îxracata Îranê bûye, di hemberî vê de muwazena pîlana millî ya di navbera salên 1951-1953'an de ku petrol hat millîkirin, li gor qazanca Îranê bûye. Sevîya zêdebûnê di sala 1952'an de 10 mîlyon dolar bû û di sala 1953'an de ji 40 mîlyon dolaran derbaz bû(11). Her di wê wextê de terkîba bazirganîya derve jî zêdetirî îro ya qazanca Îranê bû. Wê wextê dewletê giranîya xwe danî ser bazirganîyê û wasite û kel û pelên pêwîstî yên ji bo pêşdebirina aborî ji derve da anîn.

Pêwîst e ev yeka han jî bê gotin ku dereca îtxalata bê gumruk ku di wê cetvela jorê de nehatîye, di van salên dawîyê de gelek zêde bûye û qîmeta li ser hev a van kel û pelan ku sala 1958'an dezgên dewletê û konsorsîyûm û ordîya Îranê anîne, gihiştîye 172 mîlyon

(10) Rojnama Etla'at, hejmar: 1. 8.1961 û
Economic Developments in the Middle East, 1958-1959, New York, 1960, p. 102, 109.

(11) Amarê bazirganîya derveyê Îranê di sala 1958'an de, Tehran, rûpel: 26.

dolaran[12]. Sala 1960'an ji 100 mîlyon dolaran derbaz bûye û sala 1961'ê gihîştîye 130 mîlyon dolaran.[13]

Di vir de ji me re ronî dibe ku sevîya îxracata petrolê di navbera salên 1957-1960'an de sê caran zêde bûye ku çi heye sevîya îxracata kel û pelên din %6 kêm bûye. Ji aliyekî din de jî sevîya îxracatê gelek zû zêde bûye û di navbera salên 1957-1960'an de bûye %77.

%50'yê petrola Îranê diçe Avrupa Rojava, %16 ji Rojhilata Dûr, %6 ji Avustralya, %17 ji Afrîka re û %6 jî ji Amerîka Bakur re diçe[14]. Mezintirîn welatên ku kel û pel ji Îranê dikirin, evên xwarê ne :

Îtxalat û îxracata Îranê (ji derveyê petrolê)
di sala 1958'an de[15] (bi mîlyon dolar)

| Welat | Îxracat | Îthalat |
|---|---|---|
| Almanya Federal | 1.223 | 7.314 |
| Dewletên Yekgirtî yên Amerîka | 1.080 | 5.663 |
| Brîtanya | 852 | 4.907 |
| Japon | 147 | 3.454 |
| Yekîtîya Sovyet | 1.749 | 1.864 |
| Fransa | 633 | 1.085 |
| Îtalya | 273 | 1.031 |
| Formoza | 1,8 | 1.260 |
| Hindîstan | 191 | 962 |
| Çekoslovakya | 252 | 615 |

**Cetvela Hejmara 20**

(12) Sala Îranî di 21'ê Adarê de destpê dike û di 20'ê Adarê de temam dibe.

(13) Tehran Ekonomist, hejmar: 1.5.1063.

(14) Raporek di warê kar û barê konsorsîyûman de di sala 1959'an de, bi zimanê Farisî, Tehran, 1960, rûpel: 160.

(15) Foreign Trade Statistics of Îran (1958-1962), Tehran, p. 4, 6, 8.

Almanya Federal di sevîya giştî ya bazirganî û sevîya îtxalatê de di rêza yekem de ye (%21), lê di sevîya îxracatê de di rêza duyem de ye. Yekîtîya Sovyet di sevîya bazirganîya derve de ketîye rêza çaran, lê di îtxalatê de rêza pêncan girtîye (%5) ya jî tevan girîngtir ev e ku Yekîtîya Sovyetê di îxracata Îranê de rêza yekemîn girtîye, yanî %22. Japonya di sevîya bazirganîyê de rêza pêncan û ya îtxalatê de ya çaran (%10) û di îxracatê de ya sêzdehan (%1,8). Formoza jî di şandina kel û pelan ji de Îranê re şeşemîn welat e û ji bo kirîna kel û pelan jî sî û pêncem e. Çekoslovakya jî di bazirganîya Îranê de rêza dehan girtîye û di îtxalatê de çardehem (%1,8) û di îxracatê de heştem e (%3).

Sala 1958'an îtxalata Îranê ya ji Dewletên Yekgirtî yên Amerîka û Almanya Rojava, gihîştîye %66.6'ê hemû îtxalata Îranê, lê îtxalta Îranê ji Yekîtîya Sovyet û welatên sosyalîst ên Avrupayê re tenê %9,5 bûye(16).

Ev cetvela han nîşan dide ku welatên emperyalîst bazirganîyek ser bi ser li gel Îranê dikin. Sala 1958'an îtxalata Îranê ji Almanya Rojava şeş carî îxracata Îranê ya ji wî welatî re bûye, ji Dewletên Yekgirtî û Brîtanya re pênc carî û ji Japonya re bîst carî îxracatê bûye û heta niha jî tu başbûnek bi ser vê rewşê de nehatîye, wek di sevîya bazirganîya sala 1961'an de derdikeve ku îtxalat ji Almanya Rojava ve heft carî îxracatê bûye û ji Dewletên Yekgirtî donzdeh carî, ji Brîtanya neh carî û ji Japonya çil û çar carî îxracatê bûye(17). Di vir de qîmeta bazirganîyê li gel Yekîtîya Sovyetê, ji bo Îranê ronî dibe. Ji ber ku Yekîtîya Sovyetê malên îxracatê yên kevin ji Îranê dikire ku Îran bi zehmet dikare bişîne derve, ji derveyê vê jî, bazirganî li gel Yekîtîya Sovyetê pêwistî bi perek giran nîne, ku ji Îranê re giran e û ev yeka han di dan û sitendinên li gel sermayedaran de jî bi mercê bingehîn tê hesêbkirin. Di dîroka Îranê de hatîye dîtin, ku bazirganên Îranê dikarin hemû awa berhemên sanayî û wasitên cur bi cur ji yekîtîya Sovyetê werbigrin. Vêca cîrantîya li gel Yekîtîya Sovyetê dibe sebebê vê ku li gor bazirganî li gel Dewletên Yekgirtî û

---

(16) Economic Developments, p. 5.
(17) Tehran Ekonommist, hejmar: 5.1.1963.

welatên sermayedar ên din, bazirganên Îranîyan zêdetir qazanca sermaya wan bikeve dest. Ev menzerên han di warên bazirganî de li gel Yekîtîya Sovyetê, di dema Komara Mahabad de bi tevayî derketin. Wê wextê Yekîtîya Sovyet bû sebebek girîng ê pêşdeçûna aborî li beşê bakurê Kurdistana Îranê.

Me behsa vê yekê kir ku tenê petrola netemam bêmuwazenetîya plana bazirganî ya Îranê zêde dike, lê pêwîst e em vê jî bêjin ku berhemdarî, îxrac kirin û rafînerîya petrolê di destê konsorsîyûmên petrolê de ye û mana vê ev e ku Îran nikare bi azadî petrola xwe bifroşe. Ji ber ku şertên tîcareta petrolê konsorsîyûm dîyar dikin. Di milek din de li gor peymanek ku heta niha jî di cîyê xwe de ye Îran %50 qazanca petrolê jê tê birîn. Ji ber vê di cîyê xwe de ye ku petrol ji kel û pelên îxracata Îranê derxin û nekin nav butça bazirganî.

Pêwîst e ev yeka han jî bê gotin ku gelek zerara terkîba malên îxracatê yên welatên emperyalîst ji bo Îran heye. Ji ber ku beşê piranîya wan, malên bikaranînê ne. Di hemberî vê de rewşa bazirganîya li gel welatên sosyalîst awayek din e. Rojnama "Etla'at" îşaretî vê kirîye ku li gor peymanek ku di van dawîyan de hatîye îmzakirin, %80'yê îxracata Çokoslovakya ji bo Îranê makîne û wasitên berhemdarîyê ne[18], li hemberî vê makîne û wasitên cîgir tenê %15'ê hemû îtxalata Îranê ne[19] yên din, berhemên durustkirî (mamûl) û bi taybetî malên luks û maddên seretayî ne. Sala 1960'an Îran bi bahayê 16 mîlyon dolar otomobîl ji derve anîye ku beşê piranî otomobîlên taybetî ne. Ya ecêb ev e ku di van dawîyan de Îran hinek mal ji derve tîne, ku berê îxracî derve dikir, wek genim, penîr, sêv, portaqal û heta mafur jî[20]. Ev jî sebebê sîyaseta "dergahê bilind" e ku ekonomîstên burjuwazî ji bo wan welatên di hêla aborî de paşdemayî ne, pêşnîyar dikin.

Sîyaseta "dergahê bilind" di bazirganîyê de tesîrek xirab dike li ser aborîya welat. Ji ber ku ew malên ku di hindurê welat de tên

(18) "Etla'at" hejmar: 26.2.1961.

(19) Economic Developments, p. 109.

(20) Sala 1960'an Îranê bi bahayê du mîlyon dolar mûz, porteqal, sêv û meşrubatên gazê ji derve anîye. Etla'at 26.7.1961.

çêkirin ji wan malan girantir dibin mal ku ji derve tên û vergî gumrik li ser nîne, madem wiha ye, qîmeta malên bîyanî ji berhemên hundurê welat erzantir dibin û di netîcê de bazara malên welat bi xwe dişkên.

Qîmeta malên bîyanî û ew malên
di hindurê welat de tên çêkirin(21)
(Sala 1955 100 hatîye hesêb kirin)

| | 1955 | 1956 | 1957 | 1958 |
|---|---|---|---|---|
| Ew malên di welat de tên durustkirin | 100 | 117 | 112 | 118 |
| Malên bîyanî | 100 | 93 | 83 | 82 |

**Cetvela Hejmara 21**

Welatek wek Îranê ku berhemdarîya kar çend car ji ya welatên sermayedarên pêşkevtî kêmtir e, sîyaseta "dergayê bilind" daye ber xwe, ji derveyê kesadîya bazara berhema hundur û têkçûna pîşesazîya hundur pê ve tiştek bi dest naxe.

## B) Rewşa Malî

Ev rewşa han a şepirzetî di plana malî û rewşa malî ya welat de jî ronî tê dîtin. Her çend îxracata petrolê û ew perên giran ku hukumet di vê riyê de bi dest dixe, beşek ji bêmîzaniya plana bazirganîya (bîlançoya bazirganî) Îranê tijî dike, çend sal e plana bazirganîyê ya Îranê kêm dimîne. Ew kêmasîya sala 1955'an gihîştîye 10 mîlyon dolaran(22). Deynên dewletê ji "Banka Millî" re di navbera Adara 1953 û Tebaxa 1959'an de ji du caran derbaz bûye (ji 165 mîlyon dolaran gihîştîye 364 mîlyon dolaran)(23). Eger

(21) Rapora damezrayê plandanînê, hejmar: 12, sal: 1960, rûpel: 16.
(22) Pêşdeçûna Aborî..., rûpel: 90.
(23) Aborîya Cîhanê û Peywendîya Nav Dewletan, hejmar: 11, bi zimanê Rûsî, Moskova, sal0 1961.

warîdata petrolê nebe -ku salê zêdetirî ji 300 mîlyon dolar e-, Îran gelek zêdetir dibe deyndarê welatên emperyalîst, ev deynê han sala 1961'an ji 700 mîlyon doleran derbaz bûye. Îran ji sala 1953'an ve dest bi deynkirinê kir û ji sala 1959'an şûn de jî dest bi dayîna wê kirîye. Ew deynên ji bo demek kurt û bi faîzek zêde (%6-7) didin Îranê û bi çend cure şertên sîyasî û eskerî ve girêdayî ne û li gel vê jî ew armancên ku dewletê daye pêşîya xwe, nehatin cî û bi vî awayî nayên cî jî.

Hecma peran jî netîcek tabîî ya vê rewşa aborî ye, ji ber ku perên nav bazarê gelek zû zêde bûne.

| Sal | Sevîya perên nav bazarê bi mîlyon qiran |
|---|---|
| 1953 | 20.067 |
| 1954 | 21.632 |
| 1955 | 23.078 |
| 1956 | 26.447 |
| 1957 | 31.387 |
| 1958 | 38.917 |
| 1959 | 37.942 |
| 1960(24) | 44.500 |
| 1961(24) | 41.300 |
| 1962(24) | 44.300 |

**Cetvela Hejmara 22**

Perên nav bazarê di navbera salên 1953-1962'an de ji du caran derbaz bûye û bûye sebebê ketina bihayê peran û kêmbûna zexîra zêr û perên giran û zêdebûna bihayê mal û giranbûna xercê xweîdarekirinê di welat de.

Di aborîya hinek wan welatan de ku ji hêla aborî de paşdemayî ne, sîyaseta zêdekirina peran di nav bazarê de dikare tesîreke

(24) Weşanên Banka Millî ya Îranê, meha Tebax û Îlona 1960 û Mont.. Bulletin of Statistics, U.N., July 1963, New York.

wê ya baş hebe. Madem wiha ye, hewce ye zêdekirina peran di nav bazarê de karek baş bê hesêbkirin, lê bi wê mercê ku ji vî pereyî bê îstîfadekirin. Ew jî bi vê dibe ku ji alîyekî de hemû berhemdarîyê bixin kar û ji alîyek din de dema ku karek wiha hat kirin ku bibe sebebê hecma peran, di hêla kêm de muwazena di navbera zêdeberhem û sevîya perên nav bazarê de bê parastin. Divê karek wisa bê kirin ku hecm negihîje sevîyek ku bihayê peran bikeve û bawerîya xelkê pê nemîne, ji ber ku ev yek paşerojek gelek xirab tîne. Hecma peran dibe sebebê ketina bihayê pere di hemberê perên giran de û di meydana navnetewî de jî cîyê pîyan dileqîne. Her wiha zerara wê ji bo bazirganîya derve jî heye û zexîra perên giran jî qut dibe. Madem wiha ye, divê hukumet bazirganî ji xwe re paxan bike û ew bazirganî bi awakî be ku parastina berhemên hundurî û danîna sanayîya welat temîn bike.

Lê rewşa niha ya Îranê gelek ji vê cihê ye. Ji ber ku ew perên ku di wextê zêdebûna peran de di nav bazarê de heye, ji bo mebesta ji derveyî berhemdarîyê, wek mebesta eskerî, tîcaretê, mamelên ax, kirîna malên luks û h.w.d...tê xerc kirin û dewlet di hemberî vê de bi bahana zêdekirina berhem pakane ji bo hecma peran dike, peran ji bo mebesta ji derveyî berhemdarîyê bikartîne.

Sala 1957'an dewlet ji belavkirina perên nû heft mîlyar qiran bi dest xist, ji ber ku dolar ji 34,6 qiranan bû 75 qiran. Nîvê vî pereyî (3,5 mîlyar qiran) di zîraetê de xist kar, biryar wisa bû ew pere heta bahara 1962'an hêdî hêdî di warê zîraetê de bikeve kar. Banka Zîraetê deynê herî zêde da xwedî milkên mezin û nunerên wan ku wek me di pêş de got, ew qasî cotkaran qîmetê zêdebûna nadin berhemên zîraetê. Dîyar e ev cure gavên han dibin sebebê belavbûna hecma peran û di cîyê xwe de sekinîna berhemê. Tenê ji %0,1'ê vî pereyî ji Kurdistanê re hat dan û her çendîn giranîya hecmê wek navçên din dikeve ser Kurdistanê jî, ew deynên ku tên dayin li vir bîst car ji nîsbeta nifûsê kêmtir bû.

Belavbûna hecmê bû sebebê bilindbûna bê hed a faîza peran. Faîza serbest a peran li Kirmaşan û hemû melbendên din ên Îranê gihîşt %24-36'an(25).

(25) Weşanên Banka Millî ya Îranê, hejmar 227, 228, Tehran, 1961

Da em niha bizanin ka sebebê vê çî ye? Di destpêkê de wisa derdikeve ku divê belavbûna hecmê û zêdebûna peran li nav bazarê dibe sebebê kêmbûna faîza peran.

Her çendîn faîza serbest %36-24 bû, qîmeta faîzê di bankan de 3-4 car ji vê kêmtir yanî %6-7 bû. Madem wiha ye, sebeb ev e ku dewlet dixwaze kêmbûna butçê di riya van deynan de tijî bike ku ji banka millî werdigre. Wek me di pêş de got ev deynên han heta sala 1959'an gihîştin 364 mîlyon dolaran. Piranîya van perên ku nû belavbûn, ji bo mebestên eskerî û îdarî û xercên rojane tên serf kirin û di netîcê de belavbûna hecm her dirêj dibe û perên pêwîstî ji bo bi deyndan ji sermayedaran re, di dest bankan de namîne û ewên pêwîstîya wan bi peran heye divê di bazara azad de bi dest xe û ev jî dibe sebebê bilindbûna qîmeta faîza serbest.

Bi taybetî li dor û berê bajaran tesîrek xirab a tîcaret û mamela axê jî ji bo bikarxisitna hinek perên nû heye, ji ber ku dema sermayedar ji tîcaret û mamela axê salê %50-100 qazanc dike, kes amade nîne sermaya xwe di kar û barê berhemdarîyê de bixe kar. Mirovek, di baharê de metrek çargoşe ya axê bi pênc dolaran dikire dawîya salê bi 8-10 dolar û hîn zêdetir jî difroşe. Madem wiha ye, ecêb nîne ku kîriya xanîyan ji here xercekî din zêdetir dibe. Di navbera salên 1953-1961'an de xercê jîyanê li ser hev %76 zêdetir bûye, lê kîriya xanîyan %120 zêdetir bûye.

Bilindbûna faîza peran dibe astenga biserhevketina peran û bikaranîna wan ji bo berhemdarîyê û hemû pere ji bo karên bê berhem tên razandin.

Yek ji wan sebebên esasî yê buhrana aborî ya Îrana îro, peywendîya Îranê li gel peymana destdirêjkerî ya CENTO ye. Îran, xwedî eskerek 200 hezar kes e ku 30 hezar kes zabit û 60 hezar kes bi rutbe ne(26). Ji destpêka sala 1953'an heta destpêka sala 1961'an mesrefên eskerî yên Îranê gihîştîne zêdetirî ji 866 mîlyon dolaran(27). Ev pere gelek ji wî pereyî zêdetir e ku Îran di navbera 1958-1963'an de ji bo sanayî, bazirganî, hat û çûn , programên

(26) Rojnama "Baxtr Emroz", hejmar0 21.12.1061.

(27) Aborîya Cîhanê û Peywendîya Nav Dewletan, hejmar 11, bi zimanê Rûsî, Moskova, 1961.

civakî û îdarî xistîye kar.

Di derbarê bazirganîya derve de jî ev sîyaseta han ji rêbaza "dergayê bilind" derdikeve. Ji sala 1953'an ve Îran bûye bazarek vekirî ji bo hemû welatên sermayedarî, ji Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê bigre heta Formoza. Ev teorîya han li ser teorîya bi nav û deng a "vergîya muqayesekirî" damezraye. Ev teorîya han dibêje vergîya bazirganî azadtir be, evqas zêdetir û baştir di eslê "vergîya muqayesekirî" de tê holê û li gor vê teorîyê bazirganîya cîhanî ji xwe re dibe sebebê baştirbûna parvekirina cîhana kar û her welatek dikare malên xwe yên berhemdarî bi awakî baştir bifroşe, ku di wê hel û mercê de bi xercek kêmtir berhem anîye. Lê Îran ne tenê bû cîyê feyda welatên emperyalîst ku tenê madên xwe yên xam difroşin wan, her wiha nikare behsa berhemên xwe yên kevin jî bike.

Di derbarê parvekirina cîhana kar de jî rewşa Îranê xerabtir bû. Ev jî belga wê ye ku cîbicîkirina teorîya "vergîyên muqayesekirî" di peywendîya navbera welatên sermayedarî û wan welatan de ku di warê aborî de paşdemayî ne, ji derveyî armanca bêhêzkirina welatê paşdemayî pê ve berhemek din nîne.

Di behsa teorîya "vergîya meqayesekirî" de pêwîstî bi vê meselê jî heye ku bê gotin, ew monopolên kevirên dilsozîyê ji bo vê teorîyê li singa xwe dixin, gelek yekalî vê teorîyê cîbicî dikin. Ev rewşa han derdikeve pêş ku eger welatên Rojhilata Navîn bi azadî petrola xwe li ser bingehê vê teorîyê bifroşin, ev ew monopol in ku petrol bi bihayê Xelîcê Meksîka yanî tona wê 23 dolaran difroşin. Di hemberî vê de ku xercê berhemdarîya petrolê li Rojhilata Navîn gelek kêmtir e, eger welatên Rojhilata Navîn vê petrola han tona wê bi 15 dolaran di bazara Avrupa Rojava de bifroşin, monopolên petrolê dê çi bikin? Gelo ev ne Rojhilata Navîn e ku petrol kêmtirîn xerc berhem tîne? Gelo tesadufî ye ku rast ev malê han, yanî petrol ku welatên Rojhilata Navîn bi kêmtirîn xerc berhem tînin, bi azadî di bazara cîhanê de nayê firotin û rast ev berhemê han jî di destê monopolên navnetewî de ne ku bi bihayê monopolan tên firotin?

FESLA DEHAN

# CÎYÊ PETROLÊ DI ABORÎYA NETEWÎ DE

## 1- Petrol di Cîhanê de

Li Kurdistanê wek hemû navçên xwedî petrol yên Rojhilata Navîn, petrol rolek aborî ya girîng dilîze. Ew meselên ku peywendîya wan bi petrol û bikaranîna petrolê ve hene û di warîdatê de heta derecek zêde pêş de çûna wan welatan di seha aborî û sîyasî de dîyar dikin, li her melbendê wek hev in. Madem wiha ye, pêwîst e ev mesele di hemû waran de di çarçova Rojhilata Navîn de li ser bê sekinandin û divê merkeza lêkolîna me rewşa aborî ya petrola Rojhilata Navîn û bi taybetî tesîra wê li ser warîdata pêşdeçûna vê navçê be.

Hingî diçe qîmeta petrolê di aborîya cîhanê de zêdetir dibe û hêdî hêdî wek dike cîyê rejîya (rijî) kevir digre û ji vê jî girîngtir ev e ku wek madda xam di sanayîya kîmyayê de jî tê bikaranîn. Liqek di kîmyayê de hatîye danîn navê wê "petro-kîmya" ye , ku bi giştî di aborîyê de cîyekî gelek girîng girtîye. Niha petrol yek ji wan maddên xam ên herî girîng e ku insan lê digerin. Ji ber ku derxistin, neqilkirin, ambarkirin û ji hev veqetandina (rafînerî) wê ji rejîya kevir hêsantir û kêm mesreftir e. Ji bo berhemdarîya hêza elektrîkê, tonek petrol qasî sê ton rejî tê de kalorî heye û di

ser vê de jî qet xwelîya wê nîne. Ji derveyê vê jî petrol sebebek girîng yê berhemdarîya ziblê nîtrojen ê ji bo çandinîyê ye. Di navbera bîst salan de petrol di berhemdarîya zibil de %10'an gihiştîye %60'an, di hemberî vê de nîsbeta rejîya kevir %90'an hatîye ser %40'an.

Dîyar e girîngîya stratejîk a petrolê her ne hewcedarî behskirinê ye. Her çend ku di netîca peydakirin û pêşdeçûna fûze û bikaranîna çend cure şewatên nû de, şer awayek nû bi xwe re anîye holê jî, cardin petrol şewatek girîng a şerên vê demê tê nasîn. Projên emperyalîzmê û peymanên nîzama wê wek Peymana Atlantîka Bakur û yên din, vê qîmeta stratejîk a petrolê îspat dikin.

Madem wiha ye, di cîyê xwe de ye ku berhemdarîya petrolê ji sala 1900'an heta sala 1966'an, ji bîst mîlyon tonan gihîştîye zêdetirî 1.600 mîlyon tonan, yanî heştê car qasî sala 1900'an.

Niha çar melbendên girîng ji bo derxistina petrolê hene, Dewletên Yekgirtî yên Amerîka, melbenda Derya Karîbî (yanî Venezuella), Rojhilata Navîn û Yekîtîya Sovyetan. Sala 1961'an berhema petrolê ya Rojhilata Navîn ji çaran yekê hemû berhemên petrola cîhanê zêdetir bû. Di warê zêde berhemê de jî Rojhilata Navîn hemû cîhana sermayedarî paş de hiştîye, ji ber ku di navbera salên 1950-1965'an de berhema petrola Rojhilata Navîn %370'ê, li Venezuella %188 û Dewletên Yekgirtî yên Amerîka tenê %44 zêde kirîye.(1)

Ji pêncan sisiyê hemû rezerva petrolê ku heta niha di dinyê de hatîye dîtin, li welatên Rojhilata Navîn e. Sala 1965'an Rojhilata Navîn bi berhema zêdetirî ji 400 mîlyon tonan Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê paş de hiştîye, ku di wê salê de 375 mîlyon ton berhem anîbû. Îro Rojhilata Navîn di berhemdarîya petrolê de rêza yekem girtîye. Di van panzdeh salên dawîyê de berhema petrola Kurdistanê çend car zêde bûye û sala 1965'an berhemê petrola Kurdistanê gihiştîye 45 mîyon tonan ku %3'ê berhema petrolê ya hemû cîhanê ye.(*)

(1) Petroleum Press Service, London September, 1962, p. 124.

(*) Di sala 1971'an de ew petrola ku li hemû perçên Kurdistanê hat deranîn, nêzîkî 60 mîlyon ton bûye. -Nivîskar.

Her ev yeka ku me behs kir, bi başî cîyê giringîya petrola Rojhilata Navîn ji bo aborîya welatên sermayedarî û bi taybetî Avrupa Rojava ku mezintirîn bi karhênerê vê petrola han e, derdixe û vê rola han a giring nîşan dide ku di waridatê de petrola Rojhilata Navîn di aborîya Amerîka û di cîhana sermayedarî de bi gelemperî rol dilîze.

## 2- Petrola Rojhilata Navîn û Monopolên Petrolê

Li gel hemû vê qîmeta petrolê ku di aborî û pêşdeçûna welatên Rojhilata Navîn de heye, petrola gelên van welatan di destê wan de nîne(2). Ji ber ku ew sermaya netewî ya di petrolê de hatîye li kar xistin, %1'ê sermaya giştî kêmtir e. Sebebê vê jî ev e ku sanayîya petrolê hemû di destên monopolên emperyalîst de ye, ku piştî problem û serêşîyek tund monopolên Amerîkayê ketîne pêşîya hemûyan. Beşê monopolên Amerîkayê ku sala 1937'an %13,1 bû, di sala 1957'an gihîşt %59,6'an, di hemberî vê de beşê monopolên Brîtanya di vê navê re ji %76,8'an hatîye ser %30,6'an.

Kartela cîhanî ya petrolê, ku ji vir şûn de em ê bi du herfan "K. C." bidin dîyarkirin(3), heşt monopolên petrolê tê de civîyane û li gor wan îmtîyazan ku li wan melbendan wergirtine, derxistin, veqetandin, neqilkirin û firotina petrola Rojhilata Navîn girtîye destê xwe. Di van salên dawîyê de hinek şirketên petrola Îtalya, Japonya û Kanada jî hatine Rojhilata Navîn, lê ew îmtîyazên ku

(2) Peywendîya vê behsê bi van welatan re heye: Îran, Iraq, Erebîstana Suûdî, Kuweyt, Qeter, melbendên bêteref û Behreyn. Misir, Tirkîye û Îsraîl me jê veqetandiye, ji ber ku her sê kêmtir %1'ê petrola Rojhilata Navîn berhem tînin.

(3) Kartelên cîhanî bi awakî resmî nînin. Lê di praktîkê de rêkevtinek nehêhî di navbera şirketên petrolê de heye. Dîyar e ev rêkevtina han jî reqabeta di navbera van şirketan de ranake û gelek car reqabetek tund di nav wan de heye.

wan şirketan wergirtine, nebûye çara bidestxistina berhemek girîng, li gel vê jî şirketên Japonya û Îtalya ku endamên "K. C" nînin[4], hinek problemên mezin ji bo "K. C" durust dikin.

Niha problema monopolan ew e ku kîjan ji wan di derxistina petrola Rojhilata Navîn de desthilatê zêdetir têke destê xwe. Da em bizanin hemû ev qîmetdana bi petrola Rojhilata Navîn ji ber çîye?

Xercê derxistina vê petrolê gelek kêm e. Li Xelîc mesrefa derxistina varîlek petrol du dolar e, lê li Rojhilata Navîn tenê 10-35 sent e, yanî ji pênc heta bîst caran kêmtir e. Serokanîya vê cîhêbûnê jî rastîya bîrên petrolên melbenda Rojhilata Navîn e. Her ev tenê bes e ku bê gotin bîrek petrola Îranê, yan Sûûdî û yan jî Kuveytê 500 carî bîrên Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê petrol jê derdikeve. Ji ber ku berhemê petrolê bîrek li Kuveyt rojê nêzîkî 710 ton, li Suudî 820 ton, li Iraq 940 ton û li Îranê 1 115 ton e, li hemberî vê berhema rojane ya petrola bîrekê li Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê tenê 165 ton e. Vêca li Rojhilata Navîn tu bîrek hişk nîne, di hemberê vê de ji %40'ê wan bîrên li Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê tên lêdan hişk in û dîyar e ev jî xercê berhemdarîyê zêde dike. Pişt re, di sanayîya petrolê ya Rojhilata Navîn de nûtirîn wasite tên bikaranîn û piranîya karên derxistin û rafînerîya petrolê otomatîk e û otomatîzasyon her wiha berdewam e. Ji ber vê jî ber bi zêdebûna berhemê re bi tevayî hejmara karkerên sanayîya petrolê kêm dibin. Belavbûna otomatîzasyonê tê mana zêdebûna berhemdarîya kar, ku ew jî mezintirîn qazanc e ji bo monopolên ku tê de ne. Ji bo wan netîca civakî ya oto-

---

(4) Endamên kartelên cîhanî ji pênc şirketên Amerîkî pêk hatine:
Standard Oil Company of New Jarsey,
Standard Oil Company of California,
Socony Vacuum Oil Company,
Gulf Oil Corporation,
Texas Company.
Li gel şirketên Îngilîzî, şirketên Îngilîzî-Holandî û şirketên Frensî:
British Petroleum Company.
Royal Dutch Shell Company.
Compagnie Française des Petroles.

matîzasyonê, bi taybetî zêdebûna ordîya bêkaran girîng nîne. Ji wan re hejmarek kêm karker ( bi warîdatek zêde ve) baştir e ji hejmarek zêde bi kiryek kêm. Dîyar e hinek qazancên vê akarê hene, ji ber ku dibe sebebê peydabûna grûbek arîstokrat a bi nav karker ku di hel û mercê Rojhilata Navîn de kar dîtin her tişt e. Ev karê han jî rola karkerên petrolê di tevgera çîna karker de, bi taybetî di xebata dijî monopolên bîyanî de kêm dike(5).

Heqdestê karkerên petrolê li Rojhilata Navîn li ser hev ji heştan yekê heqdestê karkerên petrolê yên Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê ye û dîyar e divê de jî zêdetir qazanca monopolan heye(6).

Ji ber ku berhemdarîya kar gelek bilind e û mêtandinek tundî jî pê re ye, petrola Rojhilata Navîn ji petrola hemû cîhana sermayedarî erzantir dibe mal.

Bîrên petrolê yên Rojhilata Navîn nêzîkî bazarên Avrûpayê ne jî , ku bikirên (muşterîyên) serekî yên vê petrolê ne û ji ber vê piranîya petrola Rojhilata Navîn li nêzîkî qeraxên behran û bi taybetî nêzîkî qeraxê Xelîca Faris derxistin û neqilkirina wê jî hêsantir e. Ewên ku nêzîkî deryan jî nînin, di riya borîyên (lule) petrolê re bi hêsanî tên neqilkirin qeraxên Derya Spî. Ev jî aşkera bûye ku neqilkirina petrolê di riya deryayê re ji hemû riyan erzantir e. Ji ber ku piştî Şerê Cîhanê yê Duyem xercê neqilkirina petrolê di riya deryayê re, li ser hev heftê car ji ya riya reş û bîst car ji riya hesin û çar car ji neqilkirina bi borîyan kêmtir bûye. Vêca, em dizanin Rojhilata Dûr kêm petrol e û %10'ê petrola Rojhilata Navîn ew dikirin, ku eger em melbendên petrolê ên cîhana sermayedarî bigrin berçav, Rojhilata Navîn nêzîktirîn melbenda

---

(5) Waridata mehane ya karkerekî jêhatî di sanayîya petrolê de digihîje 70-80 dolaran ku li Rojhilata Navîn li gor sanayîyên din kirêyek (ucret) zêde ye, ji ber ku karkerek jêhatî di wan sanayîyan de mehê 40-50 dolar heqdest werdigre-Nivîskar.

(6) Ferqek zêde di Rojhilata Navîn de di navbera ucreta karkeran de heye: ew welatên ku sevîya jîyana wan bilintir e û hestê (hîsa, şuûra) çînîtî ya karkerên wan û xebata li dijî monopolan ji bo rojên bên zêdetir e, ucretek zêdetir wek ji karkerên welatên Erebîstana Suûdî werdigrin-Nivîskar.

petrolê ye ji Rojhilata Dûr re.

Îmtîyazên ewqas zêde ji bo derxistina petrola Rojhilata Navîn ketine destên monopolên petrolê, ku wan han dide ku bi hemû îmkanên xwe di van melbendan de derxistina petrolê bikar bînin . Wek nimûne qazanca salane ya monopolên Amerîkayê li Dewletên Yekgirtî %20, li Venezuellayê %30 û li Rojhilata Navîn %100'ê wê sermayê ye ku xistine kar.

Wek em ê di dawîyê de jî bibînin parvekirina qazancê di navbera şirketên petrolê û welatên Rojhilata Navîn de li ser bingeha 50-50 tenê derew û çavgirêdan e, ya dikeve destê monopolan gelek ji nîvî zêdetir e, ji ber ku tenê qazanca rafînerîkirinê resmî di belgên Netewên Yekgirtî de hene, sala 1961'an gihîştîye 1.500 mîlyon dolaran.

Asoya (ufuk) berbipêşdebirina sanayîya petrolê jî li Rojhilata Navîn ji hemû cîhana sermayedarî ronîtir e, ji ber ku zêdetirî ji %70'yê wê zexîra petrolê ku heta niha hatîye dîtin ketîye vê melbendê û her salê jî damarên nû tên dîtin, di eksê vê li melbendên din ên cîhana sermayedarî berhemê wê gelek kêm e.

Di navbera salên 1950-1965'an de di nîsbeta para Rojhilata Navîn di berhemdarîya petrola cîhanê de %16,9'an gihîştîye %25'an. Ev cetvela han a xwarê ku beranîna petrola van sê melbendên girîng ên cîhana sermayedarî di van neh salên dawî de nîşan dide, gelek bi ronîtî guherînên van dawîyan ji me re derdixe.

**Berhema petrolê bi mîlyon ton**

| | 1957 | 1958 | 1959 | 1960 | 1961 | 1962 | 1963 | 1064 | 1965 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Dewletên Yekgirtî | 353 | 330 | 347 | 345 | 353,5 | 361,6 | 371 | 376,6 | 384,9 |
| Venezuella. | 145,3 | 138,6 | 146,5 | 151 | 151 | 170,8 | 169,2 | 177,7 | 181,7 |
| Rojhilata Navîn | 175 | 210 | 226 | 265 | 278,5 | 305 | 338,1 | 377 | 415,9 |

**Cetvela Hejmara 23**

Di vê cetvelê de cihêbûna navbera berhema zêde ya her yek ji wan sê melbendan a di van heşt salên dawî de bi eşkere derdikeve. Li hemberî vê berhemên zêde yên Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê %9 û yên Venezuellayê %44 bûye û berhemên zêde yên Rojhilata Navîn gihîştîye %137'an(*).

Sala 1958'an zexîra petrolê li Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê 12 carî berhema salane û li Venezuella jî 15 car bûye, li hemberî vê sala 1961'an li Rojhilata Navîn zexîra petrolê 90 carî berhema salane bûye.

## 3- Şirîkatîya 50-50 û Cîbicîkirina Wê

Gav bi gav pêşdeçûna qîmeta petrolê di aborîya welatên Rojhilata Navîn de, têkoşîna van welatan zêde kirîye ji bo bidestxistina beşek zêdetir ji qazanca petrolê. Piranîya van welatên xwedî petrol problemên wan ên aborî yên gelek giran hene. Her wiha netemamîya butça giştî ya van welatan û nebûna sermaya pêwîst ji bo cîbicîkirina projên pêşdeçûnê, van welatan han dide ji bo daxwaza beşek zêdetir a qazanca petrolê bikin. Tevgera li dijî emperyalîzmê û bi taybetî ji ber wan sebebên aborî yên jorê nerazîbûna wan li dijî monopolên petrolê , hemû han bi wan hukumetan ve didin ku ji bo daxwaza beşek adîlanetir ji berhemê petrolê bikin. Hukumetên van welatan vê yeka han jî dizanin, ku rewşa navnetewî jî ji bo gihîştina armanca wan amade ne û welatên sosyalîst, welatên bê alî û mirovên demokrat ên welatên pêşkevtî yên sermayedarî piştevanîya wan dikin. Her ji ber vê jî em dibînin ku li hemberî monopolan tundtir radiwestin û heta ji van hinek pêgavên berçav jî avêtine.

Ev têkoşîna han heta niha li ser zêdekirina warîdata petrolê a van welatan li ser pîyan sekinîye, ev di çarçova wan rêkevtinan de ye ku di navbera van welatan û monopolên petrolê de hatine îmza kirin. Wek em dizanin ev rêkevtinên han bi resmî li ser esa-

(*) Ji sala 1965'an heta 1972'an berhemên zêde yên petrola Amerîka %38 û ya Rojhilata Navîn %64 bûye, heta ya Venezuella %8 kêm bûye.

sê 50-50 hatine îmzakirin.

Em dixwazin berî bêjin ku eslê 50-50 piştî xebatek dijwar û berdewam hatîye holê û van welatên han pêş de hîn beşek gelek kêmtir werdigirtin, wek nimûne ji destpêka sala 1908'an ku li Îranê dest bi derxistina petrolê hatîye kirin, heta sala 1950'an ku sanayîya petrolê hat millîkirin, şirketa petrola Îranê û Îngilîzan, pêşîyê 326 mîlyon ton petrol derxistine ku ji vê tenê 105 mîlyon lîrê sterlîn ketîye destê Îranê, li hemberî vê, şirketê 790 mîlyon lîre jê qazanc kirîye. Şirketa petrolê ji her tonekê du lîre qazanc dikir, lê Îran tenê şeş şîlîn distand, yanî ji qazanca şirketê heft carî kêmtir .

Piştî Şerê Cîhanê yê Duyem li welatên Rojhilata Navîn xebatek xurt li dijî monopolan destpê kir û di sala 1950'an de, ev xebata han gihîşt wê derecê ku millîkirina sanayîya petrolê li Îranê temam bû. Di wê navê re Îran mezintirîn welatê berhemhênerê petola wê melbendê bû. Sala 1954'an carek din petrola Îranê ket destê monopolên petrolê vê carê konsorsîyomên cîhanî cîyê şirketên petrola Îranê û Îngilîzan girtin. Lê ev bûyera han yekemîn car vê rastîya han xist ber çavên gelên van welatan ku monopolan çi serwetek zêde ji van welatan talan dikirin.

Nerizayî û dijîtîya gelan di netîcê de monopolan neçar kir ku hinek xwe paş de bikêşin. Ev yeka han bû ku dest ji îmtîyazên berê hatin kêşan û şirîkatîya 50-50 di parvekirina qazancê de hat holê.

Li gor vê şirîkatîyê, qazanc li gor "nirxê îlankirî" tê hesêb kirin (7), lê piştî sala 1948'an bihayê petrolê li gor xercê berhemdarî ya Dewletên Yekgirtî hat hesêb kirin. Di wî wextî de ji Dewletên Yekgirtî di cîhanê de mezintirîn berhemhêner û bikarhênerê petrolê bû. Lê ji wî wextî ve ji welatekî petrolfiroş bû welatek petrolkir û vê carê monopolan bihayê petrolê li gor xercê berhemdarîya Venezuellayê hesêb kirin. Niha xercê berhemdarîyê ji bo her varîlek petrola xav bi vî awayê xwarê ye:

(7) Nirxek e ku monopol ji bo petrolê dîyar dikin.

Xercê berhemhêner ji bo her varîlek (bi dolar)[8]

| | |
|---|---|
| Îran | 0,10 |
| Suudî | 0,35 |
| Iraq | 0,25 |
| Kuweyt | 0,10 |
| Xelîcê Faris li ser hev | 0,21 |
| Derya Karîbî | 2,85 |

**Cetvela Hejmara 24**

Li ser hev xercê berhemdarî li Rojhilata Navîn ji dehan yekê xercê berhemdarî li xelîcê Meksîka û ji çaran yekê xercê berhemdarî li Derya Karîbî ye. Petrola xav jî li her melbend û welatekî berhemdarî bi vî awayî ye: [9]

Bihayê varîlek petrola xav di sala 1962'an de (bi dolar)

| | |
|---|---|
| Xelîcê Faris (li ser hev) | 1,72 |
| Îran | 1,73[10] |
| Iraq | 2,07[10] |
| Erebîstana Sûûdî | 1,80[10] |
| Kuveyt | 1,59[11] |
| Derya Karîbî | 2,52[11] |
| Xelîcê Meksîkî (li ser hev) | 3,15-3,25[12] |

**Cetvela Hejmara 25**

(8) "Aborîya Welatên Sermayedarî Piştî Şerê Cîhanê yê Duyem", Moskova, 1959, rûpel: 101.

(9) Ev cetvela han li gor Petroleum Press Service, London, 1962 hatîye çêkirin.

(10) Safî 34-34,9 derece.

(11) Safî 31-31,9 derece.

(12) Safî 35-35,9 derece.

Ev cetvela han nîşan dide ku ferqa biha kêmtir e ji ferqa xercê berhemdarîyê. Em dikarin bêjin sebebê vê jî ew e ku ev xercên han ku di cetevela hejmara 24 an de behsa wan hatîyekirin, heta derecekê nêzîkî xercê rastîyê yê berhemdarîyê ye, lê ev bihayên di cetvela hejmara 25 an de hatine behskirin, ji derveyî yên Xelîcê Meksîkî hemû ew biha ne ku monopol wek bihayê "îlankirî" dîyar dikin. Li ser esasê van bihayan jî welatên Rojhilata Navîn piştî derxistina xercên berhemdarîyê para xwe ji qazanca petrolê werdigrin. Dîyar e hem biha û hem xercê berhemdarîyê monopol dîyar dikin. Cîyê balkêşanê ye, ku şirketa petrola Iraqê xercê berhemdarîyê ji bo petrola Kerkukê, Besrayê û Musilê, ton 13 şîlîn hesêb dike, li hember vê, hel û mercên berhemdarîyê di van sê melbendan de gelek ji hev cihê ne. Ji derveyê vê jî bi dirêjayî dema piştî şer xercê berhemdarîyê wek xwe maye.

Hel û mercên Dewletên Yekgirtî yên Amerîka ji bo berhemdarîya petrolê ji her cîyê din xerabtir e û ji ber vê, bihayê petrola cîhanê li gor vê hel û mercê tê dîyar kirin. Pêwîst e em rola kartelên cîhanî jî di dîyarkirina bihayê petrolê de bigrin berçav. Ev tê vê manê ku bihayê petrola cîhanê her wext li gor bihayê petrola Dewletên Yekgirtî tê dîyarkirin, wek berdevkên kartelên cîhanî îddîa dikin, ne li gor petrola Venezuellayê ye.

Li gor vê divê bihayê varîla petrola Rojhilata Navîn 3,15-3,25 dolar be, ku ev jî nêzîkî du carî bihayê îro yê tespîtkirî ye û dikare warîdata welatên xwedî petrol heta sevîyek zêde pêş de bibe. Cardin ev wisa dide xuyakirin ku monopol jî zêdetir qazancê bi dest dixin, lê rastîya meselê bi vî awayî sade nîne.

Di vir de ye ku desthilat û îmkanên kartelên cîhanî yên petrolê derdikevin. Kartelên cîhanî yên petrolê sala 1960'an, %61'ê berhema petrola cîhana sermayedarî û %94'ê berhema petrola Rojhilata Navîn di dest de bû. Mana vê jî ev e ku, kartelên cîhanî yên petrolê mezintrîn desthilat in li ser derxistin û parvekirina petrola dinya sermayedarî. Kartelên cîhanî bi van hemû desthilatên xwe ve dikarin li gor kêfa xwe bi bihayê petrolê bilîzin.Wek nimûne li Xelîca Faris petrolê tê girtin, bê wê ku kirîn û firotinek di holê de be. tîcaret di Avrupa Rojava re tê kirin, ku li wir petrol bi bihayê cîhanê tê firotin. Ev pê lîstina han serokanîya mezintirîn qazancekê ye, ku kartelên cîhanî li ser he-

sabê zîyana welatên Rojhilata Navîn dikin destê xwe. Ji ber ku ferqa di navbera bihayê cîhanê û bihayê tespîtkirî yê xav de li Xelîca Faris, ji bo her varîlê dolarek, yanî ji bo her tonekê 7,2 dolar e[13]. Ev ferqa han ji bo Rojhilata Navîn sala 1962'an gihîştîye du mîlyar dolaran û ji bo nifûsa Kurdistanê jî ji 250 mîlyon dolaran derbaz bûye, ku monopolan di riya pê lîstina bihayê petrolê re talan kirine. Ji bo derxisitna giranîya vî perê ku dike 125 mîlyon dolar, ev tenê bes e ku em bêjin; ev %12,5'ê waridata netewî ya hemû beşên Kurdistanê ye. Muqayesek bihayê petrola xav ji me re derdixe ku bihayê hatî tespît kirin ji bo varîlek petrol li Xelîcê Faris 0,5 dolar nizimtir e, heta eger petrola Venezuellayê jî li gor esasê vê muqayesê bê hesêb kirin.

Waridata petrola welatên Rojhilata Navîn di navbera 1957-1961'an de bi mîlyon dolar[14]

| | 1957 | 1958 | 1959 | 1960 | 1961 |
|---|---|---|---|---|---|
| Îran | 213 | 272 | 262 | 285 | 290 |
| Iraq | 137 | 224 | 243 | 267 | 265 |
| Sûûdî | 303 | 302 | 294[15] | 332[15] | 340[15] |
| Kuveyt | 308 | 354 | 409[16] | 409[16] | 454[16] |
| Welatên Rojhilata Navîn li ser hev | 1016 | 1224 | 1274 | 1360 | 1440[17] |

**Cetvela Hejmara 26**

(13) Ji bo sadekirina safî ya herî bilind a petrola Amerîka li ber çav hatîye girtin û hejmara herî nizm me dolarek danîye, yanî ferqa navbera nirxê petrola Amerîka û petrola Îranê 3,15-2,7 = 1,8 dolar e.

(14) Ev cetvela han li gor Petroleum Press Service, 1962 hatîye çêkerin. Rûpel: 324, reqemên texmînî jî nivîskar amade kirine-Nivîskar.

(15) Ev reqemên han melbendên bêalî nagrin.

(16) Reqem texmînî ye.

(17) Behreyn û Qeter jî li gel e.

Ev cetvela han li ser hev zêdebûna warîdatan nîşan dide, lê pêwîst e waridata her tonek petrolê jî li ber çav bê girtin, ku di wan salan de bi vî awayî bûye:

Waridata welatên Rojhilata Navîn di her tonek petrola xav de (bi dolar)

| | 1957 | 1958 | 1959 | 1960 | 1961 |
|---|---|---|---|---|---|
| Rojhilata Navîn (li ser hev) | 5,8 | 5,8 | 5,8 | 5,1 | 5,1 |

Ev yek ji me re vê dide zanîn ku warîdata tonek petrolê li Rojhilata Navîn 70 sent, yanî %12 hatîye xwar û li gor vê sala 1961'an nêzîkî 195 mîlyon dolar zerar gihîştîye welatên vê melbendê.

Feyde tê de heye ku em hinek ji nêzîk ve li wan reqemên di cetvela jorê de hatine, binêrin. Berhemê petrolê li Îranê, ku konsorsîyom serî dikişîne, sala 1961'an 8 mîlyon ton zêde bûye, lê çi heye ku warîdata welat tenê pênc mîlyon dolar zêde bûye, ev vê yekê bi me dide zanîn ku Îran ji bo her tonek berhemê zêde yê sala 1961'an tenê 60 cent wergirtîye. Li Iraqê di eksê vê de, tenê tonek berhem zêde kirîye, lê warîdata wî du mîlyon dolar zêde bûye. Sala 1960'an carek din bihayê tespîtkirî yê petrolê erzan bû û welatên Rojhilata Navîn %3-4'ê waridata xwe ji destê xwe kirin. Di vir de Venezuella jî ber bi van welatan ket û di Îlona wê salê de (Xermaneyî sala 1339) (hinek ji meha Tîrmeh û hinek jî ji meha Tebaxê ye-Elîşêr) rêxistinek bi navê "Rêxistina Welatên ku Petrolê Îxrac Dikin" hat damezrandin[18]. Welatên endamê vê rêxistinê dan xuyakirin ku petrol beşek girîng ji warîdat û wê sermayê ye ku ev welatên han di projên xwe yên aborî de bikar tînin, her wek muwazena hatinên butça dewletê jî raste rast pişta xwe bi berhemê petrolê ve girê dane û ev jî *"wek sermaye dawîya wê*

---

(18) Endamên vê rêxistinê ji Îran, Iraq, Suûdî û Venezuella pêkhatine. Piştre jî Lîbya, Qeter, Endonezya ketnê.

*tê û pêwîst e ew tewazina lê têt xerc kirin, sermayek din di cîyê wê de deyne".*

Ewên me di warê petrola xav de gotin, hemû di derbarê berhemên petrolê de jî rast in û em dikarin di vê riyê re bizanin ku monopol çi qazancên zêde bidest dixin. Ew tonek petrol li Avrupa Rojava bi 240 dolaran difroşin wan kesan ku di warê petrolê de kar dikin, ev bihayê han 160 carî xercê berhemdarîya Rojhilata Navîn e, ku wek me got xercê berhemdarîya wan ji bo her varîlek petrol 21 sent e, yanî her tonek dolarek û nîv e.

Propagandîstên kartelên cîhanî yên petrolê vê ferqa han bi vê pîne dikin, ku ew welatên ku petrolê dikirin, vêrgîyek gelek zêde dixin ser petrolê, bêyî ku wê ronî bikin ka sevîya vê vergîyê çend e. Lê ji xwe aşkera ye ku xercê neqilkirin, rafînerî, firotin û her wiha gumrikê jî bi ser hev de 160 carî ji xercê berhemdarîyê zêdetir nîne.

Nunerê Sûûdî di Rêxistina Netewên Yekgirtî de îspat kir ku monopolên petrolê ji neqilkirina her varîlek petrola Rojhilata Navîn 20 sent û ji rafînerî dolar û ji firotinê jî du dolar qazanc dikin, ku li ser hev dike 3,2 dolar.

Ji vê yeka ku me behs kir derdikeve, ku xercê berhemdarîya petrola xav li Rojhilata Navîn ji bo her tonekê dolar û nîv e. Monopolên petrolê wisa didin xuyakirin ku projên lêkolîn û dîtina petrolê wan tûşî xercek giran dike. Bila wisa deynin ku ew ji sisîyan yekê xercê berhemdarîyê ye, yanî nîv dolar û hemû li ser hev dike du dolar. Tona petrola xav a Rojhilata Navîn di bazara cîhanê de bi 23,3 dolaran tê firotin, yanî her varîlek 3,15 dolaran, serokanîyên hemû wan qazancên ku dikevin destê monopolan jî di vir de ne.

Qazanca rafînerîyên monopolên petrolê di her tonek petrola Rojhilata Navîn de (bi dolar)

| | |
|---|---|
| Li ser hev xercê ku li derxistinê tê kirin | 2 |
| Li ser hev warîdatên dewletên Rojhilata Navîn | 5,1 |

| | |
|---|---|
| Hemû ew sermaya ku tê de xistine kar | 7,1 |
| Bihayê firotinê | 23,3 |
| Qazanca pakkirinê (rafînerî) | 16,2 |

**Cetvela Hejmara 27**

Ew petrola ku li Rojhilata Navîn tê derxistin, hemû li ser hev ji 300 mîlyon tonan derbaz dibe û warîdatên ku ketine destên welatên Rojhilata Navîn gihîştîne 1.530 mîlyon dolaran, li hemberî vê monopolên petrolê bi hev re 4.860 mîlyon dolar qazanc kirine. Ji derveyê vê, %20'ê petrolê jî (yanî 60 mîlyon ton) li Rojhilata Navîn tê rafînerîkirin û eger em hesabê nunerê Suûdî bikin esasê lêkolîna xwe, yanî li Erebîstana Suûdî ji her varîlek petrola rafînerîyê 3,20 dolar (ton bi 23 dolaran) û li welatên Rojhilata Navîn ên din nêzîkî 20 dolar qazanc tê dîtin(19), derdikeve ku monopol 1.200 mîlyon dolarên din jî qazanc dikin.

Ew qazanca li Rojhilata Navîn dikeve destê monopolan, tiştek gelek ecêb e, yanî 6.060 mîlyon dolar, yanî ji %15'an zêdetirî warîdata netewî ya wan hemû welatên xwedî petrol ên Rojhilata Navîn. Madem wiha ye, tesadufî nîne ku monopolên mezin ên cîhanî yên petrolê di deh salên borî de 54 mîlyar dolar qazanc kirine(20).

Ev reqemên jorê nîşan didin ku esasê 50-50 fir û fêlek veşartî ye û li gor wan tiştên me li jorê behs kirin, nîsbetê 50-50 nîne, belko ji %79,8-20,2 bi qazanca monopolan e. Ev nîşan dide ku divê ku waridata welatên berhemdar ên petrolê li Rojhilata Navîn du carî heta du car û nîv bê zêde kirin. Ducarkirina warîdata petrola Kurdistanê jî ji bo sala 1962'an mana zêdebûna 180 mîlyon dolar e.

Gelek caran monopolên petrolê behsa vê yekê dikin ku derxistina petrolê pêwîstî bi sermayeke zêde ye, lê ew sermaya li Rojhi-

(19)World Petroleum Industry, New York, 1961, p. 271.
(20) Eynî serokanî

lata Navîn xistine kar ji ya hemû cîyên dinya sermayedarî kêmtir e.

Li ser hev ew sermaya ku di deh salên 1949-1959'an de ji bo derxistina her tonek petrol xistine kar (bi dolar)[21]

| Dewletên Yekgirtî | Kanada | Venezuella | Rojhilata Navîn | Rojhilata Dûr | Welatên din |
|---|---|---|---|---|---|
| 12,3 | 25,7 | 4,2 | 1,18 | 6,45 | 10,0 |

**Cetvela Hejmara 28**

Çend sal e welatên Rojhilata Navîn hewil didin ji derveyî kartelên cîhanî ji bo derxistina petrolê hinek peymanên nû îmza bikin; sala 1957 Îran peymanek li gel Şirketa Petrola Îtalya û li gel Şirketa "Amerika Standard Oil Company of Îndiana" û li gel şirketa Kanada "Siwr Petroleum Limited" îmza kir. Ev şirketên han heqê wan ê îmtîyazê nîne. Belko %50 beşê şirketên şirîk hene. Nîvpara din jî ya Şirketa Millî ya Petrola Îranê ye. Di vir de jî esasê 50-50 di navbera hukumeta Îranê û şirketên şirîk de heye û ji ber vê Îran bi nîvê para xwe ve, warîdata Îranê dibe %75 ji qazanca giştî ya şirketên şirîk. Kuveytê peymanek girîng li gel şirketa Japon "Ereb-Yasikin" îmza kirîye û her wiha Erebîstana Suûdî jî peymanek li gel vê şirketê îmza kirîye. Sermaya van herdu welatan di van şirketan de nînin, lê Erebîstana Suûdî %5... (li vir şaşîtîyek çapê heye, ji ber ku tenê reqema pêncan derketîye yê din nayê xuyakirin, ji ber vê ev hejmara han mimkun e ji sedî pêncan zêdetir be- Elîşêr) û Kuveyt %57 ji qazanca derxistin, firotin û hemû karên din ên şirketê werdigrin. Dîyar e ev herdu peymanên han jî qazanca welatê gelên Rojhilata Navîn naparêzin, bi bêbeşdarî û nerazîbûn û heta li dijî daxwazên van gelan hatine îmza kirin. Lê li gel van tevan jî çavên wan peymanan li hemû wan îmtîyazan e ku bi baştirîn ji kartelên cîhanî re hatine dan.

(21) "Qazanca Petrolê li Welatên Sermayedarî" bi zimanê Rûsî, Moskova, 1962, rûpel: 276.

Ev peymanên han evqas ji bo van welatan baş e ku dikarin çavdêrîya her dan û sitendinekê bikin, ku her yek ji van şirketan dike. Her çendîn girîngîya van peymanan heta niha jî tenê xwedî karekterek qanûnî ye, lê cardin jî gavek ji bo kêmkirina tirs û hîla kartelên cîhanî ye. Bêguman, warîdat û ehemmîyeta van peymanan li gor wan peymanên ku li gel kartelên cîhanî hatine îmza kirin, nîşan dide.

## 4 - Millîkirina Petrolê

Piştî birrek gotûbêjên bê netîce yên welatên endamên OPECê gihîştin vê netîcê ku pêwîst e armancek wan a tundtir hebe. Her çend hukumetên van welatan heta niha jî mesela millîkirina sanayîya petrolê nexistine ber muzakere û lêkolînê, lê ev karê han wek çareserîyek yekcarî dûr nayê zanîn, bi taybetî ku mesela millîkirinê di Rojhilata Navîn de tiştek nû nîne û vê carê hel û mercên cîhanê jî mimkun e alîkarîya serkevtina millîkirinê bide. Ji ber ku ew roj bi ser de çûye, ku ji bo hebûna gemîyên teyaran ên Brîtanya li Xelîcê Faris bikare bîryarê li ser her tiştî bide. Li gel van tevan jî divê em bêjin ku mesele di warê aborî de evqas sade nîne.

Sala 1962'an Rojhilata Navîn zêdetirî ji 270 mîlyon ton petrol şand ji derve. Eger di lêkolîna mesela millîkirina petrolê de ev berçav bê girtin ku piştî millîkirina petrolê dewletên emperyalîst petrola Rojhilata Navîn nakirin, divê ji bîra me neçe ku welatên sosyalîst nikarin vê petrola han bikirin. Ji ber ku bi kêmasî Yekîtîya Sovyetê û Romanya ji wan welatan in ku petrol îxrac dikin. Tiştek aşkera ye ku welatên din ên sosyalîst ku niha petrol ji Yekîtîya Sovyet dikrin, nikarin rolek mezin li ser petrola Rojhilata Navîn bilîzin.

Di alîyekî din de dinya sermayedarî û bi taybetî welatên Avrupa yên rojava pişta xwe bi petrola Rojhilata Navîn ve girê dane. Ehemmîyeta petrolê jî di aborîya van welatan de gihîştîye sevîyekê ku nikarin ne ji bo şewat û ne wek maddek seretayî qet tiştek din di cîyê wê de deynin. Ev welatên han jî bi taybetî ewên ku endamên kartelên cîhanî yên petrolê nînin, petrolê ji Yekîtîya

Sovyet dikirin. Di vir de ev pirsa han têt holê ku: ev welatên han ji ber çi nikarin petrola millîkirî ya Rojhilata Navîn bikirin? Welatên Avrupa yên rojava û her wiha hinek welatên Rojhilata Dûr ên wek Japonya û Avusturalya, pêwîstîyek wan gelek zêde bi petrolê heye. Madem wiha ye, herdu mil jî pêwistîyên wan bi yek û du hene: hem petrola Rojhilata Navîn di bazara Avrupa rojava de cîyê xwe digre û hem aborîya welatên Avrupa rojava pişta xwe bi berhemdarîya petrola Rojhilata Navîn ve girê dide.

Sala 1950'an dema ku li Îranê petrol hat millîkirin, Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê û hinek ji welatên Rojhilata Navîn hemû pêwistîyên petrola Avrupayê temîn kirin. Dîyar e ew dem pêwistîya wan bi petrolê çend car ji niha kêmtir bû. Monopolên petrolê ji bo tejîkirina valatîya cîyê petrola Îranê berhemên petrolê li welatên din pêş de birin û welatên Rojhilata Navîn û Dewletên Yekgirtî yên Amerîka karîn lazimiyên petrola bazara Avrupa rojava û ya hemû dinya sermayedarî temîn bikin. Ji ber vê, berhemê petrolê li Îranê hat ser sevîyek pêwistîyên hundur ên Îranê, di hemberê vê de berhemên petrolê li welatên din ên Rojhilata Navîn gelek zû berbijor ve çûn.

Lê niha Dewletên Yekgirtî yên Amerîka nikarin petrolê îxrac bikin, bi eksê vê, mîqtarek zêde dikirin, petrola Venezuellayê jî pêwistîya Amerîka Latînî û ew petrola zêde a Dewletên Yekgirtî yên Amerîka dixwaze û pêwistê welatên Avrupa rojava tijî nake.

Di vir de em digihîjin vê netîcê ku serkevtina millîkirinê pêwistî bi yekgirtina welatên endamên OPEC û têkoşîna bi hev re ya wan li dijî kartelên cîhanî yên petrolê heye. Ev welatên han her di destpêkê de di vê rastîya han gihîştin ku di benda çarem a wê biryarnama ku di civîna damezrandina OPEC de qebûl kirin, wiha dibêje:

*"...Hemû dewletên endam teehhud dikin ku tu qazanc û îmtîyazek wisa ji şirketên petrolê wernegirin ku bibe astenga serkevtina biryarên bi hev re yên welatên endamên vê rêxistinê.*[22]

Ji alîyekî din de welatên xwedî petrol ên Rowhilata Navîn

(22) Rojnama Etla'at, hejmara 12.12.1960.

dikarin demek bê petrol jî xwe rabigrin, aşkera ye ku ev welatên han dikarin ji alîkarîya aborî ya aktîf a welatên sosyalîst jî îstîfade bikin.

Madem wiha ye, îmkana daxwaza millîkirina petrolê ya cîbicîkirinê heye, mebesta me ew jî nîne ku monopolên petrolê û heta endamên kartelên cîhanî jî ji derxistin, rafînerî, neqilkirin û firotina petrola Rojhilata Navîn bêpar bikin. Lê ev beşdarîya han li ser bingehek nû û adîlane divê bibe. Berî hemû tiştekî divê monopolên petrolê rêz bi heqê hakîmîyeta welatên xwedî petrol bigrin. Çimkî desthilatek sîyasî ya girîng di destê van monopolên han de ye û desteki wan ê girîng di têkelhevî, fesadî sazkirin û di her sîyasetek dijî gel de heye û dest dikin nav hemû kar û barên taybetî yên van melbendan. Vala nîne ku gelên van melbendan dibêjin: *"Nebûna petrolê baştir e ji hebûna monopolan"* her ev yeka han îsbata wan nerîzabûnên bi heq in.

Giringîya pêkhatina rêxistina welatên petrolfiroş divê de ye ku ev rêxistina han cebheyek yekgirtî ya welatên xwedî petrol pêkanîye, bi wî şertî ku yekîtî û hevderdîyek bihêz di nav de hebe û millîkirina petrolê wek gavek bê îmkan dûr nayê zanîn, dikarin monopolan neçar bikin serî li ber daxwazên wan bitewînin.

Serkevtina millîkirinê, pêwîstî bi piştivanîya civakên xelkê û bi taybetî çîna karker heye ku qazancek wê ya mezin di millîkirina sanayîya petrolê de heye. Bûyerên van dawîyan ên Rojhilata Navîn baş nîşan didin ku hewl û xebata grubên kevneperest ên fermanrewan û burjuwazîya netewî, li milekî ji bo li dij derketina monopolên petrolê û li milek din ji bo li dij derketina gel, îmkana serkevtinê nîne. Xebat li dijî monopolan bi bê piştevanîya bê sînor a gel nikare biserkeve.

Di hemû halan de millîkirina petrolê, gîrugiriftên derxistin, rafînerîkirin, neqilkirin û firotina petrolê bi xwe re tîne. Rojhilata Navîn, ne hejmarek kêm be bingeha karnasîya wî welatî bi xwe nîne û piranîya cîyên rafînerî û wasitên neqilkirinê ên petrolê û ambarên wan, an ên kartelên cîhanî ne, yan rasterast desthilata wan di ser de ye. Ji alîyekî din de kartelên cîhanî bi sebebê liqên xwe ve ku destê wan li ser piranîya bazaran heye, problem û asteng dixe ser riya petrola millîkirî. Lê bi girtina mewqufek xurt

li beramberî kartelên cîhanî dikarin hêdî hêdî bi ser van problem û astengan de biserkevin û mimkun e bikarin ji alîkarîya wan monopolên ku endamên kartelên cîhanî nînin jî îstîfade bikin. Em di-karin wek nimûne vê yeka han bidin nîşan ku şirketên Îtalya û Japonan di hêla naklîyatê de alîkarîya petrola millîkirî ya Îranê kirin. Îddîayên monopolên petrolê ku wek hinek dibêjin: goya bi gelên Rojhilata Navîn ve sanayîya petrolê pêş naçe. Ewan ji bo gelê Misrê û Kanala Suweyşê jî her vê yekê digotin, di hemberî vê de ku va ye heşt sal e karnasên Misrî hemû kar û barên çûn û hatina kanalê bi rê ve dibin. Ji derveyî vê jî, ev welatên han ên Avrupayê ku endamên kartelên cîhanî nînin û bi taybetî Almanya Rojava û Îtalya, ji xwe re kirîna petrola Rojhilata Navîn tercîh dikin. Ev her du welatên han jî li Avrupa rojava mezintirîn muşterîyên petrola Yekîtîya Sovyetê ne. Di wextê xwe de bi resmî jî hat belav kirin ku şirketên Almanya Federal gelek pê xweş in ku ji xwe re petrol ji şirketên millî yên petrola Îranê birin.(*)

## 5 - Peywendîya Petrolê bi Pêşkevtina Aborî ve

Ji van lêkolînên jorê em dikarin van netîcan derxin: ji milekî de warîdata serê mirovekî a welatên xwedî petrol ên Rojhilata Navîn di salê de nêzîkî 150 dolar e, ku heşt car ji waridata serê mirovekî a welatên sermayedarî yên pêşkevtî yên Avrupa rojava û bîst car ji ya Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê kêmtir e. Madem wiha ye welatên vê melbendê di nav hejarî, belengazî, tuneyî û nexwendewarîyê de dijîn. Ji alîyekî din de jî her salê çend mîlyar dolar ji gelên van welatan têt dizîn. Eger bêt û qazanca petrolê heta li ser esasê 50-50'yên niha jî bi awakî edîlane bê parvekirin, ji mezintirîn problemên aborî yên van welatan re riya çareserkirinê têt dîtin.

---

(*) Ev rêzên han di sala 1964'an de hatine nivîsandin. Serkevtina millîkirina petrolê li Iraqê bi xweşî derxist ku heta çi dereçê nêrînên nivîskar di vî warî de rast bûne.-Nivîskar.

Warîdata petrolê dikare bibe serokanîyek ji bo temîn kirina sermayê. Nabe ji bîra me biçe ku di van welatan de ku di warê aborî de paşde mane, kêmbûna sermayê astenga herî girîng a li ser riya geşkirina aborî ye, lê petrol dikare di rojên bên de bi mîlyaran dolar warîdat ji bo welatên Rojhilata Navîn temîn bike.

Ew texmînên di warê asoya (ufuk) rojên bên a petrolê de hatine kirin, nîşan didin ku di deh salên bên de petrol dibe serokanîya serekî ya hêza elektrîkê û girîngîya rola wê ji ya gaza tebîî jî zêdetir dibe. Ev bawerîya bi hêz a li ser petrol û gaza tebîî ku dê sala 1970'an de bibin ji sisyan-diduyê serokanîyên hêza elektrîkê û zêdekirina berhemên van du maddan ji ya hêza elektrîkê jî bi zûtir pêş de diçe, ji ber ku hêza elektrîkê %50 zêde dibe, lê sevîya berhemê petrolê û gazên tabîî %66 zêde dibe û beşê piranî ya van berheman jî li Rojhilata Navîn in, ji ber vê Rojhilata Navîn dê bibe melbenda herî girîng a xwedîyê îxraca petrolê di cîhana sermayedarî de.

Di navbera salên 1960-1970'an de zêdebûna nîsbeta beşê Rojhilata Navîn di berhemê giştî yê petrolê de li gor cîhana sermayedarî, (Bi mîlyon ton)(23) (*)

| | 1960 | 1970 | Zêdebûna berhem di van deh salan de | Sewya li ser hev a berhem di salê de |
|---|---|---|---|---|
| Cîhana sermayedarî bi giştî | 885 | 1 375 | %55 | %4,5 |
| Rojhilata Navîn | 265 | 690 | %260 | %10 |
| Nîsbeta para Rojhilata Navîn | %30 | %50 | — | — |

**Cetvela Hejmara 29**

Hebûna van hemû serokanîyên petrolê zemîn xweş dikin ji bo ku ew bibe serokanîyek şewatê û hêza elektrîkê, ji ber vê, di daxilê quwetê de ye ku elektrîkek erzan bê berhemanîn û elektrîk bê kişandin her cîyê.

Ya ecêb ew e, Rojhilata Navîn ku %30'yê petrolê, yanî zêdetir %12'yê serokanîya hêza elektrîkê ya cîhana sermayedarî tîne, xwedî elektrîkek yekcarî kêm e û mesrefa hêza elektrîkê ya vê melbendê ji dehan yekê mesrefa elektrîka welatên sermayedarî yên pêşkevtî derbaz nabe.

Di van deh salên bên de pêwîst e guherînek vekirî bi ser vê rewşa han de bê, bi awakî wisa ku welatên Rojhilata Navîn bikarin hêza elektrîka xwe li ser petrolê dabimezrînin û elektrîk biçe her cîyê û di zîraet û sanayîyê de bikeve kar. Pêywendîya vê yekê bi Kurdistanê ve jî heye, Kurdistan xwedî serokanîyek gelek dewlemend a elektrîka avê ye ku dikare ji zêdetirî îhtîyaca elektrîka Kurdistanê temîn bike.

Lê mimkun e ku petrol wek maddek xav di sanayîya kîmyayê de bi awakî fireh bê bikaranîn û Rojhilata Navîn dikare di vê sanayîya kîmyayê de ku asoyek berfireh di rojên wê yên bên de heye, bibe pispor. Pêwîst e ev jî bê gotin ku welatên xwedî petrol ên van melbendan xwedî serokanîyek mezin ên gazên tebîî jî ne. Di sala 1961'an de li Rojhilata Navîn 6 .707 mîlyon metre kub gazên tebîî hatîye dîtin[24]. Sala 1960'an, 21.000 mîlyon metreyê şeşgoşe gazên tebîî li gel petrolê hatine derxistin ku tu feydek jê

---

(23) Ev cetvela han li gor World Petroleum Industry hatîye çêkirin, ku sala 1961'an li New York derketîye. Bingeha wan gotinên ku di derbarê Rojhilata Navîn de hatine kirin, ev zêdayî ye ku di navbera salên 1950-1960'an de bi ser berhemê petrolê de hatîye û her wiha asoya geşkirina rojên bên muqayese kirin li gel melbendên xwedî petrol ên din ên dinya sermayedarî-Nivîskar.

(*) Di sala 1970'an de berhemên Rojhilata Navîn (ji derveyî Misir, Tirkîye û Îsraîl) gihîştîye 680 mîlyon tonan. Lê ji ber peydabûna kanîyên girîng ên petrola Afrîka, petrola cîhana sermayedarî zêdetir ji sevîya ku hatî tespît kirin pêş de çûye û nîsbeta beşê Rojhilat %35 bûye-Nivîskar.

(24) Petroleum Press Service, 1961, II, p. 406.

nehatîye sitendin[25]. Ev cure serokanîyên han dikarin ewqas alîkarîya geşkirina sanayîya kîmyayê bidin, ku bibe destpêk ji bo danîna sanayîya welat û bingehek ji bo sanayîya bingehîn, her wiha dikare ji bo berhemdarîya sewîyek zêde a eşyan bê bikaranîn wek maddê xav jê bê îstîfade kirin û bibe sebebê guhertinek bingehîn di rewşa niha ya zîraetê de.

Wek ku berî niha me got, piranîya petrola Rojhilata Navîn xav diçe ji derve, ji ber vê pêşdeçûna sanayîya rafînerîya petrolê dikare rewşek li gor qazanca welatên xwedî petrol biguhere, ji ber ku ew dem piranîya îxracata petrolê dibin berhemên petrolê û beşek zêde ji warîdata petrolê di van welatan de dibe sermaye. Geşbûna sanayîya kîmyayê jî alîkarîyek zêde dide pêşdeçûna bazara wî welatî bi xwe û berhevkirina hemû serokanîyên welat bi xwe ji bo pêşdebirina aborîya welat. Rêk û pêkkirina petrolê jî bi serê xwe problemên planên bazirganî çareser dikin. Ji ber ku bi awakî giştî ew welatên ku di warê aborî de paşketî ne, eşyayên wan ên îxracatê kêm in, da ku bikaribin di beramberî vê de pêwistîyên xwe ji derve bînin.

Di van çend salên bên de mimkun e bi îxrackirina petrolê û berhemên wê, ev mesela han bê çareserkirin û vê carê welatên Rojhilata Navîn piştî demek kurt bikarin berhemên kîmyayî û her wiha berhemên petro-kîmyayî jî bişînin ji derve.

Ev welatên han dikarin problemên planên malî (malî bîlanco) bi îxrackirina petrolê çareser bikin û di cîyê petrolê de makîne û wasitên pêwistî ji bo danîna sanayîyê bînin.

Geşkirina sanayîya petrolê di rojên bên de, ehemmîyeta beşê dewletê di van welatên han ên Rojhilata Navîn de zêdetir dike. Ev warîdata dewletê ku ji petrolê bidest dikeve, beşê dewletê dike mezintirîn xwedî sermayedarîya welat û ev jî tesîrek baş li danîna sanayîya welat dike.

Wek me li jorê jî got, hinek ji dewletên Rojhilata Navîn ji bo derxistina petrolê di riya sermaya netewî re hewlek zêde didin û bêguman vê sermaya han a netewî ji bo derxistina petrolê bikar

(25) Eynî serokanî.

tînin, ji ber vê ev liqa serekî ya beşê giştî ye, di xebata dijî emperyalîstan de dibe bingehek aborî ji bo damezrandina sanayîya petrolê ya serbixwe. Ev geşkirina niha, nîşan dide ku di Rojhilata Navîn de sanayîya petrolê dibe bingeh ji bo danîna sanayîya welat. Bihêzkirina beşê dewletê li dijî sermayên emperyalîstên bîyanî ji milekî û li dijî sermaya taybetî ya hindûr ji milekî din, dikarin bibin gavek mezin ji bo pêkanîna hel û merceke baş ji bo pêşdeçûna a aborîya welat.

Evên han hinek ji wan berheman in ku li welatên Rojhilata Navîn û her wiha li Kurdistanê jî bidest dikeve, ev jî têt wê manê ku petrol di noqtên girîng ên çareserkirina meselên pêşkevtinên aborî de rol dilîze. Dîyar e serokanîyên petrolê ne tiştek in ku heta hetayî bimînin, madem wiha ye pêwîst e di riya programek aborî ya rast de bên bikaranîn. Lê kartelên cîhanî yên petrolê di berhemdarîyên petrolê de guh nadin aborîya netewî, her wek, gazên tabîî jî bi yekcarî ji nav dibin. Welatên Rojhilata Navîn diviya li gor pêwistîya aborîya xwe problemên derxistinên petrolê çareserî bikin û bi tevayî para xwe ya ji gazên tabîî jî bistînin. Eger bi vî awayî hereket bikin serokanîyên petrolê bi kêmasî bi dehan sal ber didin.

Heta sala 1980'yan petrol û gazên tabîî bê şik dibin beşê herî mezin di berhemdarîya hêza elektrîkê de û wek maddeyek xav jî daxwazî li ser zêde dibe. Wisa têt xuyakirin ku heta wê demê meselên girîng ên pêşkevtina aborî çareser bikin û pişt re dikarin bi wê sevîya ku kar têkirin, "sermayek din" di cîyê petrolê de bê danîn.

FESLA YANZDEHAN
# PROBLEMÊN ABORÎYA GIHAŞTÎ

## 1- Serxwebûna Sîyasî û Pêşkevtina Aborî

Kurtîya wan behsên borî vê netîca han dide destê me ku çareserkirina mesela Kurd di warê sîyasî û netewayetî de, bi serkevtina hêzên demokrasî û damezrandina rejimên sosyalîst ve girêdayî ye.

Dîyar e, serxwebûna sîyasî şertek pêwistî yê pêşkevtina aborî ye, lê tenê bi serê xwe bes nîne. Gelek caran piştî bidestxistina serxwebûna sîyasî di nav hewl û xebatên welat de di pêşdebirina serxwebûna aborî û paşvemayên (bermayên) peywendîyên aborî de ne wekhevî peyda dibe. Ji ber ku pêşdebirina aborî ne ji bo qazanca welat, belko ji bo qazanca monopolan bûye. Eger em bi kurtî li dîroka Kurdistanê ya nû binêrin, ev rastîya han bi temamî ji me re derdikeve û her wiha sebebê paşdemayîn û tekilhevîya warê aborîya Kurdistanê jî ji me re ronî dibe. Ji bo jiholêrakirina wan ziddîyetên ku me besh kirin, pêwist e bingehek wisa yê maddî û aborî bê damezrandin ku bikare welat ji girêdana aborî rizgar bike. Dîyar e mebesta me ji vê, aborîya temam nîne, lê mebest ew e ku di sewîya niha ya pêşdebirina hêzên berhemdarî û peywendîyên aborî yên cîhanê de, hemû welatên paşdemayî yên aborî bi serokanî û îmkanên xwe ve bikin ku bigihîjina sevîyek

wisa ku bikaribin cîyê xwe yê hêja di parvekirina cîhana kar de tijî bikin.

Kakilê meselê di vê de ye ku ji bo pêşxistina bi lez a hemû alîyên hêzên berhemdarî ên Kurdistanê, pêwîst e çi riyê bigre pêşîya xwe, heta ku bikare di demek kurt a dîrokê de ji çengê (lepê) paşdemayîna aborî rizgar bibe.

Ev mesela han ji bo sedan mîlyon kes gelên din ên vê cîhanê jî gelek girîng e. Ji ber ku niha û di rojên bên de zêdetir, mesela serxwebûna sîyasî ya gelên bindest di vê rewşê de seyr dike.

%90'ê xelkê Kurdistanê di nav hejarî û nexwendewarîyê de dijî. Dîyar e karker û gundîyên Kurdistanê her bi wî qasî razî nabin ku tenê bi zimanê Kurdî bixwînin, ger wiha be heta daxwaza serxwebûna sîyasî ya welat jî nakin, belko doza temînkirina rewşekê di hêla jîyanê de jî dikin. Dixwazin ji bin rewşa bindestîyê rizgar bin û jîyanek însanî ji xwe re temîn bikin. Kedkarên Urdunê her çendîn di warê netewayetî de bindest nînin û dewletek wan a bi gotin ya serbixwe heye, lê jîyana wan ji jîyana kedkarên Kurdistanê nexweştir e.

Madem wiha ye bidesxistina serxwebûna sîyasî tu demê nayê mana çareserkirina problemên aborî yên girîng ên muhîmtirîn sinif û tebeqên gel. Heta serxwebûna sîyasî bi dest nekeve, rewşa aborî ya meselê bi başî dernakeve. Tenê ew dem e ku rewşa aborî dibe mîzan ji bo qîmetpêdana pêşdebirina warîdata welat.

Di nav sewîya pêşkevtina wan welatan de ku pêş de diçin ferqek zêde heye. Di hinekan de wek piranîya welatên Amerîka Latînî, peywendîyên sermayedarî ji Afrîka û Asya zêdetir pêş de çûne. Heta di navbera welatên eynî melbendê de jî ferqek zêde heye, wek ferqa navbera Surîyê, Yemenê û navbera Tirkîyê, Pakîstanê û yên din. Lê ew lêkolîna ku me di warê aborîya Kurdistanê de kir, ji bo van hemû welatan rast e. Ew jî ev e ku hêzên ber-hemdarî yên Kurdistanê gelek girêdayî û bêser ber pêş de çûne, heta niha jî paşvemayên peywendîyên borî bi hêz in, warîdata serê mirovekî gelek nizm e û desthilata monopolên sermayedarî li ser welat heye.(1)

(1) Li gor lîteratûra aborî ku li Rojhilat belav bûye û ya Netewên Yekgirtî li gel e, tenê pîvana ji bo welatekî di hêla aborî de paşkevtî bê hesêb

## 2- Peywendîya Dumilî ya Navbera Çandinîyê û Danîna Sanayîyê

Problemek dijwar têt pêşîya welatên ku di helbijartina riya aborî ya netewayetî de pêş de diçin: gelo bi awakî serekî pişt bi çandinîyê ve girêdin, an ber bi pêşdebirina sanayî de biçin? Vê carê mesele ne di warê teorî de û ne di cîbicîkirinê de tenê helbijartina yek ji van herdu riyan e. Belko naveroka meselê di wê de ye ku gelo welatên pêş de diçin, divê di warê parvekirina cîhana kar de her di cîyê xwe de bimînin, gelo pêwîst e ev welatên han barkêşê berhemên çandinîyê û maddên xav bin, yan divê cîyên xwe biguherin û ber bi sanayîyê de biçin û bibin welatekî sanayî yê pêşkevtî?

### a) Warê Başkirina Avakirina Sanayîyê

Danîna sanayîyê yanî guherîna welatek çandinî bi welatekî sanayî, têt wê manê ku beşê piranîya warîdata netewayetî di

---

kirin, warîdata serane ye. Ev pîvana han divê di pîvana hêzên berhemdarîyê de jî bê bikar anîn, lê ev tenê ne bes e û ne rast e jî. Ji ber ku di welatên paşkevtî de nikare bibe belgên pêşdebirina hêzên berhemdarî. Di gelek welatên paşvemayî de liqek sanayîyê, yan derxistina madenan, an hetta liqek çandinîyê serokanîya serekî ya warîdata netewayetî ye, wek petrola Rojhilata Navîn, Venezuella û madenên bi qîmet ên hinek welatên Afrîqa û yên din. Dîyar e berhemdarîya kar di van liqên sanayî û yan çandinîyê de zêde ye, li hemberê vê berhemdarîya kar di liqên din de ewqas nizm e ku nayê muqayesekirin. Madem wiha ye, sewîya warîdata serane nikare sewîya şepirzetîya rewşa aborî ya welatên ku pêşde diçin ji me re ronî bike û gelek caran manzarên şaşîtî jî dide destê me. Sala 1961'an warîdata serane li Kuweytê 3 000 dolar bû, ji ber wê ku weridata petrolê gihîştibû 900 mîlyon dolaran û hejmara nifûsa welat jî 300 000 kes bû. Dîyar e ev warîdata han ji ya Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê jî zêdetir e. Li Venezuellayê warîdata serane digihîje 500 dolaran, ku ew jî qasî warîdata serane ya hinek welatên rojava ye. Lê hemû warîdata netewayetî ya Venezuellayê ya petrolê ye. Di vir re em digihîjin vê netîcê ku hêzên berhemdarî yên Kuweytê, Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê, Venezuellayê û Avrupa Rojava qasî hev pêşkevtî ne, ev jî aşkera ye tiştek pêkenînê ye -Nivîskar.

cîyê çandinîyê de ji sanayîyê (bi taybetî sanayîya guherandin) peyda dibe. Qazanca vê guherîna han jî gelek zêde ye: berî hemû tiştî ev e ku sanayî dibe liqê herî girîng ê aborîya netewayetî û liqekî esasî ku sewîya pêşdebirina beşên din dîyar dike. Ji ber ku bê sanayî, damezrandin û pêşdeçûna dezgên hatin-çûn û guherandinê, yanî çêkirina eşyayên pêwîst ji bo kar û barê leşsaxî û kulturî bê îmkan e. Her wiha sanayî ji bo geşkirin û pêşxistina çandinîyê jî şertek pêwîst e. Ji derveyî van jî ku berhemdarîya kar di sanayîyê de gelek ji ya çandinîyê zêdetir e û ev jî ji bo çandinîyê netîcek tabîî ye. Ji ber ku di vir de deskevtîyên nû yên zanistî û teknîkî bi hêsanî nayên cîbicîkirin. Di vir de derdikeve ku sewîya zêdebûna berhemê di sanayîyê de ji çandinîyê gelek zêdetir e(2). Zêdekirina bi hêsanî ya berhemdarîya sanayîyê ji bo pêşdebirina warîdata welatên ku pêşde diçin, qîmetek wê ya zêdetir heye, ji ber ku mesela warîdata serê mirovekî di van welatan de gelek girîng e, vêca eger ev welatên han bikarin aborîya xwe di riyekê de bibin ku beşê piranîya warîdata netewayetî ji vê beşê bi dest bikevin ku sewîya gihaştinê zêdetir e -yanî sanayî, dikare warîdata netewayetî ya xwe bi hêsanî bibe pêş. Barê rastîn yê rewşê di welatên paşdemayî de di vir de derdikeve ku sewîya zêdebûna nifûsa wan nêzîkî sewîya zêdebûna berhemên çandinîyê ye, (%2-3). Her çendîn sewîya li ser hev a gihaştina sanayîyê ji sewîya li ser hev a gihaştina çandinî û sewîya zêdebûna nifûsê jî zêdetir e, lê cardin warîdata serê mirovekî gelek hêdî pêş de diçe, sebebê vê jî ev e ku nîsbeta sanayîyê di warîdata giştî ya welat de gelek nizm e û di navbera %5 û 10'an de ye.

Piştgirêdan bi çandinîyê ve ji derveyê vê hinek zerarên wê yên din jî hene. Ji ber ku di eksê berhemên sanayîyê de ku asoya wê ya geşkirinê fireh e û qet tiştek pêşî lê nagire, gîhaştina çandinîyê xwedî sînorekî ye û her wiha pîvana axên zîraetê jî kifş in, ku ev jî sewîya gîhaştina çandinîyê dîyar dike.

(2) Bi awakî giştî ev di warê welatên sermayedarî û sosyalîst de rast e, lê nayê wê manê ku li hinek welatan berhemên çandinîyê ji bo demek ji berhemên sanayîyê zêdetir pêşde biçin -Nivîskar.

Mesela bazarê jî ji bo welatekî ku tenê pişt bi çandinîyê ve girê dide, problemek mezin e. Ji ber çend sebeban sewîya bazara berhemên çandinîyê hatîye dîyar kirin. Ji ber ku sînorê xwarina însanan kifş e û nikare ji mîqtarek zêdetir bixwe. Rast e hejmara nifûsa cîhanê bi taybetî welatên ku pêşde diçin gelek zû zêde dibe û niha jî di piranîya navçên dinyayê de problemên xwarinê di holê de ne, lê dema ku em meselê di demek dûr û di hêla teorîyê de bikolin, em neçar in vê mesela han bigrin berçav. Vê carê welatên ku pêşde diçin pêwîstîyên wan bi vê heye ku berhemên xwe yên çandinîyê bifroşin wan welatên pêşkevtî ji bo ku bikarin wasitên sanayîyê ji wan bikirin, lê welatên sanayîyê yên pêşkevtî bi tu awayî rastî problemên kêmasîyên xwarinê nabin.

Ji derveyî van, sewîya li ser hev a zêdebûna mesrefa maddên xav kêmtir e, yanî ji derveyê petrolê û hinek maddên din ên xav, mesrefa maddên xav di berhemdarîya sanayîyê de kêmtir zêde dibe. Sebebê vê jî ev e ku di netîca bilindbûna berdewamî ya berhemdarîya kar û pêşkevtina teknîkê de sewîya vî maddê xav ku ji bo beşê berhem tê bikaranîn, kêm dibe. Di milek din de jî bikaranîna maddên destçêkirî (sentetîk) di çêkirina gelek berhemên sanayîyê de çiqas diçe zêde dike. Hemû ev tiştên me behs kirin me digihînin vê yekê ku welatên ku pêşde diçin pêwîst e ji bo pêşdebirina warîdatên xwe zêdetir hewla pêşdebirina sanayîyê bidin. Lê em bizanin ka gelo danîna vê sanayîyê pêwîst e bi lez û li ser bingeha sanayîya giran bê destpêkirin?

Di vî warî de cihêtîya rewşa welatekî li gel welatê din heye. Di hinek welatên pêşde çûyî de - pirr jî kêm in- ku serokanî û hel û mercên bi rêk û pêk hene û sanayîyek heta derecekê pêşkevtî hatîye damezrandin, wek Brezîlya û Hindîstan, dikarin li ser bingeha sanayîya giran sanayîya welat deynin, dîyar e ev jî peywendîya wê bi wan beşên sanayîyên giran ve heye ku pêwîstîyên di wî welatî de bidest dikevin. Lê di welatên din de ku sanayî hîn destpêk e û serokanî û pêwistîyên wê riyê di dest de nînin, divê di pêş de hewla temînkirina pêwîstîyên avakirina sanayîyê bidin. Grûbek welatên din hene ku liqeke pêşkevtî ya sanayîya wan heye, wek sanayîya petrolê di Rojhilata Navîn de. Dîyar e di van cure welatan de divê avakirina sanayîyê li ser bingeha pêşdeçûn û îstîfadekirinek bi temamî bi van cure sa-

nayîyan bê damezrandin. Lê di hemû van welatan de pêwîst e di destpêkê de ehemmîyetek zêde bi çandinîyê bê dan, bê wê ku ji bîra wan biçe ku avakirina sanayîyê riya pêşî ya pêşkevtina aborî ye. Bi awakî vekirî em bêjin, karekî girîng li pêşîya welatên paşdemayî ye ji hêla aborî ve ji bo pêşdebirina aborîya xwe, ew jî dîyarkirina mîzanê ye di navbera çandinî û sanayîyê de. Ev mîzana han li gor sebebên aborî û ji derveyî aborîyê, di her yek van welatan de cihê cihê ye. Bi gelemperî, hemû welatên ku pêşde diçin pêwîst e di qonaxa bingehavêtina yekemîn a sanayîyê de hinek meselan çareser bikin.

Yekem karê wan ev e ku çandinîyê ji berhemdarîya tabîî rizgar bikin. Ji bo vê armancê jî pêwîst e islahatek (reform) bingehîn a axê bikin ku bikarin sewîya jîyana kedkarên gundî bilind bikin, ji derveyê vê jî pêwîst e hel û mercê pêwîst ji bo pêşdeçûna bazara hundur û zêdekirina sewîya bikaranîna berhemên sanayîyê amade bikin. Pêşdeçûna bazara hundur ji bo damezrandina sanayîyek netewî şertek gelek pêwîst e. Ji ber ku ev sanayîya han nikare di demek nêzîk de biçe meydana reqabeta cîhanî.

## b) Başkirina Çandinîyê û Handana (Teşwîkkirina) Berhemên Çandinîyê

Cîbicîkirina başkirina çandinîyê bi awakî bingehîn, bi gelek hel û mercan ve girêdayî ye. Pratîka Hindîstanê, ya Rojhilata Navîn, Afrîka û Amerîkaya Latînî nîşan daye ku burjuwazîya netewî ya li ser hukum di van welatên paşdemayî de nekarîye mesela çandinîyê bi yekcarî çareser bike. Ji ber ku burjuwazîya netewî ku li milekî dixwaze paşvemayên peywendîyên derebegî ji holê rake ku astenga hatin û çûna hêzên kar e û bergîrî li pêşdeçûna bazara hundur dike, li milekî din her çendîn dixwaze desthilat û nifûza çîna derebeg kêm bike, lê amade nîne bi yekcarî wan bixaşîne. Her çendîn burjuwazîya netewî bi piştgirîya gundîyan hatîye ser kar, lê naxwaze qet gavek girîng li dijî milkîyeta derebegî bavêje. Ji ber ku ji wê ditirse ku bi mîlyonan gundîyên bêax û neçar dest têkin nav kar û barên îqtîdara wan. Hetta, çi dema ku gundî dest bavêjin kirinek şoreşgêrî, ji bo ku burjuwazîya netewî xwe ji wan biparêze li gel derebegan birê dikeve. Li Kurdistanê û gelek welatên din ên paşvemayî erdek ge-

lek zêde di destê grûbek zêde ji burjuwazîya netewî de heye ku ew jî rolek mezin dilîze. Bi awakî giştî burjuwazîya netewî li dijî hilweşandina milkdarîya taybetî ya "pîroz" e û dijîtîya stendina milk ji derebegan dike, ji ber ku ji wê ditirse ku rojekê milkdarîya burjuwazî jî bikeve tirsê.

Armanca burjuwazîya netewî ji başkirina çandinîyê ew e ku zîraetê zêdetir perçe perçe bike û perçên milkên mezin di nav gundîyan de parve bike û awayê kar jî li ser bingeha berhemên biçûk bimîne. Ji ber ku makînên zîraetê yên gundîyan nînin û nikarin dezgahên avdanîyê yên fireh damezrînin. Di pêş de me behs kir ku li Îranê gundîyan demek berî niha axên Şah kirrîn, lê ji ber ku wasitên wan ên zîraetê tunebûn, neçar bûn wan bifroşin. Ev yeka han bi serê xwe nîşan dide ku berhemdarîya kar qet zêde nake û belko di kêlîna axên biçûk de di cîyê xwe de dimîne. Her ji ber vê ye ku sewîya jîyanê yan di cîyê xwe de disekine, yan gelek hêdî pêş de diçe û her ji ber vê jî ye ku pêşdebirina bazara hundurî gelek sist e.

Lê dema ku desthilat bikeve destê çîna karker, yan wan kesên ku hilgirên bîr û baweriya şoreşgerî ne, mesela çandinîyê bi curek bingehîn tê çareserkirin. Ji ber ku karker dost û hevpeymanên gundîyan in û ax didin destê wan kesên ku dikêlin, bi yekcarî çîna derebeg û peywendîya derebegî ji wê bindestîya giran ji holê radikin ku çendîn sedsal in di gundan de hebûne. Wê demê ku ax wek wasitek berhemdarî dibe milkê giştî û ji milkê tik û tenê yê şexsek derdikeve û bi vî awayî hel û mercên di cî de ji bo berhemdarîya sosyalîzmê bi berfirehî pêk têt û berhemdarîya kar di çandinîyê de bi awakî berbiçav zêde dike.

Pratîka Kubayê di vî warî de gelek hêja ye. Li Kubayê piştî başkirina çandinîyê, hem ji bo wan karkerên çandinîyê ku di axên mezin ên qamîşê şekir (latîfundîya) de kar dikirin û hem ji bo gundîyên feqîr komela muşterek hat damezrandin û bi vî awayî jî pêşîya avakirina sanayîya welat, çandinîyê kir muşterek. Her çendîn li Kurdistanê û welatên Rojhilata Navîn axên mezin ên wek latîfundîyan nînin û sermayedarî jî li melbendên gundan qasî wî wextî yê Kuba pêş nekevtîye, lê cardin jî bi awakî giştî divê ev awayê han bê meşandin.

Dîyar e ji bo cîbicîkirina van karên han pêwîstî bi hinek şertên

taybetî heye: yekem, pêwîst e desthilat di destê hêzên demokrasîyê de be, ji bo ku piştgirîya komelên kolektîfan bike. Duyem, divê bi alîkarîya welatên sosyalîst makînên zîraetê ji bo komelên kolektîf bên temîn kirin û hêdî hêdî komelên kolektîf bibin xwedî karakterên sosyal û xwedîyê berhemên mezin. Hinek hel û mercên din jî hene ku di hêla xwe de alîkarîya muşterekbûna zîraetê dikin, wek damezrandina dezgên avdanîyê ku ji ber vê pêwîstî bi karekî zêde ye, gundîyan han dide ji bo ku alîkarîya yek û du bikin(3). Divê bi alîkarîya hukumetê ev bibe awakî destpêkî ji bo komelên muşterek. Nabe ev yeka han jî jibîra me biçe ku heta niha jî slogana parvekirina axê bi ser gundîyan de nebûye slogana girsên fireh ên gundîyan, heta pêwîst be di destpêkî de bi neçarî ji bo gundîyên bê ax, ax bê dan û vêca pişt re komelên muşterek bên damezrandin.

Hestê (hîssa) milkdarîya taybetî carekê bi tevayî di mêjîyê gundîyan de rûneniştîye. Li ba wan wisa ye hinek 'urf û 'adet û paşvemayên peywendîyên eşîretî wek milkdarîya eşîretê ji bo ax û hevkarîya di saha xwedîkirina heywanan de (hube), di kolektîfkirina berhemdarîyê de rolek wê ya girîng heye. Ev yeka me behs kir li eksê milkdarîya aîlê nîne, bi vî awayî ku her aîlek pîvanek ax jê re bê dayîn ku li gel hejmara wan ferdên tê de kar dikin birê bikeve. Ev nîzama han ji bo gîhaştina berhemê çandinîyê û çareserkirina mesela bêkarî di gundan de qazancek wê ya gelek mezin heye, bi taybetî di qonaxa yekem de ku hê pîşesazî bi pêş de neketîye û mekanîzekirina zîraetê karek giran e û problemên gelek mezin di pêş de ne. Ev her ji ber wê nîne ku sanayî di destpêkê de nikare makîne, zibl û pêwîstîyên din ên zîraetê temîn bike, belko ji ber vê jî ye ku carna kadroyên wiha jî kêm in ku bikarin zîraetê bi mekanîze rêve bibin.

Problemên din ku di pêşdebirina welatên paşdemayî de milek din ê girîng girtîye, mesela bêkarîyê ye. Wek me di fesla heştan de got, di çandinîyê de bêkarîyek veşartî (dizî) heye û anîna traktorekê, li gundekî Kurdistanê tê mana bêkarîya nîvê nifûsa

(3) Her niha ew hevkarîya han a li ser axên mezin de têt dîtin, jê re dibêjin "herewez" (ev gotin di mana muşterekîyê de hatîye bikaranîn, ez bawer im mebest ji vê kooperatîv in-Elîşêr) -Nivîskar.

wî gundî. Her niha ew gundîyên ku ji bo peydakirina kar berê xwe didin bajaran, problemên wan ên zêde li ber çav in û li piranîya welatên ku pêşde diçin ordîyek mezin a bêkaran heye.

Di pêş de me got ku di qonaxa yekem de zêdetir dîqqat li ser çandinîyê têt kişandin, ev jî tê wê manê ku sanayî zêde pêş nakeve ku hemû ew hêzên kar ên ji ber çandinîyê dimînin bixin kar. Çênebûna berhemdarîya çandinîyê her di wê sewîya xwe de dimîne. Di wî halî de tenê rê ev e ku ne di riya mekanîzekirinê de, lê di riya zêdetir xelkê xistina nav kar û zibilkirina axê de hewla zêdekirina berhem bê dan. Bi vî awayî gîhaştina berhem eger pêwîstî bi hêza karek zêdetir nebe, bi kêmasî ji bo demekê be qasî berê her pêwîst e. Dîyar e di vê riyê de karkerên zîraetê jî zêdetir şareza dibin û ji bo mekanîzekirina rojên pêş rê xweş dibe.

Berî hemû tiştekî pêwîst e berhemên zîraetê ji awayê tik û tenê ê berhemê bên rizgarkirin ji bo beşek ji eşyayên xwarinê yên xelkê tê temîn kirin û pêwîst nebe ji derve bê anîn. Pişt re welat dikare çend cur berhemên çandinîyê bişîne ji derve û bi vê, cîyê xwe di bazara cîhanê de qayîm bike. Ev car jiholêrakirina awayê tik û tenê ê berhemê bê serûber rewşa aborî ya welat baş dibe û çareserîyek ji wê rewşê re tê dîtin ku welat bi sebebê girêdana bi welatên sermayedaran tûşî bûye. Di vir de armanc ew nîne ku berhemên kevn ji holê bên rakirin, an feyde ji wê şarezatî û pratîkê neyê sitendin ku di rojên borî de bi dest ketine, belko armanc ew e ku hinek berhemên din jî li ser bên zêdekirin ku di welat de hel û mercek li bar ji bo berhemdarîya wan heye. Her di wî wextî de li gor me wisa be ku çandinî di qonaxa yekem de û heta di qonaxek hinek pêşkevtûtir jî de bi hêsanî pêş de diçe. Em dikarin bi vî awayî bêjin ku ew welatên di hêla aborîyê de paşvemayî ne, hemû makîne û wasitên zîraetê ji derve tînin, lê para wergirtina zêde ji zîraetê pêwîstî bi sevîyek zêde zibl û maddên kîmyayî heye ku divê di hundurê welat bi xwe de bên çêkirin.

Me di pêş de behsa ehemmîyeta av û avdanîyê di welatên Rojhilata Navîn de kir. Lê ji bo hinek welatên din jî ku di hêla aborîyê de paşdemayî ne, qîmetek zêde ya avdanîyê heye. Bêgûman çîmento û maddên din dezgên avdanîya berbelavî û çêkirina bendan ji bo ku ava pêwîst ji bo zîraetê bê temînkirin,

tiştek pêwîst e. Madem wiha ye, divê pêşkevtina zîraetê, pêşdebirina sanayîya kîmyayî û avakirina sanayîyê jî bi pê re be.

## c) Hinek Problemên Avakirina Sanayîyê

Di qonaxa avakirina sanayîyê ya yekem de divê ev esasên han li berçav bên girtin: ji bo ku sermaye kêm e, pêwîst e zêdetir ew sanayî bê damezrandin ku pêwîstîya wê bi sermayek kêmtir heye û zêdetir jî bi qazanca sarmeyê ve kar dixin ber dest. Wek nimûne li Kurdistanê kargehên çîmento, cigare û tiştên wek van babetan bên damezrandin. Vêca baştir ew e ku ew sanayî bê damezrandin ku dibin sebebê îxrackirina eşyayan ji bo bazara cîhanê, ji ber ku ew welat bikare makîne û wasitên pêwîstî ji bo avakirina sanayîyê di cîyê van eşyan de werbigre. Dîyar e ev sanayîya han ji welatekî heta welatên din ferq heye û girêdayîye bi îmkanên cîgirtina berhemên wan di bazara cîhanê de. Ji ber vê di her welatekî de ew sanayî bê damezrandin ku hel û mercek wê ya musaîd heye. Mimkun e li Kurdistanê jî sanayîya colayî (berrik, xalîçe, kilîm û.h.d çêkirin -Elîşêr), şîr û ev cure tiştên han baş bin.

Di qonaxa duyem de divê giranî tenê bê xistin ser wan beşên sanayîyê ku dikarin bibin bingeh ji bo damezrandina sanayîyên din, yanî damezrandina wan sanayîyan ku makîne û wasitên din çêdikin. Pêwîst nîne her di destpêkê de ew sanayî bikare wasitên pêwîst ên kargehek temam, an sentrala elektrîkek temam çêke. Dikare di destpêkê de makînên biçûk û wasitên yedek ên berhemdarîyê destpê bikin. Ji ber ku tu qanûnek biryar nade ku hemû welatên mezin, biçûk, dewlemend û feqîr bi damezrandina sanayîya giran, maden dîtin û çêkirina makînên mezin sanayîya welatên xwe ava bikin. Tiştên wiha ne têt kirin û ne qazanca wê jî heye. Belko divê her welatek tenê bi wan beşên sanayîya makîne û wasiteçêkirinê ve mijûl be ku di wî welatî de baştir hel û mercên pêkanîna wan heye. Gelek rast e di welatekî de ku hel û mercên musaîd ji bo sanayîyek dîyarkirî nîne, her bi yekcarî qet'î bê dîyar kirin. Ev jî netîcek tabîî ya hevkarîya aborî ya di navbera welatên melbendeke dîyar kirî û netîca parvekirina kar de ye di navbera wan welatan de. Mimkûn e Kurdistan û hemû welatên Rojhilata Navîn bi giştî berê xwe bidin sanayîya kîmya û petro-

kîmyayê.

Welatên ku pêşde diçin di avakirina sanayîya xwe de astengek din jî dertê pêşîya wan. Ew jî dîyarkirina curê wan makîne û wan dezgehan e ku pêwîst e di sanayîya xwe ya nû de bikar bînin. Gelo pêwîst e makînên nû û otomatîkî di bilintirîn sewîya sanayîya nû de bikar bînin, an divê makînên navîn wisa bikar bînin ku berhemdarîya wan kêmtir e, li ser vê noqtê dijîtîya bîr û bawerî zêdetir e. Lê li ser hev, ew nezera ku dibêje pêwîst e welatên ku pêşde diçin li ser bingeha makînên navîn û kêm berhemê sanayî bibin, ev rayek ne rast e, ji ber ku bi vî awayî tu wextî nikarin rewşa xwe li gel welatên sermayedarî yên pêşketî muqayese bikin. Lê di milek din de di bikaranîna makînên otomatîkî de jî tûşî problemek bêkarîyê dibin ku me di pêş de behs kir. Ji ber ku dema projên xwe li ser bingeha bikaranîna makînên otomatîkî damezrînin, grûbên gundîyên ku ji bo kar diçin bajaran nikarin kar peyda bikin. Riyên çareserkirina van probleman bi vî awayî ye: di qonaxa yekem de sanayîya çinîn, cigare û yên din bi makînên kêm berhem bên destpê kirin(4). Lê pêwîst e ev sanayîyên han bibin bingeh ji bo sanayîyên din, baştirîn makîne û wasitan tê de bikar bînin. Ji ber ku anîna makînên nû ji bo welatên ku pêşde diçin li gor welatên pêşkevtî yên sermayedarî wextek zêdetir dixwaze û bi vî awayî heta ew makînan dixin kar û dest dikin bi berhemdarîyê, makînên ji wan nûtir tên çêkirin. Ji derveyê van jî ew makînên berhemdarîya wan kêm e, nikarin wasitên bi wî awayî ji bo beşên din çêkin ku berhemdarîya wan zêde be.

## 3- Bilindkirina Sewîya Jîyanê

Mesela bilindkirina sewîya jîyana kedkaran di qonaxa yekem û her wiha di qonaxên piştî aborîya gihaştî de jî meselek berçav e.

---

(4) Hinek caran di bazara cîhanê de ev karê han welat tûşî hinek probleman dike. Ji ber ku divê berhemên wan, reqabeta berhemên sanayîya welatên pêşketî bikin. Lê divê di bîra me de be ku heqdestîya (ucret) karkeran di welatên paşdemayî de nizm e û ev jî alîkarîya wê reqabetê dike -Nivîskar.

Di fesla heştan de me got ku sewîya jîyana gundîyên Kurdistanê ewqas nizm e ku cîyê bawerîyê nîne. Madem wiha ye aborîya gihaştî bi awakî berçav jîyana xelkê ber bi başbûnê de dibe. Ev rastîya han jî ku serokanîyên pêwîst ji bo komkirina sermayê kêm e, nabe bibe sebebê wê ku warîdata netewayetî bi zerar li beşê mesrefê bê parvekirin. Yek ji dijwartirîn problemên di holê de yên welatên ku pêşde diçin jî ev e ku pêwîst e baştirîn rê ji bo parvekirina warîdata netewayetî peyda bikin, bi awakî wisa ku bi giştî heta derecek berbijordeçûna sermayan bê temîn kirin û ger ew zêdekirin gelek kêm jî be, her di wî wextî de beşê mesrefê jî bi giştî li ser bê zêdekirin. Vêca divê zêdebûna bi lez a nifûsa me jî di bîra me de be. Bilindkirina berdewamî ya sewîya jîyana welatên ku pêş de diçin ji ber du tiştan gelek pêwîst e: yekem ev e ku kedkar rola herî girîng di pêşdebirina welat de dilîzin û pêwîst e beşek pêwîst ji wê nirxê ku berhem tînin werbigrin. A diduyan jî ev e ku parvekirina warîdata netewayetî bi vî awayî, kedkaran zêdetir han dide ji bo wê ku pêşkevtina welatê xwe bi giringî bigrin dest.

Ji bo gihîştina sevîyek kultur û zanistîya bilind, ji bo pêşdebirina hêzên berhemdar qîmetek hişyarî, şarezatî, hewildana xelkê ya zêde heye û ev mesele bi ronî di sewîya gîhaştina berhem de jî derdikeve. Vê carê bilindbûna sewîya jîyanê dibe sebebê firehbûna bazara hundurî ku ev jî pêşdebirina sanayîya netewayetî ji bo pêşdeçûnê han dide. Ev bi serê xwe dikare bibe sebebê zêdetir berhevbûna sermayê.

Di warê riya temînkirina wan serokanîyên ku ji bo berhevbûna sermayê pêwîst in, du teorî hene: yek ji wan alîkarîya ji derve serokanîya serekî ya berhevbûna sermayê dihesibîne û ya din serokanîyên hundurî giringtirîn dizane. Aşkera ye alîkarîya derve jî dikare di gîhaştina aborîya welat de rolek girîng bilîze. Em dikarin tiştek tenê bêjin ku hel û mercên derve û bi taybetî ji bo welatên sosyalîst, sebebek girîng e û rola xwe di pêşkevtina welatên ku pêşde diçin de dilîze, madem wiha ye, hel û mercên musaîd ên ji derve û hebûna welatên sosyalîst li ser pêşdebirina bi lez a van welatan rolek aktîf dilîze. Lê li gel vê jî niha li piranîya welatên ku pêşde diçin serokanîyên hundurî yên gîhaştina aborî serokanîyên eslî tên hesêb kirin. Ev bîr û raya han bi tay-

betî ji hêla Kurdistan û welatên Rojhilata Navîn de rast e, ji ber ku petrol di vî warî de rolek wê ya dereca yekem heye, lê ev nayê wê manê ku em rola girîngî ya ketina serokanîyên ji derve di nav welatên ku pêşde diçin de ji bo pêşkevtina paşerojê li berçav negrin.

Ji bo aborîya netewayetî ya welatên ku pêşde diçin mesela plan kirinê qîmetek ronî û taybetî heye. Şarezayên programên plankirinên aborî li welatên sosyalîst û pêşdebirina rêk û pêkî ya van welatan ewqas balkêş e ku di hemû welatên ku pêşde diçin de û heta di wan welatan de ku kevneperestirîn grûb li ser kar in, ehemmîyeta plankirinê hatîye qebûlkirin. Ew welatên ku pêşde diçin ên ber bi riya pêşdebirina sermayedarî ve diçin, ji ber du sebebên serekî nagihîjin sewîya pêwîstî ya plankirinê: yekem ev e ku peywendîyên berhemdarî çi yên derebegî bin û çi yên sermayedarî, peywendîyên bindestî ne ku ev li ser riya plankirinê astengek berçav e. Ya duyem hebûna sermaya monopolên bîyanî ne, ku li gor qazanca xwe kar dikin û qazanca wan jî li gel qazanca welatên ku pêşde diçin nameşe.

Ji ber vê niha ya giring ev e ku aborî ber bi plankirina rastîn bimeşe û hel û mercên pêwistî jê re bên amadekirin. Bi awakî giştî em dikarin bêjin ku dewlet û sîyaseta aborî ya dewletê û beşê dewletê ku kela aborî ya dewletê ye, dikarin di hel û mercên peywendîyên ne sosyalîstî yên welatên ku pêşde diçin de rolek gelek girîng bilîzin. Ji ber ku her çendîn rola dewletê di aborîya netewayetî berbelavtir be, asoya plankirinê firehtir dibe. Lê sosyalîzm bi bê plankirin nabe, li gel vê jî tenê destbiserdegirtina wasitên berhemdarî û damezrandina peywendîyên sosyalîstî ji bo danîna plana aborî bes nîne û belko pêwistî bi wê heye ku hêzên berhemdarî bigihin sewîyek dîyarkirî ya pêşkevtinê. Ev mesela han jî ji xwe re sebebeke girîng a nizmbûna sewîya plankirinê ye di wan welatan de ku pêş de diçin.

INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE

## 4- Helbijartina Riya Pêşdeçûnê

Karakterê taybetî yê herî girîng ê welatên ku pêşde diçin ev e ku aborîya wan têkel e, yanî ji çend beşê cihêbûyî pêk hatîye. Yekî din ji karakterên wan yên taybetî ev e ku sewîya berhem-

darî di vî awayê aborîyê de gelek nizm e. Madem wiha ye, girîngtirîn mesele helbijartina riya pêşdeçûnê ye ku bikare welat ji paşkevtina aborî rizgar bike. Niha ya baştir ev e ku em dîqetê bikêşin ser wan netîcan ku dewletên pêşkevtî piştî xelasîya şer di helbijartina riyên cur bi cur ên pêşdebirinê de bi destxistine. Hindîstan ji bo welatên xwedî aborîya têkel nimûnek baş e. Aşkera ye em nikarin çav li wan destkevtîyan bigrin ku Hindîstan di pêşdebirina aborî de bi dest xistîye. Lê ka em li wan astengên serekî binêrin ku van welatên han di pêşdebirina aborîya xwe de tûşî bûne, ew jî bilindkirina sewîya hêzên ber-hemdarîyê ne. Di vir de çareserkirina mesela çandinîyê û her wiha avakirina sanayîyê, zêdekirina warîdata serê mirovekî û jiholêrakirina şûnewarên monopolên sermayedaran gelek girîng in.

Li Hindîstanê ev panzdeh salin ku burjuwazîya netewî desthilatê girtîye dest, lê hîn nekarîye mesela çandinîyê çareser bike. Îslahata erdê bi awakî bingehîn nekirîye, ne peywendîyên wan ên çandinîyê guherîne û ne rewşa jîyana kulturî û civakî ya melbendên ku li gundan rûdinin. Netîca islahata axê ev bûye ku: ji %82'yê aîlên gundîyan ji %27'ê axê ketîye destê wan, di hemberî vê de ji %2,43'ê aîlan ji %28'ê axê di destê wan de ye. Sewîya li ser hev a zêdekirina berhemên çandinîyê heta têra beşê pêwistîyên herî basît ên welat nake. Di salên piştî şer de Hindîstan naçar bû bi mîlyonan ton dexl (zexîre) ji derve bîne, ku piranîya wê ji Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê anî. Li gel vê jî heta niha sewîya bikaranîna serane ya eşyayên xwarinê ji yên dema berî şer nizmtir e û heta niha jî li Hindîstanê birçîtî êrîşê jîyana bi mîlyonan însan dike.

Hecma giştî ya aborîya Hindîstanê jî qet neguherîye, ji ber ku sanayî tenê ji %16'yê warîdata netewayetî berhem tîne û ev jî têt vê manê ku Hindîstan heta niha jî welatekî zîra'î yê paşkevtî ye. Sewîya pêşdeçûna berhemdarîya sanayîyê jî qet hêvî jê nayê kirin ku di demên nêzîk de sanayîya welat pê bê avakirin. Ji ber ku sewîya li ser hev a pêşdeçûna berhemên sanayîyê di navbera salên 1951-1962'an de, salê %6,6 bûye[5].

---

(5) Monthly Abstracts of Statistics. May 1963.

Li gor vê heta para serê mirovekî ya warîdata netewayetî jî hêvîya guhertinek bingehîn jê nayê kirin. Di nav wan salên jorê de warîdata netewayetî %47 zêde bûye, lê warîdata serê mirovekî tenê %18, ji ber ku hejmara nifûsê gelek zêde dibe. Sewîya li ser hev a zêdebûna varîdata serê mirovekî di salê de gihîştîye %1,5'ê(6). Heta niha jî cîyê pîyên monopolên emperyalîst ên bihêz di aborîya Hindîstanê de heye. Ji ber ku di navbera salên 1948-1958'an de ew sermaya taybetî ya li Hindîstanê xistine kar, ji 560 mîlyon dolaran gihîştîye 1.200 mîlyon dolar. Heta niha jî beşê piranîya berhemê çayê ku malê îxracatê yê serekî yê Hindîstanê ye, di bin desthilata sermayedarên Îngilîz de ye. Her wiha sermayedarên bîyanî beşek wan a zêde di wan madenan de heye ku cewherên wan ên keviran berhemek baş didin û her wiha di rafînerîyên petrolê, madenên manganez, sanayîya kîmyayê, titûn û cew de beşa wan heye.

Ev riya basît a niha ya aborîya Hindîstanê ye ku zêdetir ji 15 sal e burjuwazîya vî welatî ber bi sermayedarîyê ve dibe. Li hinek welatên din ên ku pêş de diçin rewşên wek Hindîstanê tê dîtin. Sewîya li ser hev a gîhaştina salane ya welatên ku pêş de diçin di navbera salên 1958-1963'an de di sanayîyê de gihîştîye %7,6(7) û di çandinîyê de gihîştîye %3'ê. Yanî berhemê netewayetî yê safî salê %5 zêde kirîye(8). Eger em wiha deynin ku ev zêdebûna han her berdewam e û buhranên (qirîz) aborî tesîr lê nake, waridata aborî ya van welatan ku di sewîya aborî de wek Kurdistanê ne, bi vî awayî tên berçav. Ku hejmara nifûsê salê zêdetir ji %2 zêde dibe, zêdebûna warîdata serê mirovekî salê ji %3'an derbaz nabe. Ev jî têt vê manê ku 80 sal jê re dixwaze, yanî heta

(6) Rewşa Aborî ya Dewletên Sermayedarî, bi zimanê Rûsî, Moskova, 1963, rûpel: 71.

(7) Zêdebûna sewîya gihaştî ya wan welatan ji çayê Hindîstan vedigerîne ser zêdekirina bi lez a hinek maddên xav, bi taybetî petrolê - Nivîskar.

(8) Wisa hatîye nivîsandin ku li gor programa pênc salî ya sêyem (1961-1965) li Hindîstanê zêdeberhem bigihîje %30'an, yanî salê %4,5'an -Nivîskar.

sala 2040'an, warîdata serane li Kurdistanê bigihîje 1 064 dolaran, yanî sewîya niha ya welatên pêşkevtî yên Avrupayê.

Di vir de yek netîce tenê têt wergirtin: eger Kurdistan û welatên din ên Rojhilata Navîn riya pêşdebirina sermayedarî deynin ber xwe, ne tenê di demek kêm de nikarin warîdata seranên xwe bigihînin welatên pêşkevtî, belko mimkun e nêzîkî wan jî nekevin.

Lê eger welatên ku pêşde diçin riya pêşdebirina sosyalîzmê bidin ber xwe, rewşa wan bi awakî din dibe. Belgên vê jî pêşdebirina zû ya komarên (cumhurîyet) Qafqasya û yên Asya Biçûk ên Yekîtîya Sovyetê ne. Li Ermenîstana Sovyetê sala 1960'an berhemê serane ya elektrîkê gihîştîye 1 478 kîlowat seet ji bo her yek kesekî, ku ji ya Îtalya, Japonya, Danimarka û gelek ji welatên sermayedarî yên din zêdetir e û 15 carî Tirkîyê û 32 carî Îranê ye. Berhemdarîya giştî li Komara Tacîkîstana Sovyetê di navbera wan şeş salan (1956-1961'an de) de du car zêdetir bûye, yanî li ser hev salê %15 zêde kirîye. Ev cur geşkirin di van dawîyan de hinek welatên wek Komara Kora Demokratîk a Gel ku çend sal berî niha di rêza welatên paşkevtî de dihat hesibandin, şahidê rastbûna van gotinan e.

Pêşdebirina aborî li Kora Demokratîk gelek bi ronî karaktera taybetî ya sosyalîzmê nîşan dide:

Sewîya giştî ya salane ya sanayîyê di navbera salên 1957-1960'an de li ser hev gihîştîye %36,6'an, yanî 3,5 zêdetir bûye(9). Di salên 1960'î de nîsbeta sanayî û çandinîyê di berhemdarîyê de 71 û 29 bûye. Belgeyek ronîtir ev e ku çêkirina makînan gihîştîye %21,3'yê hemû berhemên sanayîyê û ev welatê han ji %90'ê wan makînên bikartîne, bi xwe çêdike. Wisa dixuyê ku sewîya berhemên sanayîyê di programa heft salî ya 1961-1967'an de li ser hev bigihîje %18'an di salê de û berhemên wasitên berhemdarîyê jî bigihîje 3,2'yê sewîya niha. Warîdata netewayetî jî 2,7 qat zêde bûye, yanî li ser hev salê %15,3, ev sê qat sewîya li ser hev a gîhaştî warîdata netewayetî ya wan welatên ku pêş de diçin ku riya pêşdebirina sermayedarî dane ber xwe. Vala nîne ku Kora

(9) Kovara Meselên Aşîtî û Sosyalîzmê, Kanûna Duyem 1962.

Demokratîk di berhemên serane yên hinek berheman de wek hêza elektrîkê, welatekî sermayedarî yê pêşkevtî yê wek Japonya paş de hiştîye. Madem wiha ye, eger Kurdistan riya sosyalîzmê deyne ber xwe û waridata netewayetî wek Kora Demokratîk biserkeve (%15,3) û evê jî em li ber çav bigrin ku hejmara nifûsê salê %2'an zêde dibe, piştî bîst salan warîdata serane digihîje 1 160 dolaran û ji sewîya niha ya welatên sermayedarî yên pêşkevtî derbaz dibe. Ji derveyê vê jî hebûna wan hemû serokanîyên petrolê li Kurdistanê û welatên din ên Rojhilata Navîn, mimkun e vê pêşkevtina han zûtir jî bike.

## Jîna Nû Yayınları

1-Images du Kurdistan de Turquie, **Şuayip Adlığ**
2-Dêngê Xêzikan, **Mamoste**
3-1925 Kürt Ayaklanması (Şeyh Sait Hareketi), **Prof. M. A. Hasretyan, Dr. K. Ahmad, M. Ciwan**
4-Ronahi (1942-1945 yılları arasında çıkmış olan Ronahî dergisinin tüm sayılarının bir arada tıpkıbasımı)
5-Jiyana Rewşenbîrî û Siyasî ya Kurdan (Di Dawiya Sedsala 19'a û Destpêka Sedsala 20'a de), **Dr. Celîlê Celîl**
6-Büyük Anayurt Savaşında Kürtler (1941-1945), **H. M. Çetoev**
7-Komara Demokratîk a Kurdistan (Mehabad), **Kerîmî Husamî**
8-Roja Nû (1943-1946 yılları arasında çıkmış olan Roja Nû gazetesinin tüm sayılarının bir arada tıpkıbasımı)
9-Le Bîreweriyekanim-I, **Kerîmî Husamî**
10-Yüzyılımızın Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet, **Malmîsanij**
11-Hêsir û Baran (kurteçîrok), **Bavê Nazê**
12-Zazaca-Türkçe Sözlük (Ferhengê Dimilkî-Tirkî), **Malmîsanij**
13-Agirê Sînema Amûdê, **M. Ahmedê Namî**
14-Na Xumxum a..., Arêkerdox: **Koyo Berz**
15-Bir Kürtle Konuşma (şiir), **Adonis Buduris**
16-Herakleitos (şiir), **Malmîsanij**
17-Dîwana Rûhî, Şêx **Abdurrehmanê Axtepî**
18-Şaîrên Klasîk ên Kurd, **Abdulreqîb Yûsuf**
19-Li Kurdistana Bakur û li Tirkiyê Rojnamegeriya Kurdî (1908-1981), **Malmîsanij** & **Mahmûd Lewendî**
20-Zargotina Kurdên Sûriyê, Amadekar: **Dr. Celîlê Celîl**
21-İki Dünya Savaşı Arasında Irak'ta Kürt Sorunu, **Prof. Şakirê Xidoyê Mihoyan**
22-Zimanê Min-I, **Haydar Diljen**
23- Saîd-î Nursî ve Kürt Sorunu, **Malmîsanij**
24-Hunerê Tabloyên Şerefnamê, **Abdulreqîb Yûsuf**
25-Folklorê me ra çend numûney,**Arêkerdox: Malmîsanij**

BEŞÊ SISIYAN

# MESELA KURD

FESLA DANZDEHAN

# MESELA KURD DI DEMA ÎRO DE

## 1- Karakterê Taybetî yê Mesela Kurd

Berî em bên ser behsa çareserkirina mesela Kurd, em hinekî behsa karakterê taybetî yê mesela Kurd bikin, ku serokanîyên wê ew zanyarî ne ku me di beşên pêşî de behs kirin.

Tevgera rizgarîxwaz a netewî ya gelê Kurd di dema niha de hem li dijî emperyalîzmê wek dijminek serekî ye hem li dijî çînên serdest yên Îran, Iraq û Tirkîyê ye(*). Lê netewên serdest ên van hersê welatan jî, yanî Faris, Ereb û Tirk niha di qonaxa xebata li dijî emperyalîzmê de ne, madem wiha ye, gelê Kurd di ser vê de ji bo tevgera rizgarîxwazîya netewî ya gelên van her sê welatan, ji bo azadîya netewayetî ya wan jî xebat dike. Hinek asteng li gel vê bûyera han in. Çimkî ji bo gelê Kurd wek neteweyekî bindest nasîna dijminê serekî, yanî emperyalîzmê karek rehet nîne, ji ber ku bi awakî rasterast li dijî hukumetên van hersê welatan xebat dike. Ev nêrîna han jî ku goya dibêje xebata gelê Kurd bi awakî

(*) Iraq piştî 11'ê Adara 1970'yan ket nav rewşek nû. Binêre: "Gotina Dawî" ya vê kitêbê.

ronî li dijî emperyalîzmê nîne, her di vir de serokanî jê re çêdibe ku ew welatên Kurd tê de dijîn bi gotin serbixwe ne û nifûza emperyalîzmê di wan welatan de bi awakî kolonyalîya kevin nîne, belko di bin perda hukumeta derebegî û burjuwazîyên kirêgirtî de veşartî ye, ku her çend bi gotin serbixwe ne, lê di rastî de bûne bingehek ji bo qazanca emperyalîstan.

Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem heta îro dewletên emperyalîst ên mezin ji bo belavkirina tovên dijîtîya netewî, hewil dane ku têkoşîna xwe dilsoz û wekîlê qazanca gelê Kurd nîşan bidin û tekilhevî têxin nav tevgera rizgarîxwazîya netewî. Her ev yeka han tenê bes e ku em li sîyaseta Brîtanya li Iraq û Tirkîyê ya piştî Şerê Cîhanê yê Yekem û sîyaseta Brîtanya û Fransa li Iraq û Surîyê di navbera herdu şerên mezin ên cîhanê de û her wiha li sîyaseta Dewletên Yekgirtî yên Amerîka li Îran û Iraqê piştî Şerê Cîhanê yê Duyem binêrin. Pêwîst e bê gotin ku sîyaseta tekilhevî ya emperyalîstan gelek caran bûye sebebê sernekevtina xebata rizgarîxwazî ya gelê Kurd. Îspatên çendîn sal xebata gelê Kurd û ên gelan ên dema niha gelek dersên mezin hînî gelê Kurd kirine. Ne dûr e kêm netewe hebin ku bi qasî gelê Kurd xwîn rijandibin, ezîyet tam kiribin ku heta bikaribin dijminê xwe yê serekî yanî emperyalîzmê binasin. Bi awakî serekî Kurd li melbendên sinorên çend welatan dijîn ku di heryek van welatan de kêmayetî têt hesêb kirin. Bi vî awayî hêzên gelê Kurd bi awakî sunî hatîye perçekirin. Ji alîyek din de jî hukumetên van welatan qazanca xwe di wê de dibînin ku li dijî tevgera rizgarîxwazî netewî ya Kurd hevkarîya yekûdu bikin. Madem wiha ye, hemû hewl û kirinên ji bo rizgarkirina yek ji wan beşên Kurdistanê li gel dijîtîya çînên fermanrewa yên welatên xwe û di wan welatan de rû bi rû dibe ku Kurd beşek di axa wan de dijî. Vê carê çi cur guhertinek bi ser van welatan de bê, li ser welatên din û bi giştî hemû melbendên Rojhilata Navîn tesîr dike. Pişt re, ji bo ku beşek ji Kurdan li Iraqê û Surîyê dijîn, ev guherînên han bi giştî jî ji bo welatên Ereban girîng in.

Ev bûyerên han tev bûne sebebê pêkhatina rewşek gelek taybetî. Em netewek parvekirî dibînin ku ji bo bidestxistina azadîya xwe xebat dike û sînorê çend dewletan hêzên wê ji hev cihê kirine û di dema giringî û nazîkîyê de li gel hêzên yekgirtî yên van

dewletan û heta hinek dewletên din jî rû bi rû dibe.

Ji alîyekî din de, Kurdistan xwedî serwetek petrolê ya gelek zêde ye ku monopolên emperyalîst derdixin û her awakî guherînên ku di van melbendan de ne mumkun e tûşî dijîtîya wan monopolan jî bibe, ku bi awakî taybetî li Rojhilata Navîn bi sebebekî giring ê dîyarkirina sîyaseta hukumetên welatên xwe, yanî Amerîka, Brîtanya û Frense tên hesibandin(*).

Her wek me di fesla sêyem de got, ji Şerê Cîhanê yê Yekem ve çarenivîsa Kurd bi petrolê ve hatîye girêdan ku heta niha jî ji bo welatên sermayedarî maddek xav a gelek girîng e. Bi vî awayî Kurdistan ji bo ku serokanîyek dewlemend a petrolê ye, roj bi roj ji bo welatên sermayedarî giringtir dibe. Monopolên emperyalîst her salê bi sedan mîlyon dolar ji petrola Kurdistanê qazanc dikin û bi cîbûna wan di Kurdistanê de di pratîkê de rola wan di bindestî û mêtina kedkarên Kurd û talankirina serwetên tebîî yên Kurdistanê de nîşan dide.

Rojhilata Navîn ji ber ku sê qit'an; Asya, Avrupa û Afrîqa bi hev ve girê dide û ji ber girîngîya rewşa sîyasî û rola stratejîya cîyê wê, di programa emperyalîstan de cîyekî taybetî girtîye. Ev melbendên han û bi taybetî Kurdistan ketîye nêzîkî sînorê yekîtîya Sovyetê, di vê melbendê de çendîn bingehên (pêgehên) eskerî yên peymanên emperyalîst hatine damezrandin. Ji derveyê vê jî Kurdistan xeleka peywendîya Yekîtîya Sovyetê û Rojhilata Ereb e. Pratîkên salên dawî yên piştî şer nîşan didin ku her serkevtinek di yek ji wan welatên Rojhilata Navîn de tesîr dikin li ser hemû navçên wê melbendê û qet welatek Rojhilata Navîn nîne ku nebe meydana guhertinek girîng û heta şoreşgêrane jî. Çi dema bi cîrantîya Yekîtîya Sovyetê guherînek kûr bi ser rewşa sîyasî ya wan melbendan de bê, xistina desthilata emperyalîzmê li Rojhilata Navîn jar dibe. Her ji ber vê emperyalîzm li dijî hemû awa guherînên bingehîn ên vê melbendê radiwestin, bi taybetî eger peywendîya wan bi rizgarbûna gelê Kurd ve hebe. Dîyar e nikarin vê karaktera taybetî ku bi awakî esasî pey-

---

(*) Bi millîkirina şirketa petrola Iraqê di yekê Hezîrana sala 1972'an de kokên monopolên petrola bîyanî li Kurdistanê hatin birîn.

wendîya wan bi mesela Kurd ve heye, ji wê rewşa dîyarkirî ya navneteweyî cihê bikin ku mesela Kurd tê de têt çareserkirin.

Di çareserkirina mesela Kurd de wek gelek meselên din ên dema me, sebebek din ê girîng jî tesîr dike. Di warê dîrokê de ji derveyî ku dema me dema hilweşandina sîstema kolonyalî û dema rizgarîya netewên bindest e, dema ji sermayedarîyê derbazbûna sosyalîzmê ye jî.

Tenê di bin ronahîya van rastîyên jorê de em dikarin mesela Kurd bikolin, ji derveyê vê ji bo çareserkirina mesela Kurd her awa hewl û kirin ji dûrî vê rewşa han a giştî, di hêla teorî de şaşî ye û di pratîkê de jî zerar e. Lenîn wiha dibêje:

*"Di teorîya Marksîzmê de ji bo lêkolîna her meselek civakî şertek heye ku mirov nikare piştguh bike, ew jî danîna wê meselê di çarçova dîroka wê de ye. Eger bibe tenê peywendî bi welatek ve hebe (wek nimûne "programa mesela neteweî ya wî welatî") ew dem lêkolîna wê karaktera taybetî ku di wê qonaxa dîrokê de wî welatî ji welatê din cihê dike, karek pêwîst e*(3).

## 2- Rewşa Niha ya Kurdan

Di beşê yekem ê vê kitêbê de me behsa armanca hukumeta Tirkîyê, Îran û Iraqê ya di warê mesela Kurd de kir. Piştî van di bin ronahîya bûyerên nû de em vê meselê dikarin bikolin.

Ew perça peywendîya wê bi Tirkîyê ve heye, di salên piştî şer de ku rûkarê dinyayê bi tevayî guherand, li wir (mebest Tirkîye ye-Elîşêr) qet tiştek nû li gor rewşa berî şer nehat guhertin.

*"Li melbendên rojhilatê, yanî Kurdistanê kirinên gelek bi hovîtî bi taybetî li dijî hevwelatîyên Kurdan hatine kirin. Çend sal e li neh wîlayetên melbendên rojhilat îdara urfî li ser kar in."*(2)

---

(1) Lenîn "Mafê Gelan di Qedera Xwe bi Xwe Tayînkirê de" çapa Çekî, rûpel: 407.

(2) Üstüngel: "Mesela Aşîtî û Sosyalîzmê", hejmar: 8, sal: 1960.

Derba eskerî ya meha Gulana 1960'an jî di vî warî de qet guherînek li gel xwe neanî. Ji ber ku Gürsel ê serokê hukumeta Tirkîyê jî her bilûra kevin lêdixe û wiha dibêje:

*"Di dinyayê de qet netewek cihê yê bi navê netewa Kurd nîne. Kurd ne tenê hevwelatîyên me ne, her wiha birayên me yên regezî jî ne."*(3)

Bûyerên piştî Îlona sala 1961'an û bi taybetî ew şoreşa ku li hemû Kurdistana Iraqê vêket, li hemû navçên Kurdistana Tirkîyê deng da û xelkên wê melbendê û bi taybetî rewşenbîr bi awakî aktîvî di wan bûyeran de beşdar bûn. Li Tirkîyê çend weşanên bi rêk û pêkî derketin û hejmarek zêde ji gundîyên Kurd çûn alîkarîya hêzên şerkar ên Kurdistana lraqê.

Hukumeta Tirkîyê di Tebaxa sala 1963'an de li dijî welatparêzên Kurd dest bi êrîşek fireh kir, bi sedan kes girt û mehkemê (dadgehê) 25 kes ji van bi gunehkarîya hewlê pêkanîna dewleteke serbixwe ya Kurd îtham kirin û daxwaza hukmê îdama wan kir. Wek em dizanin sala 1925'an, yanî 40 sal berî vê jî Şêx Seîd û hevalên wî bi vê tuhmeta han hatin îdam kirin. Di salên 1965-1966'an de hinek guherandin bi ser sîyaseta hundur û derve ya Tirkîyê de hatin. Di netîcê de, ji bo ku hukumetê rêbazek çûna ber bi demokrasîyê de dabû pêşîya xwe, helbijartinek heta derecekê azad, hat kirin û Partîya Karker a Tirkîyê (ku hilgirê bîr û bawerîya Marksîzmê ye) karî nûnerên xwe bişîne parlamentoyê. Li ser mesela Kurd jî hinek kil û kêmasî hatin nîşan dan û çend weşanên ku bi zimanê Tirkî derketin di wan de behsa rewşa Kurdistana Tirkîyê dihat kirin.

Piştî sala 1925'an guherînek esasî bi ser rewşa cîhanê de hat, lê hukumeta Tirkîyê ku îddîa dike ku di riya azadî û serxwebûnê de layengirê xebata gelan e û hemû wesîlan ji bo piştgirîya mafên kêmayetîyên Tirk bi xurtî bikar tîne, di çarçova welatê xwe de xwe ji mafê gelê Kurd dide alîkî.

Hukumeta Îranê rewşa xwe di beramberê Kurdan de hinek guhertîye, lê ev jî bi tu awayî nebûye sebebê guherîna rewşa Kurdên

---

(3) Rojnama "Kim" a Tirkîyê, hejmara 27.4.1961 ku li (Kurdish Facts) hejmara 7.6.1961, Amsterdam, hatîye wergerandin.

Îranê. Bingeha vê rewşa nû digihîje piştî şoreşa Tîrmeha sala 1958'an a Iraqê ku Radyoya Qahîrê programek bi zimanê Kurdî belav dikir. Ji ber wê ku Kurdan li dijî rejima Nurî Seîd han bide. Hukumeta Îranê ji tirsan hinek karên wisa kir ku qet di Îranê de nehatibûn dîtin. Wek wê ku li hemû Kurdistanê propagandayek tundî da destpê kirin û piştî vê heft mîlyon dolar ji bo avdanîyâ vê melbendê texsîs kir.

Hewl û tesîra teblîxatên resmî tundtir bûn û heft radyo bi zimanê Kurdî hatin danîn, rojnamek hefteyî bi zimanê Kurdî di bin çavdêrîya karbidestan de li Tehran hat weşandin. Kovara Bamşad wiha nivîsandîye:

*"Wisa dixuyê ku Misrîyan beşê Kurdnişîn ê Surîyê daqurtandine...eger dema Qahîrê Sûrîye dadibeland me dengê xwe kiriba, niha Misrîyan nedikarîn behsa Kurdistanê bikin".*(4)

Rojnamek din gelek bi cur'etî wiha nivîsandîye:

*"Eger pêwîst be tiştek bi navê tevgera Kurd destpê bike, heqê netewayetî yê Îranê ye ku mil bide ber. Ji ber ku Kurd li çi ciyekî bin Îranî ne û xwîna Îranî di demarên wan de digere...û dîyar e heqê Îranê ye ku bibe pêşeng û wan Kurdên ku li welatên din belav bûne di bin ala pîroz a xwe de berhev bike".*(5)

Wezîrê Derve yê wê serdemê di Meclisa Şûra de da xuyakirin ku:

*"Mesela Kurd ku hinek car dijminên Îranê behs dikin, di eslê xwe de li Îranê li holê nîne".*(6)

Da niha em bizanin ka gelo bingeha sîyaseta hukumeta Îranê di warê mesela Kurd de çîye? Em dikarin bêjin ev sîyaseta han bîr û bawerîya serokwezîrê berê yê Îranê Muhemmed 'Elî Firûxî ronî dike, ku sala 1927'an li Tirkîyê sefîrê Îranê bû, di namek nihênî de daye xuyakirin û wiha dibêje:

*"Problema Kurd li vir gelek ji wê girîngtir e ku me mulaheze dikir. Tirk, nebûna yek rengê netewayetî, yanî hebûna Yunanîyan,*

---

(4) Bamşad, hejmar: 26.6.1958, Tehran.
(5) Rojnama Mîhrayîran, hejmar: 1.7.1958, Tehran.
(6) Rojnama Keyhan, hejmar: 30.6.1958, Tehran.

*Ermenîyan, Sirbîyan, Bulgaran, Ereban û yên din bi sebebê bingehîn ê bedbextîya xwe ya rojên bên dizanin û hewil didin di jîyana xwe ya nû de xwe ji van belan rizgar bikin û naxwazin li ser erda xwe unsurên fesad bihêlin. Niha Sirb, Bulgar û Ereb ji destê wan çûne û vê jî ji xwe re serkevtinek dizanin. Ermenîyan li Tirkîyê xelas kirine. Yunanîyan jî derdixin. Di vê rewşê de li ba wan wisa ye ku gihîştine armanca xwe, lê sê sal berî niha tûşî problema Şêx Seîd bûn. Ev têkilhevîya han gelek girîng bû, hebûna Tirkîyê xistibû xeterê, bi awakî wisa ku heştê hezar esker li Kurdistan berhev kirin û deh mîlyon pere xerc kirin. Lê ji bo ku gelek şaşîtîyan kirin dawîya problemê nehat û Tirk jî di vê bawerîyê de ne . Bûyera du meh berî niha birînek nû bû li ser dilê Tirkan.*

*Ji hemû tiştekî xirabtir ev e ku Îngilîzan behsa Kurdistana serbixwe avêtine ser devê Kurdan û bi vî karî dilê dewleta Tirkîyê xistîne tirs û lerzê. Dîyar e divê yê me jî wek wan pişta me bilerz e. Lê gelek mixabin Tirk di ciyê wê de ku me hevderdê xwe bizanin, me dijmin dihesibînin. Di milekî de wek Rûsan, an bi teqlîtkirina wan Îranê bi feyda Îngilîzan dihesibînin, di milekî din de jî di wan muzakeran de ku li Tehranê li gel Memduh Şewket Beg hatîye kirin, wisa têgihîştine ku em dixwazin navçek Kurdnişîn di navbera Îran û Tirkîyê de bikin parastgeh. Berî ez ji cenabê we re telgraf bişînim, min ev yek ji Tirkan sehkir.*

*Bi kurtî, ji ber van sebebên jorê bîr û bawerîya Tirkan ev bû û niha jî her ew e ku dewleta Îranê naxwaze di temînkirina sînor de li gel wan hevkarîyê bike. Mebesta eslî ya Tirkan bi îmzakirina peymanê li gel me ev e ku bi alîkarîya me xwe ji destê xirabîya Kurdan rizgar bikin, bi awayekî wisa ku ew hemû zehmetîyên ji bo pêkanîna Tirkîya nû kêşane vala neçe. Ji ber ku nikarin Kurdan wek Ermenîyan xelas bikin û nikarin wek Yunanîyan jî derbixin. Kurd musilman in, xelkê Asyayê ne û li gel xelkên din ên Tirk xwedîyê eynî dînî ne û bi taybetî hejmara wan jî gelek e û bi ser nakevin. Vêca ji ber vê, neçar nebin gelek eskerekî zêde di van navçan de rabigrin û mesrefek zêde bikin, dixwazin bi alîkarîya Îranê vê bela han ji ser milên xwe hildin.*

*Ew ultîmatoma ku dan dewleta Îranê jî di bin tesîra vê bîr û*

*bawerîyê de bû, ger çendîn mebesta wan baş e, lê awayê kirinê xerab hesibandine...Bi çi awayî dibe bira bibe ez di vê bawerîyê de me ku divê em bi dewleta Tirkîyê re li ser temînkirina sînor li hev bikin. Ji ber ku perîşanîya me ji wê ku goya Tirk dixwazin dewleta Îranê Kurdan ji holê rake bêcî ye û dewleta Tirkîyê çaveriya tiştekî wiha nake û heta ne dûr e li ser vê jî tekît nakin ku em Kurdan çek bikin. Ji ber ku dizanin û teqilandine ev karek rehet nîne.*

*Esasê daxwaza Tirkan ev e ku herdu dewlet alîkarîya yek û du bikin ji bo wê ku di milekî de Kurdên Îranê Tirkan tûşî nerehetîyekê nekin û di milekî din de Kurdên Tirkîyê axa Îranê nekin bingeh û penageh li dijî Tirkîyê. Madem wiha ye, çi zerar heye ku em li ser van mebestan hevkarîyê bikin?.. Lê li ser mesela Kurdistanek serbixwe ez di vê bawerîyê de me ku ev xetera han ji me re aşkera ye. Nabe em li ser gotinên Îngilîzan dilxweş bin ku dibêjin: " Me ji Şêx Mehmûd re gotîye ku em Kurdistanek serbixwe qebûl nakin". Min li vir li gel Îngilîzan axift, tişta ji min re ronî bû ev e: Navça tijî petrol a Kurdistanê gelek girîng e û ez bawer nakim Îngilîz rehet rûnin û rê bidin ku dewleta Tirkîyê xwe berhev bike û çend sal şûn de biçe ser Mûsilê. Dîyar e Îngilîz bi navê serxwebûnîyê Kurdan dikin dardestên xwe. Eger Îngilîz jî vî karê han nekin, Kurd bi xwe dê bi pê vê bikevin. Ji ber ku mesela serxwebûnê nû ketîye nav axaftin û ser ziman.. Madem wiha ye em divê çawa dibe bira bibe di fikra xwe ya li ser Kurdistanê de bin û eger em bikarin Tirkan bikin hevkarê xwe, lê ne ji bo ji holêrakirin, wêrankirina Kurdan. Ji ber ku ev xeyalek xav e. Ji bo ku em ewan bi xweşî bikişînin ber bi dewleta Îranê û bi awakî Îranî wan perwerde bikin. Ev karê han ji me re ji yê Tirkan rehettir e. Ji ber ku Kurd di hêla ziman û regez de Îranî ne û niha jî ew kesên ku dixwazin hestê netewayetîyê di Kurdan de hîşyar bikin ji Şanamê, Çîrokên Cemşîd û yên Ferîdûn îstîfade dikin. Eger memûrên dewleta Îranê hinek jîr bin û tamahîya wan kêmtir be û destê zordarîyê ji ser Kurdan rakin û bi hev re tedbîrek baş ji wan re bê sitendin, qet nebe di navbera Kurd û Farisan de dijminatî û fesadî namîne û eger hat rojek xeyala Kurdistana serbixwe bi hêztir be, wê demê Kurdên Îranê me tûşî alozîyekê nakin. Lê eger kirinên memûrên Îranê her wek berê be û em guh nedin Kurdan û*

*dev ji wan berdin, li gor bawerîya min xeter nêzîk e. Tirk dibêjin ku goya Îngilîz di nav Kurdan, Ermenîyan û Nestûrîyan de dost çêkirine û bahara bê dê li navçên Kurdistana Îranê têkelhevîyan saz bikin. Îhtîmal e ev gotinên han rast nebin û ji bo me bitirsînin û em bi wan re hereket bikin. Lê nabe em bi terkexemî rûnin".*(7)

Di vir de derdikeve ku Firûxî ji mirovên sîyasî yên Îranê yên îro dûrbîntir bûye, ji ber ku her di dawîya Şerê Cîhanê yê Yekem de mesela Kurd a rojên bê pêşnîyar kirîye. Lê karbidestên niha yên Îranê rewşê wan neçar kirîye ku nû fikir li çareserkirina mesela Kurd bikin. Li gel vê jî sîyaseta wan a niha, ku li ba wan wisa bû ku eger piştî Şerê Cîhanê yê Yekem pê de biçûna hinek serkevtin tê de bû, îro nikarin bibin xwedî destkevtinek bi wî awayî. Vêca problemek din li pêşîya karbidestên niha yên Îranê ye, ew jî ev e ku gelek ditirsin hêzên çep hêdî hêdî serokatîya tevgera netewî ya Kurd têkin destê xwe. Ji ber vê hewl didin yekîtîya tevgerê ji holê rakin û hemû ew kesên xwedî bîr û bawerîyek şoreşgerî ji serokatîyê dûr bixin.

Em dikarin sîyaseta karbidestên Îranê yên niha bi kurtî bi vî awayî bidin dîyarkirin ku dixwazin her cure tevgera gelê Kurd bitefînin û eger ji wan re derket ku ev karê han naçe serî, dest têkin nav tevgerê ji bo bikarin di hêla xwe de tesîrê bikin ser û heta eger ji wan re li hev bê serokatîyê jî bikin, eger qet nebe hewl bidin rêzên tevgerê têk bidin û ew kesên bi rastî parêzgerî bi qazanca gelê Kurd dikin ji serokatîyê dûr bixin.

Eger em cihêbûna hel û mercên Îran û Tirkîyê negrin berçav, em dibînin ku hukumetên van herdu welatan di gelek tiştan de wek hev li meselê dinêrin ku ji tevan girîngtir ev e, yek ji wan jî di pratîkê de îtîraf bi hebûna Kurdan wek neteweyekî serbixwe nake.

Ne tenê karbidestên van sê welatan xwe ji vê rastîyê dûr dixin ku dibêjin Kurd neteweyek serbixwe nîne, her wiha hinek însanên pêşverû jî li welatên cîran hêşta gûman ji wê dikin ku Kurd neteweyek cihê û serbixwe be. Ji ber vê em neçar in bi kurtî li ser vê meselê bisekinin.

---

(7) Kovara Yîxma, hejmara 8'ê Çirya Yekem a 1958'an, Tehran.

## 3- Cihêbûnên Netewayetî yên Kurdan

Gelo em dikarin bêjin ku Kurd netewe ye? Gelo baştir nîne Kurd kêmayetîya netewayetî bê hesêbkirin? Ka em di nêzik de li ser van herdu meselan bisekinin.

Gelek caran manayek rast û durust li "netewe" nehatîye dan. Lê zanistên nû sînorek rast ji bo naveroka vê manê didin dest. Netewe, civaka xelkekî ye ku di merhela dîrokê de peyda bûye û cîyê xwe girtîye. Civaka xelkekî, tenê piştî qonaxeke dîyarkirî ya kemilandî dibe netewe. Rastî jî ev e ku bingeha neteweyên serdema me bi geşbûna sermayê ve girêdayî ye, ev netewên han li gel geşbûna sermayedarîyê cîyê xwe digrin. Dîyar e bingeha kemilîna van netewan diçin digihîjin ser awayên berê yên van civakan ên qonaxa koletî û derebegîyê. Li gel vê jî ji bo ku civaka xelkekî netewe bê hesibandin, hinek şertên din pêwîst in ku ji tevan girîngtir ziman, ax, jîyana aborî û xwedî ruhîyeta hevbeş e ku xwe di jîyana kulturî ya netewe de nîşan dide.

Me behsa vê yekê kir ku Kurd civaka xelkekî xwedî dîrok e û ji sedsala heftan şûn de bi vî navî hatîye naskirin. Di serî de da em bizanin ew karakterên taybetî çi ne ku Kurd dikin neteweki serbixwe?

Wek me di pêş de got zimanê Kurdî zimanê hevbeş ê hemû Kurdan e û hebûna cihêbûnek kêm a di navbera şêwan (ji bo ku di metnê orîjînal de şêwe hatîye bikaranîn me dest tê neda, lê li gor bawerîya min bikaranîna zarava yan lehçe rasttir e-Elîşêr) de qet vê rastîya han naguherîne, ji ber ku şêwên cihê cihê heta li welatên herî pêşkevtî jî mane. Dîyar e heta niha pêknehatina zimanekî edebî yê yekgirtî ji bo Kurdan meselek gelek girîng e. Lê ev sebebê wê nîne ku goya zimanê Kurdî hîşta ewqas pêş neketîye û ji ber wê jî nîne ku goya wek hinek dibêjin şîweyek zimanê Farisî ye. Ji ber ku tu rojhilatnasekî bi nav û deng şik ji wê nake ku zimanê Kurdî di sevîya pêwistîyê de bi pêş ketîye. Yekemîn kitêba rêzimanê Kurdî di sala 1787'an de[8] derket. Madem wiha ye, nebûna zimanê edebî yekgirtî berî hemû tiştî diçe digihîje ser

(8) M.Garzoni: Grammatica Vocabolaria della Lingua Kurda, Roma 1787.

wê ku nivîsînek me ya yekgirtî tunebûye. Her wek me di pêş de got ku Kurdî bi tîpên Erebî, Latînî û Rûsî tê nivîsandin û sebebê vê jî ev e ku netewa Kurd di navbera çend welatan de hatîye parvekirin û di piranîya van welatan de xwendin û nivîsandina bi zimanê Kurdî qedexe ye. Madem wiha ye, di warê dîrokê de bi kêmasî wext û zeman pêwîst e ji bo nivîsînek yekgirtî û zimanekî edebî yê yekgirtî yê Kurdî pêk bê. Bi vî awayî em digihîjin vê netîcê ku netewê Kurd xwedî zimanekî hevbeş e ku yek ji wan karakteran e hemû neteweyan ji hev cihê dike.

Gûmana tu kesî di wê de jî nîne ku axek Kurdan a hevbeş heye, ji ber ku ji demek gelek kevin ve Kurdistan wek axa Kurdan hatîye naskirin ku bi hezaran sal e di deşt, çîya û zozanên wê de dijîn. Ji ber sebebê sînorên sîyasî perçe perçebûna Kurdistanê di navbera çend welatan de jî qet vê rastîya han naguherîne.

Di warê jîyana aborî ya hevbeş de dijîtîya bîr û bawerî û probleman zêde ye. Rastî ev e ku di nav Kurdan de nimûne jîyanek aborî ya hevbeş wek li welatê Frense û Îtalya heye, nayê dîtin. Di vî warî de heta di navbera Kurd û Tirkan de jî cihêbûn heye, ji ber ku Tirk di vî warî de ji Kurdan zêdetir pêş ketine. Sebebê vê jî di Kurdistanê de kêm pêşdeçûna sermayedarîyê ye û sebebê din jî ev e ku Kurdistan hatîye perçe perçe kirin û di pratîkê de hinek beş ji beşên din cihê bûne, her wek di nav her yek ji wan welatan de jî Kurdistan hatîye parvekirin. Dîyar e her yek ji van dibin astenga pêkhatina jîyanek aborî ya hevbeş. Wek nimûne Kurdistana Îranê hatîye sêbeş kirin: ji beşê bakur re bi resmî "Ustana Azerbeycana Rojava", ji beşê navîn re "Ustana Kurdistan" û ji beşê başûr re jî "Ustana Kirmaşan" têt gotin. Bi vê re tik û tenê riyek baş jî nîne ku beşên Kurdistanê bi hev ve girê bide û zivistanan di navbera Seqiz û Sine de çûn-hatin têt qutkirin, ku ev jî tê vê manê beşê başûrê Kurdistanê bi tevayî ji beşê bakurê Kurdistanê tê qutkirin.

Di ser van tevan re jî, pêşkevtina peywendîyên sermayedarî û ew cihêbûnên ku peyda bûne di nav kesên li gundan rûdinin û kemilîna bajaran, berbelavbûna bazirganî û hatin û çûna tevan dibin sebebê cîgirtina netewê Kurd.

Ev yeka han me digihîne vê bawerîyê ku eger em nikarin bêjin jîyana aborî ya yekgirtî ya temamî li Kurdistanê heye, em nika-

rin bêjin jîyana aborî ya hevbeşî jî nîne. Me berî niha got ku ev sînorên han bi zorê hatine danîn, peywendîyek aborî ya berbelavî di navbera Kurdan de heye, wek Kurdên Îran û Iraqê. Ji derveyî van jî yekîtîya jîyana aborî tiştek nisbî ye û netewên dor û berên Kurdan jî (wek Faris, Tirk, Ereb û Azerbeycanî) her wek Kurdan in. Ew jî li hinek cîyan yekîtîya wan a aborî bihêz e û li hinek cîyan jar e. Yekîtîya aborî ya netewên Qafqasyayê jî ne temam bû û yên netewên Asya Navîn ên li Rûsya her şûnewarê wan tunebû, lê çi heye ev nebû asteng ji bo wê ku di dîwarojî de bibin netewên sosyalîst ên serbixwe.

Ruh û exlaqê hevbeş ê Kurdan bi giştî tiştek ronî ye. Hemû rojhilatnas û ew kesên ku xwe ji bo lêkolîna li ser Kurdan amade kirine, li ser vê yekê hevdeng in ku Kurd ji hemû netewên dor û berên xwe cihê ne û Kurdan kultura xwe parastîye û di nav tu civakek regezî û zimanên din de asîmîle nebûne. Xebata dûr û dirêj a Kurdan a di riya parastina hebûna netewayetîya xwe de hemû li ser hev bûye sebebê cîgirbûna ruh û exlaqê hevbeş û kultura netewayetî ya Kurd.

Pêwîst e bê gotin ku piştî Şerê Cîhanê yê Duyem û bi taybetî di dema Komara Demokratîk a Kurdistanê de hestê netewayetî di nava Kurdan de gelek bihêztir bûye.

Jîndarîya netewayetîya Kurd her wiha bingehek wê ya dirêj heye û piştî şoreşa Tîrmeha sala 1958'an a Iraqê zêdetir xurttir bûye. Niha li Kurdistana Iraqê çend rojname bi zimanê Kurdî derdikevin. Li Îran û Iraqê çend îstasyonê radyoyê bi Kurdî hatine vekirinê ku her çend îstasyonên Îranê programên li gor qazanca gelê Kurd belav nakin, lê cardin heta derecekê alîkarîya geşkirina ziman û kultura Kurdî yanî edeb û musîqa dikin.

Ew jî girîng e ku bêgotin cîgirtina van netewan ku di warê aborî de paşdemayî ne peywendîyek gelek zêde bi xebata li dijî emperyalîzmê ve heye û netewa Kurd jî di wasitên xebata li dijî emperyalîzmê û zordarîya netewayetî de ku ji alîyê hukumetên merkezî yên Tirkîyê û Îranê ve tûşî bûye, reh û rîşên xwe qaîm dike.

Hevbeşîya ayînî jî yek ji wan sebeban bûye ku kemilandina netewa Kurd bi paş de xistîye. Ji ber ku Îslamîyet wek dînê hevbeş ê gelên misilman, bûye perdek ji bo li ser girtina zilm û zorîya netewayetî ya xelîfên Bexdadê û pişt re sultanên Osmanîyan ku ewan

jî di pratîkê de rola xelîfan lîstine.

Wek nimûne di dema Şerê Cîhanê yê Yekem de firsetek baş ji wan re derket ku di riya mafên netewayetî û mafên bidestxisitna çarenivîsa xwe de xebat bikin. Lê bi navê xezayê (cîhadê) ji destê xwe kirin û zilm û zora netewayetî ya Tirkan ji bo demekê jî be jibîr kirin.

Ev rast e ku ayîn yek ji wan bûyerên ku netewe pêktîne nîne, lê em dikarin tesîra ayînî li ser cîgirtina netewayetî ya Kurd di nimûna xwarê de bibînin: li gel zêdetir pêşketina di warê aborî û civakî ya navça Kirmaşanê, tevgera netewayetî li Mahabadê gelek bihêztir e. Ji ber ku Kurdên Mahabadê Sunî ne û Kurdên Kirmaşanê wek Farisan Şî'e ne. Cihêbûna mezheb li Mahabadê dibe sebebê wê ku zilm û zora netewayetî li Mahabad ronîtir xwe bixe pêş û ev jî hestê berxwedana Kurdan zêde dike û di netîcê de dibe sebebê bihêzbûna hestê netewayetî.

Sebebek nelibar ê din jî peywendîya eşîretî û derebegî ye ku heta niha di nav Kurdan de maye, lê ev peywendîyên han hêdî hêdî di netîca pêşdeçûna bazara hundur û peydabûna peywendîyên sermayedarî di gundên Kurdistanê de, bê qîmet dibin.

Em ji vir digihîjin vê netîce ku cîgîrtina netewayetî ya Kurd bi tevayî, di hel û mercên niha de mimkun nîne, lê ev tu wextî nayê vê manê ku mirov bikare 'esla şik ji hebûna netewa Kurd bike ku roj bi roj pêş de diçe û li cîyê xwe rûdinê.

Madem wiha ye, tu şertekî pêwistî yê netewebûnê nîne ku di netewa Kurd de nebe. Ji ber vê em çawan dikarin behsa netewên din bikin, em dikarin eynî bi vî awayî behsa netewa Kurd jî bikin, ji ber ku sê sebebên bingehîn û girîng ji bo hebûna netewe ku ji ziman, ax û ruh û exlaqê hevbeş pêkhatîye, bi tevayî di Kurdan de heye û jîyana aborî ya hevbeş jî gelek caran şertek girîng ê netewe nayê hesêbkirin. Madem wiha ye em dikarin Kurdan jî wek yek ji wan netewên din ên Rojhilata Navîn bihesibînin ku niha di qonaxa kemilandina netewayetî re derbaz dibin.

Di vî warî de yekem car Partîya Komunîst a Iraqê di warê li cîyê xwe rûniştina netewa Kurd de bîr û bawerîya xwe pêşkêş kir û vê bîr û bawerîyê kir bingeha teorîyek ji bo têkoşîna rojên xwe yên pêş.

*"Gelê Kurd li Iraqê beşek necihêkirî ye ji netewa Kurd li hemû*

*beşên din ên Kurdistanê ku di navbera Tirkîyê, Îran û Iraqê de hatîye parvekirin. Netewa Kurd yek ji wan netewan e ku hemû karakterên taybetî yên netewayetî tê de heye, civaka xelkek cîgirtî ye ku di qonaxa dîrokê de durust bûye û axa hevbeş û bingeha damezrandina aborî ya hevbeş û xwedî ruh û exlaqek hevbeş e ku di kultur, 'orf û 'adet û armanca netewayetî ya hevbeş de ji bo rizgarî û yekîtîya netewayetî xuya dike".*(9)

Derbazbûna ji eşîretî û taîfetî bi ser hozatî de, her di beramberî wê de derbazbûna ji komuna destpêkî û koletî bi ser derebegî bûye. Her wek derbazbûna ji eşîretî bi ser netewe derbazbûna ji derebegî bi ser sermayedarî ye. Kurd jî niha di vê qonexê de ne, yanî em bi awakî ronîtir bêjin di beşê dawî yê wê qonaxê re derbaz dibin.

## 4- Karektera Xebata Rizgarîxwazî ya Gelê Kurd

Xebata gelê Kurd di dema niha de berî hemû tiştî xebatek li dijî emperyalîzmê ye, madem wiha ye, dijminê serekî yê gelê Kurd emperyalîzm e. Heta dema ku dawî bi desthilata sîyasî ya emperyalîzmê neyê û peymanên eskerî neyên hilweşandin, rizgarî û serxwebûna gelan temam nabe û di bin xeterê de ne. Ji alîkî din de netewa serdest ya Îran, Iraq û Tirkîyê jî niha di qonaxa xebata li dijî emperyalîzmê de ne. Yanî hemû netewên rizgarîwxaz beşdarê xebata li dijî emperyalîzmê ne û di vî warî de netewa Kurd jî mil bi milên hemû netewên Rojhilata Navîn xebat dike. Heta ku bi vî awayî destê emperyalîzmê li ser kar û barên van welatên ku Kurd tê de dijîn be, îmkana rizgarîya Kurdan û tu netewekî din nîne. Madem wiha ye, wezîfa serekî ya hemû netewên bindest ên Rojhilata Navîn têkoşîn e ji bo rizgarîya ji bin desthilata emperyalîzmê. Di vir de derdikeve ku tevgera rizgarîxwazî netewî ya Kurdan beşek ji xebata rizgarîxwazî ya

(9) Beyannama Kongra Duyem a Partîya Komunîst a Iraqê, bi zimanê Erebî, Tîrmeha 1956'an.

cîhanê ye û peywendîyek organîk li gel sedan mîlyon însan heye ku di riya demokrasî û pêşkevtinê de li dijî emperyalîzm û kevneperestîyê xebat dikin.

Bi vî awayî tevgera rizgarîxwazîya netewî ya gelê Kurd li dijî karbidestên Îran û Tirkîyê jî ye ku nunerên derebeg û burjuwazîya komprador in û hevpeymanên emperyalîzmê ne jî. Netewên din jî di her yek van welatan de li dijî vê grûba han xebat dikin. Wek nimûne netewên Îranê li dijî hukumeta kevneperest a Şah di xebatê de ne û ji ber vê li gel Kurdên Îranê di cebheyekê de disekinin. Di ser vê de jî di xebata îro ya Îranê de îmkana Faris û Azerbeycanîyan ji bo piştgirîya gelê Kurd di Îranê de zêdetir e û peywendîya wan li gel Kurdan, niha ji peywendîyên Kurdên Îranê li gel Kurdên Iraq û Tirkîyê zêdetir e, madem wiha ye çi guherînek sîyasî li Îranê biqewime rasterast tesîrê li ser Kurdistana Îranê dike. Li hemberî vê tesîra guherînên warê sîyasî yên li Iraqê yan Kurdên Iraqê li ser Kurdên Îranê ne raste rast in. Dîyar e di guherîna sîyaseta aborî, kulturî û îdarî jî de rewş her bi vî awayî ye. Di vir de gotina Lenîn rast e ku dibêje:

*"Heta wê dema ku çend netewe bi hev re di welatekî de dijîn, bi mîlyonan û mîlyaran benikên aborî, qanûnî û civakî bi hev ve girêdayî ne".*(10)

Bi awakî din em bêjin, ji ber wê emperyalîzm û kevneperestî dijminên hevbeş ê hemû netewên welatên bindestê emperyalîzmê ne, ew netewe jî li dijî wan hev digrin. Lê di milek din de jî ev nayê vê manê ku Kurdên Îranê nikarin qet curek piştivanî li Kurdên Iraqê bikin, an tesîrê li ser bikin, bi eksê vê di kîjan welatî de guherînek bi ser rewşa gelê Kurd de bê , tesîrê dike li ser tev wan welatan ku gelê Kurd tê de dijî. Her çend sînorê xebata rizgarîxwazî netewî ya gelê Kurd di yek ji wan welatan de bihêz be, ewqas zêdetir îmkan ji bo Kurdan pêk tê ku alîkarîya birayên xwe yên welatên din bikin. Ev rastîya han di dema Komara Mahabadê de bi temamî derket, ku Kurdên Îranê karîn alîkarîyek bi qîmet ji Kurdên welatên cîran bistînin. Her wiha yekemîn sal

---

(10) V.I. Lenîn: On "Cultural and National" Autonomy, works, Vol. 19, p. 502 (Czech ed.)

piştî şoreşa 14'yê Tîrmehê ya Iraqê Kurdên Iraqê alîkarîyek zêde dan welatparêzên Kurdên Îranê. Niha jî Kurdên Îranê û Tirkîyê bi hemû awayî piştivanîya xebatkerên Kurdên Iraqê dikin.

Ev nezera jorê bi tu awayî nayê vê manê, ji bo ku niha em di qonaxa li dijî emperyalîzmê de ne, heqê Kurdan nîne ji bo cîbicîkirina mafên xwe yên netewayetî xebat bikin. Ji ber ku wek me di pêş de got xebata li dijî zordarîya netewayetî, ji xebata li dijî emperyalîzmê nayê cihêkirin. Eger gelê Kurd tenê li dijî zordarîya netewayetî xebat bike û guh nede xebata li dijî emperyalîzmê, ev xebata han ji dorûber parêzî mehrûm dimîne û îmkana serkevtina wê nîne. Ji ber ku desthilata emperyalîzmê di van welatan de problema netewayetî û zordarîya netewayetî jî li gel e. Madem wiha ye, dema ku gelê Kurd tenê ji bo mafên xwe yên netewayetî xebat bike, emperyalîzm sîyaseta "perçe bike û îdare bike" bikar tîne û tevgera netewayetî ya Kurd ji bo bêdengkirina xebata rizgarîxwazîya netewên din dixe kar.

Di vê navê re xwe ji xwedmuxtarîyê (otonomî) dûr xistin ji bo Kurdan di çarçova tevgera li dijî emperyalîzmê de şaşîyek mezin e û heta ew hêz jê îstîfade dikin ku dixwazin gelê Kurd ji serokatîyek şoreşgerî bêpar bikin û parêzgerîya dor û berê wê hildin. Divê gelê Kurd xebata li dijî emperyalîzmê xebata ji bo bi destxistina mafê netewayetî û rizgarbûna ji zordarîya netewayetî bihesibîne. Ev yeka han e ku **peywendîya karakter û her du milên xebatê yên li dijî emperyalîzmê û xebata li dijî zordarîya netewayetî ji me re ronî dike, ku di rastîya xwe de her du milên wê xebatek in û ji hev nayên cihêkirin.** Her di ber vê re divê di bîra me de be ku xebata li dijî emperyalîzmê **esasî û girîng e** û xebata li dijî zordarîya netewayetî jî beşek ji vê xebatê ye.

Çareserkirina mesela netewayetî ya Kurd bi demokrasîyê ve girêdayî ye, ji ber ku mesela netewayetî bi xwe perçek ji demokrasîyê ye. Lenîn gelek caran ducar kirîye ku di çarçova demokrasîyê de nebe, mesela netewayetî nayê çereserkirin û ji bo çareserkirina mesela netewayetî divê peywendîyên demokrasîyê di navbera netewan de pêk bê.

*"Di vir de tenê riyek ji bo çareserkirina mesela netewayetî heye (eger em wiha deynin ku di cîhana sermayedarîyê, cîhana sûd, problem û bindestîyê de îmkana çareserkirinê hebe) ew jî de-*

*mokrasîyek temam e".*[11]

Di fesla duyem a vê behsê de me ronî kir ku mesela Kurd û sîyaseta netewayetî ya wan dewletan ku hakîmîyetê li ser Kurdan dikin, peywendîyek wan a çendîn xurt bi demokrasîyê ve heye. Ji ber vê çi tiştê·ku di meydana demokrasîyê de pêşkevtinek zêdetir deşt bixe, Kurd jî wek netewek zorlêker zêdetir dikarin ji bo mafên xwe yên netewayetî xebat bikin û vî mafî bi dest bixin. Di milê din de çi dema ku derbek li demokrasîyê bê xistin, derbek jî li wî mafê demokrasîyê têt xistin ku Kurdan bi xebata xwe bi dest xistîye. Her wiha ev rastîya han a dawîyê serkevtina Kemalîstan li Tirkîyê û di navbera salên 1945-1946'an de li Îranê û piştî şoreşa 14'yê Tîrmeha 1958'an li lraqê bi tevayî ronî dikin. Madem wiha ye, bi bê demokrasî û destxistina azadîyên demokratîk ne mesela netewayetî têt çareserkirin û ne tu netewek mafên xwe yên netewayetî bi dest dixe.

Pratîka Iraqê ya di van çend salên dawîyê de gelek baş nîşan daye ku bindestîya hêzên demokrasîyê yanî derbe li demokrasîyê xistin, bi mana derbelêdana mafên netewayetî yên gelê Kurd e û her serkevtinek kevneperestî û her paş de gavavêtinek demokrasîyê êrîşek li ser gelê Kurd û ınafên netewayetî yê gel e.

Ev jî nayê wê manê ku ev her du gîrûgiriftên han hevmilên yek û din in. Gotinên Lenîn di vî warî de yên ku dibêje: mafê cîbicîkirina çarenivîsê yek ji van daxwazên demokrasîyê ye, tu şik tê de nîne. Nimûna Kurdistanê ji me re vê ronî dike ku kîjan ji van gîrûgiriftan ên serekî û kîjan di dereca duyem de ye. Îro li Kurdistana Îranê heft îstasyonên radyoyê bi zimanê Kurdî hatine danîn û bi Kurdî propaganda hukumetê belav dikin, çi heye Kurd gelek bi tundî tên perçiqandin û ji hemû mafên xwe yên netewayetî bêpar in û her cure hewl û têkoşînek ji bo bi destxistina van mafan bi tundî tê tefandin. Niha bi sedan azadîxwazên Kurd hatine girtin û bi cezayê hepskirina gelek dirêj hatine mehkûmkirin, ji ber ku azadîyên demokratîk ji holê hatine raki-

(11) V.I. Lenîn Questions of National Policy and Proletarian Internationalism, Moscow, p. 26.

rin û şûnewarên demokrasîyê kor bûne. Lê di salên 1951-1952'an de tu radyo û rojnamek bi zimanê Kurdî tunebû, lê çi heye heta derecekê demokrasî hebû û eger bi awakî nîv temam jî be azadîyên demokratîk hatibûn temîn kirin. Gelê Kurd dikarî daxwaza xwe bîne ziman û doza mafên xwe yên netewayetî bike û bi gelemperî hel û mercek baştir ji bo Kurdan pêk hatibû. Bi awakî din em bêjin, karbidestên Îranê karîbûn, an li ber gelek sebebên cihê cihê, ca bi awakî destpêk jî be, mecbur bûbûn mil bidin ber hinek mafên netewayetî yên Kurdan. Li gel vê jî aşkera ye tenê di çarçovek demokrasîyê de îmkana rizgarîya temamî ya ji zilm û zora netewayetî û temînkirina yekîtîyê di navbera netewan de heye. Yanî çareserkirina mesela netewayetî bi hebûna demokrasîyê ve girêdayî ye, her çendîn demokrasî zêdetir be, asoya çareserkirina mesela netewayetî jî ronîtir dibe. Ev bi xwe belga vê ye ku xebata ji bo demokrasîyê xebata ji bo çareserkirina mesela netewayetîyê ye jî. Lê pêwîst e bê gotin ku her evqas ku bi awakî giştî em ji bo azadîyên demokratîk hewl bidin bes nîne, belko divê em daxwaza mafên netewayetî yên gelê Kurd wek yek ji wan daxwazên demokratîk bi ronî bînin holê.

Yekî din ji barên tevgera rizgarîxwazîya netewayetî ya Kurd, karakterê tevgerê yê dijî derebegîyê ye. Beşê duyem ê vê kitêbê aşkera kir ku derebeg kevneperestirîn grûba civaka Kurdistanê ne û astenga pêşkevtina vê civakê ne. Gundî %80'yê nifûsa Kurdistanê ne, ku piranîya wan xwedîyê axa xwe nînin û ew jî hêzên herî girîng ên tevgera rizgarîxwazîya netewî ne. Serkevtina xebata di vî warî de bi sevîya bi beşdarbûna vî beşê girîng ê vê nifûsa han ve girêdayî ye. Me di fesla duyem de ronî kirîye ku sebebê bingehîn ê şikestina yek bi ser yek de serîhildanên gelê Kurd ev bûye ku serokatî di destê derebegan de bûye û sloganek (dirûşmek) wisa hilnegirtine ku gundîyan bikêşin saha xebatê. Bêguman yek ji wan sebebên hilweşîna Komara Kurdistanê jî her ev bû ku ax belav nekir. Madem wiha ye, ji bo ku gundî bi awakî aktîfî di tevgera rizgarîxwazîya netewî de beşdar bin, pêwîst e armanca parvekirina axê li berçav bê girtin, bi vî awayî dest bi ser milkên derebegan de bê girtin û di nav gundîyên bêax de bê pere bên belav kirin.

Lê di hel û mercên niha yên Kurdistanê de bi taybetî li Kurdis-

tana Îranê û Iraqê ku hîn peywendîya derebegî û eşîratî bi hêz e, mirov nikare slogana "ax a wî/wê kesî ye ku dikêle" hilgir e.(*) Ji ber ku beşek zêde ji xwedîyên axên navîn û piranîya xwedîyên milkên biçûk bi awakî aktîfî beşdarîya tevgera netewayetî dikin. Ji ber vê divê em wan xwedî axan kifş bikin ku bi xwe ji xwe re li ser axên xwe naxebitin. Wisa dixuyê sîyaseta Partîya Demokrat a Kurdistana Îranê sîyasetek rast e, ji ber ku van armancên xwarê ji xwe re dîyar kirîye: Dest bi ser de girtina axên derebegan û hemû wan xwedî milkan ku ji rêza gel derdikevin der û piştivanîya dijmin dikin. Ev jî di qonaxa niha de ku qonaxa şoreşa demokratîk a netewî ye, bi mana rakêşana bi mîlyonan gundîyên bê ax û her wiha bi mana hevpeymanî li gel gundîyên navendî û xwedî axên biçûk e. Ji derveyê vê xwedî milkên navendî jî radikêşe, yan bi kêmasî bê teref dike û derebegan ku di nav civaka Kurdistanê de armanca (hedefa) bingehîn a xebatê ne tenê dihêle.(12)

Netewîyên milê rastê bi awakî giştî li ser netewa Kurd diaxivin û daxwazên wan ev in ku di navbera çînên civaka Kurdistanê de dubendîyê deynin. Di nav tevgera rizgarîxwazîya netewayetî de jî tenê qîmet bi destxistina mafên netewayetî yên Kurd didin û hêzên şoreşgêr bi wê gunehkar dikin ku goya ev warê han li ber çavên wan nîne. Lê ji pratîkên borî em dikarin derxin ku ev tohmetên han çendîn ji rastîyê dûr in. Di milek din de netewîyên milê rastê hemû dem amade ne her çi peywendîya bi xebata çînayetî ya Kurdistanê ve hebe, "ji bîr bibin" ku dîyar e eslê naveroka xebata çînayetî li Kuristanê îro xebata gundîyan a li dijî derebegan e.

---

(*) Niha hel û merc guherîye û partîyên pêşverû li herdu perçên Kurdistanê van herdu sloganan davêjin. -Nivîskar.

(12) Mimkun e derebeg ji ber çend sebeban dikevin nav rêzên tevgera netewayetî, ku yek ji van sebeban hestê netewayetî ye. Lê ev halê han gelek kêm caran têt dîtin û divê her halek muqayesên cihê jê bê kirin. Dîyar e derebeg wek çîna li dijî gel û alîgirê hukumeta merkezî û emperyalîstan in. Divê hemû sebebên din û bi taybetî peywendîyên eşîretî di her navçeyekê de li ser hesab bê kirin.- Nivîskar.

Bi bê beşdarî, yan bi kêmasî piştivanîya civaka gundîyan tu tevgerek ne li Kurdistanê û ne li tu cîyekî din ê Rojhilata Navîn nikare biserkeve û guherînek bingehîn bîne holê û tu tevgerek jî eger armancek ronî li dijî çînên derebeg nepê, ku ew jî programa islahatek axê ya bingehîn e, nikare piştevanîya gundîyan ber bi xwe ve bikêşe.

Her çendîn gundî hêzên serekî yên xebata rizgarîxwazîya netewayetî ne, lê nikarin serokatîyê jê re bikin. Sebebê vê jî paşvemayîn û pêşdeneçûna peywendîyên berhemdarîyê ye. Ji ber vê burjuwazîya netewî û çîna karker di hel û mercên niha de hewl didin serokatîya tevgerê bikin destê xwe.

Me di pêş de jî got burjuwazîya netewî ya Kurd heta niha jî jar e û nekemilî ye û hem di bin tesîra emperyalîzmê û burjuwazîya netewî ya serdest de ye û hem di bin tesîra derebegan de û hem jî ji bo xebata li dijî emperyalîzmê dixebite. Ev yeka han ji bo burjuwazîya Kurd a netewî jî rast e ku çekek e di destê burjuwazîya Kurd de. Burjuwazîya netewî ya Kurd xwedî karakterek li dijî emperyalîzmê û xwedî karakterek demokratîk e jî. Lenîn her wext ferqa navbera nasyonalîzma netewa bindest û nasyonalîzma netewa serdest danîye:

*"Nasyonalîzma burjuwazîya her neteweyekî bindest xwedî naverokek giştî ya demokratîk e ku li dijî zilm, zor û bindestîyê ye û em bi tevayî piştivanîya vê naveroka demokratîk dikin".*(13)

Ev naveroka han xwe di xebata ji bo bidestxistina azadîya netewayetî û jîndarîya netewayetî de dixe pêş û her ji ber vê jî hemû hêzên şoreşger ên Kurdistanê piştgirîya vî warê han ê demokratîk ê burjuwazîya netewî dikin. Her çendîn di qonaxa yekemîn a li dijî xebata emperyalîzmê de armanca burjuwazî bi temamî li gel armanca hêzên şoreşger û di ser tevan de bi ya çîna karker ve rê dikeve, lê armanca van herdu çînan di netîca berbipêşdeçûna vê xebatê de ji hev dûr dikeve, ji ber ku hinek caran hêzên şoreşger piştevanîya armancên burjuwazîya netewî yên beramberî mesela netewayetî nakin.

---

(13) V.I. Lenîn: Questions of National Policy, p. 81.

*"Dawîlêanîna bi hemû awa zilm û zora derebegî û hemû awa zilm û zora netewayetî û jiholêrakirina serdestîya neteweki yan zimanekî li ser yê din, yek ji wan wezîfên girîng e ku wek hêzek demokratîk dikeve ser milê proletaryayê. Dîyar e ev qazanca xebata çînîtî ya proletaryayê ye, ji ber ku problem û astengên netewayetî dibe sebebê bêhêzbûna xebata çînîtî, lê piştivanîya burjuwazîya netewî ji derveyê vê çarçovê ye ku dîrok jê re dîyar kirîye û sînor jê re danîye, ji derveyê vê kirinek xîyanet bi proletarya û alîgirîya burjuwazîyê ye."*(14)

Di tevgera rizgarîxwazîya netewayetî ya Kurd de her yek ji van çînan, yanî burjuwazî û proletarya hewl didin serokatî bixin destê xwe û hel û mercên niha ji me re ronî dikin ku îmkanên hêzên şoreşger ji bo didestdegirtina serokatîyê li hemû welatên Rojhilata Navîn zêdetir e. Ji ber ku xebata gelê Kurd li Îran, Iraq û Surîyê di bin serokatîya partîyên sîyasî yên çep de ne (li Tirkîyê tevger, van dawîyan neçar bûne xwe paş de bikêşin). Wek nimûne li Kurdistana Îranê her hewl û xebatek ji bo damezrandina partîyek netewî ya rast şikestîye û gelê Kurd ji Şerê Cîhanê yê Duyem ve di bin riya Partîya Demokrat a Kurdistanê û partîya şoreşger a gelê Kurd de xebat dika.

Li Iraqê ku burjuwazîya Kurd heta derecekê bi hêz e, em dibînin ku di tevgera rizgarîxwazî de ciyê netewîyan ku bi hêz bûye, heye, lê li gel vê jî partîya têkoşer a Kurdistana Iraqê, Partîya Demokrat a Kurdistanê ku ji hemû sinif û tebeqên xelkê Kurdistanê pêk hatîye hewl dide ji bo dostayetî li gel welatên sosyalîst û bi taybetî Yekîtîya Sovyetê deyne, li gel Partîya Komunîst a Iraqê nifûzek wan a zêde heye û roj bi roj jî ev nifûza han di Kurdistana Iraqê de zêdetir dibe. Sebebê vê jî ev e ku ev herdu partîyên han bi awakî usûlî di riya mafên netewayetî yên gelê Kurd de heta sevîya otonomîyê ji bo Kurdistana Iraqê xebat dikin û peywendîyek organîk di navbera vê xebatê û xebat ji bo demokrasî di Iraq de, pêk anîne.

(14) Eynî serokanî, rûpel: 410.

Partîya Demokrat a Kurdistanê di bin serokatîya serekê xwe yê gelî Mistefa Berzanî de di tevgera gelê Kurd a li Iraqê de rolek esasî heye.

Di vir de hinek hel û mercên li bar hene ku benê terazîya hêzên şoreşgeran ji yên netewîyan girantir be. Rast e çîna karker jar e û hejmara wê jî kêm e, lê burjuwazî heta derecekê ji wê jartir e. Di beşê duyem de me behs kir ku burjuwazîya sanayî di nav burjuwazîya Kurd de nîne, belko burjuwazî bi awakî serekî ji burjuwazîya bazirganî pêk hatîye. Di milek din de jî proletarya sanayîyê ya Kurd peyda bûye û dike bi awakî cihê ji burjuwazî pêşde biçe. Ji ber ku sanayîyên girîng an di destê monopolên emperyalîst de ne -wek petrol li Kurdistana Iraqê- yan di destê beşên dewletê de ne, wek hemû beşên sanayîyê li Kurdistana Îran, Iraq û Tirkîyê, ku beşek ji sanayîya petrolê jî tê de ye. Bi vî awayî çîna karker li Kurdistanê bi hejmar jî ji burjuwazî zêdetir e, eger em li gel mîzana hêzên di navbera burjuwazî û proletarya Tirk an burjuwazî û proletarya Îran muqayese bikin.

Sebebê bihêzbûna çîna karker a Kurd ji burjuvzîya Kurd ev e ku çîna karkerê Îran, Iraq û Tirkîyê bi her awayî piştevanîya xebata gelê Kurd a li dijî zilm û zora netewayetî dike. Her ji ber vê jî kedkarên Kurd dikarin îmkanên zêde bi destê xwe xin û pişta wan bi vê piştevanîya han stûr be, dîyar e hemû evên han jî alîkarîya pêşdeçûna daxwazên sîyasî yên kedkarên Kurd dikin.

Di milekî din de burjuwazîya netewa serdest dijîtîya bîr û bawerîya azadî netewayetî ya Kurd dike û ev jî armanca burjuwazîya Kurd wek yek ji wan çînên civakê bêhêz dike. Rast e burjuwazî di vir de ku dixwaze hemû çîn û tebeqên gelê Kurd di xebata rizgarîxwazî netewayetî de yek bigrin û guh nedin dijîtîyên çînîtî, ku ji alîyê civakên xelkê de piştgirîyek zêde lê têt kirin, lê ev jî rast e ku her çend têkoşîn û têgihîştina civakên xelkê zêde bin, baştir armanca çînatî ya proletarya û ya burjuwazî cihê dikin, ev jî ne her ji alî proletarya û burjuwazîya netewa bindest a xwe de, her wiha ji alî proletarya û burjuwazîya netewa serdest ve jî rast e. Her ji ber vê, civakên netewa Kurd çîna karker li Tirkîyê, Îranê û Iraqê dilsoztirîn hevpeymanê xwe dizane.

Ev rewşa han di saha cîhanê de jî her bi vî awayî ye: proletarya cîhanî ku hêzên wê yên serekî welatên sosyalîst pêk tînin,

piştevanî li mafê qedera xwe bi xwe tayînkirinê dikin, li hemberî vê burjuwazîya mezin a welatên emperyalîst mezintirîn dijminê rizgarîya gelê Kurd e.

Şoreşa mezin a sosyalîst a Oktobrê ku nêzîkî Kurdistanê li Yekîtîya Sovyetan pêk hat gelek tesîr kirîye li ser tevgera rizgarîxwazîya netewa Kurd. Wek me di pêş de got gîyanê (ruhê) tevgera Mahabadê, gîyanê dostayetî li gel Yekîtîya Sovyetê, bû beşek ji rê û şûna xebata rizgarîxwazîya gelê Kurd. Her ev tenê bes e ku em bizanin, li Yekîtîya Sovyetê ku bîr û bawerîya Marksîzm-Lenînîzmê tê de serkevtîye, li gel vê jî ku hejmara Kurdan ji 100 hezaran kêmtir e, lê xwedîyê destkevtîyên mezin ên berbiçav in.

Di civaka Kurdistanê de ku hêşta peywendîyên derebegî mane û proletarya di hêla hejmarê de jar e, her wiha bi awakî giştî di hemû wan welatan de ku di hêla aborî de paşvemayî ne, rewşenbîr di tevgera rizgarîxwazîya netewayetî û di danîna rêbaza pêşdebirina piştî rizgarbûnê de rolek girîng dilîzin.

Di nav rewşenbîrên Kurd de em hejmarek gelek kêm dibînin ku guh nadin xweşî û bextîyarîya gelê xwe, lê di hemberî vê de bi taybetî di dema Şerê Cîhanê yê Duyem de û dema Komara Mahabadê de û piştî hilweşandina vê komarê, piranîya wan bi tundî di rêzên netewa xwe de cî girtin. Madem wiha ye rewşenbîrên Kurd jî piştevanekî girîng ên hêzên şoreşgeran in, ji bo ku serokatîya tevgera rizgarîxwazî netewayetî bigrin dest, her hel û mercekî pêwîst pêkhatîye ji bo wê hêzên şoreşgerên Kurdistanê bi alîkarîya hêzên demokrasî yên wan welatên ku Kurd tê de dijîn, rêveberiya tevgera rizgarîxwazîya netewayetî bigrin dest.

Ji bo ku hêzên şoreşger ên Kurdistanê bikarin serokatîya tevgerê bigrin destê xwe, pêwîst e di du cephan de kar bikin, li milekî li dijî netewayetîya berçavteng a Kurd û li milekî din li dijî şovenîzma netewa serdest. Di hel û mercên niha yên xebatê de ku gelê Kurd bi tundî di bin zilm û zora netewayetî de diperçiqe, tirsa mezin şovenîzma netewa serdest e. Hinek caran rê dikeve ku komunîst di xebata li dijî burjuwazîya netewî ya netewa xwe de tirsa şovenîzma netewa serdest piştguh dikin. Ev karê han dibe sebebê cihêbûna wan di rêzên netewe û rê ji bo bihêzbûna burjuwazîya netewî di nav tevgera rizgarîxwazîya netewayetî de

xweş dike. Lenîn komunîstan ji vê tirsa han agahdar dixe û dihe bîra wan bi vî awayî:

*"Ji tirsa vê ye ku em alîyê nasyonalîzma burjuwazîya netewa bindest digrin... alîyê nasyonalîzma netewa serdest kevneperestirîn û reştirîn awayê wê nasyonalîzmê ye."*(15)

Serkevtin bi ser burjuwazî û hêzên rastê de karek gelek giran e û kosp û astengên zêde li pêşî ne. Lê li gel vê jî di van dawîyan de derketîye ku hêzên şoreşger ên Kurdistanê ji îstîfadekirina pratîka xebata xwe û pratîkên şoreşa cîhanê, dikarin serokatîya tevgera rizgarîxwazîya netewayetî bigrin destê xwe û bi rastî jî her ew in ku bikarin heta dawîyê vê xebatê bi rê ve bibin.

---

(15) Eynî serokanî, rûpel: 210.

FESLA SÊZDEHAN
# MAFÊ QEDERA XWE BI XWE TAYÎNKIRINA NETEWAN Û MESELA KURD

## 1- Marksîzm û Mafê Qedera Xwe bi Xwe Tayînkirina Netewa Kurd

Mesela rizgarbûna kolonîyan û welatên bindest ji her meselek vê demê tundtir pêş de dikeve, ev jî berhemê van guherînên dîrokî ne ku ji Şerê Cîhanê yê Duyem ve bi ser dinyayê de hat. Niha tu netewek nemaye ku azadîya xwe wernegirtibe, yan ber bi rizgarbûnê ve neçûbe. Li milekî din jî ji alîyê dewletên kolonyalîst ve hewl têt dan çiqas ji wan re li hev bê ewqas derengtir serxwebûna sîyasî ji wan re bê dan, an hinek netewe "pênegihîştî" bên hêlan.

Marksîzm-Lenînîzm mafê qedera xwe bi xwe tayîn kirinê dide her neteweyekî. Naverokek aşkera û ronî ya vî mafî heye, Lenîn di raberizîna (munaqeşa) xwe ya bi reformîst û revîzyonîstan re gelek bi aşkera ronî kirîye ku:

*"Dîyarkirina qedera xwe bi xwe tayînkirina netewan yanî cihêbûna sîyasî ya wan netewan û damezrandina dewletek serbi-*

*xwe ya netewayetî ye."*(1)

Pişt re wiha didomîne:

*"Mafê qedera xwe bi xwe tayînkirinê ku beşek e ji programa Marksîstan, ji hêla dîrok û aborî de tenê manayek wê heye, ew jî tayînkirina qedera xwe bi xwe ya sîyasî, yanî dewletek serbixwe û pêkanîna dewletek netewayetî ya serbixwe ye."*(2)

Marksîzm ne tenê bi kurî mafê qedera xwe bi xwe tayînkirina netewan ronî dike, her wiha di her hel û mercekî de her cure problemên katî (muwaqet) jî lê peyda be, gelek bi ronî dawa vî mafî dike.

Lenîn gelek bi tundî parêzgerîya mafê qedera xwe bi xwe tayîn kirinê dikir û rexne li hemû wan kesan dikir ku li dijî vî mafî radiwestin, yan bi curek digirtin dest ku mafê qedera xwe bi xwe tayînkirinê nedigirt nav xwe. Lenîn wiha digot:

*"Sosyalîstên netewa serdest eger di dema şer û aşîtî de ji bo mafê qedera xwe bi xwe tayîn kirinê hewil nede, sosyalîst nîne û enternasyonalîst jî nîne, belko şovenîst e".*(3)

Kurd jî wek her neteweyekî xwedî mafê qedera xwe bi xwe tayînkirinê û damezrandina dewletek serbixwe ye. Karekterek taybetî yê di mesela Kurd de heye ev e ku mesele ji bo Kurdan tenê cihêbûn nîne, belko berî her tiştekî yekîtî ye. Wek nimûne cîbicî kirina mafê qedera xwe bi xwe tayînkirinê li Iraqê mana cihêbûna Kurdistana Iraqê nîne, belko yekîtîya Kurdistana Iraqê li gel Kurdistana Îran û Tirkîyê ye. Ew yeka em dixwazin bêjin mafê netewa Kurd ji bo yekîtîyek di nav dewletek serbixwe de ye.

Eger hel û mercên Kurdistanê wek me di feslên pêşî de behs kirin li ber çav bên girtin, bîr û bawerîya yekitîya gelê Kurd di yekem nêrînê de tiştek xeyalî têt berçav. Em ê pişt re bên ser vê

---

(1) Lenîn: "Mafê Netewan Ji Bo Qedera Xwe Bi Xwe Tayîn Kirinê", cilda 20'an, rûpel: 403.

(2) Eynî serokanî, rûpel: 407.

(3) Lenîn: "Proletarya Şoreşger û Mafê Netewan Ji Bo Qedera Xwe Bi Xwe Tayîn Kirinê", cilda 21'an, rûpel: 416.

meselê. Lê di her hal û karî de yekîtîya Kurdistanê dûr û ne rast bê ber çav, heq e îtîraf pê bê kirin ku Kurd xwedî mafê damezrandina dewletek serbixwe ye. Ji ber ku îtîraf bi mafê qedera xwe bi xwe tayînkirinê ji bo her neteweki bi bê cihêtî bi bê li berçavgirtina zorê, kêmbûna netewe û qonaxa pêşkevtina wî welatî ku ew netewe tê de dijî, îtîraf e bi usula enternasyonalîstî û mafê wekhevbûna netewan. Ev hel û mercê maddî ji bo damezrandina dewletek serbixwe heye yan nîne, ev serxwebûna netewekî, an mana wê di çarçova dewletekê de li gel çend netewên din milên wê yên baş an xirab heye, ev netewe ji wan mafên xwe îstîfade dike yan na û ev daxwaz di bin sîya rejimek sermayedarî de jî cîbicî dibe; an tenê di bin rejimek sosyalîst de, qet yek ji van nabin bibin sebebê wê ku ser şilo bêvekirin ku her netewek mafê qedera xwe bi xwe tayîn kirin û damezrandina dewletek serbixwe heye:

*"Perwerdekirina enternasyonalîstî ya kedkarên welatên serdest divê zêdetir li ser vê noqtê be ku mafê cihêbûna welatên bindest bidin zanîn û piştivanî lê bikin. Ev daxwazên han nayên manên cihê cihê, heta eger îmkana cîbicîkirina cihêbûna berî sosyalîzmê di hezar halan yek halî de hebe."*(4)

Her ji bo vê ye jî ku partîyên çîna karker li Kurdistanê li ser van rewşên asê û nelibar slogana qedera xwe bi xwe tayînkirina netewa Kurd bilind kirine.

Programa Partîya Komunîst a Tirkîyê di sala 1930'an bi vekirî dibêje:

*"Hukumeta karker û gundîyan mafê qedera xwe bi xwe tayîn kirinê heta dereca cihêbûna ji dewletê jî dide kêmayetîyên netewayetî yên niştecîyan (yanî Kurd û Lazan)."*(5)

Di dema Komara Mahabadê de jî Partîya TUDEH a Îranê di eksê dijîtîya tund a kevneperestên Îranê û propaganda burjuwazîyê şovenîst a Îranê de bi azayane parêzgeriya mafê qedera xwe bi xwe tayîn kirina gelê Kurd dikir.

---

(4) Lenîn: "Berhemê Gotûbêj Di Warê Qedera Xwe Bi Xwe Tayîn Kirinê de", cilda 22'an, rûpel: 472.

(5) Programên Partîyên Komunîst ên Rojhilat, Moskova, 1934.

Partîya Komunîst a Iraqê jî di sala 1956'an a dema dîktatorîya Nurî Seîd de, di konferansa xwe ya duyem de nêrîna xwe ya li ser mesela Kurd wiha da xuyakirin:

*"Gelê Kurd li Iraqê beşek ji cihênekirî yê ji netewa Kurd e li hemû Kurdistanê ku di navbera Tirkîyê, Îran û Iraq de hatîye parvekirin... Otonomî li ser bingeha yekîtîya dilxwazî û biratî di xebatê de riya çeraserîkirinek muweqet e ku li gel hel û mercê niha yên herdu netewan (yanî netewa Kurd û Ereb -Nivîskar) rê dikeve û xizmeta qazanca her du netewan dike.*

*Lê çareserîkirinek yekcarî nîne ku cîyê mafê qedera xwe bi xwe tayîn kirinê bigre, her ewqas e ku ew çareserîkirin sebebek girîng e ji bo rizgarîya gelê Kurd û cîbicîkirina yekîtîya netewayetî û amadekirina hel û mercên li bar ji bo wê ku gelê Kurd bikare mafê xwe yê qedera xwe bi xwe tayîn kirinê bikar bîne, ku ji damezrandina dewletek serbixwe ji bo hemû Kurdistanê pêk tê."*(6)

Marksîst di teorî û pratîkê de îtîraf bi mafê qedera xwe bi xwe tayînkirinê û damezrandina dewletek serbixwe ya Kurd dikin. Pêwîst e bê gotin ku partîyên çîna karker ên wan welatên ku Kurd tê de dijîn, hinek caran ji ber rewşên dijwar nekarîne bi awakî esasî mesela Kurd lêk bidin, lê ev tiştek e ku ji bo partîyên kedkarên welatên din jî çêbûye û çêdibe. Yek ji van sebeban ku vê mesela han a dijwar, dijwartir dike, ev e ku tenê bi bilindkirina slogana mafê qedera xwe bi xwe tayîn kirinê naqede. Ji ber ku mesela netewayetî li her welatekî riya çareserkirina xwe ya taybetî heye.

## 2- Daxwaza Damezrandina Dewletek Serbixwe ya Kurd

Hinek caran daxwaza pêkanîna dewletek serbixwe ya Kurd daxwazek kevneperst têt hesêb kirin û komunîstan tîne ser wê bawerîyê ku dijîtîya vê yekê bikin. Ewên xwedîyê vê bîr û ba-

(6) Belavoka Konferansa Duyem a Partîya Komunîst a Iraqê ku di Tîrmeha sala 1956'an de hat çêkirin.

werîyê ne, gelek caran vê dikin bahane ku ditirsin derebegên wê dewletê desthilatê bigrin dest û aşkera ye ew jî dijminê demokrasî û sosyalîzmê ne û bi vî awayî Kurdistan dibe kela kevneperestî di Rojhilata Navîn de. Lê ev nêrîna han bi tevayî nêrînek şaş e û serokanîya wê tênegihîştina rewşa Kurdistanê ya îro ye. Ew lêkolînên me li ser peywendîyên çandinî yên civaka Kurdistanê kirin, nîşan dide ku ji zû de ye serokatîya tevgera rizgarîxwazî di destê derebegan de nemaye. Ji ber ku peywendîya derebegî ber bi xelasîyê de diçe û burjuwazî pêş de diçe û bihêz dibe. Madem wiha ye, ew dewleta Kurdî ku dê derebegan tê de serokatî bikira piştî Şerê Cîhanê yê Yekem dema xwe tijî kirîye. Nabe ji bîra me biçe ku dewleta serbixwe ya Kurd bi bê xebatek rizgarîxwazî ya asê ku rola serekî tê de dikeve ser milê burjuwazîya netewî û hêzên şoreşger, danamezre.

Ev gotinên me yên berî bi mana şilovekirina li wan merkezên aborî yên girîng û wan nifûzên taybetî nîne ku heta niha derebegên Kurd xwedî ne û daxwaza me li ser wan peywendîyên eşîretî û derebegî ne ku xizmeta qazanca çîna derebeg dikin. Me berî niha got ku derebeg di nav civaka Kurd de bingeha herî girîng a hêzên emperyalîstan in. Ji ber vê nabe ji bîra me biçe ku ew kosp û astengek gelek zêde dixin ser riya rizgarîya netewayetî ya Kurd, her wek di dema Komara Mahabad de derket, ku derebegên Kurdistanê bûn nokerên hukumeta Îranê. Di yekem sala dawî ya şoreşa 1958'an a Iraqê de derebegan li dijî Komara Iraqê şer kirin ku wê demê rêbazek demokratîk dabû pêşîya xwe û hukumeta Îranê û monopolên petrolê jî di wî şerî de pişta derebegên Kurdan girtin.

Ew propagandên jehr ên dewletên Rojava belav dikin ku goya ew ji rewşa hukumeta Tirkîyê, Îran û Iraqê a li hemberî Kurdan ne razî ne, gelek caran vî hestê han pêk tîne ku ev dewletên han alîgirên damezrandina hukumetek serbixwe ya Kurd in. Lê di hêla teorîyê de tu îmkan nîne ku dewletên emperyalîst piştgirî li serxwebûna Kurdan an neteweyekî din bikin, ji derveyê wê ku eger ew dem naçar bin tu riyek dijîtî kirinê nemîne. Di hêla pratîkê de jî tu rê jê re nayê dîtin ku rojava di eksê daxwazên hevpeymanên di Peymana CENTO de (yanî Îran û Tirkîye) daxwaza damezrandina dewletek serbixwe ya Kurd bikin. Pişt re rojava çi hêvîyek bi wê heye ku karbidestên rojên bên ên Kurdistana ser-

bixwe ji hukumetên niha yên Îran û Tirkîyê bê îradetir bin? Me berî niha ronî kir ku Peymana CENTO li dijî tevgera rizgarîxwazî netewayetî û bi taybetî li dijî her têkoşînek gelê Kurd e. Rojnama Le Monde ya Frense ku nêrîna rojava li hemberê tevgera netewayetî ya Kurd ne razî ye, wiha dinivîse:

*"Hukumetên rojava ji bo piştgirîya tevgera rizgarîxwazîya netewayetî ya Kurd dudil in, ji ber ku ditirsin hevpeymanê wan Tirk û Îranî ji vî karî dilê wan biteqe.*[7]

Heta niha jî îmtîyaza derxistina petrola Kurdistanê di destê monopolên emperyalîstan de ye û tenê li Kerkukê salê 400-500 mîlyon dolar qazanc bi destê wan dikeve. Di hel û mercên navnetewî yên niha de çi cure guherînek bi ser rewşa Rojhilata Navîn de bê, dibe netîcek çaverênekirî ji bo qazanca petrola rojava. Hêzên rojava jî gelek baş bi vê gihîştine, ji ber vê ji hemû kesî zêdetir hewl didin "ewleyî û îstîkrara" Rojhilata Navîn û desthilata sîyasî, aborî û stratejîya xwe ya di vê melbendê de biparêzin.

Emperyalîst jî dizanin îro çi bîr û bawerîyek di nav Kurdan de peyda bûye, ji ber vê tu wextê amade nînin xwe tûşî vê problemê bikin ku serxwebûna Kurdan ji wan re çêbike. Ew dizanin Kurdistana serbixwe bi kêmasî wê problemê ji wan re çêke ku tevgera rizgarîxwazî netewî li her ciyekî ji emperyalîstan re çê dike. Vê carê rewşa niha ya wasitan jî emperyalîstan perîşan kirîye, ji ber ku tevgera Kurd heta tê radîkaltir dibe û bîr û bawerîya şoreşgerî di nav gelê Kurd de zêdetir belav dibe. Ji ber vê emperyalîst car carnan piştgirîya xwe ji bo xebata gelê Kurd nîşan didin û hewl didin di riya nifûza derebegên mezin de dest bavêjin nav tevgera rizgarîxwazîya netewayetî ya Kurd.

Desttêkirina emperyalîzmê a nav tevgera rizgarîxwazîya netewayetî tiştek nû nîne, ev desttêkirina han rewşek e ku ji kevin de heta niha ji bo ji rêderxistina xebatê û ji bo wê ku di dema pêwîst de ji pişt ve zehmetîyê jê re çêke, danîne ber xwe. Evên han tev nîşan didin ku tu wextê Kurdistana serbixwe li gel planên emperyalîzmê nameşe.

Em wisa bihesibînin ku rojekê burjuwazîya netewî li dijî emper-

(7) Le Monde, 11 Tîrmeh 1963.

yalîzmê li Îran, Iraq û Tirkîyê desthilatê girt destê xwe, yan guherînek demokratîk a kûr bi ser van welatan de hat, gelo di vî halî de emperyalîst ji bo handana Kurdan li dijî van welatan hewl nadin û pişgirî li daxwaza serxwebûna Kurdistanê nakin? Aşkera ye tiştek wiha gelek ne dûr e. Lê dema ku emperyalîstan ji bo parastina qazanca xwe pişgirî li cihêbûna Kurdistanê kirin, nîşana wê ye ku xebata dijî emperyalîzmê di wî welatî de gelek pêş de ketîye û gelê Kurd jî di hêla xwe de ji bo yekîtî û hevkarîya li gel netewên din ên van welatan destkevtîyên girîng di xebata xwe de bi dest xistine. Di hel û mercek wiha de aşkera ye ku hemû hewl û kirinên emperyalîstan ji bo rakêşana gelê Kurd ber bi plan û lîstikên xwe de, vala diçe. Her di pratîkê de jî piştî şoreşa 1958'an a Iraqê derket ku nêzîkî piranîya hemû Kurdên di bin serokatîya Partîya Komunîst a Iraqê û Partîya Demokrat a Kurdistanê de bi tundî pişta hukumeta Ebdulkerîm Qasim girtin. Nimûna ronî jî ji bo vê ew daxwaza xurt bû ku gel beramberî bûyerên bihara sala 1959'an li Musilê rabûn pê û her wiha li dijî wî planî sekinî ku şirketa petrola Iraqê di Tîrmeha sala 1959'an de li Kerkukê rêk xist.

Madem wiha ye, qazanca tevgera rizgarîxwazîya netewayetî ya Kurd bi tu awayî li gel qazanca emperyalîstan rê nakeve û di rojên bên de jî emperyalîzm dibe yekemîn dijminê serxwebûna Kurdistanê. Ev ji me re vê ronî dike ku daxwaza damezrandina Kurdistanek serbixwe tu wextî gavek kevneperestî û ji bo alîgirîya emperyalîzmê nîne.

Wisa têt berçav ku cihêbûna Kurdistanê dibe sebebê pêkhatina dewletek biçûk û di warê aborî de lawaz, ku ev jî di hêla pêşdeçûna aborî de tiştek qebûlkirî nîne. Lê ji derveyê vê ku her niha gelek dewletên ji Kurdistanê biçûktir hene, serxwebûna netewayetî ya wan tu wextî nabe asteng li ser riya yekîtîya aborîya wan di rojên bên de, yan pêkanîna civakek aborî ya mezin ku çend dewlet di nav xwe de bicivîne. Bi eksê vê, serxwebûna sîyasî bi qonaxek pêwistî ya riya wê yekîtîya aborî têt hesêb kirin ku li ser bingeha parvekirinek nû ya karê navnetewayetî damezra be.

Madem wiha ye, cihêbûna Kuristanê û damezrandina dewletek serbixwe ya Kurd tu wextî nayê mana ji hev veqetandinê, piştî vê

serxwebûnê hel û mercên pêwîst ji bo pêkanîna yekîtî di navbera wan hemû dewletên melbenda Rojhilata Navîn de pêk têt, ku dikare bi awakî federasyon be. Marksîzm tu wextî pêkhatina çend dewletên biçûk, an perçe-perçekirina dewletên mezin bi ser çend dewletên biçûk qebûl nake, lê her di wî wextî de cihêbûna netewa bindest gavek dizane ku rê ji bo yekîtî û cîyê xwe rûniştina sîyasî û aborî li ser bingeha demokrasîyê xweş dike. Di navbera van herdu gotinan de tu dijîtî nîne. Ji ber ku îtîraf bi mafê cihêbûnê ji hêla teorîyê ve hemû asteng û kospên ser riya yekîtîyê radike, ji ber ku ev yekîtîya han li ser bingeha wekhevî û demokrasîyek temam têt damezrandin. Di nav zeman de peywendîya beramberî û wekhevî di navbera netewên serdest û netewên bindest de pêk tê. Hel û mercên berçav ên ne beramberî yên aborî, sîyasî û kulturî di pêşkevtina netewa serdest de derdikeve. Hel û mercên manewî jî di awayê bîr û bawerîya netewa serdest de derdikeve ku bi çavekî sivik û şovenîstî bi netewa bindestê xwe re hereket dike. Di milek din de xelkên netewa bindest her wext bi şik li netewa serdest dinêre û bi çavê nasyonalîzmeke teng li hemû meselan difikire. Demek dirêj jiholêrakirina van hel û mercên madî û manewî re dixwaze. Pêwîst e berî hemû tiştî bawerîya civakên netewa bindest bikişîne ku civakên netewa serdest bi gîyanek enternasyonalîstî tê perwerdekirin. Lenîn gelek ronî vê aşkera dike û wiha dibêje:

*"Em ji ber vê daxwaza qedera xwe bi xwe tayîn kirinê, yanî cihêbûn û serxwebûna netewa bindest nakin ku ji hev cihêbûn û pêkhatina çend dewletên biçûk ji me re baş e, belko bi eksê vê, ji ber vê ye ku em dewletên mezin dixwazin, me yekîtî divê û heta me têkelbûna çend netewan divê, lê li ser bingehê demokrasî û enternasyonalîzma rastîn, ku ew jî bi bê hebûna mafê cihêbûnê îmkana cîbicîkirina wê nîne".*[8]

Her çendîn Marksîst piştgirîya mafê cihêbûnê dikin, lê nayê wê manê her wextî vê cihêbûnê qebûl dikin. Ji ber ku di qebûlkirina mafê cihêbûnê de:

---

(8) Lenîn: "Proletarya Şoreşger û Mafê Netewan Ji Bo Qedera Xwe Bi Xwe Tayîn Kirinê", Çapa Çekî, cilda 21'an.

*"Qet rê li Marksîstên wê netewa bindest nayê girtin ku li dijî cihêbûnê rawestin, her wekî qebûlkirina mafê telaq avêtinê (telaq berdan) tu wextî riya rawestana li dijî telaq avêtinê nagire".*(9)

Me di pêş de got Marksîst di hêla bîr û bawerîyê de alîgirê cihêbûna netewa Kurd û damezrandina dewletek serbixwe ya Kurd in. Lê di vir de wezîfa komunîstên netewa serdest û netewa bindest ji hev cihê ye. Ji ber ku bi gîyanek enternasyonalîstî perwerdekirina civakên xelkê di welatên hukim dikin de, pêwîst e li ser têgihiştînî û parêzgerîya mafê qedera xwe bi xwe tayîn kirina netewa bindest bê kirin, lê komunîstên netewa bindest ne tenê nabe propagande ji bo cihêbûnê bikin, her wiha divê zêdetir hewla cîbicîkirina slogana yekîtîyê bikin daxwaza netewa xwe. Ev jî ne tenê ku qet dijîtî tê de nîne, her wiha tenê riya bi hev nêzîkbûna netewa mezin û biçûk e, madem wiha ye, di vir de armancek heye ku du kes her yek ji wan di riyek din de diçin wê armancê.

Di hel û mercên niha de ku berhemê pêşdeçûneke dîrokî yê dûr û dirêj e, tu riyek din ji bo gihîştina armanca dostayetî, wekhevî û enternasyonalîstî nîne û nikare bibe.

Ev yeka han bi tevayî ji bo mesela Kurd jî rast e. Gelo di hel û mercên niha yên xebatê de em dikarin daxwaza serxwebûna Kurdistanê bikin **mesela rojane**, li hemberê vê emperyalîzm di Rojhilata Navîn de dijminê serekî ye û heta niha netewên serdest jî ku ji bindestîyê rizgar nebûne? Her wek me di pêş de got, ev daxwaza han ji bo Kurdan ji derveyî dubendîyê pê ve nayê tu manekê. Madem wiha ye, em nikarin cihêbûna beşek ji Kurdistanê wek Kurdistana Îranê bi serê xwe, damezrandina dewletek serbixwe ya Kurd bihesibînin. Niha eger Kurd ji bo nimûne tenê li Îranê jîyabûna rewş gelek sadetir dibû û mesela Kurd ji mesela netewekî pêk dihat ku di nav dewletekê de dijî. Her wiha eger Kurdistan kolonî jî bûya rewşa wê her rehettir dibû. Lê dijwarîya mesela Kurd di vir de ye ku Kurdistan di navbera çend dewletan de hatîye parvekirin, ku netewên din ên van dewletan jî bindestîyek sîyasî û aborî tam dikin.

---

(9) Lenîn: "Mafê Netewan Ji Bo Qedera Xwe Bi Xwe Tayîn Kirinê", çapa Çekî, cilda 20'an, rûpel: 418.

INSTITUT KURDE de PARIS BIBLIOTHÈQUE

Daxwaza serxwebûna Kurdistanê wek sloganek muwaqet zerarê dide xebata bi hev re ya wan netewan ku di nav yek welatî de bi hev re dijîn û her di wî wextî de jî sloganek e ku niha îmkana serkevtina wê nîne. Niha em bizanin heta dema ku emperyalîzm di holê de ye, daxwaza qedera xwe bi xwe tayîn kirina netewan cîbicî dibe? Derxistina emperyalîzmê bi serê xwe karek dirêj e û çend alîyên wê jî hene. Madem wiha ye, divê gelê Kurd li dijî qazanca aborî ya emperyalîzmê, yanî li dijî monopolên petrolê, dijî Peymana CENTO û dijî hemû peymanên vê nîzamê xebat bike. Hemû evên han jî gelê Kurd ji bo hêla xebata bi hev re ya li gel netewên din radikêşe.

Bi kurtî, em digihîjin vê netîcê ku di qonaxa niha de slogana serxwebûna Kurdan dî hêla teorîyê de sloganek şaş e. Nemaze di dema niha de ku nifûza emeryalîzmê li Rojhilata Navîn kêm dibe û burjuwazîya netewî li wan welatên ku Kurd tê de dijîn desthilatê digrin destê xwe, her wek sala 1958'an li Iraqê heta derecekê wiha bû. Li gor teorîya Marksîzmê tiştek tabîî bû ku burjuwazîya netewî ya Ereb li Iraqê dijîtîya daxwazên netewayetî yên gelê Kurd bike û me di pratîkê de jî dît, her wek Kemalîstan piştî Şerê Cîhanê yê Yekem êrîşê birin ser Kurdan, burjuwazîya Iraqê jî êrîşek xwînawî ya tund li dijî hevwaletîyên xwe yên Kurd destpê kirin.

Eger em vê li ber çav bigrin ku burjuwazîya Iraqê kêmtir pêgihiştîye û zêdetir perçiqandinê dîtîye, lawaztir e û her ji ber vê radîkaltir e jî, ew mewqifên beramberê daxwazên netewayetî yên Kurd xistîye kar, divê em bizanin mewqifên burjuwazîya Tirkîyê û Îranê yên beramberî tevgera rizgarîxwazîya netewayetî ya Kurd ji vê baştir nabe, ji ber ku burjuwazîya van her du welatan li gor ya Iraqê zêdetir pêgihiştî ye û kêmtir hatîye perçiqandin, bi hêztir e û her ji ber vê jî xwedî hestek bihêz ê xweparêzî û şovenîstî ye. Madem wiha ye, heta burjuwazîya netewî li ser kar be û heta rejîm rejîmên sermayedarî be, gelê Kurd mafê qedera xwe bi xwe tayîn kirinê bi dest naxe. Di milek din de jî rast nîne em bigihîjin vê netîca han ku goya têkoşîn ji bo bidestxistina mafê netewayetî û xebat ji bo hinek daxwazan heta wê dema ku sosyalîzm bi ser dikeve, têkoşînek bê feyde ye. Ji ber ku daxwazên netewayetî wek her daxwazeke demokratîk pêwîst e xebat jê re

bê kirin û heta dema desthilat di destê kevneperestî yan burjuwazîya netewî de ye, ji bo cîbicîkirina her daxwazek biçûk jî hewldan û têkoşînek zêde dixwaze, lê di hel û mercên niha de jî îmkanên cîbicîkirinê hene.

## 3- Riya Rizgarîya Gelê Kurd

Eger gelê Kurd, yanî piranîya gel, ne tenê demokrasîyê bixwaze azadî û serxwebûn jî bi destê wî keve, tenê yek rê li pêşîya wî ye, ew jî mildana ber tevgera dijî emperyalîzmê ya hemû Rojhilata Navîn e. Gelê Kurd di xebata xwe ya rizgarîxwazî û netewayetî de ji bilî demokratên welatên cîran û di ser tevan de jî hêzên şoreşger xwedî dost, hevpeymanek her alî û berdewamî nîne. Em bi awakî din bêjin, heta dema ku çîna derebeg û hetta burjuwazî jî desthilat di dest de be, mesela netewayetî ya Kurd bi tevayî nayê çeraserkirin, madem wiha ye, di çarçova rejimên sermayedarî de îmkana çareserkirina mesela Kurd di hîmî de ji hêla sîyasî û netewayetî de nîne. Çareserkirina mesela Kurd di Rojhilata Navîn de bi pêşkevtina demokrasî û sosyalîzmê ve girêdayî ye. Di vir de bi tevayî gotinên belavoka dîrokî ya partîya komunîst rast derdikeve ku dibêje:

*"Dema dawî bi perçiqandina însan a bi destê însan bê, perçiqandina neteweki a bi destê neteweyekî din jî dawî pê têt".*[10]

Mimkun e hinek ji nasyonalîstan ku bi vê netîcegirtinê razî nînin, vê pirsa han bînin holê: dema ku hêzên şoreşger li wan welatên ku Kurd tê de dijîn desthilatê bigrin destê xwe, qedera xwe bi xwe tayîn kirina gelê Kurd çawa dibe? Aşkera ye bersîva vê pirsê ronî ye: ew dem Kurd yekîtîyekê pêk tînin û dewleta xwe ya serbixwe dadimezrînin. Lê ev zû bi zû cîbicî nabe û hêdî hêdî pêş de diçe.

Çendîn çarçova sînorê demokrasîyê bi pêş de bikeve, gelê Kurd destkevtîyên zêdetir ji bo xebata xwe bi dest dixe. Gelek mimkun

---

(10) Marks û Engels:"Programa Partîya Komunîst", Nivîsînên Helbijartî, çapa Îngilîzî, cilda 1'an.

e di destpêkê de li hemû wan welatên ku Kurd tê de dijîn, mafê otonomîyê di çarçova wî welatî de ji bo Kurdan bê temînkirin. Dîyar e di qonaxa niha de slogana otonomî ji bo Kurdan di çarçova her yek ji wan welatan de ji her sloganekî wê rastir be.

Bi vê re jî, hetta cîbicîkirina otonomîyê jî pêwîstî bi hewl û têkoşînek zêde ye. Divê berê îtîraf bi hebûna netewa Kurd û zimanê Kurd bê kirin, bi taybetî li Tirkîyê û Îranê. Tenê di wî wextî de îmkan heye ku otonomî di warê aborî, sîyasî, kulturî û îdarî de ji bo Kurdan bê temînkirin. Ji vir jî li her yek perçê Kurdistana Îran û Iraqê komarek federal di çarçova wan herdu dewletan de bê damezrandin. Ew dem ew herdu komar hêdî hêdî nêzîkî hev dibin û heta di dawîyê de bi tevayî dibin yek û pişt re jî beşên din ên Kurdistanê jî dikevin ser vê dewleta nû damezrayî. Her wextê yekîtîya Kurdistanê ji me re girîng e, lê ev mesela han tenê ji bo Kurdan di holê de nîne, her wiha ji bo Ereban jî ev mesele heye û yekîtîya Kurdan ji yekîtîya Ereban nayê cihê kirin. Rojek divê Erebên Iraqê bi Erebên welatên din re bibin yek. Ev karê han tesîr dike li ser yekîtîya netewa Kurd jî ku beşek zêde jê bi Erebên Iraq û Surîyê re dijîn.

Gelo digunce ku tenê beşek Kurdistanê rizgar be û dewletek serbixwe ya Kurd bê damezrandin? Tiştên wiha kêm çaverêya wan têt kirin, li gel wê ku gelek jî dûr nayê dîtin. Her çend em naxwazin li ser vê behsê bi kûrî bisekinin, lê em dikarin bêjin şoreşger piştivanîya pêkhatina van cure dewletan jî dikin, bi wî şertî ew gav ji bo qazanca cebha dijî emperyalîzmê û mesela demokrasî û sosyalîzmê li Rojhilata Navîn be, Şoreşger, piştî desthilata sîyasî ji destê çîna serdest derxist, her ji xwe re jî li wî beşê Kurdistanê ku desthilatê tê de girtîye destê xwe, bi alîkarîya çîna karker a welat ew cure dewlet dadimezrînin(11). Lê ev tenê demek e ku em bizanin pêkanîna dewletek demokratîk a serbixwe li beşek Kurdistanê dibe nimûnek ku alîkarîya hîşyarbûna netewa

(11) Serkevtina şoreşa sosyalîzmê di welatekî de û damezrandina sosyalîzmê di wî welatî de, li hemberê wê dema ku welatên din her wiha di bin rejimên kevin de bimînin tiştek gelek zêde dûr e. Di eksê vê parvebûna hêzan di cîhanê de û her wiha rewşa giştî ya Rojhilata Navîn nîşan didin ku guherîn gelek rehettir diçin pêş -Nivîskar.

Kurd li beşên din ên Kurdistanê dike û dibe alîkarê damezrandina demokrasî û sosyalîzmê li hemû Rojhilata Navîn.

Mesele tenê li ser vî şiklî nîne ku mafê qedera xwe bi xwe tayîn kirinê tê de têt temîn kirin, ji ber ku bi gelek sebebên cur bi cur ve girêdayî ne. Her wiha mesele ev tenê jî nîne ku gelê Kurd tenê bi nav xwedî dewletek serbixwe be, belko mesele ew e ku gelê Kurd bi rastî xwedî mafê qedera xwe bi xwe tayînkirinê be û bi azadî bikare wî mafî bikar bîne. Madem wiha ye, mesela girîng di vir de naverok e. Niha em dikarin gelek welatên wisa peyda bikin ku tenê bi nav serbixwe ne. Wek nimûne Urdun welatek serbixwe ye bi nav hakimê xwe ye, xwedî sirûda dewleta xwe, perê xwe û ala xwe ye û nûnerê wê li Komela Netewên Yekgirtî jî heye. Di milek din de Komara Ozbekîstan li Yekîtîya Sovyetê dewletek serbixwe nîne û xwedî perê xwe yê taybetî nîne û nunerê wê jî li Komela Netewe Yekgirtî nîne, ji ber ku yek ji wan komarên Yekîtîya Sovyetê ye. Lê ji her kesekî re ronî ye ku Ozbekî netewek serbest in û ji xwe re bi azadî qedera xwe tayîn dikin, li hemberî vê gelê Urdun ji hemû mafekî rêvebirina serbixwe ya kar û barên welat bêpar e.

Ji ber vê niha û rojên bên jî mesela herî girîng ji bo gelê Kurd ev e ku bikare bi destê xwe qedera xwe bi xwe tayîn bike. Me di pêş de got gelê Kurd yekîtî çêdike, lê mebesta me ew nîne ku gelê Kurd ji netewên cîran cihê dibe. Ji ber ku gelek mimkun e yekîtîyek dilxwazî ya gelek mezin pêk bê ku bi tevayî ji bo qazanca gelê Kurd û ya netewên din be. Ji ber vê ev sînorên niha di rojên bên de ewqas girîng nabin. Yekîtîyên dilxwazî yên netewan ên li ser bingeha helbijartinek azad, di rojên bên de tenê bi awayê peywendîya enternasyonalîstî dibe. Ev jî riya çareserkirina Lenîn a ji bo mesela netewayetî ye ku yekem car li Yekîtîya Sovyetê biserkevt. Lê damezrandina yekîtîyek bi azadî karek dirêj e û pêwîstî bi wext û têkoşînek zêde heye.

Niha nîv sedsal di ser wê demê re derbaz dibe ku Lenîn nivîsandîye:

*"Ew yekîtî bi carek pêk nayê. Divê ev yekîtîya han bi sebr û dûrbînek zêde ve bê cîbicî kirin, ji bo vê qet tiştek têk nedin û riya çûna bi ser wan şik û dudilîyan bibînin ku çend sedsal e perçiqandina derebegî, sermayedarî, milkdarîya taybetî û prob-*

*lemên parvekirina milkên taybetî û ji serî heta binî parvekirina ji bo me bicî hiştiye".*(12)

Çareserkirinek bingehîn a problemên aborî yên welatên Rojhilata Navîn, qazanc û problemên hevbeş ên gelên vê navçê, çêbûna coxrafya vê melbenda, ew peywendîyên aborî û kulturî ku di nav netewên vê melbendê de damezrane û pişt re giringîya petrolê ji bo aborîya piranîya van welatan, hemû ev û gelek meselên aborî û sîyasî ku di rojên bên de wê bên pêş, pêwîstîya wan bi yekîtîyek dilxwazî di navbera netewên Rojhilata Navîn de heye, yekîtîyek ku li ser bingeha demokrasî, enternasyonalîstî û peywendîyên sosyalîstî hatibe damezrandin. Ev jî di warê aborî de nayê mana pêkanîna çend aborîyên netewayetî yên mînyaturî, belko têt mana pêkanîna çend beşên mezin an bi kêmasî navçeyî (herêmî). Tenê sosyalîzm e ku dikare mesela netewayetî li ser bingehek wekhevîya netewan çareser bike. Sosyalîzm dikare di demek kurt a dîrokê de ciyê hemû sebebên esasî yên wan newekhevîyan ku ji berê de hebûye tijî bike û ev sebebên han jî ji paşkevtina aborî û kulturî ya netewên bindest pêkhatine. Lê di warê mesela netewayetî de ya pêwistî bi demek dirêj heye; guherîna awayê bîr û bawerîya xelkê ye, yanî xwe mezin dîtin û şovenîzma netewa mezin û nasyonalîzma şikî ya netewa biçûk e. Madem wiha ye, rakirina newekhevî di navbera netewan de pêwîstî bi demek zêde û hewl û xebatek berdewamî ye ji bo wê ku civakên xelkê bi gîyanek enternasyonalîstî bên perwerdekirin.

(12) Lenîn: "Namek Ji Bo Karker û Gundîyên Ukraynayê", çapa Çekî, cilda 30'an, rûpel: 294.

# NETÎCE

Armanca me ya ji lêkolîna peywendîyên çandinî û pêşdeçûna dîroka van peywendîyan, derxistin û nîşandana hemû wan peywendîyên civakî bû ku civaka Kurdistanê ya îro jê pêk hatîye. Me nîşan da ku gelek hel û mercên hundûrî û derve bûne sebebê wê ku hêzên berhemdar ên gundên Kurdistanê û civaka Kurdistanê bi giştî, gelek hêdî bi pêş de bikevin.

Di her demek dîyarkirî ya dîrokê de gelek sebebên cuda cuda tesîr kirine li ser merhela pêşkevtina vê melbendê, wek êrîşa eşîretên bîyanî û ew şerên ku heta dawîya sedsala 19'an di pratîkê de dom kirine û kêmbûna hejmara nifûsê û bêliyaqetîya hukumetên merkezî û h w d...her wekî dîtina çend riyên nû ji bo Hindîstanê di riya başûrê Afrîka re û Kanala Suveyşê zerarê bi rola cîhanî ya vê melbendê daye. Li gel vê jî sebebê herî girîng ê kêmtir pêşkevtin, an pêşnekevtina vê melbendê di berhemdarîyê de, hebûna peywendîyên aborî yên tabîî bûne. Çend sedsal ranta berhemê di holê de bûye û wek me di pêş de got aborîya tabîî ku awayê ranta berhemê tê de ye, bûye sebebê jîyanî di çandinîyê de. Peywendîyên guherîn û bazara hundurî jî gelek hêdî pêşde diçû. Peywendîyên çandinîyê jî ji ber wê ku naveroka serekî ya peywendîyên berhemdarî bûn, pêşkevtina hêzên berhemdarîyê gelek dereng xistîye.

Heta sedsala 19'an ku Kurdistan bû beşek ji bazara sermayedarîyê, civaka Kurdewariyê di pêşnekevtinê de maye. Ji wê demê şûn de jî derebegî û peywendîyên derebegî bûne naveroka herî girîng û esasê civaka Kurdistanê. Ji derveyî van paşvemayî û peywendîyên eşîratî tesîra wan her di nav civakê de maye.

Peywendîyên Kurdistanê bi bazara cîhanê re hinek guherînên girîng bi xwe re anîne. Wek cîgirtina milkdarîya derebegî û peydabûna cihêbûn li gundan û qutbûna milkdarîya muşterek, hilweşîna peywendîyên eşîretî, cîbicîbûna parvekirina civakî ya kar, pêşdeçûna bazara hundur û derve û peydabûna burjuwazîya netewî ya Kurd. Lê di ser hemû van guherînan de jî, wek me di pêş de got, peywendîyên derebegî di bingehê de wek xwe mane.

Her çendîn di wê demê de peywendîyên derebegî hakim bûn, lê cardin paşvemayên peywendîyên eşîretî û patrîyarkî jî mabûn û peywendîyên sermayedarî jî dest bi pêşveçûnê kiribûn. Di netîcê de peywendîyên eşîretî ji holê rabûn û peywendîyên derebegî jî hêdî hêdî kêm bûn û peywendîyên sermayedarî berbipêş de çûn. Dîyar e problemên gelek zêde di pêşîya vî karî de bûn û çend sebeb bûbûn asteng li pêşîya vê pêşdeçûnê. Derebeg ku pîyên herî girîng ên tebeqa fermanrewa bûn, desthilata xwe ya sîyasî ji bo ragirtina çerxa pêşkevtina civakê û hiştina peywendîyên berhemdarîyê dixistin kar.

Di sedsala 19 û 20'an de emperyalîzm wek sebebek derve tesîrek zêde kir li ser jîyana civakî. Di wê demê de bûyerek çêbû ku natebayî di nav de hebû: ji alîkî de emperyalîzmê wek bilintirîn sewîya sermayedarîyê hewl dida welatekî têke bin destê xwe û dest deyne ser darayî û serweta wî û bike meydan ji bo pêşdebirina sermayê, ku ev kar jî di rastîyê de pêşdebirina peywendîyên berhemdarî yên sermayedarîyê ye. Ji alîyek din de jî di hundurê welat de derebeg tenê hevpeyman û ciyê pîyên emperyalîzmê bûn. Yanî emperyalîzm li gel hêzekê rêketibû ku dixwest peywendîyên rizîyayî yên kevin bimînin. Li dijî wan hêzan emperyalîzmê pişta derebegan digirt ku nedixwest dawî bi zordarîya netewayetî bê û peywendîyên derebegî ji holê bên rakin û peywendîyên nû yên pêşkevtî di şûnê de bên danîn. Evên han tev bûn sebebê bihêzbûna xebata dijî emperyalîzmê û xebata dijî zordarîya netewayetî.

Sewîya hêzên berhemdarîyê ku me di pêş de behs kir, bi tevayî li gel awayê ranta axê dimeşe. Ji derveyê ranta berhema ku awayê serekî yê ranta axê ye, ranta kar û ranta pere jî heye û li hinek melbendan ranta axê awayê ranta sermayedarîyê bi xwe ve girtîye. Ranta axê derdikeve ku dibe sebebê guherîna peywendîyên derebegî bi peywendîyên sermayedarî. Lê ev guherînên han karekî gelek li ser xwe û dirêj dikişînin. Ji ber ku gundî ku bi şiklî azad e, ji çend hêlan ve bi axê ve girêdayî ye û di pratîkê de nikare di cî de bihêle. Madem wiha ye, tevgera hêzên kar çi li bajar çi li gundan gelek berteng e. Peywendîyên derebegî her di wê demê de astenga li ser riya bazirganî û guherînên azadî jî ne û xwedî milk û mirovên dînî û bazirganên bajêr jî di vî warî de rolek wan a xirab heye, lê li gel van tevan jî ranta berhemê sebebê esasî yê pêşnekevtina hêzên berhemdar ên Kurdistanê têt zanîn.

Nizmbûna berhemdarîya kar jî berî her tiştî dikeve ser peywendîyên kevn ên berhemdarîyê. Wasitên berhemdarîyê bê hed destpêk in û pêwîstîya wan bi karekî zêde yê cotkaran heye. Nizmbûna sewîya berhemdarîya kar di vir de derdikeve ku berhemdarîya çandinîyê bi tevayî li ser berfirehbûna zêdekêlîna çandinîyê sax bûye. Me di pêş de behsa bêkarîya gundên Kurdistanê kir, li gel vê xelk birçî ye, beşê zêde yê wan hevwelatîyên ku dikarin kar bikin, gelek kêm kar bi destê wan dikeve. Ew nikarin bi azadî ciyê xwe bigûherin ji bo bajêr. Her çendîn di hinek melbendan de koç kirin heta derecekê azad e, lê ewên diçin bajaran jî kêm ji bo wan kar peyda dikin.

Di xwedîkirina heywanan de jî peywendîyên derebegî û eşîretî di holê de ne. Di vî liqê han ê çandinîyê de peywendîyên hobê gelek bi qîmet in. 'Orf û adetên hobê rê ji bo pêkhatina civaka muşterek xweş dike ku bi giştî dikarin rolek baş di guherîna warê xwedîkirina heywanan û zîraetê de bilîzin.

Em ji beşên pêş ên vê behsê netîce distînin ku ew kesên li Kurdistanê û civaka Kurdistanê wek civaka eşîretek koçer dinêrin, gelek şaş in. Ji ber ku eşîretên koçer di me'na gelemperî ya gotinê de, li Kurdistanê her nînin. Eşîretên nîvkoçer jî bi tevayî her kêm dibin. Ji ber çend sebebên cuda cuda û bi taybetî ji ber peywendîyên Kurdistanê bi bazarên cîhanî û ber bi pêşveçûna peywendîyên ser-

mayedarî, eşîret heta derecekê gelek guherî ne. Her çendîn heta niha jî paşvemayên peywendîyên eşîretî mane, lê eşîret bi awayê xwe yên eslî nemane û hêdî hêdî hildiweşin.

Madem wiha ye, civaka Kurdewarî, ne wek hinek wan welatên Afrîkayê yên ku van dawîyan gihîştine serxwebûnîya xwe, civakek eşîretî ne.

Lêkolîna rewşa gundîyan derxist ku sewîya jîyana gundîyên Kurd yek ji wan nizmtirîn sewîya jîyanê ye di cîhanê de. Ev jî ji sewîya warîdata serane derdikeve ku salê digihîje 100 dolaran. Wek me di pêş de jî got warîdata salane ya beşê piranîya gundîyan ji 30 dolaran jî kêmtir e.

Asoya pêşdebirina sanayîyê jî heta derecekê gelek tarî ye û ev jî dibe astenga pêgihîştina çîna karker û burjuwazîya netewî di welat de. Bi awakî giştî em dikarin bêjin ku girîngtirîn astenga pêşdeçûna sanayîyê, di hundur de peywendîyên derebegî û li derve jî tesîra emperyalîzmê ye. Ev herdu sebebên han bûne asteng li ser riya damezrandina sanayîya hundur û bi giştî pêşkevtina welat, ji derveyê vê jî ku ew di bingehîn de astenga pêşdeçûna sanayîya welat in.

Hemû ev sebebên han di berfirehkirina sist û hêdî ya bazara hundur de jî tên dîtin. Ev jî netîca peywendîyên berhemdarî û nifûza monopolên bîyanî ye ku bazirganîya derve wek wesîlek bi tesîr di dest de ye. Bazaran tijî ji tiştên bîyanî dikin û ji ber nizmbûna sewîya berhemdarîya kar jî sanayîya hundur nikare raqabet li gel wan bike. Ji ber ku dewlet jî alîkarîyê nade, sanayîya hundur hêdî hêdî ber bi xelasîyê de diçe.

Bi kurtî, Kurdistan melbendek paşkevtî ya aborî ye ku wek gelek welatên paşvemayî yên din hêzên berhemdarîyê yekmilî pêş de çûne û heta niha di sewîyek gelek nizm de adet û paşmayîyek bi hêz a peywendîyên derebegî jî tê de dixuyê.

Yek ji girîngtirîn bûyerên dema me hilweşîna sîstema kolonî ye. Netewên bindest yek di pê yekê de rizgar dibin. Li Asya sîstema kolonî dike bi tevayî ji holê rabe. Lê li Rojhilata Navîn heta niha jî hinek melbend di bin desthilata kolonyalîstî de mane. Tenê netewek mezin ê vê melbendê ku heta niha rizgar nebûye û ji mafê netewayetî û serxwebûnîya sîyasî bê par e, netewê Kurd e. Her çendîn Kurdistan di me'na tevayî ya gotinê de kolonî nîne, lê

rewşa Kurdistanê ya sîyasî gelek nêzîkî wê ye. Ji derveyê vê jî Kurdistan di navbera çend welatan de hatîye parvekirin.

Eger em hel û mercên dîrokî û navçeyî li ber çav bigrin, dibînin ku di Kurdistanê de her hel û merc pêwistî bi rêveberîya xebata netewî heye, bi yek şertî ku hêzên pêşkevtî yên welatên cîran piştevanî lê bikin.

Bidestxistina mafên netewayetî û bi taybetî mafê qedera xwe bi xwe tayîn kirinê, qonaxek herî girîng a dîroka netewê Kurd e. Lê heta dema ku dawî bi desthilata emperyalîzmê li Rojhilata Navîn neyê, îmkana çareserîkirina vî milê problemê nîne. Madem wiha ye, xebat ji bo rizgarî û serxwebûna Kurdistanê beşek e ji xebata dijî emperyalîzmê ya hemû netewên Rojhilata Navîn. Her di wî wextî de çareserkirina mesela Kurd bi serkevtina demokrasî û hêzên demokrasîyê ve girêdayî ye. Çareserîkirina mesela Kurd û bidestxistina mafên qedera xwe bi xwe tayîn kirinê ji bo netewa Kurd bi bê demokrasîyê îmkan nîne. Her ji ber vê jî têkoşîn ji bo çareserkirina mesela Kurd bûye beşek ji xebata hêzên demokrasîyê yên Rojhilata Navîn di riya cîbicîkirina demokrasîyê de.

Mesela Kurd divê li ser bingeha hel û mercên jîyana netewa Kurd û rewşa welat bê çareserkirin û pêwist e sevîya pêşdeçûna aborîya welat û problemên 'orf û adetên kulturî û dînî yên gelê Kurd li berçav bên girtin. Paşdemayîna kûrî di çareserkirina mesela Kurd de zerarên gelek mezin ji bo armanca rojên bên, di xwe de dihewîne.

Çareserkirina demokratîk a mesela netewayetî pêwîstî bi rêzgirtinek temamî ya bi bîr û bawerîya enternasyonalîstî ye. Kurd jî wek her neteweyekî din mafê wî heye ku qedera xwe bi xwe tayîn bike heta dereca ku dewletek serbixwe damezirîne. Ev mafê han ji bo netewa Kurd bi me'na mafê yekkirina welatê xwe ye. Tenê li riya îtîrafkirin bi wî mafî li ser bingeha bîr û bawerîya enternasyonalîstî riya ji bo pêkanîna yekîtîyek dilxwazî di navbera netewa Kurd û netewên serdest ên niha yên Rojhilata Navîn de, pêk tê.

Sosyalîzm rê ji bo çareserkirina esasî ya mesela netewayetî vedike, ku yek ji wan dijwartirîn meselên dema me ne. Sosyalîzm dikare hemû milên netewayetî û aborî yê mesela Kurd bi hev re

çareser bike, her wek riya çareserkirina hemû wan meselan jî nîşan dide ku peywendîya wan bi mesela aborî ve heye. Pêşveçûna sosyalîzmê ne tenê tezmîna pêşkevtina aborî ye, her wiha dawîlêanîna bindestîya însanan ji alîyê însanan ve ye jî û dibe sebebê parvekirinek dadperwerî ('edalet) ya rojên bên ên netewayetî di navbera endamên civakê de, parvekirinek ku pîvana wê ya esasî karê însan be.

Sosyalîzm rê ji bo Kurdistanê xweş dike ku heta pişta xwe pê girê bide, ji welatekî paşkevtî yê çandinî bibe welatekî pêşkevtî ya sanayî. Kurdistanek xwedî van hemû serwetên zêde û bi taybetî ew hemû zexîra petrola heyî û Kurdistanek bi gelên xwe ve aza û bi kar naskirî û Kurdistanek cîranê Yekîtîya Sovyetê ku amade ye alîkarîyek hêja ya ji hemû alîyekî pêşkêşî wî welatî bike ku dike sosyalîzmê ava bike, ew Kurdistan di demek dîrokê ya kurt de dikare bibe baxê pêşkevtî ya Rojhilata Navîn.

## GOTINA DAWÎYÊ JI BO ÇAPA KURDÎ

Şoreşa Tîrmehê ya sala 1958'an asoyek nû ji bo gelê Kurd vekir. Di netîca beşdarbûna gelê Kurd di xebata dijî rejima Nurî Seîd de destûra Komara Iraqê da xuyakirin ku: "Kurd û Ereb di vî welatî de hevbeş in". Gelê Kurd di yekemîn sala şoreşê de berhemên gelek girîng bi temîn kirina mafên netewayetî û sîyasî bi dest xist. Hêdî hêdî ew hêvî xurt bû ku hel û mercên destpêkî ji bo çareserkirina durust û mantiqî ya mesela Kurd di çarçova Komara Iraqê de dike pêk bê, çareserkirinek ku dikir bibûya nimûne ji bo hemû ew welatên ku Kurdistan di navbera xwe de parve kirine. Bi taybetî îmkana çareserkirina demokratîk û adîlane di karaktera netewî û dijî emperyalîzmê ya hukumeta piştî şoreşê de dihat dîtin.

Di vî warî de hinek gavên destpêkî hatin dîtin. Kurdek bû endamê Konseya Serokatîyê ku ji sê endaman pêk dihat, çar wezîrên Kurd di hukumetê de beşdar bûn, nîşana (amblema) dewleta nû nîşana destpêka yekîtîya du netewan, Ereb û Kurd bû, ji ber ku xencera Kurd û şûrê Ereb di ser hev re derbaz bûbûn, Barzanîyê bi nav û deng ê serokê Kurdan ku ji sala 1947'an ve li Yekîtîya Sovyetê bû, vegerîya Iraqê û wek qehremanekî netewî pêşwazî lê hat kirin, Partîya Demokrat a Kurdistanê bi resmî hat naskirin û zêdetirî bîst rojname û kovar bi zimanê Kurdî hatin weşandin ku çar ji van rojane bûn.

Lê ev dema han a pîroz temenê wê gelek kurt bû. Ji ber ku benda sêyem a destûrê nehat cîbicîkirin û meşîna kar û barên Iraqê her wiha lazimê merkezîyetek tund bû. Li Kurdistana Iraqê tu guherînek wisa nehat kirin ku li gel armancên gelê Kurd rê bikeve. Hetta navê "Kurdistanê" bi resmî hat qedexekirin. Ne tenê ev, du sal piştî şoreşê hukumeta Qasim dest bi cîbicîkirina sîyaseta dijî demokrasîya hundur kir û di ser vê de jî tundkirina zor û zordestîya dijî hêzên azadîxwaz û qedexekirina azadîyên demokratîk, tundî û zordestîya dijî destkevtîyên gelê Kurd jî dest pê kir û piştî demekê eskerek zêde jî hat şandin Kurdistana Iraqê.

Qasek şûnde hemû ew destkevtîyên ku tevgera netewayetî ya Kurd bidest xistibûn hatin sitendin û rojnama "Xebat" hat girtin û pişt re dest danîn ser hemû rojnamên Kurdî. Mistefa Barzanî jî ku li Bexdadê ji xwe emîn nebû vegerîya Barzan û gelek ji Kurdan ku tirsa girtina xwe dikirin, xwe veşartin, an çûn Kurdistanê ba Barzanî û alîgirên wî.

Di bihara sala 1961'an de rewş li Kurdistanê şepirzetir bû. Hukumeta Qasim bi alîkarîya hinek serokeşîretên kevneperest û xwedî milkên mezin dest avêtin bi nerehetîyek çekdarî ji bo wê ku li Kurdistanê şer dayêxin. Planek vê sîyasetê hebû, heta payîza sala 1961'an wisa lê hat ku Kurd ji bo parastina can û malên xwe neçar bin dest bavêjin çek. Sîyaseta dijî demokrasî û dijî niştimanî ya Qasim û êrîşbirina ser Kurdistanê hêdî hêdî bûn sebebê nerazîbûna hemû Kurdan û gelek welatparêzên Iraqê. Ev êrîş û bombebaranîya nifûsa bê parêzger a Kurdistana Iraqê û şewitandina gundan û bikaranîna dexma sîyasî, eskerî û her wiha abloqedana navçên Kurdan ên di warê aborî de berhemê wê tenê ew bû ku dijîtîya civakên gelê Kurdistana Iraqê zêdetir kir. Ji ber vê şerekî dirêj ê çend salî destpê kir ku heta 11'ê Adara sala 1970'an dawî pê nehat.

Ev şerê han ê birakûjîyê bû sebebê têkçûna rewşa sîyasî û aborî ya Iraqê. Di vê navberê de çend caran rewşa sîyasî ya Iraqê hat guherandin. Nebûna îstîkrara sîyasî rewşa aborî ya welat jî bi tevayî ji hev xist. Iraq di hêla aborî de bi paş ket û jîyana civakên xelkê di Kurdistanê û beşên Ereban de roj bi roj şepirzetir bû. Peywendîya dostîtî ya gelê Kurd û Ereb ku ji dirêjahîya dîrokê ve destbirayên hev bûn, derbek mezin lê ket.

Ev şerê han ê dirêj çend rastî bi tevayî îspat kirin. Yekem ew e ku gelê Kurd di Kurdistana Iraqê de di xebata xwe ya ji bo wergirtina mafên xwe yên rewa berdewam e û heta bidestxisitna van mafên xwe xebata xwe dê bidomîne. Duyem ew e ku riya çareserkirina problemên Kurdan ne riya şer û esker birina ser e, lê qebûlkirina mafê qedera xwe bi xwe tayîn kirin û xebata ji bo cîbicîkirina vî mafî ye. Sêyem îspat bû ku heta aşîtîyek esasî li Kurdistana Iraqê de pêk neyê û mesela Kurd neyê çareser kirin, rewşa Iraqê bi giştî rûyê hêmintîyê nabîne. Bi rastî jî bi bêyî çareserkirina mesla Kurd di Kurdistana Iraqê de, armanca Iraqê di nav welatên Ereban de jî jar dibe û Iraq nikare wek ku pêwist e rola xwe di meydana sîyaseta Ereban û bi giştî di Rojhilata Navîn de bilîze.

Her wiha pratîkê nîşan da ku pêkanîna otonomîyê ji bo Kurdistana Iraqê di çarçova komara Iraqê de baştirîn awayê çareserkirina problema Kurd e. Ev awayê han hem mafê gelê Kurd temîn dike û hem yekîtîya komara Iraqê diparêze û hem îmkanek temam pêk tîne ji bo ku Iraq bibe bingehek xurt a demokrasîyê û dijî emperyalîzmê li Rojhilata Navîn. Ne tenê ev, çareserkirina bi aşîtî û demokratîk a problema Kurd li Iraqê, rê ji bo yekîtîya stratejîya tevgera netewa Kurd û tevgera netewa Ereb xweş dike, ev yekîtîya han ku tesîr dike li ser qedera herdu netewan û hemû Rojhilata Navîn.

Piştî 17'ê Tîrmeha 1968'an ku Partîya Be'esa Erebî ya Sosyalîst li Iraqê hat ser kar, hemû van rastîyan xist ber çav û hêdî hêdî destpê kir rêxweşkirina ji bo sekinandina şer li Kurdistana Iraqê. Piştî muzakerek dirêj a navbera serokatîya tevgera gelê Kurd û Partîya Be'esê, herdu mil li ser bendên beyanama 11'ê Adara 1970'an li hev hatin. Beyanama 11'ê Adarê di çend hêlan de girîng bû. Cara yekem bû ku di dîroka gelê Kurd de partîyek ku desthilata sîyasî di dest de bû, herwek ne tenê hukumetek îtîrafê bi wê kir ku Kurd netewek cihê ye û pêwîst e bigihîje mafên xwe yên netewayetî, her wiha bi aşkeratî ji xelkê Kurd re otonomî awayê çareserîkirina problema Kurd hat qebûlkirin. Ev noqtek guhertî bû di dîroka gelê Kurd de. Her di wê demê de bi beyanama 11'ê Adarê rê ji bo cîbicîkirina slogana esasî ya şoreşa Kurdistana Iraqê jî -Demokrasî Ji Bo Iraqê û Otonomî Ji Bo Kurdistana

Iraqê- xweş kir. Dawî pêhatina şerê deh salan û derçûna beyanama 11'ê Adarê serkèvtinek mezin bû ji bo gelên Rojhilata Navîn. Ji ber ku astengek gelek mezin li ser riya Iraqê hat hildan û şertek gelek pêwîstî bû ew, ku li Rojhilata Navîn Iraq bibe bingehek xurt ê dijî emperyalîzmê . Derçûna beyanama 11'ê Adarê ne tenê serkevtina gelê Kurd li Kurdistana Iraqê bû, her wiha serkevtinek bû ji bo gelê Kurd li hemû perçên Kurdistanê û nimûnek baş ya çareserkirina problema Kurdî xist ber dest. Bi vî awayî helek sîyasî ya bê mîsal li Iraqê di holê de ye. Serkevtina vê hela han ji bo çarenivîsa gelê Kurd li hemû perçên din ên Kurdistanê gelek girîng e. Gelê Kurd li Îran, Tirkîyê û Surîyê bi hêvîyekê li rewşa Kurdistana Iraqê dinêre û hêvîya wê ye ku Partîya Be'es a Sosyalîst a Erebî ku hinek gavên gelek bi qîmet ên wek millîkirina petrola Kerkukê, îmzakirina peymanên netewî û rêxweşkirin ji bo pêkanîna cebha netewî di nav hêzên netewî û demokratîk ên Iraqê de daye ber xwe, pêk ve tevî serokatîya tevgera gelê Kurd li Kurdistana Iraqê problemên Kurd li Iraqê bi awakî demokratîk, bi aşîtî û seranserî çareser bike. Ew dem bi gelemperî ne kevneperestên Rojhilata Navîn û bi taybetî ne jî rejîma Şah û emperyalîzm di cîbicîkirina planên dijî gelan de biser dikevin û serkevtin her dibe ji bo gelan.

## ÎLAVA YEKEM
# BENDÊN BEYANNAMA 11'Ê ADARA 1970'AN

1- Zimanê Kurdî li gel hebûna zimanê Erebî·di hemû wan melbendên ku piranîya nifûsa wan Kurd e dibe zimanê resmî. Zimanê Kurdî di van melbendan de dibe zimanê xwendinê û zimanê Erebî jî li wan hemû dibistanên Kurdî têt xwendin. Her wiha zimanê Kurdî jî li hemû navçên Iraqê bi wê sewîya ku qanûn nîşan dide, wek zimanekî duyem têt xwendin.

2- Beşdarbûna Kurdên bira di hukumetê de û bi awakî giştî bêyî hebûna ferqê di navbera Kurd û yên xeyrî Kurdan de ji bo cîgirtin di îdaran de û ji bo wergirtina mewqîyên girîng ên dewletê wek wezaret û serokatîya ordî û yên din... yek ji wan karên girîng e û hewce ye ku hukumeta şoreşê cîbicî bike. Hukumet di beramberî vê de vê heqîqeta han qebûl dike û bi pêwîst dizane ku hewl bide ji bo wê ev heqîqeta han bi awakî adîlane bête holê ku di rojên borî de Kurdên bira lêrast hatine, li berçav bigre.

3- Ji ber wê ku netewa Kurd ji rojên borî ve di hêla kulturî û perwerdekirinê de paşvemayî ye, projek ji bo çareserkirina vê paşdemayînê bi van riyên xwarê ve têt danîn:

a) 'Ecele kirin ji bo cîbicîkirina biryarên Konseya Serokatîya Şoreşê di warê ziman û mafên kulturî yên gelê Kurd de û amade kirin û belavkirina programên taybetî di warê meselên netewa-

yetî yên Kurd de di radyo û televîzyonê de ji alîyê serokatîya giştî ya kultur û ragihandina Kurdî.

b) Paşdevegerîna wan xwendekarên ku bi sebebê hel û mercên tund ê melbendê ve hatine derxistin an naçar bûne dest ji xwendinê berdin, bi bê liberçavgirtina temenên wan, vegerin dibistanên xwe û peydakirina riya çareserkirinek li bar ji bo problemên wan.

c) Çêkirina dibistanên zêde li melbendên Kurdistanê û bilindkirina sevîya perwerdekirin û hînkirinê û wergirtina xwendekarên Kurdan ji bo zanistgeh û enstîtutîyên nîzamî û parvekirina bursê bi pîvanek adîlane.

4- Memurên îdarî li wan melbendên ku piranîya nifûsa wan Kurd e wê Kurd bin, an jî bi kêmasî ji wan kesan be ku zimanê Kurdî baş dizanin. Ji bo berpirsiyarîya esasî jî (wek amîr, fermandar, serokên polîs, rêveberên emnîyetê û ev curê berpirsîyarîyên han) tên dîyar kirin û di cî hewl têt dan ji bo pêşdeçûna dezgên dewletê di navçê de bi tedbîr û rawêj li gel komîta bilind çavdêrîkirin li ser cîbicîkirina vê beyannamê, bi awakî ku cîbicîbûnê temîn bike û yekîtîya netewî û cîyê xwe girtî di melbendê de bi hêz bike.

5- Hukumet îtîraf bi vê yekê dike ku gelê Kurd heqê wî heye rêxistinên xwendekaran, xortan, jinan û mamostan ên taybetî ji xwe re dabimezrînin û ev rêxistinên han bibin endamê rêxistinên niştimanî yên Iraqê.

6- a) Muddetê derbazbûna şiqa (1) û (2) ya biryara Konseya Serokatîya Şoreşê hejmara (59) ya roja 5.8.968'an heta roja derçûna vê beyannama han têt dirêj kirin û hemû wan kesan digre ku di hedîsên tund ên melbendên Kurdnişîn de beşdar bûne.

b) Bê wê ku şertek li ber wan bê danîn karker, memûr û kesên di karên dewlet û eskerîyê de kar dikin vedigerin ser karên xwe, karmendên dewletê li gor pêwistîyê li melbendên Kurdistanê ji wan îstîfade têt kirin.

7- a) Pêkanîna komîsyonek ji pispor û zanayan ji bo pêşdebirina melbendên Kurdnişîn di hemû hêlê de û bi wê lezê ku di daxilê îmkanê de ye û hesabkirina wan zerar û zîyanan ku di salên borî de bi ser wan de hatîye û amadekirina budçeyek pêwîst ji bo cîbicîkirina van. Ev komîsyona han girêdayî Wezareta Kar û Bar e.

b) Amadekirina plana aborî bi awakî ku pêşdebirina rewşê di hemû navçên Iraqê de temîn bike, li gel wê berçavgirtina hel û mercên paşvemayî yên melbendên Kurdistanê.

c) Li gor qanûnek taybetî ku li gel qanûnên welat rê bikeve, maaşê teqawidîyê (xanenşînî) ji bo aîlên wan kesên ji endamên tevgera çekdarî yên Kurd û xeyrî wan têt texsîs kirin ku di hel û mercên gelek mixabinî yên şer de şehîd bûne. Her wiha ji bo wan kesan ku ji ber van sebeban tûşî seqetbûnê bûne û nikarin kar bikin.

d) 'Ecelekirin ji bo gihîştina wan kesên ku di riya cîbicî kirina-niştecîkirin û yên din de zerar li wan ketîye û li wan hatîye qewimîn û bi awakî ku kar ji bo bêkaran bê temîn kirin û her wiha alîkarîyek di ciyê eşya de, pere û bijartinek mantiqî ya zerar û zîyanê ji bo wan kesan ku daxwaza wan ji bo yarmetîyê heye, ev wê di destê komîsyona bilind de be. Ev qismê han wan kesan nagire ku ketine ber bi qismên din.

8- Vegerîna ehlên gundîyên Ereb û Kurd a ser şûnewarên xwe yên berê. Ehlê van gundan jî ku ketine wan melbendên ku nikarin vegerin cîyên xwe yên kevin, dewlet ji bo qazanca giştî li gor qanûnê wê dest deyne ser, li melbendên cînar bicî bike û wan zerar û zîyanê wan jî ji wan re hesêb bike ku ji ber van sebeban li wan dikeve.

9- 'Ecelekirin ji bo cîbicîkirina qanûnî ya başkirina çandinîyê li melbendên Kurdistanê û destkarîkirina bi awayekî ku ji holê rakirina peywendîyên derebegî temîn bike û hemû gundî perçe axek wan a bi serê xwe hebe û ew vêrgîya çandinîyê jî ji wan neyê sitendin ku di salên gelek mixabinî yên şer de li ser wan civîyaye.

10- Rêkevtin li ser destkarîkirina qanûna esasî ya katî bi vî awayê xwarê:

a) Gelê Iraqê ji du netewên serekî pêk hatîye ku netewên Ereb û Kurd in. Ev qanûna han mafên netewayetî yên gelê Kurd û mafê hemû kêmayetîyan di çarçova yekîtîya Iraqê de garantî dike.

b) Ev qismê han li ser benda çaran a qanûnê têt zêde kirin: "Zimanê Kurdî di ciyê zimanê Erebî de li melbendên Kurdnişîn dibe zimanê resmî".

c) Cîbicîkirina evên pêş di qanûna esasî de.

11- Îstasyona radyo û çekên giran ji hukumetê re têt dan û ev jî girêdayî ye bi cîbicîkirina qonaxên dawî yên vê rêkevtinê.

12- Yek ji cîgirê Serokkomar wê Kurd be.

13- Qanûna bajaran bi curekî têt hazirkirin ku li gel naveroka vê beyannamê rê bikeve.

14- Piştî ragihandina vê beyannamê ji bo cîbicîkirina tedbîr û rawêjê komîta bilind a çavdêrî , divê li gor serhejmara resmî ku şûn de têt kirin, ji bo yekxistina bajaran û wan navçên îdarî ku piranîya nifûsa wan Kurd in gavên pêwistî bên avêtin. Ji vir şûn de dewlet hewl dide ji bo pêşdebirina îdara vê navçê û ji bo pêşdebirin û hêsankirina bikaranîna hemû mafên netewayetî yên gelê Kurd, ji bo wê ku otonomî ji bo Kurdan bê temîn kirin. Heta ev yekîtîya han a îdarî pêk bê, kar û barên netewayetî yên Kurdan di riya li ser navê civîna komîta bilind û bajarên navçên jor ve rêk û pêk têt kirin. Ji ber vê otonomî di çarçova komara Îraqê de pêk tê, dîyar e bikaranîna serwetên vê melbendê jî di bin selahîyeta vê komarê de ye.

15- Gelê Kurd li gor hejmara nifûsa Iraqê di desthilata qanûndanînê de beşdar dibe.

## ÎLAVA DUYEM

# BIRYARA PARTÎYA KARKER A TIRKÎYÊ LI SER MESELA KURD

Yekem car di dîroka komara Tirkîyê de partîyek sîyasî ya qanûnî ku nunerên wê di parlamentoya Tirkîyê de hene, bi aşkera îtîraf bi hebûna gelê Kurd dike û di biryara xwe ya resmî de ku di kongra çarem a vê partîyê de hatîye sitendin, bîr û bawerîya xwe li ser mesela Kurd belav kirîye ku di gotinên "resmî" yê karbidestên Tirkîyê de bi "problemên Rojhilat" têt binavkirin.

Bi rastî ev qerara han gavek girîng e û azayane ye û em hêvîdar in Partîya Karker a Tirkîyê ku partîya pêşverû ya kedkarên hemû gelên Tirkîyê ye, di cîbicîkirina bendên van biryaran de biserkeve.

Biryara kongra çaran a Partîya Karkerê Tirkîyê ku di meha Çiriya Duyem a sala 1970'an de (Befranbara 1349'an) hatîye sitendin bi vî awayî ye:

Kongra çaran a Partîya Karker a Tirkîyê îtîraf dike û bi aşkera îlan dike.

- Gelê Kurd li Rojhilata Tirkîyê heye.
- Her di destpêkê de desthilata çînên faşîst ên karbidestên Tirkîyê li hemberî gelê Kurd programa sîyaseta zordarî, qetlîam û asîmîlasyona Kurd meşandine ku gelek car ji hêla pratîkê de xwînawî û bi zilum xwe domandîye.

- Yek ji wan sebebên esasî yên paşvemayîna vê navçê ku gelê Kurd tê de dijî li gor navçên din, ji derveyî qanûna pêşdeçûnên ne libar ên sermayedarî sîyaseta civakî û aborî ya karbidestên çînên hakîm e ku ev li ber çavê wan bûye, di vê navçê de gelê Kurd niştecî ye.

- Vêca binavkirina "gîrûgiriftên rojhilat" bi gîrûgiriftên pêşveçûna navçeyî, ji derveyî domandina bîr û bawerîya şovenîstî-nasyonalîstî ya çînên hakîm pê ve qet tiştek din nîne.

- Piştivanîya partîya me ku dijminek dijwar ê rêbaza dijî demokrasîyê, faşîzm, zordarî û şovenîya-nasyonalîstî ye, di xebeta gelê Kurd de ji bo feyde sitendin ji mafên qanûnî yên hevwelatî yên xwe û ji bo cîbicîkirina hêvî û daxwazên xwe yên demokratîk wezîfek şoreşgerî ya tabîî û pêwîstî ye.

Divê sosyalîstên Kurd û Tirk mil bi milê hev din di nav partîyê de têbikoşin ji bo ku ew xebata ji bo qerar û bicîanîna hêvî û daxwazên demokratîk ên gelê Kurd û xebata ku çîna karker û rêxistinên pêşverû yên partîya me di riya şoreşa sosyalîst de didin bê têkelkirin û bibe sefek şoreşgerî.

Fermana jiholêrakirina bîr û bawerîya regezperestî-nasyonalîstîya şovenîstî ya burjuwazî ku di nav kar û civakên alîgirên partîyê, sosyalîstan, karker û di nav civakên kedkarên din de heye, yek ji armancên herî bingehîn û dûr û dirêj a xebata îdeolojîk û pêşveçûna partîya me ye.

Partî gîrûgurufta Kurd bi çavê pêwistîyên xebata şoreşgerîya sosyalîstî ya çîna karker ve temaşe dike.

(Ji rojnama Kurdistan a organa Komîta Merkezî ya Partîya Demokrat a Kurdistanê (Îran) hatîye wergerandin. Hejmar (3), Xakelêweyî 1350, Nîsana 1971'an.)

# ÎLAVA SÊYEM
# PROGRAMA PARTÎYA DEMOKRAT A KURDISTANÊ (ÎRAN)

Di Konferansa Sêyem
a Partîyê de Hatîye Qebûlkirin
Cozerdana 1350 (1971)

## Destpêk:

1- Ji kevin de ye gelê Kurd di riya azadîyê de û ji bo bidestxistina mafê qedera xwe bi xwe tayîn kirinê xebat dike. Seranserî sedsala 19'an, şahidê rojên borî yên xwînawî ê netewa me ye. Ji destpêka sedsala 20'an ve heta Şerê Cîhanê yê Duyem ev xebata han li hemû perçên Kurdistanê berdewam bûye. Di wê demê de ku dijîtîyên gelên azadîxwaz ên cîhanê li hemberî kevneperestî û faşîzmê, pêwîstîyek dîrokî peyda bûbû ku rêxistinek sîyasî ya wisa peyda bibe ku bikare xebata gelê Kurd bi rê ve bibe. Ji bo bicîkirina vê armanca han bû ku gelê Kurd li Kurdistana Îranê ji wê rewşa li bar ku piştî bîst sal dîktatorîya Riza Şah jê re li hev hatibû, jê îstîfade kir û Partîya Demokrat a Kurdistanê damezirand. Bi vî awayî damezrandina Partîya Demokrat a Kurdistanê netîca wê pêwîstîya dîrokî, nîşana hîşyarî û jîrîya lawên gelê Kurd bû. Ji wê demê ve Partîya Demokrat a Kurdistanê ku

pêşverûtirîn lawên gel di rêzên xwe de berhev kirine, rê nîşander û rehberê hêzên demokratîk û dijî emperyalîzmê ye di Kurdistana Îranê de.

Pêkhatina Partîya Demokrat a Kurdistanê di dîroka gelê Kurd de noqtek guherînê bû û bû destpêka serdemek nû di xebata netewa me de. Di bin serokatîya Partîya Demokrat a Kurdistanê de bû ku netewa Kurd karî cara yekem di dîroka xwe ya nû de hukumetek netewî di beşek axa Kurdistanê de bîne ser kar ku dikir daxwazên dîrokî cîbicî bike. Vê hukumeta han tenê salek dom kir û piştî paşvekişîna tevgera gelên Îranê carek din hukmê dîktatorî yê nîzamî û zordarî bi ser hemû Kurdistana Îranê de daket. Lê gelê Kurd têkoşîna xwe nerawestand û niha jî her ji bo cîbicîkirina armancên Partîya Demokrat a Kurdistanê xebat dike.

Partîya Demokrat a Kurdistanê xwedîyê bîst û pênc sal xebatek asê û giran û gelek bi hevraz û nişîv û gelek fedakarî û gîyanî ye. Aşkera ye ji wan deman heta îro bûye xwedî pratîkek dewlemend û ji xebata gelê Kud û yên din ders wergirtîye. Ew programa ku li ser rewş û halê nû yê îro yê cîhanê, Rojhilata Navîn û Îranê hatîye danîn, şertên guhertî yên kûr ên sîyasî, pêşkevtina civakî, zanistî û teknîkî li cîhanê û her wiha qonaxa niha ya xebata gelên Îranê û şertên taybetî yên Kurdistana Îranê digre berçav.

2- Dema me dema rizgarîya gelên bindest ên di bin zordarîya emperyalîzmê, dema jarbûna cepha emperyalîzmê di seranserî cîhanê de, serdema peydabûn û berbipêşdeçûna sosyalîzmê û pêşkevtina hêzên demokrasî û rizgarîxwaz di hemû welatan de ye. Piştî bîst û pênc sal Şerê Cîhanê yê Duyem guherîna sîyasî wisa pêkhatîye ku sîma sîyasî ya cîhanê guherandîye. Sîstema kolonyalî bi tevayî hilweşîyaye û ji derveyî hinek navçên Afrîqayê welatên kolonî di dinyayê de nemane. Bi dehan netewên mezin û biçûk mafên qedera xwe bi xwe tayîn kirinê bi dest xistine û dewletên xwe yên serbixwe damezrandine.

Ev bûyerên sîyasî di gelek welatan de guherandinên kûr ên civakî bi xwe re anîne. Di van welatan de civaka kevin a paşdemayî ji holê rabûye û civakên pêşkevtî yên nû cîyê wan girtîye. Çînên zordar û kevneperest ên tagirê emperyalîzmê ku li ser kar bûn, desthilata wan a sîyasî ji dest çûye û nifûza wan a aborî kêmtir bûye û hêzên gel û nûnerên sinif û tebeqên pêşkevtî

yên civakê desthilatê girtine dest.

Çîna derebeg û peywendîyên derebegî li gelek welatan hilweşîyane û rê ji bo pêşkevtina civakê di van welatan de vebûye. Bi giştî ew hêzên civakê yên ku bikarin civaka însanan ber bi pêş ve han bidin azadîyên xwe bidest xistine û îmkan ji wan re pêkhatîye ku bikarin civakek baştir, pêşkevtîtir û însanîtir durust bikin.

Ew welatên ku di hêla aborî de pêşkevtî bûn di saya destkevtîyên zanist û teknîk ku îmkanên nehatî dîtin ji bo pêşxistina aborîyê, karibûne aborîya xwe ya gihaştî xurttir bikin û sewîya jîyana danîştiwanên xwe bilindtir bikin. Şoreşa zanistî-teknîkî îmkanek rastîn pêkanîye ji bo her welatekî ku bikare paşvemayîna xwe ji holê rake û jîyanek hêja ya mirovî di beşê sêhemê sedsala 20'an ku em tê de dijîn, pêk bîne. Lê carek di berambera vê de ku hinek welatan karibûye sewîya jîyana piranîya danîştiwanên xwe bilind bikin û civakek bi mesref deynin ku gelek tişt û eşya dikevin destê civakên xelkê. Bi sedan mîlyon kes li Asya, Afrîqa û Amerîka Latînî di wê rewşê de nînin ku tiştên pêwistî yên seretayî ji xwe re temîn bikin. Ev yek ji girîngtirîn nelibarîya civaka îro ya mirovatîyê ye.

Welatên emperyalîst niha jî bi hêzên xwe yên sîyasî û aborî ve ji bo parastina peywendîyên newekhevî yên nav dewletan feyde digrin. Niha jî netewên bindest berî hemûyan bi taybetî netewên biçûk tesîra wan di danîna sîyaseta navnetewî de gelek kêm e hetta gelek caran mafên wan ên rewa ji alîyê emperyalîstan ve têt pêpezkirin. Lê di esasî de peywendîyên kolonyalî yên kevin ji holê rabûye û cebhek fireh li dijî emperyalîzmê ji welatên sosyalîst û demokrasîyê, ji welatên nû rizgarbûyî, ji netewên wan welatan ku ji bo azadîya xwe xebat dikin pêk hatîye ku bûye hêzeke îmkan û bi piştevanîya bîr û raya giştî ya mirovên pêşkevtî ve bibe unsurek girîng a sîyaseta cîhanê. Rewşek wisa pêkhatîye ku netewên biçûk jî bi piştstûrîya hêzên xwe û îstîfadekirina ji hevderdên mirovatî yên pêşkevtî dikarin mafên xwe yên rewa dest bixin û biparêzin.

3- Piştî Şerê Cîhanê yê Duyem di warê aborî, civakî û sîyasî de guherînek mezin bi ser Îranêde hat. Bi rastî jî Îran nedikarî bi tevayî xwe ji guherîna kûr a cîhanê bide alîkî. Lê ev guherînên han

bersîvên îmkanên aborî û tabîî yên Îranê nînin û Îran niha jî welatek paşdemayî têt hesêb kirin. Ji derveyî van, ev guherînên han zêdetir bi qazanca çîna desthilatdar û ew kesên pere û maaş ji Şah û dewletê distînin bûye û civakên xelkê niha jî her di feqîrî û çarereşîyê de dijîn. Piranîya xelkê Îranê bi taybetî li gundan niha jî nexwendan e, ji alîkarîya leşsaxî û tibbê bê par e.

Terkîba civakî ya gundan heta derecek zêde guherîye. Çîna derebeg û xwedî milkên mezin di esasê xwe de wek çîn nemane û cîyê xwe dane burwuvazîya gund ku ji milkên biçûk û werzkanên dewlemend pêkhatine. Armanca rejîma Şah, emperyalîzm ku piştivanîya van guharandinan kir û dike, firehtir kirina bazara sermayedarî û pêkhatina burjuwazî bû li gundan ku ji alîkî de bibe bingehek civakî ji bo rejimê û ji alîkî din de riya pêşdeçûna sermayedarîyê xweş bike. Dîyar e di sanayîyê de jî rejim beşê xusûsî bi zerarê beşê giştî bihêztir dike û ji bo anîn û xistina kar a sermaya bîyanî mecalên li bar pêktîne ku di vir de jî armanc her di sanayîyê de pêşdebirina sermayedarî ye, riyek e ku pratîkên gelek welatên paşdemayî yên din çewtîya wê îspat kirine û bi aşkera nîşan dane ku bi zerara civakên xelkê ye.

Konsorsîyom wek bingehên herî mezin ên aborî û sîyasî yên emperyalîzmê li Îranê niha jî her sal bi sedan mîlyon dolar serweta petrola Îranê talan dikin. Her wiha di nav dewleta Îranê de ji xwe re bûye dewletek û ji xwar û heta jorê bi sedan maaşxwer di hemû dezgên dewletê de hene û tesîr dikin li ser dîyarkirina sîyaseta giştî ya welat.

Di sîyaseta derve de rejîma Îranê li ser riya emperyalîzmê û bi taybetî emperyalîzma Amerîka diçe, ji bilî ku endamê Peymana CENTO ye ku ev jî destebendeke eskerî û emperyalîstî ya dijî gelên Rojhilata Navîn e. Îran peymanek duqolî ya eskerî jî li gel Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê îmza kirîye û bi hezaran musteşarên Amerîkî yên seresker, polîs û jandarme serê bendan girtine.

Di Îrana îro de dîktatorî gihîştîye sevîyek bilind. Şûnewarên azadî û demokrasîyê nemane. Partîyên netewî û pêşkevtî, sendîka û rêxistinên demokratîk ên kîtlewî hemû xeyrî qanûnî hatine îlan kirin, azadîya belavok û weşanî nemaye, Meclisa Şura û Sena ji alîyê Şah de têt dîyar kirin, desthilata

qanûndanînê, dadxwazî û îcrayî hemû di destê Şah de ye. Dezgên polîs û sazmana emnîyetê hakimê gîyan û malê xelkê ne. Îran bûye bendîxana her însanekî bi şeref û azadîxwaz.

Bi vî awayî dijîtîyek mezin di nav desthilata sîyasî ya welat û guherîna aborî û civakî, di nav mirovên Şah û maaşxwer di milekî de û gelên Îranê di milê din de pêk hatîye ku tik û tenê riya çareserkirina wê, berpakirina şoreşek kûr a civakî ye.

4- Kurdistana Îranê di warê aborî û civakî de di nav welatek paşdemayî de navçek paşdemayî ye . Di rastîyê de Kurdistana Îranê her çendîn di hêla servetên tabîî yên bin erd de dewlemend e, lê yek ji paşdemayîntirîn navça Îranê ye. Guherînên aborî û civakî li Kurdistana Îranê hetta wek navçên din ên Îranê jî nîne. Rewşa aborî, tibbî û kulturî ya piranîya nifûsa Kurdistana Îranê gelek kêm guherîye. Sewîya jîyanê gelek nizm e. Kedkarên Kurdistanê ji alîkarîya tibbî, derman, dibistan û avdanîyê bi tevayî bê par in.

Kurdistana Îranê navça herî milîtarîzekirî ya Îranê ye. Tu manayek qanûnê di vir de nîne. Memurên eskerî û bi taybetî jandarme û sazmanên emnîyetê hemû desthilat di destê wan de ye. Zordarîya netewayetî hemû Kurdistana Îranê girtîye. Rejîma Şah di beşê sêyem ê sedsala 20'an de jî naxwaze îtîraf bike ku neteweyek bi navê netewa Kurd heye ku beşek ji wî netewî ye ku li welatên cîran ên Îranê li ser axa bab û bapîrên xwe dijî. Zarokên Kurdan divê her ji zaroktîya xwe ve zimanê Farisî bixwînin û mecbûr in di dibistanan de bi Farisî biaxivin. Kultura netewayetî ya gelê Kurd îmkana pêşkevtina wê nîne. Memûrên bilind piranîya wan Kurd nînin. Kêmtirîn daxwazên netewayetî bi tundî tên temirandin. Sîyaseta Fariskirina Kurdan ku ji zemanê Riza Şah ve destpê kiribû niha jî her berdewam e. Zordarîya netewayetî di her beşekî jîyana aborî, sîyasî û civakî de li Kurdistana Îranê têt dîtin. Kurdistan kirine bendixane ji gelê Kurd re.

5- Bi vî awayî emperyalîzm, rejîma Şah û alîgirên wan li Kurdistanê dijminê gelê Kurd in û astenga pêşkevtina welatê me ne. Xebata gelê me li dijî wan e. Partîya me di wê bîr û bawerîyê de ye ku gelên Îranê jî her di wê rewşê de ne û dijminê gelê Kurd her dijminê gelên Îranê ye. Partîya Demokrat a Kurdistanê li gelê Îranê wek karbidestên rejîma Şah nanêre. Partîya me di wê bîr û

bawerîyê de ye ku riya rizgarîya Îranê bi pêkanîna enîyek fireh a yekgirtî ya li dijî emperyalîzmê ye ku hemû hêzên demokrasî, netewî û rêxistinên sîyasî û demokatîk pêşkevtî li ser esasê programek hevbeş di rêzên xwe de bicivîne. Partîya Demokrat a Kurdistanê di wê bîr û bawerîyê de ye ku ji bo rizgarbûna Îranê ji bin nifûza emperyalîzmê û ji bo temînkirina demokrasîyê divê rejîma kevneperest a Şah bê hilweşandin û di carçova Îranek demokratîk de hukumetek otonomî ya Kurdistanê bê damezrandin ku bikare daxwazên dîrokî yên gelê Kurd bicî bîne.

Xebat ji bo hukumetek otonom li Kurdistanê ku daxwaza qonaxa dirêj e, li gel xebat ji bo cîbicîkirina hinek daxwazan di çarçova rejîma niha ya Îranê de bê mîmkan nîne. Partîya Demokrat a Kurdistanê di wê bîr û bawerîyê de ye ku bi xebata di cî de îmkan heye rejîm mecbur bê kirin paş de gav bavêje. Vêca ji ber vê, partîya me her niha jî ji bo cîbicîkirina hinek daxwazan ên wek azad kirina girtîyên sîyasî û bi resmî naskirina zimanê Kurdî û..h.w.d. xebat dike, li ba wê wisa ne ku xebata rêkûpêk dikare van daxwazên han li ser rejîma Şah de bide ferz kirin.

6- Ji bo gihîştina armanca bingehîn a gelê Kurd ku ji pêkanîna hukumetek otonom a Kurdistanê di çarçova Îranek demokratîk de ye, Partîya Demokrat a Kurdistanê yekîtîya hêzên demokrasî û netewî yên Îranê şertek bingehîn dizane, dîroka bîst û pênc sal a tevgera demokrasîyê li Îranê baş nîşan dide ku emperyalîzm û rejîma Şah li Îranê ji ber nebûna yekîtîya hêzên şoreşger û pêşverû yên gelên Îranê, ji vê valatîyê îstîfade kirine di rastîyê de rejîma dijî niştimanî her ji ber vê xwe ragirtîye ku rêxistinek yekgirtî ya şoreşger li Îranê pêk nehatîye ku bikare xebata civakên xelkê bi rê ve bibe.

Partîya Demokrat a Kurdistanê ji bo pêkanîna vê yekîtîyê hem li dijî şovenîzma Îranê ye ku şilo li ser hebûna netewa Kurd vedike û tu mafek netewayetî jê re qebûl nake û hem li dijî nasyonalîzma teng a Kurd e ku rejîma Şah û gelên Îranê ji hev cihê nake. Hem şovenîzma Îranê û hem jî nasyonalîzma teng a Kurdan her du jî dijminên yekîtîya tevgera niştimanî ya gelên Îranê ne. Her di wê demê de jî Partîya Demokrat a Kurdistanê di wê bîr û bawerîyê de ye ku di rewş û halê niha de tirsa mezin şovenîzma mezinxwazî ya Îranê ye.

Partîya Demokrat a Kurdistanê vê programa han dixe ber çavê gelê Kurd û ji hemû daniştiwanên Kurdistanê karkeran, gundîyan, rewşenbîran, bajariyan, eşîretên welatparêz û ji hemû xelkên bi şeref ên Kurdistanê daxwaz dike ku ji bo cîbicîkirina bendên vê programê têbikoşin. Partîya Demokrat a Kurdistanê dilniya ye ku yekîtî û xebata di cî de ya gelê Kurd bi hev re bi gelên din ên Îranê re dikarin û divê rejîma bi ser emperyalîzmê ya Şah hilweşînin. Niha li ser milê endaman û alîgirên partîyê ye ku vê programa han bibin nav civaka gelê Kurd û li ser munaqeşe bikin û bîr û bawerîya partîya me li ser problemên aborî, sîyasî û civakî yên welat ronî bikin.

Civakên xelkê divê bi tevayî bi vê programê bigihîjin û programê têkoşîna xwe ya sîyasî bizanin. Tenê di wê demê de ye ku programa partîya me dibe hêzek maddî ya îmkana û hemû netewe bi me re dixe nav tevgerê. Tenê di wê demê de ye ku hêzên bê sînor ên gel ji bo bicîanîna programa me dicole û serkevtina nîhayî ji bo welatê me temîn dike.

Gelê me bi hêzên xwe piştstûr e û di vê xebatê de ji piştevanîya hemû gelên cîhanê, hemû hêzên demokrasîyê û welatparêzên dinyayê îstîfade dike. Gelê Kurd tenê neteweyek 10-12 mîlyon ê Rojhilata Navîn e ku ji mafê qedera xwe bi xwe tayîn kirinê bêpar e. Li Kurdistana Iraqê beşek ji gelê me piştî xebatek dûr û dirêj mafê netewayetî bi awayê otonomî bi dest xistîye û mijûlî qayîmkirina vî mafî ye. Da em têbikoşin bila bi mîlyonan Kurd li Îranê jî di çarçova Îranek demokratîk de mafê otonomîyê bidestxin.

Partîya Demokrat a Kurdistanê armancên xwe di vê programê de guncandîye û bicîanîna van armancan erkê ser milê hukumeta otonomîyê ya Kurdistanê ye ku di çarçova Îranek demokratîk de pêk têt.

INSTITUT KURDE de PARIS BIBLIOTHÈQUE

## Armancên Giştî :

1- Partîya Demokrat a Kurdistanê partîya pêşverû ya gelê Kurd e li Kurdistana Îranê û li gel hêzên pêşkevtî yên Îranê li dijî emperyalîzmê û rejîma kevneperest a paşayetî û ji bo rizgarîya seranserî Îran û bidestxistina mafê qedera xwe bi xwe tayîn kirina gelê Kurd di Kurdistana Îranê de xebat dike.

2- Partîya Demokat a Kurdistanê alîgirê aşîtî û dostîtîya nav milletan e û piştivanê xebata rizgarîxwazî ya gelên hemû welatên dijî emperyalîzma cîhanê ye.

3- Armanca dîwaroj a Partîya Demokrat a Kurdistanê pêkanîna civakek dadperwerî (adîl) ya sosyalîst e.

4- Slogana stratejîk a Partîya Demokrat a Kurdistanê pêkanîna otonomî ji bo Kurdistanê ye di çarçova Îranek demokratîk de.

5- Hukumeta millî ya otonomî ya Kurdistanê ji hemû axa Kurdistana Îranê pêk têt. Sînorê Kurdistana Îranê bi awakî wisa têt dîyar kirin ku li gel şertên dîrokî, coxrafî û aborî bigunce û bi daxwazên piranîya daniştiwanên vê navçê rê bikeve.

## Îdarekirina Kar û Barên Dewletê :

6- Kar û barên sîyaseta derve, parêzgerî û danîna projên aborî yên dûr û dirêj ji bo hemû Îranê di bin selahîyeta hukumeta demokratîk a Îranê de ye. Ji derveyî van hemû selahîyetên desthilatî yên hukumetê li Kurdistanê di destê hukumeta millî ya otonomî ya Kurdistanê de ye. Nûnerên hukumeta millî ya otonomî ya Kurdistanê di rêvebirina kar û barên dewleta merkezî de beşdar dibin.

7- Di hukumeta millî ya otonomî ya Kurdistanê de hemû desthilat di destê xelkê de ye ku bi wasita nûnerên xwe yên encumena netewayetî ya Kurdistanê de wê desthilatê bikar tîne.

8- Encumena netewayetî ya Kurdistanê bilintirîn organa desthilatdar a hukumeta millî ya otonomî ya Kurdistanê ye. Nunerên encumenê ji alîyê xelkê ve tên helbijartin. Hemû ew kesên temenê wan gihîştîye 18 salan mafê wan ê helbijartin û yên gihîştine 21 salan mafê wan hatinbijartinê heye. Helbijartina giştî, wek hev, raste rast û nihênî ye. Mafê jin û mêran di helbijartin û hatina bijartinî de wek hev e.

9- Dezgên dewletê li Kurdistanê ji serî heta binî di destê organên hukumeta millî ya otonomî ya Kurdistanê de ne. Îdarekirina dezgên dewletê li ser esasê şandina karbidestan ji alîyê dewleta merkezî ve ye ku yên heta niha mane hildiweşin.

10- Polîs û jandarme tên hildan û di cîyê wan de li Kurdistanê hêzên pêşmerge tên damezrandin. Di cîyê ordîya kevneperest a

Şahînşahî de eskerên gel ji bo parêzgerîya welat û destkevtîyên gel pêk têt.

11- Zimanê Kurdî, zimanê resmî yê hukumeta millî ya otonomî ya Kurdistanê ye. Di hemû qonaxên xwendinê de hînbûn bi zimanê Kurdî ye û di îdarên dewletê de jî ev ziman bi resmî têt bikaranîn. Zimanê Farisî her wek li navçên din ên Îranê, di hukumeta millî ya otonomî ya Kurdistanê de jî zimanek resmî yê dewletê ye û di dibistanan de piştî sala çaran a destpêkî zarokên Kurdistanê di ber zimanê Kurdî re dixwînin.

12- Kêmatîyên netewayetî yên daniştiwanên Kurdistanê li gel Kurdan xwedî mafên wekhev in. Mafên wan ên kulturî têt parastin û zarokên wan di dibistanên destpêkî de bi zimanê xwe yên zikmakî dixwînin û mafê wan ên weşandina rojname û kitêban bi zimanê wan heye.

13- Hukumeta millî ya otonomî ya Kuristanê azadîyên demokratîk; azadîya beyan û weşanî, danîna rêxistin û sendîka ji bo hemû çînên demokratîk û tebeqên gel tezmîn dike. Daniştiwanên Kurdistanê di helbijartina kar û cîyên xwe de serbest in û serbestîya çûn û hatinê heye.

14- Dewlet û dîn ji hev cihê ne. Her dînek azad e û esasê hemû dînan li hemberê qanûnê wek hev in. Qanûn riya cihêtîya regez û dîn nade.

15- Jin û mêr di mal de û di nav civakê de mafê wan ê wekhevîyê heye û ji bo karê wek hev maaşê wek hev werdigrin.

## Armancên Aborî :

16- Rêbaza esasî ya pêşkevtina aborî ya seranserê Îranê û her wiha Kurdistanê, danîna sanayîyê li gor usûla nû û rêkevtin li gel destkevtîyên şoreşa zanistî û teknîkî di cîhanê de ye. Danîna bingehek aborî û civakî ji bo danîna sanayîyê yek ji wezîfên herî esasî yên hukumeta demokratîk a Îranê û hukumeta millî ya otonomî ya Kurdistanê ye.

17- Hukumeta millî ya otonomî ya Kurdistanê bi wasita beşê giştî aborî ku beşê esasî yê pêşxistina aborîyê ye, sanayîya pêşkevtî di Kurdistanê de pêk tîne û sanayîya netewî û destkir ku niha heye diparêz e. Di tenişta beşê giştî yê aborî de beşê

te'awinî û xusûsî jî di danîna sanayîya welat de beşdar dibe.

18- Serokanîyên bin erd û her wiha av, çêrîngeh û zozan serveta hemû xelkên Kurdistanê ye û hukumeta millî ya otonomî ya Kurdistanê bi qazanca civakên gel jê îstîfade dike.

19- Zêdekirina berhemên zîraetê di riya mekanîze kirin û bikaranîna awayê zanistî di zîraet de û danîna projên avdanî û çêkirina sedên avan beşek herî girîng ê sîyaseta aborî ya hukumeta millî ya otonomî ya Kurdistanê ye.

20- Hukumeta millî ya otonomî ya Kurdistanê hewl dide ji bo geşkirina bazirganîya hundur û derve û ji bo jîyandina kesb, kar û pîşesazî li Kurdistanê û ew projên aborî ku cîbicîkirina wan ji alîyê beşê giştî de bi qazanca pêşdebirina aborîya welat nîne, dispêre beşê xusûsî û ev jî ji bo armanca îstîfadekirin ji hemû serokanîyên aborî ji bo pêşxistina welat e.

21- Bilindkirina sewîya jîyana gel û bi taybetî ya kedkarên Kurdistanê naveroka esasî ya sîyaseta aborî ya hukumeta millî ya otonomî ya Kurdistanê ye û ev hukumeta han hemû hêz û îmkanên xwe bikar tîne ji bo wê her çend zûtir piranîya nifûsa Kurdistanê ku di nav feqîrî û bê beşî de dijîn, ji vê rewşê rizgar bike û jîyanek wisa ji wan re pêk bîne ku wek jîyana mirovî ya nîvê duhemê sedsala bîstan be.

22- Heşt seet karê rojane di her cîyî de tê qebûlkirin, dîyarkirina bi kêmasî kîrya karkeran, li gor xercê jîyanê têt zêdekirin. Ew karkerên ku xwedî karên giran in nabe ji şeş seetan zêdetir kar bikin. Karker beramberê qezîyên kar, nexweşî û pîrîtîyê teqawûd dibin û ew zarokên temenê wan ji 15 salan kêmtir e nabe kar bikin.

23- Ax a wî/wê kesê ye ku dikêle. Tev axa dijminên gel li ser cotkarên bê ax bê pere têt parve kirin. Teqsîdên wan axên ku li ser cotkaran hatîye parve kirin nayê dan.

24- Hukumeta millî ya otonomî ya Kurdistanê pêwîst e alîkarîya cotkaran bike ji bo bikarin wasitên zîraetê ji xwe re amade bikin û berhemên zîraetê ji wan bi bihayek baş bê kirîn û ji bo demên dirêj û bi faîzek kêm qerz (deyn) ji wan re bê dan. Deynê cotkaran ji faîzxwarên bajêr, gund û dijminên gel re nayê dan. Bêkarî li seranserê Kurdistanê têt helkirin û bi tu awayî deyn û heqek namîne.

25- Hukumeta millî ya otonomî ya Kurdistanê qîmetek taybetî dide bi pêşdebirina xwedîkirina heywanan û çêrîngeh li gor şertên li bar ji kesên ku heywan xwedî dikin re têt sipartin û riya zanistî û durustî ya perwerdekirina pez û dewaran tê hînkirin.

## Sîyaseta Kulturî û Leşsaxî :

26- Hemû zarokên Kurdistanê keç û kur heta 15 salî bi mecburî dibê bixwînin û hukumeta millî ya otonomî ya Kurdistanê bi xurtî ji bo ji holê rakirina nexwendewarîyê dixebite. Li Kurdistanê mesrefa xwendina destpêkî li ser hukumetê ye û xwendin di sevîyên din ên fêrbûnê de bê pere ne. Ev benda han dibistanên ayînî jî digre nav xwe.

27- Hukumeta millî ya otonomî ya Kurdistanê ji bo bilindkirina sevîya kultura gel û damezrandina bingeha kultur û zanistî wek tîyatro, sînema millî, dibistanên bilind û zanistgehan têdikoşe.

28- Pêşdebirina ziman û edeba Kurdî, piştivanîya nivîskar û zanayên Kurd, rêbaza berdewamî sîyaseta kulturî ya hukumeta millî ya otonomî ya Kurdistanê dibe.

29- Ji bo rewşenbîrên Kurdistanê li gor qabîlîyeta wan kar têt dan. Hukumeta millî ya otonomî ya Kurdistanê sîyasetek wisa li beramberê rewşenbîran dide ber xwe ku welatê xwe bicî nehêlin û xizmeta welatê xwe bikin.

30- Hukumeta millî ya otonomî ya Kurdistanê ji bo bilindkirina sevîya leşsaxî ya hemû gel têdikoşe û rewşek wisa pêk tîne ku hemû xelkê Kurdistanê bikarin bi alîkarîyek bê pere ji îmkanên tibbî îstîfade bike û ji bo nehîştina wan nexweşîyan ku li Kurdistanê de belav bûne li hember rawestandinek tund destpê dike.

## Sîyaseta Derve :

31- Sîyaseta derve ya hukumeta demokratîk a Îranê sîyasetek bê teref û serbixwe ye û peywendîya dostanî li gel hemû welatan li ser esasê rêzgirtina yekûdu û nasîna hakîmîyeta netewayetî û destdirêj nekirina di nav kar û barên yekûdu, têt damezrandin.

32- Hukumeta demokratîk a Îranê piştivanîya xebata rizgarîxwazî û dijî emperyalîzmê ya gelan dike û alîgirê wê ye ku

her netewek xwedî mafê qedera xwe bi xwe tayîn kirinê be.

33- Hukumeta demokratîk a Îranê di rêza rêxistina Netewa Yekgirtî de û ji derveyî vê rêxistinê parastin li aşîtîya cîhanê û bi hev re jîyana aşîtî di nav gelan de dike û alîgirê çareserkirina problemên navnetewayetî di riya muzakeran de bi bê bikaranîna zorê ye.

34- Hukumeta demokratîk a Îranê divê bibe bingeha alîkarîya xebata rizgarîxwazî ya gelên bindest û bi taybetî di Rojhilata Navîn de û pena sîyasî ji bo hemû însanek niştimanî û azadîxwaz dide. Her wiha hukumeta millî ya otonomî ya Kurdistanê ji her rewş û firsetekê ji bo alîkarîya birayên xwe yên Kurd ên perçên din ên Kurdistanê îstîfade dike û pena sîyasî dide her Kurdekî welatparêz.

# SEROKANÎ


1- Aborîya Cîhanê û Peywendîya Nav Dewletan, bi zimanê Rûsî, Moskova, 1961.

2- Aborîya Welatên Sermayedarî Piştî Şerê Cîhanê yê Duyem, bi zimanê Rûsî, Moskova, 1959.

3- Amarî Bazirganîya Derve ya Îranê di sala 1958'an de, bi zimanê Farisî, Tehran.

4- Amarî Geşkirina Aborîya Derve, bi zimanê Çekî, Prag, 1958.

5- Awrik bo Ser Dîroka Cîhanê, çapa Îngilîzî, Ç.L. Nehro, Alahabad, 1935.

6- Awirek bo ser Dîroka Peywendîyên Derebegî li Azerbeycan û Ermenîstan. Bi zimanê Rûsî, Lenîngrad, 1949, Î.P. Petrovîskî.

7- Awirekî Etnografî bo Ser Kurdên Bajarê Êrîwanê. S.A. Îgazarof.

8- Îndehaî Dahad w Şehrihayê Ma. Bi zimanê Farisî, Tehran, 1958, K. Ziringar.

9- Ez Mihabad Xwînîn ta Kiranehayî Rudars, bi zimanê Farisî, Tehran, 1948, Nb Pîsyan.

10- El- Cemu'ete el- Ehsaîyet'ul Sinwiyye, bi zimanê Erebî, Bexda, 1958.

11- Eynî serokanî, bi zimanê Erebî, Bexda, 1969.

12- Afxanîstana Îro, bi zimanê Rûsî, Moskova, 1960.

13- Ansîklopedîya Brîtanîya.

14- Ansîklopedîya Mezin a Sovyetê.
15- Îrana Îro, bi zimanê Rûsî, Moskova, 1957.
16- Weşanên Banka Millî ya Îranê, 1959.
17- Berhemê Muzakera Warê Qedera Xwe bi Xwe Tayîn Kirinê.
18- Programa Partîyên Komunîst ên Rojhilat, Moskova, 1934.
19- Belûcî, bi zimanê Rûsî, 1959, M.Pîkolîn.
20- Beyannama Konferansa Duyem a Partîya Komunîst a Iraqê, bi zimanê Erebî, 1956.
21- Manîfestoya Partîya komunîst, Marks, Engels.
22- Proletarya Şoreşger û Mafê Netewan a Qedera Xwe bi Xwe Tayîn Kirinê, Lenîn.
23- Pêşdeçûna Aborî û Mesela Çandinî di Sedsala 20'an de, bi zimanê Rûsî, 1921, M.B. Wolontir.
24- Pêşdeçûna Sermayedarî li Rûsya, bi zimanê Çekî, Prag, 1952, Lenîn.
25- Peywendîyên Çandinî li Kurdistana Îro, bi zimanê Azerbeycanî, Bako, 1955, 'A. Gelawêj.
26- Tarîxê Zend, bi zimanê Farisî , Tehran, 1956, Doktor Hîdayetî.
27- Tarîxê Merdux, bi zimanê Farisî.
28- Teqwîm Ferhengê Mahabad, 1954-1955
29- Tehran Ekonomîst, bi zimanê Farisî, 1962.
30- Coxrafya Îqtîsadî Îran, bi zimanê Farisî, T.Behramî.
31- Coxrafya Kurdistan, bi zimanê Farisî, A.S. Himdanî.
32- Coxrafya Kişawirzî Îran, bi Farisî, T. Behramî.
33- Coxrafya Nizamî Kurdistan, bi zimanê Farisî, Tehran, C. Rizimara.
34- Coxrafya Tirkîyê, çapa Rûsî, Moskova, 1959, B. Darkut.
35- Çend Name Di Warê Sermaye de, bi zimanê Çekî, Prag, 1957, Engels.
36- Afirandinên Giştî, bi zimanê çekî, Lenîn.
37- Dîtnîha û Şîndnîhayî Îran, bi zimanê Farisî, Tehran, 1950, M. Danişwar.
38- Raporek di Warê Kar û Barên Konsorsîyoman di Sala 1959'an de, bi zimanê Farisî, Tehran, 1960.
39- Raporek ji Sefera Wilayetên Rojavayê Îranê, bi zimanê Rûsî, Tîflîs, 1905.

40- Rapora Damezrandina Plan Kirinê, hejmar: 12, 1960.
41- Serîhildana Rizgarîxwazîya Netewî ya sala 1920'an a Iraqê, bi zimanê Rûsî, Moskova, 1958, D.N. Katlov.
42- Rojname:
a) Etla'at, Farisî.
b) Bamşad, "
c) Keyhan, "
d) Rehber, "
e) Mîhr Îran "
f) Baxtir Emroz "
g) Millet, Tirkî.
h) Kim, "
i) Vakit, "
j) Le Monde, Fransizî.
43- Rojhilata Navîn di Kar û Barê Cîhanî de, bi Farisî, Tehran, 1950, G. Lînçifkî.
44- Rojhilata Nêzîk Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem, 1918-1923, bi zimanê Çekî, Prag, 1951, A.F. Mîller.
45- Rewdet'ul Sefa, Tarîx.
46- Riya Xebatê, çapa Çekî, Prag, 1952, S. Üstüngil,
47- Serhejmara Giştî ya Nifûs û Mesken, cilda 24'an a bajarê Seqiz, cilda 28'an a bajarê Kirmanşah, cilda 55'an a bajarê Mahabad, bi zimanê Farisî, Tehran.
48- Hejmartina Taybetî ya Têkoşîna Çandinî û Madenan di sala 1958-1959'an de, Tehran, 1960.
49- Hejmartina Demografîk a Salane ya Komela Netewên Yekgirtî, bi zimanê Fransî, 1956.
50- Sermaye, bi zimanê Çekî, Prag, 1956, Marks.
51- Seferek bi Kurdistana Bakur de, sala 1902, Deng û Behsên Qafqas, Beşê Hevde, bi zimanê Rûsî, K.N. Simîrnov.
52- Şaname, bi zimanê Farisî, Firdewsî.
53- Şoreşên Kurd, bi zimanê Kurdî, Bexda, 1959, E. Seccadî.
54- Şerefname, Emîr Şerefxan Bitlîsî.
55- Ferhenga Coxrafya Îranê, bi Farisî, Tehran, 1949-1954.
56-Qazanca Petrolê di Welatên Sermayedarî de, bi zimanê Rûsî, Moskova, 1962.
57- Qamusu'l-'Elam, Stenbol, 1896.

58- Qwanîn Mesubeî Meclîsê Şuraî Millî, bi zimanê Farisî, Tehran.
59- Kurd û Pêwîstek Nijadê Wî, bi zimanê Farisî, Tehran, 1956.
60- Kurtîyek ji Dîroka Îranê, bi zimanê Rûsî, Moskova, 1952, M.S. Îvanov.
61- Kurd Di Şerê Navbera Rûsya, Tirkîye û Îranê de di Sedsala 19'an de, bi zimanê Rûsî, Tiflîs, 1900.
62- Kurd û Emperyalîst, weşanên Deng û Behsên Rojhilata Navîn, bi zimanê Rûsî, Taşkend.
63- Kurd, B.A. Aviryanov.
64- Kurdên Mukrî, Di Komele û Gotarên Etnografya ya Asya Nêzîk, bi zimanê Rûsî, Moskova, 1958, L.Wîlçîvskî.
65- Kemalîst, çapa Çekî, 1938, M. Tekinalp. -Yên Kemalîst
66- Ginc Şaygan, bi zimanê Farisî, Berlîn, M. Cemalzade.
**67- Kovar:**
a) Micelleî Îqtisadî Îran, Farisî
b) Tufan Xerb, "
c) Senendec "
d) Yixma . "
e) Rojhilata Şoreşger, Rûsî
f) Rojgarî Taze F. Stîpanov 1949.
g) Meselên Aşîtî û Sosyalîzmê.
68- Gelên Asya Navîn, bi zimanê Rûsî, Moskova, 1957.
69- Di Warê Peywendîyên Civakî û Aborîya Îranê de, bi zimanê Rûsî, Tiflîs, 1905, L.N. Tîgrianov.
70- Di Warê Cîgirbûna Netewayetî ya Kurdan de li Îranñê, Moskova, 1955, A.G. Akopov.
71- Di Warê Derebegî Di Nav Kurdan e, bi zimanê Rûsî, Êrîvan, 1936, A.Z. Şemîlov.
72- Ji Uman Heta Amêdê, bi zimanê Erebî, 'E. S. Goranî.
73- Mafê Gelan ê Qedera Xwe bi Xwe Tayîn Kirin,, çapa Çekî, Lenîn.
74- Mesela Kurd, M. Pogoryalov, kovara Şer û Şoreş, bi Rûsî.
75- Dîroka Cîhanê, bi zimanê Rûsî, Moskova, 1955.
76- Dîroka Cîhanê, çapa Çekî, Prag, 1960.
77- Dîroka Dîplomasîyê, çapa Çekî.
78- Namek Nehênî, kovara Dinya, 1958, Tehran, M. Firuxî.

79- Namek ji Karker û Gundîyên Ukraynê re, Lenîn.
80- Nizhetu'l-Qilûb, Hemdullah Mestufî.
81- Petrol û Sîyaseta Derve, bi zimanê Çekî, Prag, 1950, A. Brûksî.
82- Çandinî û peywendîyên Çandinîyê li Îranê di sedsala 12 û 14'an de, bi zimanê Rûsî, Moskova, 1960.
83- Rewşa Çekoslovakya di Aborîya Cîhanê de, bi zimanê Çekî, Prag.

## Fransizî

1- Archives Nationales de France, Correspondance Consulaire, Baghdad.
2- Balsan. F: Les Surprises du Kurdistan Paris 1945.
3- Binder. H: Au Kurdistan, en Mesopotamie et Perse, Paris 1881.
4- Fany. M: La Nation Kurde et son Evolotion Sociale, Paris 1933.
5- Ch. A. Hooper: L'Iraq et la Société des Nations, Paris 1926.
6- Malcolm. Sir John: Historie de la Perse Paris 1821.
7- Nikitine. B: Les Kurdes, Etude Sociologique et istorique, Paris 1956.
8- Nikitine. B: Les Afchars d'Urmuyeh, Journal Asiatique, Jan-Mars 1929.
9- Rambout. L: Les Kurdes et le Droit, Paris 1947.
10- Rechid Ahmed: Les Droits Minoritaires en Turquie, dans le Passé et le Prêsent, Paris 1935.
11- Romanette. L: Le Kurdistan et la Question Kurde, Paris 1937.
12- Rousseau. L: Notice Historique sur la Perse Amcienne et Moderne et ses Peuples en Général Marseille 1818.
13- Sekban. Ch. Dr: La Question Kurde, Paris 1933.

## Îngilîzî

1- Douglas. W: Strange Lands and Friendly People London 1952
2- Economic Developments in the Middle East, 1958-1959, U. N. New York

3- Foreign office No. 62. Armenia and Kurdistan, London 1920.
4- Foreign Trade Statistics of Iran 1958-1962 Tehran.
5- Gavan. S. S: Kurdistan, Divided Nation of the Middle East London 1958.
6- Iran today, Tehdan 1950.
7- Lambton. A: Landlord and Peasant in Persia, London 1953.
8- Lenin. V.I: Questions of National Policy and Proletarian Internationalism Moscow.
9- Lenin. V. I: On "Cultural and National" Autonomy works Val. 19 (czech ed.)
10- Middle East Economic Digest, February 1960 and February 1961 London.
11- Monthly Abstracts of Statistics May 1963.
12- Monthly Bulletin of Statistics U.N. New York 1963-1971.
13- Petroleum Press Service February 1963 London.
14- Question of the Frontier between Turkey and Iraq, League of Nations, Geneva 1925.
15- Roosevelt. A: The Kurdish Republic of Mahabad, Middle East World Petroleum Industry, New York 1961.

## Almanî

1- Moltke. H: Briefe aber Zustande und Begeberheiten in der Turkei aus den Jahren 1835-1839 Berlin 1941.

## Îtalî

1- Garzonî. M: Grammatica Vocabolaria della Lingua Kurda, Roma 1787.

## Tirkî

1- Dersimi. N: Kurdistan Tarihinde Dersim, Halab 1952.
2- Türkiye Îstatistik Yıllığı, Ankara 1968.

## Jîna Nû Yayınları

1-Images du Kurdistan de Turquie, **Şuayip Adlığ**
2-Dêngê Xêzikan, **Mamoste**
3-1925 Kürt Ayaklanması (Şeyh Sait Hareketi), **Prof. M. A. Hasretyan, Dr. K. Ahmad, M. Ciwan**
4-Ronahi (1942-1945 yılları arasında çıkmış olan Ronahî dergisinin tüm sayılarının bir arada tıpkıbasımı)
5-Jiyana Rewşenbîrî û Siyasî ya Kurdan (Di Dawiya Sedsala 19'a û Destpêka Sedsala 20'a de), **Dr. Celîlê Celîl**
6-Büyük Anayurt Savaşında Kürtler (1941-1945), **H. M. Çetoev**
7-Komara Demokratîk a Kurdistan (Mehabad), **Kerîmî Husamî**
8-Roja Nû (1943-1946 yılları arasında çıkmış olan Roja Nû gazetesinin tüm sayılarının bir arada tıpkıbasımı)
9-Le Bîreweriyekanim-I, **Kerîmî Husamî**
10-Yüzyılımızın Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet, **Malmîsanij**
11-Hêsir û Baran (kurteçîrok), **Bavê Nazê**
12-Zazaca-Türkçe Sözlük (Ferhengê Dimilkî-Tirkî), **Malmîsanij**
13-Agirê Sînema Amûdê, **M. Ahmedê Namî**
14-Na Xumxum a..., Arêkerdox: **Koyo Berz**
15-Bir Kürtle Konuşma (şiir), **Adonis Buduris**
16-Herakleîtos (şiir), **Malmîsanij**
17-Dîwana Rûhî, Şêx **Abdurrehmanê Axtepî**
18-Şaîrên Klasîk ên Kurd, **Abdulreqîb Yûsuf**
19-Li Kurdistana Bakur û li Tirkiyê Rojnamegeriya Kurdî (1908-1981), **Malmîsanij** & **Mahmûd Lewendî**
20-Zargotina Kurdên Sûriyê, Amadekar: **Dr. Celîlê Celîl**
21-İki Dünya Savaşı Arasında Irak'ta Kürt Sorunu, **Prof. Şakirê Xidoyê Mihoyan**
22-Zimanê Min-I, **Haydar Diljen**
23- Saîd-î Nursî ve Kürt Sorunu, **Malmîsanij**
24-Hunerê Tabloyên Şerefnamê, **Abdulreqîb Yûsuf**
25-Folklorê me ra çend numûney,**Arêkerdox: Malmîsanij**